



KT

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**AWAYÊ LÊKIRINA NAVAN LI HERÊMA DÊRIKÊ
(LÊKOLÎNEKE ONOMASTÎK-SOSYOLOJÎK)**

Serdar Öçal

12711004

Mêrdîn 2016

KT

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**AWAYÊ LÊKIRINA NAVAN LI HERÊMA DÊRIKÊ
(LÊKOLÎNEKE ONOMASTÎK-SOSYOLOJÎK)**

Serdar Öçal

12711004

Şêwirmend

Prof. Dr. Farouk İsmail

Mêrdîn 2016



TC

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**DERİK YÖRESİNDE AD VERME BİÇİMLERİ
(ONOMASTİK-SOSYOLOJİK BİR İNCELEME)**

Serdar Öçal

12711004

Tez Danışmanı

Prof. Dr. Farouk İsmail

Mardin 2016

TEAHUDNAME

JI RÊVEBERÎYA ENSTITÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ RE

Ez li xwe digrim ku min ev teza xwe ya bi navê ‘‘Awayê Lêkirina Navan li Herêma Dêrikê (Lêkolîneke Onomastîk-Sosyolojîk)’’ li gor Rêvebernameya Perwerde-Hîndekarî û Azmûnan ya Lîsansa Bilind ya Zanîngeha Mardin Artukluyê amade kiriye û ev tez bi giştî xebata min e û min ji bo her jêgîrekê çavkanî nîşan daye û min ew li gor rêbernameya rênûsa tezan nivîsîye û her weha ez pesend dikim ku kopîyayên kaxezî û elektronîk yên teza min di arşîvên Enstîtuya Zanistên Civakî yên Zanîngeha Mardin Artukluyê de, wekî di şerd û mercên li jêr min daye xuyakirin de were hilanîn.

Ez daxwaz dikim ku li gor Rêvebernameya Perwerde-Hîndekarî ya Lîsansa Bilind tiştê pêwîst e were kirin.

- Giştîyê teza min dikare ji bo gihîna herkesî vekirî be.
- Teza min dikare tenê li wargehên Zanîngeha Mardin Artukluyê ji gihîne re vekirî be.
- Ez dixwazim teza min ji bo ... salan ji gihîne re girtî be. Di dawîya vê demê de heger ez ji bo dirêjkirinê serî lê nedim, giştîyê teza min ji her derê ve ji bo gihîne dikare were vekirin.

21.01.2016

Serdar Öçal

JI RÊVEBERÎYA ENSTITÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ RE

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de wekî teza lîsansa bilind hatîye pejirandin.

(îmze)

Serok :

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

Pesendkirin:

Ez pesend dikim ku îmzayên jorîn, yê endamên perwerdeyê yê navborî ne.

(Îmze)

Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav

Rêveberê Enstîtûyê

(Mohr)

PÊŞGOTIN

Ziman, sazîyeke civakî ye ku mirovan li ser li hev kiriye. Ji ber vê li hevkirinê ye ku di nava civatê de her bêje, peyv û hevok, ji bilî hin rewşên taybet yên bi peywendîyê ve girêdayî, ji bo herkesî tê heman wateyê. Ji bilî hin bêjeyên nuh û yên çîroka çêbûna wan dîyar, hemî bêjeyên din di demên kevnar û nedîyar de çêbûne. Di çêkirina van bêjeyan de vîna yekayek mirovan tune ye, ev kar karekî anonîm û civakî ye.

Mirov dema ku bi zarotî dest bi peyvê dike, zimanekî amade dibîne li hemberî xwe û wekî herkesê di nava civatê de vî zimanî dipejirîne. Ziman berî wî, ji alîyê civatê ve hatîye çêkirin, lê belê di nava pergala û derfetên zimên de, di hin waran de vîna mirovan yekayek jî heye. Ev vîna bi awayeke zelal di warê navlêkirinê de, nexasim di lêkirina hin navên taybet de xuya ye. Wek mînak, zarokekî we çêbibe yan jî hun ji xwe re pisîkekê, kuçikekî xwedî bikin, hun ji xwe re şîrketekê yan jî komeleyekê ava bikin, pirtûkekê binivîsin, avahîyekê çêkin, li gor derfetên zimên, hun kîjan navî bixwazin hun dikarin lê kin yan jî navekî nuh jê re çêkin. Lê ev nayê vê wateyê ku hemî navên taybet bi vîna mirovan ya eşkere çêbûye. Navê gel û welatan, ziman û netewan, bajar û gundan, çem û golan, ol û mezheban û gelek navên din yên taybet, bêyî vîna eşkere ya mirovekî, wekî bêjeyên din, di demên ne dîyar de û ji alîyê civakê ve bi awayeke anonîm hatine çêkirin. Her çend pîranîya navên taybet ji alîyê civakê hatibe dayin jî, mirov dikare li ser bixebite bê ka navên taybet li gor çî û bi çî awayî hatine dayin. Di bin banê zimannasîyê de zanista ku vê xebatê dike, ango zanista li ser navên taybet dixebite, “onomastîk” e.

Li gelek welatên rojava li ser onomastîkê kongre tîna lidarxistin, kovara tîna derxistin, di enstituyên zimanan de li ser her cûre navên taybet lêkolîn tîna kirin. Bi taybetî jî li Amerîka komeleya bi navê “American Name Society”, li Frensa Konseya Navnetewî ya Zanistên Onomastîkê (International Council of Onomastic Sciences) û kovara wê ya bi navê “Onoma” çavkanîyên girîng in. Ev her du sazî jî bi rêya malperên xwe yê înternetê jî encamên lêkolînan, nivîsên akademîk diweşînin. Kovara Onoma di heman demê de kovareke bi hakem e. Li ser onomastîkê bi kurdî em li tu xebatê rast nehatin. Di tirkî de jî xebatên li ser onomastîkê gelekî kêmtir in. Ji bilî zimannasîyê, zanistên wek dîrok, dîroka çandê, psîkolojî, perwerde, felsefe, ol, etnolojî,

civaknasîya derûnî û antropolojî jî dikare ji lêkolînên onomastîkê sûdê wergirin. Ji ber van girîngîyan û ji ber valahîya di vî warî de me xebateke li ser onomastîkê pêwist dît.

Ev xebat li ser sê mijarên onomastîkê, li ser navê mirovan (anthroponym), li ser navê jîngeh û teşeyên erdnigarî (toponym) û li ser navê eşîr û malbatan (ethnonym) e. Ji ber ku qada xebatê Dêrika Çîyayê Mazî ye û têkilîya lêkirina navan bi civakê re jî heye, me sosyolojîya Dêrikê jî ligel lêkolîna onomastîk kire armanca xebatê. Ji bo navê mirovan me ji navenda Dêrikê du dibistan û ji gundên Dêrikê jî çar gund (Qizil, Bixur, Fitin û Xarok) hilbijartin. Li her du dibistanan me navê şagirtan û anketên ku me bi wan re çêkirin û li çar gundan jî me lîsteyên hilbijêran û lîsteyên dibistanên seretayî yên van gundan wek kereste bikaranî. Bi vî awayî me xwest em fêhm bikin bê li herêma Dêrikê navê mirovan yê herî pir tî bikananîn kîjan in, navên tî bikananîn bi kîjan zimanan in, meyla lêkirina navan çawa ne, tiştên ku baondorê li navlêkirina zarokan dike çi ne û hwd.

Ji bo xebata li ser navê teşeyên erdnigarî û navê eşîr û malbatan, me ji nava Dêrikê û hemî gundên wê nav tomar kirin. Xebata herî zor û bi zehmet ev bû. Dûv re me ev navên tomarkirî, li gor pergala çêbûna wan, dabeş kirin. Ji ber ku ji bo berhevkirina navan em çûn hemî gundên Dêrikê û ji her gundekî kêmanî me bi du sê heb şênî re hevdîtîna pêk anî. Di van hevdîtînan de ji bilî tomarkirina navên teşeyên erdnigarî û navê eşîr û malbatan, me hewl da ku em agahîyên sosyolojîya herêmê û taybetmendîyên devokî, çandî, dîrokî û folklorî jî bidin hev. Ji bilî gera li nava gundan, ji bo ku em navê kuçe, kolan û taxên Dêrikê, navê eşîr û malbatên li navendê bidin hev, gera li navenda navçê jî pêwist bû. Her weha li navendê jî me bi gelek mirovan re hevdîtîna pêk anî û me agahîyên sosyolojîk, dîrokî, folklorîk, çandî û hwd. jî dan hevdû. Ji ber wê em dikarin bibêjin çavkanîyên vê xebatê yê herî girîng ev beşdarvanên li navendê û li gundan in ku me hevdîtîna bi wan re pêkanîye.

Beşa navê mirovan, ji ber ku keresteyên wê bêtir bûn, ji beşên din dirêjtir e. Di vê beşê de berî ku em agahîyên lêkolînên li ser navê mirovan bidin, pêşî em di heqê wan gundan de agahîyên sosyolojîk, dîrokî, çandî, aborî û hwd. didin. Beşa navê teşeyên erdnigarî jî ji ber heman sedemê ji beşa navê eşîr û malbatan dirêjtir e. Beşa navê eşîr û malbatan beşa herî kin bû, ji ber ku hejmara eşîr û malbatan, li gor keresteyên beşên din kêmtir e, mînakên me ji van navan daye jî kême e. Mijarên beşa destpêkê jî ji ber ku pir

bûn, ev beş dirêj hatîye nivîsandin. Di vê beşê de ligel metodên lêkolîna mijarên onomastîkê, Dêrik bi taybetmendîyên xwe, ji alîyê sosyolojî, dîrok, erdnigarî, ziman û devok, wêjeya gelêrî û hwd. ve hatîye nasandin.

Ji bo tespîtîkirina mijara tezê û di danîna çarçoweya wê de û di hemî pêvajoya xebatê de ji bo alîkarîya şewirmendê xwe Mamoste Prof. Dr. Farouk Îsmail sipasdar im. Ji bo hemî beşdarvanên ku min hevdîtin bi wan re çêkirin, bi taybetî şênîyên Qizilê, Bixurê, Fitnê û Xarok û yên li navenda Dêrikê û gundên wê yî din sipasdarim ku derîyên xwe li min vekirin û bi dilovanî alîkarîya min kirin. Ji mamosteyê erdnîgarîyê Ramazan Baği re jî sipas dikim ku di derheqê têgehên erdnîgarîyê û taybetmendîyên wan de ez zelal kirim. Ji bo Miray Ulusoy û Fahriye Adsay jî sipasîyên xwe pêşkêş dikim ku di nivîsandina kurteya Îngilîzî de alîkarîya min kirin. Ji bo sebr û piştgirîya malbata xwe û bi taybetî kurê xwe Siwar jî sipasdar im ku di pêvajoya xebatê de bi awayeke mecbûrî ez ji wan dûr mam, carinan min ew tenê hêştin.

Serdar Öçal

KURTE

Di qabilîyeta zimên ya gerdûnî de kiryareke girîng jî ‘‘lêkirina navan’’ e. Mirov nava li her tiştê ku pê re di nava têkilîyê de ye dike. Bi vî awayî bi navlêkirinê mirov serwerîyê li der û dora xwe dike, bi xêra van navan, heyînan ji hev vediqetîne, wan nas dike û dide naskirin. Beşek ji van navan, ‘‘navên taybet’’ in. Navên taybet bi çi awayî tînin dayin, meylên navlêkirinê çi ne, rêbazên navlêkirinê bi rêk û pêk in yan na? Onomastîk, binbeşek zanista zimannasîyê ye ku li bersîva van pirsan digere ango li ser navên taybet û awayê çêbûna wan dixebite.

Hemî cûreyên navên taybet dikare bibe mijara lêkolînên onomastîk. Navê mirovan, navê çîya, gir û zinaran, navê kuçe, kolan, gund, bajar û welatan û hwd. Girîngîya lêkolînên onomastîk ji bo zimanekî ev e ku, onomastîk ji bilî zimannasîyê dikare di derheqê bandora şaristanîyên kevn, çand û neteweyên bîyanî, awayê jîyana civakî ya li ser wî zimanî gelek agahdarîyan bide. Li welatên Rojava ev girîngîya onomastîkê tê zanîn, lê di tirkî û kurdî de di vê qadê de valahîyeke mezin heye.

Ev xebat, li herêma Dêrika navçeya Mêrdîn, bi navê xwe yê din Dêrika Çîyayê Mazî, li ser sê mijarê onomastîkê û li ser sosyolojîya Dêrikê ye. Mijarên xebatê yê onomastîk navê mirovan (anthroponym), navê jîngeh û teşeyên erdnigarî (toponym) û navê eşîr û malbatan (ethnonym) e. Dêrik, herêmeke kurmancîaxêf e. Ji ber wê di lêkolîna sosyolojîk de ligel taybetmendîyên civakî, dîrokî û erdnigarî yê herêma Dêrikê; me xwest em li ser devokê Dêrikê, li ser wêjeya gelêrî ya li herêma Dêrikê û mînakên berhemên gelêrî jî hin agahîyan bidin.

Peyvên sereke: Onomastîk, awayên navlêkirinê, anthroponym, toponym, ethnonym, Dêrik, sosyolojîya Dêrikê, dîroka Dêrikê, erdnigarîya Dêrikê

ÖZET

Evrensel dil kabiliyeti içinde önemli eylemlerden biri de ‘ad verme’ eylemidir. İnsanoğlu etkileşim içinde olduğu her şeye isim vermektedir. Böylece insanlar, varlıklara isim vererek çevreleri üzerinde bir iktidar kurar, bu isimler sayesinde varlıkları birbirinden ayırt eder, onları tanıyıp tanıtırlar. Bu adların bir bölümü ‘özel adlar’dır. Özel adlar nasıl verilir, ad verme eğilimleri nelerdir, ad verme yöntemleri belli bir düzene göre mi işliyor yoksa belli bir yöntem yok mudur? Onomastik, dilbilimin bu sorulara cevap arayan bir alt bilim dalı olarak özel adları ve bunların oluşum biçimlerini inceler.

Bütün özel ad çeşitleri onomastik araştırmalara konu olabilir. İnsan isimleri, dağ, tepe isimleri, sokak, cadde, köy, şehir, ülke isimleri vb. Onomastik araştırmaların bir dil için önemiyile ilgili denilebilir ki, dilbilim alanı dışında onomastik araştırmalar eski medeniyetlerin, yabancı kültür ve milletlerin ve sosyal yaşam biçimlerinin o dil üzerindeki etkileri hakkında birçok fikir verebilir. Batı’da onomastik biliminin önemi bilinmekte; ancak Türkçe ve Kürtçede bu alanda büyük boşluklar bulunmaktadır.

Bu çalışmada, Mardin’in Derik ilçesinde, diğer ismiyle Dêrika Çîyayê Mazî yöresinde, onomastiğin üç konusu ve Derik’in sosyolojisi ele alınmıştır. Çalışmanın onomastik konuları insan isimleri (anthroponym), yerleşim yeri ve coğrafi yer şekillerinin isimleri (toponym) ile aşiret ve aile isimleri (ethnonym) dir. Derik, Kürtçe’nin Kurmanci lehçesinin konuşulduğu bir yöredir. Bu yüzden sosyolojik araştırmada Derik’in sosyal, tarihi ve coğrafi özelliklerinin yanı sıra istedik ki Derik ağzı, Derik yöresine özgü halk edebiyatı ürünlerinin örnekleri hakkında da biraz bilgi verelim.

Anahtar Sözcükler: Onomastik, ad verme biçimleri, anthroponym, toponym, ethnonym, Derik, Derik’in sosyolojik yapısı, Derik tarihi, Derik’in coğrafi yapısı

ABSTRACT

One of important practices of language competence is denomination. Human beings denominates everything they interact with. Thus, human beings control their environment through denominating beings while they distinguish beings and know them. Some of these names are ‘proper nouns’. How are proper nouns given, what are the tendencies of naming, are there any order in terms of naming methods or is it arbitrary? Onomastics as a subsection of linguistics that seek answers to these questions survey the proper names and the formation of them.

All types of proper nouns can be subject for onomastics studies. Names of people, mountains, hills, street, avenues, villages, cities, and countries etc. It can be said about the importance of onomastic study for a language that out of the linguistic onomastic studies express ideas on the effects of ancient civilization, alien cultures and nations and their social life patterns on own language. In the western world the significance of onomastics is known; however, there are huge gaps in this area in Turkish and Kurdish.

In Derik district of Mardin or under the name of Dêrika Çîyayê Mazî district in another saying the three subjects of onomastics and sociology of Derik is discussed in this study. Study’s onomastic topics are listed as names of people (anthroponym), settlements and geographical fundamentals names (toponym) and the names of tribes and families (ethnonym). Derik is a region where Kurmanci idiom of Kurdish spoken. Therefore, it is aimed in this study to slightly inform about not only the social, historical and geographical features of Derik but also Derik’s idiom, folk literature items.

Key words: onomastic, forms of naming, anthroponym, toponym, ethnonym, Derik, Derik’s social structure, history of Derik, Derik’s geographical fundament.

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	IV
ÖZET	V
ABSTRACT	VI
LÎSTEYA TABLOYAN	XI
LÎSTEYA WÊNEYAN	XIV
KURTEBÊJE	XV
PÊVEK	XVI
I. DESTPÊK	1
I.1. NAVLÊKIRIN	6
I.2. ONOMASTÎK	7
I.3. LÊKOLÎNA ONOMASTÎK	10
I.3.1. Lêkolîna Li Ser Navê Mirovan (Anthroponym).....	11
I.3.2. Lêkolîna Li Ser Navên Erdnîgarî (Toponym).....	13
I.3.3. Lêkolîna Li Ser Navê Eşîr û Malbatan (Ethnonym).....	16
I.4. LÊKOLÎNA SOSYOLOJÎK	17
I.5. TAYBETMENDÎYÊN HERÊMA DÊRIKÊ	19
I.5.1. Erdnîgarîya Dêrikê.....	19
I.5.2. Dîroka Dêrikê.....	25
I.5.2.1. Avakirina Dêrikê, Mala Dawidê Kalo û Mala Qeya.....	32
I.5.2.2. Şerê Dêrikîyan.....	33
I.5.2.3. Şerê Qoto Meqso.....	34
I.5.2.4. Teyarê Qereçolî.....	35
I.5.3. Sosyolojîya Dêrikê.....	36
I.5.3.1. Serjimêrîya Dêrikê.....	36

I.5.3.2. Rewşa Perwerdeyê Li Dêrikê	37
I.5.3.3. Rewşa Bingeha Civakî Li Dêrikê	38
I.5.3.4. Ol û Mezheb Li Dêrikê	42
I.5.3.5. Rewşa Eşîrtîyê Li Dêrikê	42
I.5.3.6. Rewşa Zimên Li Dêrikê	48
I.5.3.7. Rewşa Folklorê Li Dêrikê.....	49
II. NAVÊ MIROVAN LI HERÊMA DÊRIKÊ.....	52
II.1. NAVÊ ŞAGIRTAN LI DERİK ANADOLU LİSESİ.....	52
II.2. NAVÊ ŞAGIRTAN LI ATATÜRK ORTAOKULU.....	67
II.3. QIZIL Ê REWŞA NAVÊ MIROVAN LI QIZILÊ.....	78
II.3.1. Cih, Erdnîgarî û Serjimêrîya Qizilê.....	78
II.3.2. Dîrok û Binyada Civaka Qizilê.....	79
II.3.3. Aborîya Qizilê.....	82
II.3.4. Jîyan Li Qizilê	83
II.3.5. Çand û Kevneşopî Li Qizilê	85
II.3.6. Rewşa Navê Mirovan Li Qizilê.....	87
II.4. BIXUR Ê REWŞA NAVÊ MIROVAN LI BIXURÊ.....	97
II.4.1. Cih, Erdnîgarî û Serjimêrîya Bixurê.....	98
II.4.2. Dîrok û Binyada Civaka Bixurê.....	99
II.4.3. Aborîya Bixurê.....	100
II.4.4. Jîyan li Bixurê	102
II.4.5. Çand û Kevneşopî li Bixurê	104
II.4.6. Rewşa Navê Mirovan Li Bixurê.....	108
II.5. FITIN Ê REWŞA NAVÊ MIROVAN LI FITNÊ.....	117
II.5.1. Cih, Erdnîgarî û Serjimêrîya Fitnê.....	117

II.5.2. Dîrok û Binyada Civaka Fitnê.....	118
II.5.3. Aborîya Fitnê.....	121
II.5.4. Jîyan li Fitnê	122
II.5.5. Çand û Kevneşopî li Fitnê	124
II.5.6. Rewşa Navê Mirovan Li Fitnê.....	129
II.6. XAROK Ê REWŞA NAVÊ MIROVAN LI XAROK.....	132
II.6.1. Cih, Erdnîgarî û Serjimêrîya Xarok.....	132
II.6.2. Dîrok û Binyada Civaka Xarok.....	133
II.6.3. Aborîya Xarok.....	137
II.6.4. Jîyan li Xarok	138
II.6.5. Çand û Kevneşopî li Xarok	140
II.6.6. Rewşa Navê Mirovan li Xarok.....	144
II.7. ENCAMA BEŞÊ	149
II.7.1. Rewşa Sosyolojîya Herêma Dêrikê.....	149
II.7.2. Rewşa Çanda Gelêrî li Herêma Dêrikê.....	155
II.7.2.1. Rewşa Zaravayê Kurmancî li Dêrikê	156
II.7.2.2. Rewşa Devokê Dêrikê.....	161
II.7.2.3. Rewşa Kevneşopîyan li Herêma Dêrikê.....	166
II.7.3. Rewşa Navê Mirovan li Herêma Dêrikê.....	172
III. NAVÊN ERDNÎGARÎ LI HERÊMA DÊRIKÊ.....	181
III.1. NAVÊ DÊRIKÊ Ê TAX, KOLAN Ê KUÇEYÊN WÊ.....	181
III.2. NAVÊ GUNDÊN DÊRIKÊ.....	187
III.3. NAVÊ TEŞEYÊN ERDNÎGARÎ LI HERÊMA DÊRIKÊ.....	194
III.3.1. Navê Teşeyên Erdnîgarî Yên bi Navê Riwekekê re Çêbûne.....	199
III.3.2. Navê Teşeyên Erdnîgarî Yên bi Navê Ajalekê re Çêbûne.....	200

III.3.3. Navê Teşeyên Erdnîgarî Yên bi Navê Mirovan re Çêbûne.....	201
III.3.4. Navê Teşeyên Erdnîgarî Yên li Gor Taybetmendîyeke Erdnîgarî-Xwezayî Çêbûne.....	203
III.3.5. Navê Teşeyên Erdnîgarî Yên li Gor Jîyana Civakî Çêbûne.....	204
III.3.6. Navê Teşeyên Erdnîgarî Yên bi Rengdêrên Reng, Pîvan, Hêl û Hejmaran Çêbûne.....	205
III.3.7. Navên bi Avahîyekê, Şûnwarekê re Têkildar.....	206
III.3.8. Navê Mêlavan û Çîrokên Wan	206
III.3.9. Navên Xwerû û Yên Wateya Wan Ne Dîyar.....	207
III.4. ENCAMA BEŞÊ.....	208
IV. NAVÊ EŞÎR Û MALBATAN LI HERÊMA DÊRIKÊ.....	214
IV.1. NAVÊ EŞÎRAN LI HERÊMA DÊRIKÊ.....	214
IV.2. NAVÊ MALBATAN LI HERÊMA DÊRIKÊ	219
IV.3. ENCAMA BEŞÊ.....	222
V. ENCAMA GIŞTÎ.....	224
VI. ÇAVKANÎ.....	228
PÊVEK.....	231
1. Kaxeza Pirsan.....	232
2. Mînakek Lîsteya Hilbijêran.....	234
3. Mînakek Lîsteya Şagirtan.....	235
4. Anketa li DAL'ê û Ata. O.'yê Hatîye Çêkirin.....	236
5. Wêne ji Herêma Dêrikê.....	237
6. Nexşeya Dêrikê û Çar Gundan.....	243

LÎSTEYA TABLOYAN

- Tablo 1:** Hejmar û Rêjeya Navan (DAL)
- Tablo 2:** Navê Keçan, yên Herî Kêm Du Caran Hatîye Bikaranîn (DAL)
- Tablo 3:** Navê Lawan, yên Herî Kêm Du Caran Hatîye Bikaranîn (DAL)
- Tablo 4:** Hejmar û Rêjeya Navan li Gor Zimanan (DAL)
- Tablo 5:** Navên Têkel (DAL)
- Tablo 6:** Şagirtên Dunavo (DAL)
- Tablo 7:** Rewşa Temenê Şagirtan (DAL)
- Tablo 8:** Navên Kurmancî, li Gor Temenê Şagirtan (DAL)
- Tablo 9:** Bernavê Şagirtan, Navê Duyemîn (DAL)
- Tablo 10:** Perwerdeya Dê û Bavê Şagirtan (DAL)
- Tablo 11:** Navê Şagirtan bi Kurmancî be Perwerdeya Dê û Bavan (DAL)
- Tablo 12:** Navê We Kê li We Kiriye? (DAL)
- Tablo 13:** Hun Zanin Ev Nav ji bo Çi li We Bûye? (DAL)
- Tablo 14:** Hun bi Wateya Navê Xwe Zanin? (DAL)
- Tablo 15:** Hun ji Navê Xwe Hez Dikin? (DAL)
- Tablo 16:** Hejmar û Rêjeya Navan (ATA. O.)
- Tablo 17:** Navê Keçan, yên Herî Kêm Du Caran Hatîye Bikaranîn (ATA. O.)
- Tablo 18:** Navê Lawan, yên Herî Kêm Du Caran Hatîye Bikaranîn (ATA. O.)
- Tablo 19:** Hejmar û Rêjeya Navan, Li Gor Zimanan (ATA. O.)
- Tablo 20:** Navên Têkel (ATA. O.)
- Tablo 21:** Rewşa Temenê Şagirtan (ATA. O.)
- Tablo 22:** Navên Kurmancî, li Gor Temenê Şagirtan (ATA. O.)
- Tablo 23:** Bernavê Şagirtan, Navê Duyemîn (ATA. O.)
- Tablo 24:** Perwerdeya Dê û Bavê Şagirtan (ATA. O.)

Tablo 25: Navê Şagirtan bi Kurmancî be Rewşa Perwerdeya Dê û Bavan (ATA. O.)

Tablo 26: Navê We Kê li We Kiriye? (ATA. O.)

Tablo 27: Hun Zanin Ev Nav ji bo Çi li We Bûye? (ATA. O.)

Tablo 28: Hun bi Wateya Navê Xwe Zanin? (ATA. O.)

Tablo 29: Hun ji Navê Xwe Hez Dikin? (ATA. O.)

Tablo 30: Hejmar û Rêjeya Navan (li Qizilê)

Tablo 31: Navê Jinan, yên Herî Kêm 4 Caran Hatîye Bikaranîn (li Qizilê)

Tablo 32: Navê Mêran, yên Herî Kêm 4 Caran Hatîye Bikaranîn (li Qizilê)

Tablo 33: Hejmar û Rêjeya Navan li Gor Zimanan (li Qizilê)

Tablo 34: Navên Têkel (li Qizilê)

Tablo 35: Dunav (li Qizilê)

Tablo 36: Hejmar û Rêjeya Navên Kurmancî, li Gor Temenê Hilbijêran (li Qizilê)

Tablo 37: Hejmar û Rêjeya Navan li Gor Zimanan (li Dibistana Seretayî ya Qizilê)

Tablo 38: Navê Keçan, yên Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Dibistana Seretayî ya Qizilê)

Tablo 39: Navê Lawan, yên Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Dibistana Seretayî ya Qizilê)

Tablo 40: Hejmar û Rêjeya Navan (li Bixurê)

Tablo 41: Navê Jinan, yên Herî Kêm 3 Caran Hatîye Bikaranîn (li Bixurê)

Tablo 42: Navê Mêran, yên Herî Kêm 3 Caran Hatîye Bikaranîn (li Bixurê)

Tablo 43: Hejmar û Rêjeya Navan, li Gor Zimanan (li Bixurê)

Tablo 44: Navên Têkel (li Bixurê)

Tablo 45: Dunav (li Bixurê)

Tablo 46: Hejmar û Rêjeya Navên Kurmancî, li Gor Temenê Hilbijêran (li Bixurê)

Tablo 47: Hejmar û Rêjeya Navan li Gor Zimanan (li Dibistana Seretayî ya Bixurê)

Tablo 48: Navê Keçan, yên Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Dibistana Seretayî ya Bixurê)

Tablo 49: Navê Lawan, yê Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Dibistana Seretayî ya Bixurê)

Tablo 50: Hejmar û Rêjeya Navan (li Fitnê)

Tablo 51: Hejmar û Rêjeya Navan, li Gor Zimanan (li Fitnê)

Tablo 52: Hejmar û Rêjeya Navên Kurmancî, li gor Temenê Hilbijêran (li Fitnê)

Tablo 53: Hejmar û Rêjeya Navan (li Xarok)

Tablo 54: Navê Jinan, yê Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Xarok)

Tablo 55: Navê Mêran, yê Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Xarok)

Tablo 56: Hejmar û Rêjeya Navan li Gor Zimanan (li Xarok)

Tablo 57: Navên Têkel (li Xarok)

Tablo 58: Dunav (li Xarok)

Tablo 59: Hejmar û Rêjeya Navên Kurmancî, li Gor Temenê Hilbijêran (li Xarok)

Tablo 60: Hun li Dibistanê bi Hevalên Xwe re bi Kîjan Zimanî Dipeyivin? (DAL)

Tablo 61: Rewşa Navê Hilbijêrên 4 Gundan, li Gor Zimanan

Tablo 62: Rewşa Navê Şagirtên 6 Dibistanan, li Gor Zimanan

Tablo 63: Rewşa Hemî Navan, li Gor Zimanan

Tablo 64: Navê Gundên Dêrikê

LÎSTEYA WÊNEYAN

Wêne 1: Mozayîkek Zemberorê (Zemberor)

Wêne 2: Wêneyê belkirî yê xezalekê yan pezkûvîyekê, li ser parçeyek şelbik (Tilbisim)

Wêne 3: Mezelên Tatîn (Fitin)

Wêne 4: Li hewşa malekê kevirên şehkirî (Qizilê)

Wêne 5: Dîmenek ji Bixurê (Bixur)

Wêne 6: Dîmenek ji Bixurê (Bixur)

Wêne 7: Dîmenek ji şûnwarên Fitnê (Fitin)

Wêne 8: Li Xarok jîyan (Xarok)

Wêne 9: Li Xarok jîyan (Xarok)

Wêne 10: Kevirekî xaç li ser (Selmê)

Wêne 11: Dîmenek Dêrikê

Wêne 12: Dîmenek Dêrikê

KURTEBÊJE

Amd. : Amadekar

ATA. O. : Ataturk Ortaokulu (Dibistana Navîn ya Ataturkê)

Bix. : Bixur

bnr. : binêrin

c. : cîld

DAL : Derik Anadolu Lisesi (Lîseya Anadoluyê ya Dêrikê)

Dib. : Dibistan

Fit. : Fitnê

H. : Hicrî (Koçî)

hwd. : her wekî din

M. : Mîladî (Zayînî)

Qiz. : Qizilê

r. : Rûpel

Xar. : Xarok

PÊVEK

1. Kaxeza pirsan
2. Mînakek lîsteya hîlbijêran
3. Mînakek lîsteya şagirtan
4. Anketa ku li DAL'ê û Ata. O.'yê hatîye çêkirin
5. Wêne
6. Nexşeya Dêrikê û Cihê Qizilê, Bixurê, Fitnê û Xarok

I.DESTPÊK

Li ser çêbûna zimên gelek teorî hene û ji van teorîyan hinek jê heya serdemên kevnar dihere. Pirsra ku “ziman çawa çêbûye” hîn jî di rojeva zimanzanan de ye lê belê bi derfeta zanistên îroyîn hîn jî ne pêkan e ku bi awayeke vekirî em bibêjin ziman bi vî awayî, di filan demê de, li filan derê derketîye holê. Ev yek naye vê wateyê ku hemî teorîyên li ser çêbûna zimên, teorîyên texmînî û bêbingeh in. Mirov dikare bêje ku her teorîyek xwedîyê hin rastî ne. Her teorîyekê ji alîyekê yan jî ji çend alîyan ve li mijarê nêrîye û li gor van nêrînan pênasên xwe yî li ser zimên afirandîye. Wek mînak, teorîya ku dibêje “ziman ji teqlîda dengên li der û dorê derketîye holê” tenê ji alîyê deng ve li mijarê nêrîye, taybetmendîyên wê yî din piştguh kiriye.

Ne tenê li ser mijara ku ziman çawa derketîye holê, li ser taybetîyên zimên jî gelek tişt hatine gotin. Her çend taybetmendîyên zimên jî wekî çêbûna zimên li gor nêrînên cuda hatibin tarîfkirin jî, taybetmendîyên wê yî herî pir derdikevin pêş û piranîya zimanzanan dipejirînin ev in: “Ziman, navgîna ragihandinê ya herî xurt e; ziman, zindî ye, ji ber wê di nava demê de tê guhertin yan jî dikare bimire; ziman, danûsitendina wateyê ye; ziman, sazîyeke civakî ye ku ji dangan pêk tê; ziman, hêmayê ramanê ye; ziman, çandê diafirîne û di bin bandora çandê de dimîne; ziman, cudatîya herî girîng ya di navbera neteweyan de ye û hwd.” Ev pênas û taybetmendî giş rast in, lê her yekê li gor nêrîna xwe alîyeke zimên derxistîye pêş.

Bi çî awayî, kengî û li ku derketibe holê bila derketibe, her zimanek xwedîyê pergalalekê ye û li gor vê pergala xwe tê bikaranîn. Ji bilî qabîliyeta zimên, her zimanekî taybet, ji alîyê vê pergala xwe ve tê lêkolîn. Pergala her zimanî di nava xwe de

ji beşên guhertî pêk tên. Di nava van beşan de mijareke girîng jî ‘‘nav’’ û ‘‘awayên lêkirina wan’’ in. Ev mijar jî wekî çêbûna zimên ji mêj ve bûye sedemên nîqaşan. Di dîrokê de nîqaşên meşhûr yên pêşî ku li ser vê mijarê hatîye kirin yek jê, em ji pirtûka Platon ya bi navê ‘‘Cratylus’’ê pê dihesin ku di navbera filozofên Yewnan Cratylus û Hermogenes de derbas dibe. Di vê nîqaşê de her du filozof li bersîva van her sê pirsan digerin:

1. Di navbera tiştan û navê wan de çi têkilî heye?
2. Gelo ji bo tiştêkî, navek yan gelek navên rast heye?
3. Yê ku nava li tiştan dike kî ye? (Sav, 2010: 615-628)

Ev her sê pirsên ku zimanzan li bersîva wan digerin, heta serdema me hatîye û wek du fikrên cuda li hemberî hev sekinîye: ‘‘Hêmayên zimanî bisedem in, yan bêsedem in?’’ Ev nîqaş, bi awayeke giştî ji bo hemî cûreyên hêmayên zimanî hatîye kirin. Lê belê di sedsala 20’an de bi navê ‘‘onomastik’’ê di bin zanista zimannasîyê de beşeke nuh ava dibe ku tenê li ser navên taybet disekine. Ev zanist, li ser awayê lêkirina navên taybet yên wek navê mirovan, navê cihan, navê kuçe, kolan û taxan, navê gel û netewan, navê beşên erdnîgarî, navê lehengên di berhemên wêjeyî de, navê berhem û marqeyan û hwd. dixebite. Ev xebata me jî xebateke onomastîk e û li ser sê beşên onomastîkê ye. Navê mirovan, navê cih û teşeyên erdnîgarî û navê eşîr û malbatan, mijarên vê xebatê yên onomastîk in. Qada xebatê, navçeya Mêrdîn Dêrik û herêma wê ye.

Ev xebat ji çar beşên bingehîn pêk tê. Beşa yekemîn ‘‘destpêk’’ e. Di vê beşê de pêşî wek kiryareke ji qabilîyeta zimên pênasa ‘‘navlêkirin’’ê hatîye kirin. Dûv re bi awayeke kurt zanista ‘‘onomastîk’’ê hatîye nasandin. Di binbeşa ‘‘lêkolîna onomastîk’’ de her sê mijarên onomastîkê yên di vê xebatê de, ango ‘‘lêkolîna li ser navê mirovan, lêkolîna li ser navên erdnîgarî û lêkolîna li ser navên eşîr û malbatan’’ çawa hatîye lêkolîn, tê tarîfkirin.

Li ser awayê lêkirina navê mirovan, taybetmendîyên sosyolojîk yên herêma qada xebatê xwedî bandoreke mezin e. Ji ber wê lêkolîn li ser sosyolojîya navenda Dêrikê û çar gundên wê hatîye kirin. Ji ber wê ye ku ev xebat xebateke onomastîk û sosyolojîk e.

Lêkolîna sosyolojîk bi çî awayî hatîye kirin, di binbeşa ‘‘lêkolîna sosyolojîk’’ de hatîye vegotin. Li dû vê binbeşê taybetmendîyên Dêrikê bi sê binbeşên cuda hatîye vegotin. Ev binbeş, ‘‘erdnîgarîya Dêrikê, dîroka Dêrikê û sosyolojîya Dêrikê’’ ye. Beşa destpêkê, bi vegotina sosyolojîya Dêrikê diqede.

Beşa duyemîn ya bingehîn ‘‘Navê Mirovan li Herêma Dêrikê’’ ye. Ev beş ji heft binbeşan pêk tê. Di van binbeşan de li du dibistanê navçê li ser navê şagirtan hatîye sekinandin. Anketên li van her du dibistanan bi şagirtan re hatine çêkirin wek kereste hatine bikaranîn û nirxandin. Piştî dibistanan çar gundên ku ji bo lêkolîna li ser navê mirovan hatîye hîlbijartin tên. Di bin sernavê her gundekî de pêşî sosyolojîya gund bi kurtasî hatîye nasandin, pişt re navên niştecihên gund ji listeyên hîlbijartina adara 2013’an hatîye lêkolîn. Dûv re ji bo dîtina navê nişên nuh listeyên dibistanên van gundan hatîye nirxandin. Piştî ku her çar gund diqede, di binbeşa heftemîn de wek encam bi tevayî daneyên beşê tê nirxandin.

Beşa sêyemîn ya bingehîn ‘‘Navên Erdnîgarî li Herêma Dêrikê’’ ye. Di vê beşê de pêşî li ser navê kuçe, kolan û taxên Dêrikê hatîye sekinandin. Dûv re navê Dêrikê û 170 navê gund û mezrayên wê hatîye sinifandin û nirxandin. Di vir de li ser navê jîngehan hatîye sekinandin ku navê wan çawa çêbûne. Paşê ji Dêrikê û ji 174 gund û mezrayên wê navê teşeyên erdnîgarî hatîye tomarkirin, sinifandin û nirxandin. Ev cûreyên erdnîgarî li gor awa û taybetmendîyên xwe di bin sernavên hevbeş de hatine tomarkirin. Wek mînak navên çem, gol, kanî, bîr, şikeftan û hwd. wek jêderên avê di bin heman sernavî de hatine tomarkirin û dûv re jî wek encameke gelemperî, ev hemî navên cûreyên erdnîgarî hatine nirxandin.

Beşa çaremîn ‘‘Navê Eşîr û Malbatan li Herêma Dêrikê’’ ye. Di vê beşê de ew jîngehên ku navên erdnîgarî jê hatîye tomarkirin jî tê de, navê hemî eşîrên herêma Dêrikê û ji ber ku hejmara malbatan gelekî zêde ye, tenê navê wan yê hêjayî mînakdayinê ye hatîye tomarkirin û sinifandin. Di vê beşê de armanc fêmkirina awayê çêbûna navê eşîr û malbatan e. Di dawîyê de dîsa wek encama lêkolîna beşê, nirxandina beşê hatîye kirin.

Wek qada xebatê hîlbijartina Dêrikê û li dû wê jî hîlbijartina van çar gundên wê ne bijartinên ji rêzê û texmînî ne. Berî her tiştî ji ber ku lêkolînerê vê xebatê ji Dêrikê ye

û li Dêrikê dijî, ji alîyê têkilîya bi çavkanîyan re, hevnasîya der û dorê, ji alîyê veguhastinê û aborîya lêkolînê ya bi giştî, gelek awantajan dide û derfetên lêkolînê zêdetir dike. Ji bilî vê yekê, Dêrik û herêma wê devereke “kurmancîaxêf” e ku bi vê taybetmendîya xwe li hemî Kurdistanê û di nava hemî Kurdan de tê naskirin. Ji ber vê taybetmendîya xwe, ji bo lêkolînên li ser kurmancî devereke hêjayî xebatê ye.

Wek navend piştî tespîta Dêrikê, bi taybetî ji bo lêkolîna onomastîk, çî bû sedem ku di nava 71 gund û 92 mezrayan de ev her çar gund, Qizil, Bixur, Fitin û Xarok hate hilbijartin? Sedemên vê bijartinê taybetmendîyên van gundan yên erdnîgarî, aborî, eşîrî, devokî, çandî û civakî ye:

Ji alîyê erdnîgarî ve her çar gund xwedî taybetmendîyên cuda ne. Bakurê Dêrikê çîya ye û rêjeyek rûberîya Dêrikê li ser vî Çîyayê Mazî ye. Di vê xebatê de temsîliyeta herêma çîyê Xarok dike.¹ Li der û dora Xarok gelek gir, zinar, newal, guher û kanî hene. Rêjeyek girîng ji rûberîya Dêrikê jî di quntara çîyayê Qerecdax de ye. Temsîliyeta herêma Qerecdax, gundekî mezin yê Qerecdax Bixur dike. Bixur li ser ferşê Qerecdax e, ax û kevirên wê wolkanîk in, gelek jêderên avê yên ku ji berfa Qerecdax dadinisile li Bixurê dide der û diherike heye. Ya herî girîng Dengiz e ku şikefteke qarstîk e. Rûberîya Dêrikê ya herî pir li alîyê berîyê dikeve. Berî, herêmeke rast e ku ji bilî girên dîrokî (til, hoyuk) tu bilindayî lê tune ye. Zevî û kar û barên çandinîyê lê gelekî zêde ye. Ji bilî van her sê erdnîgarîyên bingehîn yên guhertî, sedema bijartina Fitnê ji hêla erdnîgarî ve senteza van her sê taybetmendîya ye. Fitin di quntara Çîyayê Mazî de ye. Li herêma Dêrikê ji cihên weha ango di navbera çîyê û berîyê de dimîne re “lêf” tê gotin. (Şênîyekî li Bixurê ev bêje wek “lêv” bi lêv kir. (Ş. Bixur, 2014) Fitin jî di lêf de ye û ji ber wê axa wê hem li çîyê heye û hem jî rast û zevîyên wê gelek in. Ji her sê gundên din bêtir nêzîkî Dêrikê ye, di navbera çîyê, ferşê Qerecdax û berîyê de ye.

Sedema duyemîn rewşa van gundan ya aborî ye ku ew jî bi taybetmendîyên erdnîgarî ve girêdayî ye. Gundekî ku zevî û cotkarî lê zêde be bi awayeke xwezayî ji alîyê aborî ve rewşa wî gundî ya gelemperî ji gundên bê zevî çêtir e. Di nava van her çar gundan de gundê ji çandinîyê re herî guncan û gundê ku zevîyên wê herî pir Qizil e. Li

¹ Xarok bi awayê fermî bi Şemrex ve girêdayî ye. Sedemên ku Xarok û çend heb gundên din yên Şemrex ketîye nava vê xebatê û wek gundên Dêrikê hatine hesabandin, di beşa yekemîn, di binbeşa “Lêkolîna li Ser Navên Erdnîgarî” de hatîye vegotin.

dû wê Fitin, li dû wê Bixur û herî dawî jî Xarok tê. Gundê herî pir ajalvanî lê tê kirin ji alîyê rêzê vê berevajîya vê rêzê ye.

Ev her çar gund ji alîyê eşîrî ve jî ji hev cuda ne. Li Qizilê bi giranî Sorkî, li Bixurê Metînî, li Fitnê Rûtî, û li Xarok jî Eboyî û Şêxalîkî dijîn. Li nava Dêrikê û gundên wê yî din gelek eşîrên din hene lê ya ku me xwest bi vî awayî em bibînin bê bi guhertina eşîran, di awayê lêkirina navê mirovan de tu guhertin çêdibin yan na.

Ev her çar gund jî bi kurmançî dipeyivin. Li herêma Dêrikê li hin deveran ji bilî kurdî wek ziman bi erebî; ji bilî kurmançî jî wek zarava bi zazakî (dimilî) tê peyivandin. Lê belê ji ber ku sînorê zimanê xebatê kurdî û sînorê zaravayê xebatê jî kurmançî ye, me ev gundên lê bi erebî û zazakî tê peyivandin, ji alîyê lêkirina navê mirovan ve nekir nava sînorê xebatê. Ev her du deverên erebî û zazakî lê tê peyivandin dibe bibe mijara lêkolînên din. Ji alîyê din ve divê were gotin ku rêjeyek bilind yê şênîyên Dêrikê û herêma wê bi tirkî dizanin bipeyivin, lê zimanê tirkî di nava jîyana rojane de nayê bikaranîn. Di nava gel de vegotinek heye ku dibêjin, ‘*Du heb Dêrikî li ku bigihên hev tenê bi kurmançî dipeyivin.*’ Her çend ev her çar gundên me hilibijartine, gundên kurmançîaxêf bin jî hin hûrgilîyên devokî jî di navbera wan de heye. Di beşa lêkirina navan de dema ku em di derheqê sosyolojîya van gundan de agahîyan didin em bi kurtasî behsa van taybetmendîyan jî dikin lê nirxandinên berfirehtir di encama heman beşê de hatîye kirin.

Sedemeke din ya vê bijartinê, taybetmendîyên van gundan yên çandî û civakî ne. Ev sedem, wek encameke hevbeş, sedemên li jor rêzkerî ne. Her çend guhertinên pir mezin di navbera van her çar gundan de tunebin jî di hin waran de cudatîya wan heye. Cudayetîyên ku bala me kişandîye, bi pîranî yên wekî kevneşopî, têkilîyên civakî, rê û resmên zewac û mirinê û hwd. wek nirxandin di beşên van gundan de hatîye kirin.

Bi bijartina van gundan me xwest ku em bandora taybetmendîyên erdnîgarî, aborî, eşîrî, devokî, çandî û civakî li ser awayê lêkirina navê mirovan bibînin. Ji bilî bandora van taybetmendîyên gelemperî, gelek faktorên din jî hene ku bandorê li awayê lêkirina navan dikin. Ji nav vana yên herî girîng, rewşa malbatê ya aborî, civakî, çandî, perwerdeyî, sîyasî, bawerîyên olî û kevneşopî, rewşa zagonî ya serdest, rewşa civakî ya dema navdayinê ye. Ji ber van faktorên bibandor divîyabû em li ser sosyolojîya Dêrikê

û ya her çar gundan jî bisekinin. Ji ber vê pêdivîyê me li ser sosyolijîya navçê û ya van çar gundan jî lêkolînek çêkir da ku em bandorên sosyolojîk jî karibin analîz bikin. Berî taybetmendîyên her çar gundên hatine hilbijartin, di bin sernavê taybetmendîyên Dêrikê de erdnîgarîya Dêrikê, dîroka Dêrikê û sosyolojîya Dêrikê hatîye lêkolîn. Li dû wê, li navenda Dêrikê awayê lêkirina nava li ser mînakên du dibistanan hatîye nixandîn. Piştî wê, beşên gundan tê ku di van beşan de pêşî taybetmendîyên gundan yê wek erdnîgarî, serjimêrî, dîrokî, aborî, çandî û sosyolojîk tên nixandîn û dûv re navê şênîyên li van gundan yê di listeyên hilbijartinê de ne wek tabloyan tên sinifandin û li dû her tabloyê, daneyên tabloyê tê nixandîn. Ji bo cudayetiya di navbera nifşan de derkeve holê me li navê şagirtên dibistanên van gundan jî nêrîye. Di encama dawîya beşê de nixandînen gelemperî hatine kirin. Anha wek çalakîyeke zimên ya gerdûnî, bi kurtasî em li ‘‘navlêkirinê’’ binêrin.

I.1. NAVLÊKIRIN

Wek pêdivîyeke xwezayî ji berê de mirovan nav li tiştan kirine û ev helwesta xwezayî ji ber vê pêdivîya xwe, hîn jî didome, bêguman di demên pêş de jî dê bidome. Li der û dora me çî hebe, em bi çî re di nava têkilîyê de bin em nava li wan tiştan dikin. Sedem û pêdivîyên navlêkirinê gelek in. Dema ku em nava li mirovan, li gund û bajaran, li kuçe û kolanan, li çem û zinaran, li ajal û riwekan, li alav û amûran nekin em nikarin wan ji hev veqetînin, wan bisenifînin, wan nas bikin, wan bidin naskirin. Em nava li wan nekin em nikarin li ser wan bipeyivin, wan berawird bikin, wan bişîbînin hev. Ji alîyekî din ve navlêkirin ji mirovan re rêçeke desthilatdariya li ser xwezayê, li ser der û dorê ye. Ger em nava li tiştan nekin, em nikarin wan kontrol bikin, li ser wan hikum bikin û wan birêve bibin.

Meyla navlêkirinê ewqas xurt e, em nava ne tenê li tiştên ku em dibînin ango tiştên şênber dikin; her weha em nava li tiştên razber, ew tiştên ku em nabînin û nabihîzin jî dikin. Qebûlkirina sêwira wan bes e ji bo ku em nava li wan kin. Wek cesaret, tirs, bawerî, evîn, başî, xerabî, hût, cin, pîrebok û hwd. Em nava li liv û tevgeran jî dikin ku bi vî awayî navê lêkeran çêdibe. Wek: meş(în), rev(în), xwendin, xwarin, nêrîn û hwd.

Di nava pergala zimên de cûreyek ji hêmayên zimanî yê girîng jî “nav” in. Ji ber vê yekê jî di nava rêzimana zimanan de beşek girîng jî bo navan tê veqetandin û zimanzan li ser wan û taybetmendiyên wan disekin. Di van xebatên rêzimanî de, di beşên navan de bi piranî binbeşên wekî “navên taybet-navên cins, navên razber-navên şênber, navên nêr-navên mê, navên xweser-navên tewandî, di navan de pirjimari, qertafên ku nav distînin, têkilîya navan bi cûreyên bêjeyên din re û hwd.” tên lêkolîn. Ji van lêkolînên rêzimanî yê li ser navan pê ve, di nava zanistên zimannasîyê de zanista “onomastîkê” tenê li ser “awayê çêbûna navên taybet” dixebite. Bi kurtasî em ê vê zanistê bidin nasîn.

I.2. ONOMASTÎK

Ji bilî van binbeşên li ser navan ku mijarên rêziman in, di sedsala dawîn de di nava zanista zimannasîyê de bi navê “onomastîk”ê beşek nû ava bûye û ev qada zanistê li ser “navên taybet” tenê disekine. Ji van navên taybet navê mirovan, navê cihan û navên etnîkî yê wek millet, qewm û gelan mijara xebatên onomastîk yê bingehîn in. Binbeşa ku li ser lêkirina navê mirovan disekine “antroponîm” (anthroponym), beşa ku li ser navê wargeh, jîngeh û teşeyên erdnîgarî disekine “toponîm” (toponym) û beşa ku li ser navê komên mirovan, yê wek malbat, eşîr, gel û miletan disekine jî “etnonîm” (ethnonym) e. Her çend ev her sê beşên onomastîkê beşên bingehîn bin jî beşên li ser navên taybet yê gelek tiştên din dixebitin jî hene. Wek hydronym (li ser navê çem, gol, bahr û cûreyên din yê jêderên avê dixebite), hodonym (li ser navê rê, kuçe, kolan û taxan dixebite), charactonym (li ser navê lehengên di berhemên edebî de derbas dibe dixebite) û gelek beşên din yê onomastîkê hene.² Di vê xebatê de me di beşa navên erdnîgarî de cî daye navê kuçe, kolan û taxên Dêrikê û navê jêderên avê yê wek çem, gol, bîr, kanî û hwd. jî.

Em li gor xebatên antroponîm, toponîm û etnonîmê tenê bibêjin, hin pirsên ku onomastîkvan, di lêkolînên xwe de li bersîva wan digere ev in: “Awayê lêkirina navan çi ne, populerbûna navan çi qas e, rêjeya navê mirovan yê guhertî û yê wek hev çi qas

² Ji bo agahiyên berfirehtir bnr. (<http://www.icosweb.net/index.php/terminology.html>)

in, navekî cinsî çawa dikare bibe navekî taybet, leqeb û nasnavên mirovan çawa çêdibin, koka navan ji hêla etîmolojîyê ve çi ye, wateya navan çi ye, raborî û pêvajoya lêkirina navan çi ye, navê gund û bajaran çawa li wan hatine kirin, navê qewm, kom û miletan çawa çêbûne, têkilîya navê komên etnîkî û cihan çi ye, têkilîya navdayînê bi çandê re, bi sîyasetê re, bi ol û bawerîyan re, bi derûnîya kesan û civakê re, bi netewayên bîyanî re, bi awayê hilberînên aborî re çi ye? û hwd.” Lêkolînan dibe li gor mijarê û li gor nêrîn û teorîya xwe ya zanistî ji van pirsan li ser yekê yan çend heba hûr bibe, yan jî dibe ku ji bilî van pirsan hin pirsên guhertî derkevin hemberî wî û wan hêjayî lêkolînê bibîne. Lê mijar her dem awayê lêkirina navên taybetî, koka van navan û wateyên wan in.

Wekî ji van mijar û pirsên li jor rêzkirî jî tê fêmkirin, onomastîk li gel zimannasîyê bi qadên zanistî yên wekî sosyolojî, psîkolojî, felsefe, mentiq, dîrok, arkeolojî, antropolojî, erdnîgarî, çand, folklor, sîyaset, ol û hwd. ve jî têkildar e. Li gor mijara xebatê ev têkilî bi hin zanistan re li gor yên din xurttir û bi yên din re lawaztir e. Wek mînak xebateke li ser toponîmê bi awayeke xwezayî dêbi erdnîgarî, jeolojî, dîrok û çandê re bêtir têkildar be.

Her çend zanista onomastîkê zanisteke ciwan be jî, em di dîrok û çanda kevnar de dibînin ku di demên berê de jî mirovan xwestine têbigihên ku bê ka çawa nav li tiştan hatine kirin. Di her sê pirtûkên pîroz de mijara navlêkirinê bi hin guhertinên biçûk derbas dibe. Ev mijar di Qur’anê de di sûretê Beqere ayeta 31, 32 û 33’an de weha derbas dibe: *‘Yezdan navê hemî heyinan rê Adem da. Dûv re ew (tişt) nişanî melayketan da û ji wan pirsî: ‘Ger hun rastgo bin de ka navê van tiştan ji min re bibêjin.(31) Melayketan got: Em te ji hemî kêmanîyan tenzîh dikin. Ji bilî tiştê ku te rê me daye em bi tiştêkî din nizanin. Bêguman yê ku her tiştî bi heqqê wê zane û yê ku her tiştî bi hîkmet dike tu ye.(32) Yezdan weha got: ‘Ya Adem, ji wan re navê vana bêje.’ Piştî ku Adem navê wan (tiştan) ji melayketan re got, Yezdan got: ‘Min ji we re negote ku xeyba erd û ezmên bêguman ez zanim, tiştên ku hun aşkere jî dikin û tiştên ku hun vedişêrin jî ez zanim.’ (33)*

Di ayeta 34’an de Yezdan ji melayketan dixwaze ku ji Adem re şujde bibin. Balkêş e ku ev ayeta şujdebûnê li pê ayetên ku Adem navê hemî heyînan dijmêre û şûn de tê. Nişîtên ku Adem wek xelîfeyê Yezdan yê li rûyê erdê ye, zanebûna wî ya bi van navan e. Bi zanebûna xwe ji melayketan cuda dibe. Heman mijar di Peymana Kevin de

di beşa Genesîsê, di binbeşa duyemîn, ayeta 19 û 20'î de weha derbas dibe: “*Yezdan ajalên li erdê û çivîkên li ezmanan giş ji axê çêkiribû. Ji bo bibîne ku bê ka kîjan navan li wan dike, gişê wan ji Adem re anî. Adem çî nav li wan kir (êdî) ew gîyanewer bi wî navî hat naskirin.*”(19) “*Adem nav li hemî ajalên kedî û yên kûvî û li çivîkên li ezmanan kir lê belê ji bo wî alîkareke guncan nehate dîtin.*”(20)

Ji bilî van çavkanîyên olî, di serdema Yewnanî ya antîk û di serdema navîn de jî “navê tiştan” bala lêkolînavan û nivîskaran kişandîye û di vî warî de xebatên cûr be cûr hatine kirin. Mihaly Hajdu dibêje: “*Di çar Wedayên Hîndan de, di destanên wek Mahabharata û Ramayana de, di Awestayaya Îrana kevin de, di Poetic Edda'ya Îzlanda de, di Kalevala ya Fînî de û di çend çîrokên efsanewî yên antîk yên din de jî şîroveyên li ser nava gelek in. Û her weha di destanên Homeros de jî mînakên weha hene. Ji bilî vana dîroknasên Yewnanî û Romayî jî li ser etîmolojîya nava xebitîne.*”³

Her çend dîroka xebatên li ser navan ewqas kevin bin jî wek beşek bi rêk û pêk ya zanista zimannasîyê onomastîk, zanisteke gelkî ciwan e. Di sala 1949'an de li Parîs'ê konseyek ji bo xebatên onomastîkê ava bûye û ev konsey bi civînên navnetewî û bi weşana kovareke bi navê “Onoma” heya nuha jî xebatên xwe didomîne. Ji hêla din ve li Dewletên Yekbûyî yên Amerîka jî di sala 1951'ê de komeleyek bi navê “The American Name Society” (ANS) ava bûye ku ev komele ne tenê li ser navên Amerîkî her weha li ser navê deverên din yên li dinyê jî dixebite. Bi xebatên van her du sazîyan onomastîc ber bi zanisteke bi rêk û pêk ve diçe. Mixabin bi kurmancî em li xebateke modern ya onomastîkê rast nehatin. Heger xebateke bi vî rengî hatibe kirin hebe jî haya me jê çênebûye û me derfet nedîye ku em bi dest xî da ku em jê sûd werbigrin.⁴ Tevî vê bêderfetbûnê, me lêkolîna xwe ya li ser mijarên onomastîkê bi çî awayî kir, rêbaz û keresteyên me çî bûn, pêşî bi kurtasî em ê behsa wê bikin.

³ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. li “Mihaly Hajdu (Budapest, Hungary) The History of Onomastics, (<http://nevtan.arts.unideb.hu/nevtan/tagozat/06hajdu.pdf>)

⁴ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. (<http://www.americannamesociety.org/>) û (<http://www.icosweb.net/>)

I.3.LÊKOLÎNA ONOMASTÎK

Onomastîk, lêkolîna li ser navên taybet e. Navên taybet, navê wan heyinan e ku li gerdûnê tenê ne. Bi gelemperî di zimanan de navên ku wek ‘‘taybet’’ tên pejirandin ev cûre nav in:

Nav û paşnavê mirovan: Şevîn, Arjen Arî, Celadet Elî Bedirxan...

Navnas, nasnav û pênasên mirovan: Mîr, Xan, Xanim, Qedrî Beg, Quto, Bozo, Mela...

Navê cihan: (Wek gund, navçe, bajar, welat, tax, kuçe, rê û hwd.) Beyrok, Dêrik, Mêrdîn, Hîndîstan, Taxa Qelê, Rastika Fêrîko, Rêya Aşan...

Navê teşeyên erdnîgarî: (Wek zinar, çem, gol, behr, newal, gelî û hwd.) Tûrcel, Firat, Gola Gavana, Behra Sipî, Newala Qesaba, Gelîyê Elî Begê...

Navên gel, netew, eşîr, ziman û zaravayên wan: Kurd, Tirk, Îngilîz, Botî, kurdî, tirkî, zazakî, kurmancî...

Navê ol, mezheb, terîqet û bawerîyan: Îslam, Mesîhîtî, Şafîtî, Neqşîbendî, Durzîtî...

Navê berhemên: (Wek Pirtûk, rojname, kovar, nivîsar, peyker, helbest, beste, wêne, film, avadanî, û hwd.) Sîya Evînê, Azadîya Welat, Çirûsk, Edebîyata Welatî (nivîsa Kamûran Elî Bedirxan-Hawar-1,rp.5), Kîne Em, Monalisa, Dema Hespên Serxweş, Dêra Sor...

Navên ku li ajalan tên kirin: Kotan, Qero, Çomer, Şêro, Belek, Şînboz, Bozê Rewan, Zerê...

Navên cismê astronomî: Roj, Dinya, Mars, Hêv, Ganimede...

Navê sazîyan: Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Komeleya Mafê Mirovan, Zanîngeha Mardin Artûklûyê...

Ev cûreyên navên taybet giş dikarin bibin mijara lêkolînên onomastîk. Lê belê ji bo lêkolîneke zanistî û bi rêk û pêk were kirin, divê sînorê xebatê ji alîyê cih û ji alîyê mijarê ve diyar be û ji van cûre navan yek yan jî çend heb bihata hilbijartin. Di vê

xebatê de, di beşa lêkolîna onomastîk de ev sînor bi vî awayî hatîye danîn. Cih û herêma lêkolînê navçeya Mêrdîn Dêrik, bi navê xwe yê din Dêrika Çîyayê Mazî û herêma wê ye. Mijarên onomastîk yên ku hatine hilbijartin sê heb in: Navê mirovan, navên erdnîgarî û navê eşîr û malbatan. Kereste û rêbazên me yên li ser van her sê mijaran bi vî awayî ne.

I.3.1. Lêkolîna Li Ser Navê Mirovan (Anthroponym)

Di vê xebatê de ji bo lêkolîna li ser navê mirovan, ji navenda Dêrikê du dibistan û ji gundên Dêrikê jî çar gund hatine hilbijartin. Li Dibistana Navîn ya Ataturk'ê bi 125 şagirtan re; li Lîseyaya Anadolûyê ya Dêrikê jî bi 278 şagirtan re anketek hatîye çêkirin. Dibistanek lîse ye û dibistana din navîn e. Bi vî awayî şagirtên temenê wan di navbera 10-18'an de ye bûne mijara lêkolînê. Ji ber ku gelek zarok bi xwendin û nivîsandina kurmancî nizanin em mecbûr bûn pirsên anketê bi tirkî amade bikin. Bi van pirsan me xwest em fêhm bikin ku li navenda Dêrikê ji bo keç û lawan navên herî pir û yên herî kêr hatine bikaranîn çi nin, rêjeya navên kurmancî, tirkî, erebî, farisî û heger hebe ji zimanên din çi nas in, navê şagirtan kê li wan kiriye, awayên navlêkirinê çi ne, şagirt ji navê xwe hez dikin yan na, heger hez nakin dixwestin navê wan çi be û hwd. (pêvek 4: forma anketa ku li dibistanan hatîye çêkirin) Bersîvên her pîrsekê wek tabloyekê hatîye sinifandin, rêjeya wan hatîye pîvan û li binê tabloyan ev bersîv û rêje hatine nîrxandin.

Çar gundên ji bo lêkolîna li ser navan hatine hilbijartin Qizil, Bixur, Fitin û Xarok e. Li van gundan navên herî pir û yên herî kêr hatine bikaranîn, rêjeya navên kurmancî, tirkî, erebî, farisî û navên ji zimanên din, rêjeya dunavan, li gor temenê mirovan rêjeya navên kurmancî, sedemên guhertina rêjeya navan li gor temenê mirovan û hwd. hatîye lêkolîn. Keresteyê ku ji bo navên mirovan yên li gundan hatine bikaranîn, listeyên hilbijêran e ku ev liste ji aliyê YSK'yê (Lijneya Bilind ya Hilbijartinê) ve ji bo Hilbijartinên Rêveberîyên Herêmî yên Giştî yên 30.03.2013'an hatine amadekirin û ji muxtarên gundan re ji bo bangewazî û darvekirinê hatîye şandin. Di listeya Qizilê de 1122 kes, di ya Bixurê de 677 kes, di ya Xarok de 130 kes û di ya Fitnê de 32 kes heye. Di van listeyan de navê şênîyên van gundan yên ku di tarîxa 30.03.2013'an de 18 salê xwe dadigirin û mafê wan î hilbijartinê çêbûye û yên ji vî temenî û berjor heye. Di

lîsteyan de ji bilî navê hîlbêjêran, temenê wan, zayendê wan, navê dê û bavê wan, cihê ji dayikbûnê û cihê ku di nifûsê de lê qeydkirî ne hatîye nivîsandin. (Pêvek 1: mînakek lîsteya hîlbijêran) Ji ber ku di lîsteyan de mirovên ji 18 salî û berjortir tenê hene, me pêdivî dît ku em li wan gundan navê zarokan jî bibînin. Ji bo wê jî me ji Gerîndeya Perwerdeya Netewî ya Navçeya Dêrikê û ya Şemrexê lîsteyên şagirtên dibistanên seretayî yên gundê Qizilê, Bixurê û Xarok sitende. Ji ber ku dibistana Fitnê ya seretayî girtî bû û şagirtên vî gundî diçûn dibistanên Zorava ya seretayî û navîn, me lîsteya şagirtên Fitnê ji Gerîndeya Dibistana Zorava sitende. Bi van lîsteyan jî me derfet dît ku em navê zarokên temenê wan di navbera 6-13'an de binirxînin û navê wan û navê mezinan bidin ber hev da ku bi demê re guhertinên di meyla navdayina mirovan de çêbûne bibînin. (Pêvek 2: Mînakek lîsteya şagirtên dibistanên seretayî yên gundan)

Ji ber ku ev her çar gundên navborî di heman demê de bûne mijara lêkolîna sosyolojîk jî, di dema hevpeyvînên me yî bi şênîyên gund re me fîrset dît ku em ji pîrejî û pîremêran û ji jin û mêrên ciwan bipirsin bê ka çawa nava li zarokên xwe dikin. Kî nava li zaroka dike, dema ku nava li zarokên xwe dikin li gor çî biryarê didin, bandora çî li ser wan heye di dema navlêkirinê de, helwestên sîyasî, olî, kevneşopî çî nin? Di her beşê van gundan de bersîvê çavkanîyan li gor bilindbûna rêjeya vegotinên wan hatine nivîsandin.

Li Tirkîyê heya van salên dawî jî navên kurmancî qedexe bû ku dê û bav li zarokên xwe kin. Ev qedexebûn ji sala 2005'an û vir de her ku çûye sist bûye lê belê ji bo navên tê de tîpên ‘‘x, w, q, ê, î, û’’ heye hîn jî didome. Gelek dê û bavên xwestine navên kurmancî li zarokên xwe kin ji ber vê helwesta xwe hatine darizandin. Ji ber wê em di nava xebatê de li navê kurmancî ku ji ber vê qedexebûnê hatine xerakirin jî rast hatin. Wek mînak ku di kurmancî de navê ‘‘Gebat’’ tuneye, ev nav di eslê xwe de ‘‘Xebat’’ e lê ji ber ku tîpa ‘x’yê qedexe ye ji aliyê daîreya serjimêrîyê weha hatîye nivîsandin. Di encama beşa duyemîn de gelek tespîtên bi vî rengî hatine kirin hene.

I.3.2. Lêkolîna Li Ser Navên Erdnîgarî (Toponym)

Lêkolîna li ser navên erdnîgarî di nava xwe de ji 8 binbeşan pêk tê. Di beşa yekemîn de navê Dêrikê û tax, kolan û kuçeyên wê, li dû wê jî wek jîngeh, navê gund û mezrayên Dêrikê hatine berhevkirin û nirxandin. Li gor me sînorê Dêrikê ne sînorê fermî yê anha ye. Sînorê Dêrikê yê çandî û dîrokî çend heb gundên li çiyê jî vedihewîne ku ev gund bi awayê fermî bi Şemrex ve girêdayî ne. Ji ber wê, navê van gundan jî di beşa navên erdnîgarî û navên eşîr û malbatan de cî digire. Ev gund şeş heb in. Xarok, Bîrînî, Mavan, Berkevîrê, Gundik û Golika Geryayî. Xarok di vê xebatê de ji bo temsîliyeta Çiyayê Mazî di nava lêkolîna li ser navê mirovan û lêkolîna sosyolojîk de jî cih digire. Niştecihên van her şeş gundan xwe Dêrikî dihesibînin. Dema ku Dêrik bi Dîyarbekir ve girêdayî bû, sînorê Dêrikê diçû heya Pîran ku 5 km li bakurê Şemrex e. Lê sedem ne ev tenê ye. Heger ew tenêba wê çaxê divîyabû hemî gundên li der û dora Şemrex jî xwe Dêrikî bihesibînin. Ji xwe di wan deman de Şemrex bi xwe li ser Dêrikê bûye. Sedema herî girîng ew e ku şênîyên van her çar gundan di heman demê de xwe ji eşîrên Dêrikê dihesibînin. Bîrînî, Mavan û Berkevîrê xwe Rûtî dihesibînin, Gundik herçend anha vala be jî di demên ku tije bû Rûtî û Şaqûlkî tê de dijîyan. Xarokî jî du beş in. Eboyîyên di Xarok de xwe Rûtî dihesibînin û Şêxalîkîyên di Xarok de jî xwe Ebasî dihesibînin. Golika Geryayî jî ji berê de wek Mamûdî tê naskirin. Ev yek jî dibe sedem ku bi qasî ku têkilîyên wan bi Dêrikê re heye, ewqasî bi Şemrex re tune. Dema ku karekî wan î fermî hebe diçin Şemrex, jê pê ve danûsitendinê wan bi rêjeyeke bilind bi Dêrikê re ye.

Gundên ku şênîyên wan ji eşîra Metînî ye jî xwe Dêrikî dihesibînin. Eşîra Metînî di navbera Dêrik, Şemrex, Çinar û Wêranşar de li qadeke gelekî berfîreh bela ye. Li gor hin vegotinên endamên vê eşîrê 37, li gir hinekên din zêdetirî 40'î gundên wan heye. Her çend gundên wan li ser axa sînorê van her çar navçeyan hebe jî mirovên vê eşîrê xwe Dêrikî dipejirînin. Lê ji ber ku wek mesafe dûrî navendê nin, têkilî û danûsitendinên gelek ji van gundan bi Dêrikê re lawaz e, me hemî gundê Metînî nekire nava sînorê vê xebatê. Ji dêvla wê me ji bo temsîliyeta eşîra Metînî "Bixur" xiste nava lêkolîna li ser navê mirovan û lêkolîna sosyolojîk, gundên din yên Metînî jî yên ku ji wan bi awayê fermî bi Dêrikê ve girêdayî ne, xiste nava lêkolîna navên erdnîgarî û lêkolîna navê eşîr û malbatan. Ji alîyê din ve, li hêla berîyê jî hin gund hene ku têkilî û

danûsitendinên wan bi navenda Dêrikê re pir lawaz e. Ev gund jî tenê ji bo karên xwe yî fermî tên Dêrikê, jê pê ve têkilîya wan bi piranî bi Qoserê re yan jî bi Wêranşar re heye. Ji van gundan hinek jê ji bo ku nêzîktirî wan e û derfetên wan bêtir e diçin van navçeyan, hinek ji wan jî ji ber şer û pevçûnên eşîrî nedihatî navenda Dêrikê. Sedem çî dibe bila bibe, her çend şênîyên van gundan nedihatî Dêrikê jî tu carî negotine em ne Dêrikî ne, em ji Qoserê yan ji Wêranşar in. Ji ber wê me di nava vê xebatê de cih da van gundan ku ji xwe bi awayê fermî jî li ser Dêrikê ne. Di van salên dawîn de şer û pevçûnên eşîrî yên di navbera şênîyên van gundan û eşîrên navenda Dêrikê bi aşîtî çareser bû û êdî çûn û hatina wan ya ber bi Dêrikê ve zêdetir bûye.

Navê gundan yên bi kurmancî, ji aliyê Komara Tirkîyê ve hatine guhertin û ji bo her yekê navekî bi tirkî hatîye dayin. Di kar û barên fermî de ev nav tên bikaranîn. Lê belê gel bi piranî van navan bikarnînin û bi van navan nizanin, ji dêvla wan navên berê bikartînin. Li navenda navçê heya navê gund yê bi kurmancî neyê gotin gelek kes navê gundan yên bi tirkî nas nakin. Şênîyên gundan bi navê gundên xwe yê tirkî jî zanin, ji ber ku di karê wan yê fermî de ev nav tên bikaranîn. Di van salên dawîn de vegerandina navê cihan yên berê, di rojeva Tirkîyê de ye. Bi destpêka pêvajoya çareserîya pirsgirêka Kurd, ev hêvî xurttir bûye ku her gund, bajarok, bajar, tax, kuçe û rê navên xwe yî resen şûn de bistînin. Li gelek bajar û navçeyan lijneyên şaredarîyan biryar dane ku navê tax, kuçe û kolanan bikin kurmancî û yan jî navê wan yên berê li wan vegeînin. Di adara 2014'an de di nava guhertina desteyek zagonên demokratîzebûnê de paşdedayina navê gundan jî hate pejirandin, lê hê ne dîyar e wê rêbaza guhertina navê gundan çawa be. Ji ber ku mijara me navên resen in tenê di encama beşa sêyemîn de wek nirxandina beşê behsa navê hinek gundan yê bi tirkî hatîye kirin, jê pê ve di temama xebatê de wek bîngeh em li ser navên kevin xebitîne.

Di 12.11.2012'an de bi zagona 6360'î şaredarîya bajarê Mêrdîn bû 'şaredarîya mezin'. Bi vê guhertinê re wekî hemî navçeyên Mêrdîn Dêrik jî wek navçeya navendî, bi şaredarîya Mêrdîn ya Mezin ve hate girêdan. Bi vê guhertinê re di statuya gund û mezrayan de jî guhertin hate çêkirin. Gundên Dêrikê giş bûn tax û mezrayên wan jî bûn kolan.⁵ Ev guhertin tenê guhertineke rêveberî ye. Wek jîngeh di jîyana gund û mezrayan de, di rewşa wan ya çandî, civakî, aborî û wekî din de tu guhertinek çênebûye. Ji ber wê

⁵ (<http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2012/12/20121206-1.htm>)

me li gor statuya berî vê guhertinê xebata xwe kiriye, ji dêvla têgehên “tax” û “kolan” an me têgeha “gund” bikaranîye. Ji berê de di navbera gund û mezrayan de ji bilî taybetîya wan ya rêveberîya fermî li gor me tu taybetîyeke din tunebû. Gelek mezra hene ku ji gundên xwe mezintir in. Dabeşkirina fermî ya wek gund û mezratîyê, li gor me dabeşkirineke kêfî ye. Ji ber wê di temama xebatê de me hemî mezra jî wek gund bi nav kiriye. Ji xwe heya mirov ji şênîyên mezrayan rewşa rêveberîya wan ya fermî nepirse ew jî nabêjin gundê me di eslê xwe de mezra ye û bi filan gundî ve girêdayî ye. Ango şênîyên mezrayan jî jîngehên xwe ne wek “mezra” wek “gund” tarîf dikin.

Di beşa duyemîn ya lêkolîna li ser navên erdnîgarî de, di serî de li navenda Dêrikê, û dûv re jî gund bi gund li herêma Dêrikê navê cihên erdnîgarî yên wek gir, zinar, çîya, deşt, newal, çem, gol, kanî, şikeft û hwd. hatîye berhevkirin, sinifandin û nirxandin. Di vir de dîsa sînore herêma Dêrikê, sînore wê yî çandî û dîrokî ye. Li gor awayê erdnîgarî û xwezaya cihan pîrbûna beşên erdnîgarî hatine guhertin. Wek mînak li gundên berîyê qet zinar tune ye ji ber wê ji vê herêmê tu navê zinaran nehatîye tomakirin. Hejmarên navên berhemên avî jî li gor cih û xwezaya wê derê tê guhertin. Li hin gundan hew kanîyek heye, lê li hin gundan jî çem, kanî, gol hemî cûre jêderên avê heye û hejmarên wan ji yekê zêdetir e. Wek mînak, ger li gundekî deh kanî jî hebe me tenê ew navên ku ji bo dabeşkirina me pêdivî pê heye nivîsîye. Me heman tişt ji bo navên teşeyên din jî kiriye. Me dîyar nekiriye ku bê kîjan nav, li kîjan gundî ne, ji ber ku ji bo me ya girîng ew nav bi xwe ye, ne ku wek agahîyên dokumenter, kîjan teşeyê erdnîgarî li ku ye. Lê di berhevkirina navê şûnwarên dîrokî de me heman tişt nekiriye. Me piştî navê şûnwaran, di hundirê kevanê de gund yan jî herêma wê jî nivîsîye.

Di dema tomakirina navên erdnîgarî de heya ku pêkan bû me ji çavkanîyên temenê wan mezin alîkarî xweste. Bi taybetî me xwest bi kêmanî em ji du, sê kesan navan bigrin da ku di tomakirina wan de tu xeletî neyê kirin. Di nava çavkanîyan de heya pêkan bû me xwest em ji jinan jî sîd wergirin, lê dîsa jî tevî kû di dema xebatê de tu astengîyeke civakî dernekete jî, pîranîya çavkanîyên me mêr bûn. Dema ku em di binavkirina berhemeke erdnîgarî de li cudahîyekê rast dihatin me vegotina yên temenmezin rast dipejirand û ew dinivîsande. Li çend deveran cudahîyên biçûk yên bi vî rengî derketin. Wek mînak li Xarok beşdarvanekî navê beyarekê wek “Beyarê Mamûdyâ” bi lêv kir, lê ji bo heman derê beşdarvanekî din ku bi temenê xwe ji yê

yekemîn mezintir ev nav wek “Beyarê Mamûçya” bi lêv kir. Piştî vê nakokîyê navê heman cihê ji beşdarvanê sêyemîn hate pirsîn ku ka “Beyarê Mamûdya” ye yan “Beyarê Mamûçya” ye, çavkanî bi vî awayî bersîv da: *“Ev nav ji navê Mamûd tê lê em giş dibên ‘Mamûçya’.* Ew ê ku tu ewilî pê ri peyivîyi ji bo gi tu fam biki ji te ri wenî gotîyi.” (E. Xarok, 2014) Me ev nav û hemî navên din jî wekî ku şênîyên gund çawa bi lêv dikin bi wî awayî tomar kir.

Di dema xebatê de hate dîtin ku li deverna di navbera du gund yan mezrayê cîranê hev de navên hevbeş derketin pêşberî me. Wek mînak em bibên girek di navbera du gundan de bû, çavkanîyên her du gundan jî navê wî girî ji me re gotin. Ev jî tê vê wateyê ku sînorê di navbera gundan de ne zelal e.

I.3.3. Lêkolîna Li Ser Navê Eşîr û Malbatan (Ethnonym)

Ji ber ku zanyarîyên nivîskî di derheqê eşîr û malbatan de me bidest nexiste, bi awayeke xwezayî û mecbûrî di vê beşa navên eşîr û malbatên Dêrikê de çavkanîyên me, endamên eşîr û malbatan yên bi temen in. Ji bilî temenê wan me bala xwe dayê ku ev çavkanî, di derheqê eşîr û malbatên xwe de xwedî agahî bin, zanapeyv û vebêj bin. Ji ber ku me hin çavkanîyên bi temen didîtin lê ji berê de guh nedane dîroka kok û eşîra xwe. Lê em li hin kesên bi temen ji wan ciwantir rast hatin ku ji ber ku bi awayeke baldarî li koka xwe gerîyane, ji bav û kalên xwe, ji pîrejin û pîremêrên xwe pirsîne xwedî agahîyên girîng in, me ji wan kesan jî wek çavkanî sûd wergirtîye. Me hewl da ku em ji her eşîrê kêmanî bi 3-4 kesan re hevdîtinan çêkin. Hejmara beşdarvanên hin eşîran ji 4’an zêdetir e lê ya tu eşîran ji 3’yan ne kêmtir e.

Di van hevdîtinan de carinan di navbera vegotinên beşdarvanan de hin nakokî yan jî guhertin derketin pêşberî me. Ev vegotinên ji hev cuda wek “waryantên guhertî” hate tomarkirin. Li ser eşîr û malbatên Dêrikê berî her tiştî me xwest em fêm bikin navê eşîran û malbatan çawa çêbûne. Her çend armanca me ya yekemîn ev be jî hin beşdarvanan di derheqê eşîr yan jî malbatên xwe de hin agahîyên din yên wek eşîr yan jî malbata wan ji ku hatîye, eşîr yan jî malbata wan li kîjan gundan dijîn û hwd. dan me. Ji van agahîyan jî hinek jê me hêjayî tomarkirinê dît. Van zanyarîyan jî di deverna de

alîkarîya zelalkirina navê hin eşîr yan jî malbatan kir. Ligel mijarên onomastîkê, ji ber ku ev xebat li ser qadekê hatiye kirin û bandora civakê jî li ser awayê çêkirina navan heye, bi awayeke mecbûrî diviyabû em li bingeh û taybetmendiyên sosyolojiya qada xebatê jî binêrin. Lêkolîna li ser sosyolojiya herêmê bi vî awayî hatiye kirin.

I.4. LÊKOLÎNA SOSYOLOJÎK

Di lêkolîna sosyolojîk de qadên bûye mijara xebatê, navenda Dêrikê û çar gundên wê yî bi navê Qizil, Bixur, Fitin û Xarok e. Di heman demê de ev her pênc qadên hatine hilbijartin, qadên lêkolîna navê mirovan e jî. Bi vî awayî hatîye armanckirin ku têkilîya binyada sosyolojîk ya van qadan bi awayê navlêkirinê re were tespîtkirin. Ji ber wê, dema ku hevdîtin bi beşdarvanan re hatîye kirin li gel pirsên sosyolojîk di heman demê de pirsên li ser navlêkirina zarokan jî ji wan hatîye pirsîn.

Ev her çar gund, ji aliyên erdnîgarî, eşîrî, aborî û civakî ve ne wek hev in. Ji bilî van cudayîyên xwe, ji aliyê çandî ve jî hin guhertin di navbera wan de heye. Tevlî van taybetmendiyên wan, bi bijartina van gundan hatîye armanckirin ku profila Dêrikê ya sosyolojîk bi her awayî were temsîlkirin û bandora wê ya li ser awayê lêkirina navan rasttir derkeve holê. Sosyolojiya her gundekî di beşa ‘‘Navê Mirovan li Herêma Dêrikê’’ de di bin sernavê gundên xwe de hatîye tomarkirin. Di beşê van gundan de berî ku em behsa navê mirovan bikin bi kurtasî di derheqê sosyolojiya van gundan de agahîyên ku me bidestxistine heye.

Ji bo lêkolînên sosyolojîk me hin zanyarîyên pêwîst ji sazîyên têkildar sitend, lê belê agahîyên herî pir me bi rêbazên ‘‘çavdêrî’’ (observation) û ‘‘hevdîtinên lêhûrbûnî’’ (Interview) da hevdû. (Gökçe, 1992: 94-130) Berî ku em herin bi beşdarvanên xwe re hevdîtinan pêk bînin me pirsên ku em ê ji wan bipirsîn amade kiribûn. (Pêvek: 1. Kaxeza pirsan) Li gor pêvajoya hevdîtinê, carinan li gel van pirsan me pirsên guhertî jî dipirsî. Her weha carinan jî ji bilî bersîva pirsên me, beşdarvanan agahîyên ku me nedipirsî jî didan me. Ji van agahîyan yê ku me hewce dîtîye jî me bikaranîye. Di hemî xebatê de beşdarvanên tevlî hevdîtinan bûne li gor temenê xwe du nifş in. Beşdarvanên temenê wan 50 û yê jê berjortir wek nifşê mezin; yê temenê wan di navbera 18-50’î

de wek nifşê biçûk hate pejirandin. Ji nifşê mezin beşdarvanê herî biçûk 50 salî; yê herî mezin 94 salî ye. Ji nifşên biçûk beşdarvanê temenê wî herî biçûk 18 salî; yê herî mezin 50 salî ye. Li navenda Dêrikê bi giştî bi 43 beşdarvanên ji nifşê mezin re hevdîtin hate çêkirin. Ji van beşdarvanan 18 heb jin in. Ji nifşê biçûk bi 25 beşdarvanî re hevdîtin hate çêkirin. Ji van beşdarvanan 7 heb jê jin in. Li Qizilê bi 28 beşdarvanên temenê wan di navbera 20-78'an de; li Bixurê bi 15 beşdarvanên temenê wan di navbera 21-84'an de; li Fitnê bi 8 beşdarvanên temenê wan di navbera 24-72'an de û li Xarok bi 19 beşdarvanên temenê wan di navbera 24-82'yan de hevdîtin hatîye çêkirin. Li gundan rêjeya beşdarvanên jin li gor navenda Dêrikê kêmtir e. Li Qizilê 4; li Bixurê 3, li Fitnê 3 û li Xarok 5 jin beşdarî hevdîtinan bûn. Hejmara hevdîtinan li gor mezinbûna gundan hatîye guhertin.

Hem li navenda Dêrikê û hem jî li Qizilê, li Bixurê, li Fitnê û li Xarok zanyariyên ku me xwestîye bi rêya çavdêriyê û bi hevdîtinên lêhûrbûnî em bidin hev ev in: rewşa serjimêrî, rewşa aboriyê, rewşa jîyana civakî li wê jîngehê, rewşa perwerdeyê, rewşa eşîr û malbatan, dîroka jîngehê ya kevnare û dîroka avakirina wê ya dawîn, rewşa ol û mezheban, rewşa ziman û heger hebe taybetmendiyên devokî, awayê navlêkirina zarokan, rewşa çand, kevneşopî û taybetmendiyên folklorîk...

Di berhevkirina agahîyan de di serî de vegotinên beşdarvanan yên hevbeş û yên herî pir derketine pêş, li dû wan jî heger hebe vegotinên cuda jî li gor rêjeya vegotinê hatine tomarkirin. Vegotinên beşdarvanan bi nivîsa îtalîk û di nava dunikê de û ew çawa peyivîbin, bêyî guhertina bilêvkirina wan hatîye tomarkirin. Wek çavkanî herfa navê beşdarvan, cihê ku me hevdîtin pêk anîye û dema hevdîtinê jî wek sal, di dawîya peyva beşdarvanan de hatiye nivîsîn. Bi vî awayî me xwest taybetmendiyên devokê herêma Dêrikê jî were tomarkirin. Di navbera hevdîtinên li navenda Dêrikê û yên çar gundan de mijarên guhertî hene. Wek mînak li navenda Dêrikê bi beşdarvanan re li ser Mesîhîyan û bi taybetî li ser Ermenîyan hatîye peyivandin lê li çar gundên navborî ev yek hewce nehatiye dîtin. Cudayîya pirs û hevdîtinan di navbera nifşan de jî çêbû. Wek mînak ji nifşê mezin hate pirsîn ku têkilîyê wan û filan çawabû, lê ev pirs ji nifşê biçûk nehate kirin ji ber ku wan li Dêrikê bi awayeke girseyî Mesîhî nedîtine.

Bi giştî li navenda Dêrikê û li çar gundên navborî, di çarçoweya lêkolîna sosyolojîk û awayê lêkirina navê mirovan de bi 138 kesî re hevdîtin hatîye çêkirin. Ji

vana 40 heb jin in. Ev hejmar wek rêje dike ji % 29'ê beşdarvanan. Lê ji bilî van hevdîtinan, dema ku ji bo tomarkirina navê teşeyên erdnîgarî û navê eşîr û malbatan em li navend û gundên Dêrikê gerîyan ji her gundekî kêmanî em bi du sê heb şênîyî re peyivîn. Ji ber ku hevdîtînên bi vî rengî bi kûrayî nehatîye kirin, me hewce nedît ku em hejmara van kesan tomar bikin. Ji bilî navê teşeyên erdnîgarî û navê eşîr û malbatan, li hin gundên ku me hewce dît, bi awayeke kurt me ji van şênîyan hin agahîyên sosyolojîk, folklorîk, dîrokî û li ser meyla navlêkirina zarokan jî hin agahî dan hevdû.

I.5. TAYBETMENDÎYÊN HERÊMA DÊRIKÊ

I.5.1. Erdnîgarîya Dêrikê

Dêrik navçeyeke Mêrdîn e. Li bakurê wê, navçeya Mêrdîn Şemirx (Şemrex), li başûr-rojhilatê wê navçeya Mêrdîn Qoser, li rojavayê wê navçeya Ruhayê Wêranşar heye. Li başûr axa Dêrikê xwe digihîne ser sînore Sûrî û li başûrê rojava jî xwe digihîne axa navçeya Ruhayê Serêkanîyê. Li alîyê başûr, berîya Dêrikê bi berîyên Qoser, Wêranşar û Serêkanîyê ve dibe yek. Li alîyê Qerecdax jî Dêrik bi hin gundê xwe dibe cîranê Çinara navçeya Amedê. Bi giştî rûberîya Dêrikê û gundê wê 1397 km ye. Dêrik di quntara Çiyayê Mazî de ava bûye. Bakur, rojhilat û rojavayê wê çîya; başûrê wê berî ye. Çiyayê Mazî rêzeçîya ye û li rojava digê ferşê Qerecdax, li rojhilat jî xwe digihîne xeta rêzeçîyayên Mêrdîn û Midyatê. Her çend navenda Dêrikê di quntara çîyê de be jî piranîya axa wê û gundên wê li başûrê navenda wê ango li berîyê ye. Li dû berîyê, di asta duyemîn de beşek girîng ji axa wê li rojavayê navendê ango li hêla ferşê Qerecdax dimîne. Beşek biçûk ji axa wê jî li çîyê ye.

Navê Qerecdax bi kurmancî Çiyayê Reş e, lê belê ji ber ku navê "Qerecdax" ji navê "Çiyayê Reş" populertir bûye dewsa wê girtîye û di nava gel de herî pir ew tê bikaranîn. Qerecdax çîyayeke wolkanîk e. Bilindayîya wê 1919 metre ye. Li gor hin jeologan vî çîyayî di serdema jeolojîk ya Plîyosenê de dest bi tevgera xwe ya wolkanîk kiriye û ne ji devekî tenê lê ji çend deva ve law jê herikîne û ev çîya bi vî awayî di formê çîyeyeke agirîn yê mertalî de her ku çûye bilind bûye. Ji bilî ku gelek gundên Dêrikê li ser van qîşan ava bûne ku bi herikandina van lawan çêbûne, bi qasî 5-7

kilometreyan li başûrê Dêrikê 4 girikên wolkanîk heye. Ji vana yê Girсарînc û Şehar kraterê wan aşkere xuya ne û Girkemîn û Girê Qijot jî di formê kovika de nin. Ev girikên wolkanîk yê li jêrî Dêrikê bi tevgerên tektonîk yê demên dereng de, di dawîya serdema jeolojîk ya Pleistosenê de û bi dehfdana platforma Erebbê de. Ji bilî van girikên li başûrê navçeya Dêrikê, li herema Dêrikê li Misûrî, Xirbêreş, û li Belotîyê jî kovikên wolkanîk hene. (Yıldırım û Karadoğan, 2010: 121, 129)

Gundên wê yî li alîyê berîyê dimîne xwedî zevîyên aluwyon in û gelkî bi qîmet in. Ji ber wê, mirov dikare bêje ev gundên li berîyê dimînin ji alîyê ax û zevîyan û ji alîyê cotkarîyê ve ji gundên alîyê Qerecdax û çiyê bêtir xwedî derfet in. Rêjeya derfetên çandinîyê li gundên alîyê Qerecdax ji gundên berîyê kêmtir e lê ji gundên çiyê bêtir e. Ev herêm her çend di bin herikandina wolkanîk ya Qerecdax de mabe jî di demên dirêj de bi vedana zevîyan ji kevîrên bazalt û qîjot zevîyên çandinîyê zêde bûne. Bi awayeke giştî mirov dikare bêje gundên berîyê ji gundên Qerecdax û yê çiyê dewlemendtir in. Ev pîvan tenê ji hêla danberhevdana gundan weha ye, ji ber ku çî berî dibe, çî Qerecdax dibe û çî çîya dibe, gelek niştêcihên gundan yê bê ax û zevî hene. Li beramberîya vê yekê hin cotkar jî hene xwedî bi hezaran donim zevî ne.

Li çar gundên Dêrikê bendavên avdanê hatine çêkirin û beşek ji zevîyên ku dikeve ber van bendavan, tên avdan. Ev bendav bendava Sêpnatê, bendava Qurxîyê, bendava Kunreş û bendava Sûbetanê ye. Ji bilî zevîyên li ber van bendavan, bi taybetî li hêla berîyê, cotkaran bi derfetên xwe yan jî bi kredîyên banqeyan gelek bîr kolane û ji bilî tene, berhemên wek pembo, garis û bîstanan jî diçînin. Li gor projeya GAP'ê gelek zevîyên li herêma Dêrikê wê bi kanalan bînan avdan. Di çarçoweya vê projeyê de anha bendava Heboşîyê tê çêkirin, li Heboşî û Qizilê erdên ketîye ber vê bendavê tînan îstîmlaqqirin.

Bilindayîya navenda Dêrikê ji behrê 780 m. ye. Îklîma wê mîkroklîmayek ji îklîma Behra Sipî ye, ji ber wê hin riwekên li der û dorê najîn li Dêrikê tê dîtin. Zeytûn ji nav vana ya herî girîng e. Zivistanê wê çiqas sar derbas bibe jî zeytûn adapteyî vê hewê bûye. Di 15-20 salên dawî de êdî zivistan jî wek berê sar derbas nabin. Wek demên berê zivistanî berf nabari û ev yek jî dibe sedemê guhertina rejîma çem, kanî û delavan û bandora xwe li bax û baxçevanîyê jî dike. Xuya ye sedema vê guhertina îklîmê germbûna gerdûnî ye.

Li çîyayên Dêrikê wek devîyan bi awayeke bela bela darên berî û mazî hene. Ji ber ku bi nezanî tên jêkirin ev devî mezin nabin û nabin dar. Li gor vegotina nîfşên mezin:

“Me ji dê û bavê xwe bihîst gi berê ev birekên li der û dora Dêrikê giş bi darên berî û mazî bûn.” (N. Dêrik, 2014)

“Navê Dêrika Çayê Mazî ji vî çayî û darê mazî tê.” (Ş. Dêrik, 2014)

“Mi dî pîrika mi digo me hevîrê xwe dikir û dûr em diçûn van birekna me hejîkê hişk berev dikir û em dihatin me li ser rîya xwe li tenûrê agirê xwe dadida û em dihatin mal me didî hevîrê me hilatîyi, îja em qet nedisekinîn me hevîrê xwe dibir ser tenûrê û me nanê xwe lê dixist.” (A. Dêrik, 2014)

“Gelek mal bi birîna vî çayî zengîn bûni.” (H. Dêrik, 2014)

Ji van vegotinan tê fêmkirin ku zinarên li der û dora Dêrikê berê ne weha tazî bûne. Ji bo ku wek ardû were bikaranîn bi armanca bazirganîyê hatine birîn. Ji ber ku bi awayekî nezanî hatine birîn jî ev daristana ku beşdarvan behs dikin nemaye. Agahîyên ku em di Kamusu’l Alam de û di Salnameyên Dîyarbekir de dibînin jî van vegotinên nîfşê mezin piştrast dike ku li der û dora Dêrikê bi awayeke berfireh daristanên berî û mazî hebûne.

Di vî deh salên dawî de Wezaretê Daristan û Avê hewl daye ku erdên xezîne yê li ser zinarên der û dora navçê bikin daristanên çamê. Ji bo wê li deverna dar hatine çandin, lê ji ber bê baldarîya ajalvanan û xemsarîya parastinê, li gelek cih darên hatine çandin yan xesirîne û yan bi tevayî hişk bûne. Li alîyê bakurê navçê, darên hatine çandin ji ber ku baş hatine parastin bi berhev ketine û bi qasî 1-2 metroyan bilind bûne.

Li navenda Dêrikê du jêderên avê yê sereke hene. Yek li rojhilatê navçê dimîne ku navê wê herêmê Xab e. Av ji serê Xaba Jorîn, ji bin quntara zinara Tûrcelê derdikeve û heger zivistanî berf û baran pir barîyabe, ev av ser re diherike û ber bi başûr ve li binya xwe şîpekê çê dîke û diherike. Beşek vê avê jî her dem di bin erdê re diherike û tê li şikefta xabê der dibe. Ev herêma ku şikeft lê ye navê wê “Serê Xabê” ye û ev av, li vir dest pê dîke û li ser rez û zeytûnên Xabê, bi rêya cihok û miskaran tê parvekirin. Ava

ku ji serê Xaba Jorîn derdikeve, bi demê re ji xwe re newalek çêkiriye, derbuharan bi ava berf û baranan re ev çem diherike û ber bi Tilbisim ve diherike. Ji Tilbisim diçe Rewşatê û ji wir jî ber bi berfîyê ve diherike. Lê ev çem ji ber ku bi ava berf û baranan der dibe, dibe serê havînê nema diherike. Av zuha nabe, bi vê avê rezên zeytûnan tên avdan, ji ber wê av di newalê re naherike. Li herêma Xabê ji bilî vê ava bingehîn, gelek jêderên biçûk jî hene. Kanîka Hesên û Husên, Gola Tûrcelê, Birka Osmanê Silo, Kanîbindêrê, Kanîka Sînê Bozo, Kanîka Gome, Kanîka Humhum û Hewdik ji van jêderan hinek in.

Jêdera avê ya duyemîn ya li navenda navçê ye, jêdera Kulêbê ye ku ev jêder li bakur-rojavayê navçê dimîne. Ev jêder ji ya Xabê nêzîktirî navçê ye, ji ber wê jî heya van salên dawîyê jêdera avê ya vexwarinê ya bingehîn bû. Ji bilî ava vexwarinê, ev jêder ji bo avdana zeytûn û rezên Kulêbê jî dihat bikaranîn. Li ber ava Kulêbê li başûrê navçê herêmek bi navê Berdîn jî heye ku zeytûn lê heye. Ji ber rê û avadanîyên çêbûne êdî ava Kulêbê xwe nagihîne Zeytûnên Berdîn. Di sala 2013'an de şaredariya Dêrikê ji bo ava vexwarinê av ji jêdera Xanokê anî Dêrikê. Li gel vê avê ava Kulêbê hîn jî ji bo vexwarinê tê bikaranîn. Li navenda Dêrikê ji bilî van her du jêderên avê yên sereke, li du herêmê din jî jêderên avê yên biçûk hene û ji berê de li ber wan rez û zeytûn hatine çandin. Yek jê li başûrê navçê ye ku jê re "Dahl" tê gotin jêderên wê yên avê yên sereke Kanîbîrk, Serê Golê, û Eneñib e. Herêma din jî Heramiya ye. Li vê herêmê jêderên avê yên bi navê Kanîya Pan, Kanîya Misrîn, Kanîka Dêran heye. Baxçe û zeytûnên Dêrikê li gor van her pênc herêman tên binavkirin û ev dever di heman demê de cihê ger û seyranê ne. Wek Zeytûnên Xabê, Rezên Kulêbê, Zeytûnên Dahlê, Zeytûnên Heramiya, Zeytûnên Berdîn. Di vî deh salên dawî de ji ber ku berf û baran kêr dibare, ev jêderên avê hinek ji wan qet naherikin hinek ji wan jî pir zû zuha dibin, ji ber wê jî xwedîyên rezan bîran dikolin.

Navenda navçê bi sê rêyan bi der û dora xwe ve tê girêdan. Rêyek ji Dêrikê derdikeve û ber bi başûr ve diçe. Ev rê bi piranî ji bo çûna Qoserê û Mêrdîn tê bikaranîn. Ev rê di heman demê de ji ber ku xwe digihîne rêya Îpekê, Dêrikê bi Wêranşar û Ruhayê ve jî girêdide. Di nava gel de ev rê wek rêya Qoserê tê zanîn. Rêya duyemîn, ya ku ber bi bakurê Dêrikê ve ye. Bi vê rîyê mirov pêşî diçe Şemrex. Piştî Şemrex, mirov xwe digihîne duryana Dîyarbekir û Mêrdîn. Ji bo ku mirov biçê

Dîyarbekir divê mirov biçe bakur, ji bo ku mirov biçe Mêrdîn, divê mirov biçe rojhilat. Ev rê bi piranî ji bo çûna Dîyarbekir tê bikaranîn ji ber wê di nava gel de wek rêya Dîyarbekir tê zanîn. Rêya sêyemîn wek rêya gundan tê binavkirin, Dêrikê bi gundê wê yî li aliyê Qerecdax ve girêdide. Li ser vê rêyê ji ber ku pêşî gundê Qetaro û Beyrokê heye, di nava gel de wek rêya Qetaro yan jî rêya Beyrokê tê binavkirin.

Ji bo ku mirov ji Dêrikê biçe Mêrdîn du alternatîf hene. Ya herî pir tê bikaranîn rêya Qoserê ye ku ev rê piştî 19 km'an xwe digihîne şahrêya D-400'ê ku di nava gel de wek "Rêya Îpekê" tê bi navkirin. Ku mirov digê ser vê rîyê û şûn de ji ser qoserê mirov dikare biçe Mêrdîn. Di ser vê rîyê de navbera Dêrikê û Mêrdîn 72 km ye. Alternatîfa duyemîn ya ji ser Şemrex re ye. Di vê rîyê re navbera Dêrikê û Mêrdîn 61 km ye. Ji bo ku mirov ji Dêrikê biçe Amedê divê mirov guzergaha Şemrex û Çinarê bişopîne. Navbera Dêrikê û Amedê 90 km ye. Ji bo ji Dêrikê mirov biçe Ruhayê divê ji şahrêya D-400'ê mirov berê xwe bide rojava. Pêşî dê mirovê biçe Wêranşar û dûv re biçe Ruhayê. Navbera Dêrikê û Ruhayê 155 km ye.

Li Dêrikê di warê pîşesazîyê de heya salên dereng jî tu kar tunebû. Di sala 2009'an de bi qasî 10 kmyan nêzikî navçê, li herêma gundê Girsarînc ji aliyê şirketek taybet karxaneyek çîmentoyê hatîye vekirin. Ev karxane salê dikare 788.400 ton çîmento hilberîne.⁶ Ev karxane, keresteyê pêwîst ê bingehîn ji girên agirîn yên li der û dorê derdixîne. Di vê karxanê de tenê 15 karkerên Dêrikî dixebitin. Tevî karên wek guhastin, nanpêjî û hwd. bi giştî 20 karkerên Dêrikî li vir dixebitin. Ji bilî wê di warê pîşesazîyê de derfetê kar tuneye. Aborîya Dêrikê û gundê wê, bi rêjeyek bilind li ser cotkarîyê ye. Li dû cotkarîyê li gundan ajalvanî, li navenda navçê jî bazirganî, karmendîyên fermî yên cûr be cûr tên. Li gor qeydên Odeya Esnafan ya meha Tîrmeha 2014'an li Dêrikê 372 mukellefên bacê hene ku bi awayeke aktîf dikandarîyê û zineatkarîyê dikin.

Li gundên aliyê berîyê zevîyên ajotinê gelek in û bi qîmet in. Li van gundan jêderên avê yên xwezayî wek çem û gol tunene lê gelek bîr hatine kolan û çandinîya avî tê kirin. Li gel genim, ceh û nîskan, di 10-15 salên dawî de berhemên wek garis û pembo jî gelekî tên çandin. Bi xêra van bîrên hatine kolan, cotkar dikarin di salekê de ji

⁶ <http://www.limak.com.tr/sektorler/cimento/fabrikalar/limak-mardin-cimento-fabrikasi>

zevîyên xwe du berheman rakin. Gundên li çiyê dimîne ji ber kêmanîya zevîyan bêtir bi ajalvanîyê ve dadikevin lê ajalvanî têra debara wan nake. Ji ber wê karkerên demsalî bêtir ji gundên çiyê derdikevin. Li tevaya Dêrikê rûberîya zevîyên ji çandinîyê re guncan e 970 hezar dekar e.⁷

Li navenda Dêrikê, hilberîna zeytûna di warê aborîya navçê de xwedî nirxeke girîng e. Zeytûnên tîn hilberîn wek zeytûnê şîn ji bo xwarinê tê bikaranîn. Di heyamên berê de zeytxaneyek hebûye û ji bilî vê zeytxaneyê li gelek malan, di maseran de bi awayê kevneşopî zeyt û sabûn dihate çêkirin. Lê anha xebateke bi vî rengî tune. Ji bo ku zeytûnê Dêrikê ji bo zeyt û sabûnê jî were bikaranîn hin projeyên taybet hene lê di asta destpêkê de ne. “Yekîtiya Zeytûnvanên Mêrdîn” sazîyeke sîvîl e ku zeytûnvana vekiriye û navenda vê sazîyê li Dêrikê ye. Her çend wek sazîyekê hebe jî xebatên wê ji ber bêderfetbûnên aborî gelekî kêmtir e. Hejmara darên zeytûnan û rûberîya ku zeytûnvantî lê tê kirin bi misogerî ne dîyar e, ji ber ku li gelek deverên bêtapo jî dar hatine çandin. Li gor hejmarên qeymeqamtîya Dêrikê hejmara darên zeytûnan 130 hezar e. Di salên dawîyê de li çend gundên Dêrikê jî darên zeytûna hatine çandin û anha berhema didin. Li navenda Dêrikê cûreyê zeytûna yê herî biqîmet û yê herî pir, zeytûnê “xirxalî” ye. Dêrik li Tirkî wekî navenda zeytûnê xirxalî tê qebûl kirin. Cûreyên din yên zeytûna jî yên wekî zoncik, melqebazî, xursêkî, belotî, kejik, girover, mawî, cûreyên xwemalî ne û divê tescîl bibin. Li gel zeytûnan li navenda Dêrikê û li gundên çiyê di nava xebatên aborî de xerzîkên tirî jî ciheke girîng digire. Li gor texmînên qeymeqamtîya Dêrikê rûberîya xerzîkên tirî 20 hezar dekar e. Berhemên din yên girîng li navenda Dêrikê û hinek gundên wê tîn hilberîn hejîr, hinar, mişmiş û gwîz in.

Ji berê de xwezaya Dêrikê, av û rezên wê bi xweşbûna xwe tê naskirin. Helbestvanê Kurd yê meşhûr Cegerxwîn di xortanîya xwe de li Dêrikê medrese xwendîye, paşê demekê li vir meletî kiriye û pir di bin bandora Dêrikê de maye. Di hevpeyvîneke xwe de dibêje: ‘*Dêrik gola çandê ye. Min li Dêrikê meletî kire. Ger ez neçûma Dêrikê, min Pozê Tûrcelê, Textê Qîza Qrêl, Xab û Kulêbe, rez û baxçeyên Dêrikê nedîya dibe ku ez nebûma şair. Ji alîyê îlhama xwe û hişyarbûna xwe ve ez deyndarê Dêrikê me.*’⁸ Cegerxwîn, di kovara Hawarê de jî, di hejmara 5’an de bi navê

⁷ www.derik.gov.tr

⁸ Hevpeyvîn: Firat Cewerî, Medya Guneşî, hej.5, r.49, Ist.1985

‘‘Pesna Dêrikê’’ helbestek nivîsîye û di vê helbesta xwe de behsa xweşbûna xwezaya Dêrikê û rez û kanîyê wê kiriye.⁹

I.5.2. Dîroka Dêrikê

Heya nuha dîroka Dêrikê bi awayekî zanistî nehatîye lêkolîn. Bi awayê dîroka nivîskî tiştên li ser Dêrikê hatine gotin bi piranî bi şîroveyan li ser dîroka Amed û Mêrdîn ve girêdayî ne. Ji bilî van her du bajaran, dîroka Dêrikê ya xweser nehatîye nivîsîn. Belgeyan nivîskî yên di destê me de ji ber wê pir kêmtir in û dûr naçin. Em di van belgeyan de bi piranî bi awayeke kurt rêveberîya dewletê ya li Dêrikê, serjimarîya Dêrikê, hin zanînen civaknasî di derheqê Dêrikê de, aborîya Dêrikê û hwd. dibînin. Ev belgeyan nivîskî danakevin dîroka avakirina navçeyê. Belgeyan nivîskî yên li ser Dêrikê ku me karîbû bi dest xista û bi kurtasî agahîyan didin ev in:

Di pirtûka Şemseddîn Samî ya bi navê Kamûs-ul A’lam de di xala Dêrikê de weha tê gotin: ‘‘*Bajarokek (qesabe) bi ser wîlayet û sencaxa Dîyarbekir ve û 65 km.yan li başûrê Dîyarbekir, 36 km.yan li rojavayê Mêrdîn, di quntara çîyayên Qerecdax de, li ser çemê Cerceb yê bi Xabûrê ve girêdayî ye û serjimêriya wê 1000 heb jê Ermenî û yên mayî Kurd bi giştî ji 2500 mirovî pêk tê, mizgeftê, dêrek, xanek, 15 dikan û 10 kanîyê wê heye. Av û hewa wê xweş e û bi darên zeytûn, hejîr û hinaran dorpêçkirî ye. Navçeya Dêrikê ji bakur ve bi Dîyarbekir, ji rojava bi navçeya Siwerekê, ji rojhilat bi senceqa Mêrdîn û ji başûr ve jî bi mutasarrafîya serbixwe ya Zorê ve bi sînor e. Mezinaya xaka wê 3.448 km² ye û jê 2.784 km² ji bo çandinîyê guncan e, 646 km² yê wê zinar û bi kevir e, 18 km² yê wê jî daristan e. Ahalîyên wê 18.288 kes in û 15.288 heb jê wek Tirk, Kurd, Erebi û Çerkez misilman in. 3000 heb jê wek Ermenî û Suryanî Mesîhî ne. Qeza ji 78 gundan û bi navê Mehel, Metînan, Şengur û Lîf çar heb nahîyeyan pêk tê. Bi giştî di nava hewzeyê Firatê de dimîne û jêdera çemê Cercebê dihewîne. Zevîyên wê gelekî berhemdar û baş e û li gorî ku ahalîyên wê guh nadinê û zevîyên wan dûrî wan e jî têra xwe berhem jê tê hilanîn. Darê mêwa û xerzîkên wê yên tirî pir in. Xerzîkên wê yên tirî jî pir in û celebê şeraba meqbûl jê tê hilberîn. Çêreyên wê pir in û gîhayên wê bi bîhn*

⁹ Cegerxwînê Kurdî, Pesna Dêrikê, Hawar, hej.5, r.7

in û ji şîrê mîhên wê yên pir, rûnên bîhnxweş tê derxistin. Heywanên wê yên kedî yên wek dewar, hesp, ker û qantir jî pir in.” (Bozarslan, 2001: 85)

Wek ji agahîyên Kamusu’l-alam jî tê fêmkirin Dêrik ji alîyê rêveberîya fermî berî ku were ser Mêrdîn, bi Dîyarbekir ve girêdayî bû. Ji ber wê di derheqê Dêrikê de em li çavkanîyeke nivîskî ya girîng jî di nava salnameyên Dîyarbekir de rast tên. Ev salname qeydên salên 1869-1905’an sal bi sal dide. Em li gel hin guhertinên rêveberî, li hin agahîyên sosyolojîk, erdnîgarî, aborî û çandî jî dibînin di van salnameyan de. Di salnameya Dîyarbekir ya sala 1869’an de em dibînin ku Dêrik wek nahîye bi qezaya Rasuleynê ve girêdayî ye. Rasuleyn jî qeza Dîyarbekir e. (Diyarbakır Salnameleri, 1999: c.1, 49)

Di salnameya H.1288 (M.1871-1872)’an de serjimarîya navçê 1890 e. Jê 1540 misilman, 350 jê xeyr-î muslîm in û 5 taxê navçê hene. (Diyarbakır Salnameleri, 1999: c.1, 218)

Di salnameya H.1289 (M.1872-1873)’an de Dêrik ji Rasuleynê tê veqetandin û rasterast bi navenda bajêr ya Dîyarbekir ve tê girêdan û midûrê nahîya Dêrikê yê wê demê kesekî bi navê Îsmâil Efendî ye. (Diyarbakır Salnameleri, 1999: c.1, 249)

Di salnameya H.1294 (M.1877)’an de Dêrik ji 5 nahîyeyên Dîyarbekir yên navendî yek e. Di vir de em dibînin nahîyeya Metînan ku Şemseddîn Samî di sala 1891’ê de behs kiribû ku nahîya Dêrikê ye, di 1877’an de ew jî wek nahîyeyekê bi navenda Dîyarbekir ve girêdayî ye. Li gor vê salnamê, nahîyeyên Dîyarbekir yên navendî ev in. Nahîyeya Şerqê, Nahîyeya Xerbê, Behramkî, Nahîyeya Dêrikê, Nahîyeya Metînan. (Diyarbakır Salnameleri, 1999: c.3, 49)

Di salnameya H.1308 (M.1890-1891)’ê de em dibînin ku Dêrik di bin sernavê “Qezayên Mulhaq” de ji nahîyetîyê bûye qeza û qeymeqamê wê jî yekî bi navê Suleyman Kadem Bey e. (Diyarbakır Salnameleri, 1999: c.4, 41)

Di salnameya H.1316 (M.1898-1899)’an de, di bin beşa cih, mekan û navdarên pîroz de di cîlda çaremîn de navê Şêx Pîr Xetab derbas dibe û weha tê gotin: “*Hezretê Şêx Pîr Xetab li qezaya Dêrikê li gundê Şêxan veşartî ye.*” (Diyarbakır Salnameleri, 1999: c.4, 210) Ji vê agahîyê jî em fêm dikin ku herema Şêxan û cihê mekanê Pîr Xetap

ku îro bi qasî 6 km li bakurê Şemrex e, wê demê wek gund bi ser Dêrikê ve bûye û wê demê jî wek mekanekî zîyaretê bûye.

Di salnameya H.1317 (M.1899-1900)'î de em dibînin kesên ne misilman jî di rêveberîya navçê de cî digirin. Azayê muntehebe ev in: Haci Osman Axa, Bogos Axa, Keno Axa, Haci Osman Reşid Axa. Dibastaneke seretayî heye li navçê û şagirtên wê 32 heb in. Pêdivîya keresteyên ji bo wîlayeta Dîyarbekir li gel hin deverên din ji Dêrikê jî tê derbirîn. Li vir navê du heb Osman Axa derbas dibe, li gor navan dibe ku Haci Osman Reşid Axa Osmanê Reşo be ku mezinê eşîra Mamûdan e. (Diyarbakır Salnameleri, 1999: c.4, 244)

Di salnameyên H.1318 (M.1900-1901); H.1319 (M.1901-1902); H.1321 (M.1903-1904); H.1323 M.(1905)'an de navên qeymeqam û azayên navçê hatîye nivîsandin. Di nava azayan de di salnameyên salên H.1321 û H.1323'an de wek muftîyê navçê navê Îskender Efendi derbas dibe ku ew îhtîmaleke mezin Seydayê Mele Îskender e ku melayekî bi nav û deng e. Di van salnameyên dawîn de jî di nava azayan de navê hin kesên ku mirov ji navê wan fam dike ku ne misilman in, lê em nizanin ka Ermenî ne yan Suryanî ne derbas dibe. Wek Îlyas Saliba Efendi, Keno Efendi, Cubur Efendi, Kapo Axa. Îlyas Saliba Efendi dibe Êlasê Meelim be ku ew Ermenî bû û tê gotin ku muderrîs bû. Li vir ya girîng ev e ku em dibînin di rêveberîya navçê de li gel Kurdên misilman kesên ne misilman jî cih digirin. (Diyarbakır Salnameleri, 1999: c.5, 58, 154, 265, 317)

Dema ku em agahîyên salnameyên Dîyarbekir û agahîyên Şemseddin Sami yên di Kamusu'l-Âlamê de derbas dibe didin ber hev em dibînin ku hin nakokî yan jî xeletî di navbera wan de û di navbera agahîyên me yî îroyîn de heye. Cîlda Kamusu'l-Âlam ya sêyemîn ku xala Dêrikê tê de ye, di sala 1891'ê de hatîye çapkirin. Ji vê çapê û vir de 123 sal derbas bûye. Nakokîya herî mezin ev e ku em ne di salnameyên Dîyarbekir de û ne jî di vegotinên devkî de bi tu awayî li şopa niştəcîhên Tirk û Çerkez rast nayin ku demekê li Dêrikê hebûne. Çawa ku di salnameyên Dîyarbekir de jî behsa wan derbas nabe, bi awayê devkî jî tu kes behs nake ku wek niştəcîhan demekê bi awayeke girseyî, wek malbat, ezbet yan jî eşîran Tirk û Çerkez li herema Dêrikê jîyane. Şemseddin Sami ji bo navenda Dêrikê behsa wan nake, li gor agahîyên didi me navenda Dêrikê ji Kurd û Ermenîyan tenê pêk tê. Li gor wî divê di nav sînorê qezaya Dêrikê de ango li gundên Dêrikê Tirk û Çerkez jîyabin. Lê belê di derheqê wan de tu agahî tune ku berî nuha bi

sed salî li van deran kesên nijadtirk û nijadçerkez wek niştecihan hebûne. 123 sal ne demek ewqas dirêj e ku ev agahî wenda bibin yan jî ew kesên ku nijadê wan Tirk yan Çerkez in, bi awayeke xwezayî di nava Kurdan de hatibin bişavtin. Ji ber ku kesên temendirêj wê behs bikirana û ev agahî wenda nedibû ku koka hin malbatan Tirk yan jî Çerkez in. Lê li hin gundên berîya Dêrikê eşîreke Erebe heye, ku ji wan re dibêjin Tat û anha jî li herêmê dijîn. Ji ber ku em bi çavkanîyên Şemseddin Samî nizanin em nikarin zêde tiştêkî li ser bibêjin, lê dibe di wan deman de ji ber têkilîyên xwe û yên dewleta Osmanî, hin eşîr yan jî malbatan gotibin em Tirk in yan jî Çerkez in. Lê li hêla din agahîyên di derheqê Ermenî û Suryanîyan de hatîye dayin maqûl in, ji ber ku bi gelek awayî şop û navê wan li herêma Dêrikê heye ku ji xwe heya van salên dawîn jî bi awayeke girseyî bi taybetî li navenda Dêrikê jîyane. Wekî me di salnameyên Dîyarbekir de jî dîtî ku rêjeya serjimariya wan ya li navenda Dêrikê dibe sedem ku weke ‘’aza’’ tevî rêveberîya Dêrikê bibin. Ji van kêmetewan îro hew malbateke Ermen li Dêrikê maye. Mesîhîyên Dêrikê koç kirine û yên li Tirkîyê mane çûne li Stenbol bi cih bûne, yên derketine derveyî Tirkîyê jî li welatên wek Elmanya, Frensa, Amerîka, Swêd û hwd. bi cih û war bûne.

Nakokîyeke din ev e ku îro bi navê Cerceb yan jî Circib tu çem tune ye li herema Dêrikê. Li rojavayê Wêranşar çemekî bi navê Curcup heye û îxtîmalek mezin e ku çemê Şemseddîn Samî behs dike ev e. Ev çem wekî ku Şemseddîn Samî jî dibêje bi Xabûra ku ji quntara başûrê Qerecdax diherike ve dibe yek û xwe digihîne çemê Firatê.¹⁰ Ya rastî li herêma Dêrikê çemekî ku her dem diherike tune ye anha. Piranîya çemên Dêrikê delavên ava berf û baranan e ku dibe havîn zuha dibin. Sala ku berf û baran pir be dereng zuha dibin, lê ku kêmet be xwe nagihînin nava havînê. Hemî avên Dêrikê di hewzaya Firatê de ne.

Dûrbûna Dêrikê ne wek navend lê sînorê wê yî gundewarî hatîye hesabandin ku mesafeya wê û bajarên Dîyarbekir û Mêrdîn bi wî awayî hatîye dayin. Ya na heger li gor navenda îro hatibe dayin mesafe xelit e. Û ya dawîn Çiyayê Mazî wek beşek ji çiyayê Qerecdax hatîye hesabandin ku ev yek ji xeletîyê wêdetir karekî sinifandinê ye, mirov nikare jê re bêje xeletî ye ji ber ku di wê demê de dibe ku Çiyayên Mazî, parçeyek ji Qerecdax dihate hesabandin.

¹⁰ Ji bo agahîyên berfirehtir binêrin: <http://www.viransehir.gov.tr/cografi-durumu>

Piştî ku dewleta Osmanî hildiweşe û Komara Tirkîyê ava dibe, komara nû di rêveberî û dabeşkirina bajar, navçe û gundan de gelek guhertinan çêdike. Li gor van guhertinan, di sala 1926'an de Dêrik ji bajarê Dîyarbakir tê sitandin û bi Mêrdîn ve tê girêdan. Bi vê guhertinê re nexşeya Dêrikê jî weke îro tê tayinkirin û gelek gund û çend nahîye ji Dêrikê tê qetandin. Ji ber ku Dêrik êdî navçeya Mêrdîn e, em li çavkanîyek din ya nivîskî di nava belgeyên Mêrdîn de rast tên. Ev belge pirtûka bi navê "Beledîyeler" e ku ji alîyê wezaretê hundirîn, midûrîyeta rêveberîyên herêmî ve di sala 1933'an de hatîye çapkirin. Di vê pirtûkê de di derheqê hemî şaredarîyên bajarên Tirkîyê de agahî hene. Di bin beşa şaredarîya bajarên de bi awayekî kurt behsa navçeyên wan jî tên kirin. Di bin beşa şaredarîya Mêrdîn de ji bo Dêrikê ev agahî tên dayin: *"Serjimêriya navenda Dêrikê 2657 kes e, 578 mal e, butçeya şaredarîyê 2913 lîre ye, du heb jêderên avê lê heye, karê paqijîyê bu du karkeran tê meşandin, mezbexaneyek wê heye û rojê 5 mîh, mehê dewarek lê tê şerjêkirin. Dibistanek seretayî lê heye, dîspanserek heye lê ji bo çendakî hatîye girtin, 75 dikan û karxaneyek zeytê heye. Di nava mintîqa şaredarîyê de zeytûn, her celeb mêw û sewze tê hilberîn û ji bo derve zeyt, sabûn û mêw tên hinartin. Di nava sînorê şaredarîyê de jî bi awayekî pir mazî, berû, qeşûf (qalikê hinaran), genim, ceh, gilgil, nok, rûnê malê û hirî tê hilberîn û tê hinartin."* (Beledîyeler, T.C Dahilîye Vekaleti Mahalli İdareler Umum Müdürlüğü, 1933:744)

Belgeyek din ya nivîskî salnameya bajarê Mêrdîn ya sala 1967'an e. Di vê salnameyê de jî di derheqê navenda Mêrdîn û navçeyên wê de agahîyên dîrokî, erdnîgarî, sosyolojîk, aborî û çandî hene. Di destpêka xala Dêrikê de weha tê gotin: *"Di derheqê dîroka avakirina Dêrikê de di destê me de belgeyêke misoger tune. Lê belê eşkere ye ku dîroka wê û ya navçeya Şemrexê hevbeş e... Navçe di sala 1926'an de ji bajarê Dîyarbakir hatîye sitandin û bi bajarê Mêrdîn ve hatîye girêdan. Tê texmînkirin ku li şikeftên li alîyê çiyê, mezelên di tatan de hatine kolan û hin xirbeyên avahîyan, berhemên serdema berî mîladê nin. Rast e ku li van deran demên dirêj Bizans û Romayî jîya ne û li der û dora gundê Altinköyê madenên zêr derxistine."* (Mardin İl Yıllığı, 1967:18)

Ji bilî van agahîyan, di derheqê hejmara tax û gundên navçê, navê muxtarên gundan, di derheqê awayê jîyana civakî, folklor û hin kevneşopîyên gel de agahîyên kurt tên dayin. Di beşa cihên dîrokî de di heqê Kela Rebetê, Kela Dêra Metînan,

xerabeyên Tilbisim, xerabeyên Fitnê, xerabeyên Ofî û yên Zorava, Qesra Qenco de agahîyên kurt tîn dayin. Di cihê butçeya şaredarîyan de jî serjimêrîya navçê û butçeya şaredarîyê hatîye nivîsandin. (Mardin Îl Yıllığı, 1967: 19, 32, 85, 95, 118, 119, 127, 128, 168)

Ji bilî van çavkanîyên nivîskî, ji alîyê lêkolînerêkî Dêrikî Eyyüp Güven ve pirtûkek bi navê “Derik Tarihi-1” (Dîroka Dêrikê-1) hatîye nivîsandin û di sala 2008’an de hatîye çapkirin. Di vê pirtûkê de Güven xwestîye ji çavkanîyên nivîskî û yên devkî dîroka Dêrikê binivîse. Ji bilî dîrokê di heman demê de li ser çand û sosyolojîya Dêrikê jî agahîyên balkêş hene di pirtûkê de. Mijarên nivîskar li ser sekinîye bi kurtasî di bin van sernavan de ev in: Şaristanîyên li Dêrikê hikum kirine, cihên dîrokî yên li Dêrikê, taxên Dêrikê, dîroka çapemenîyê, jeolojîya Dêrikê, afatên xwezayî yên girîng yên hatine serê Dêrikê, Ermenî, Suryanî, Cihû û Êzîdîyên li Dêrikê jîyane, kesên navdar yên li Dêrikê jîyane, eşîrên Dêrikê, qeymeqamên Dêrikê, şaredarên Dêrikê, sazîyên siwîl yên li Dêrikê, zîyaretgeh û cihên geştê, kevneşopîyên navçê, parlementerên Dêrikê, mezelen Dêrikê, zeytûnê Dêrikê, listikên Dêrikê, manî û çîvanokên Dêrikê, gundên Dêrikê, kedkarên Dêrikê yên nejbîr, xanîyên kevin û hwd.

Di pêşgotina pirtûkê de lêkolîner dibêje: “*Ez bawer dikim heger berî nuha bi 20 salî hinekan dîroka Dêrikê nivîsîba îro kêmanîyên min yên di vê pirtûkê de dê kêmtir bûya. Ya girîng destpêk e û min hewl da ku ez vê gavê bavêjim, dibe ku di xebata min de kêmasî û xeletî hebin.*” Di pêşgotinê de lêkolîner dibêje di mijarên ku çavkanî nedîtîye ji dîroka bi devkî sûd wergirtîye. (Güven, 2008)

Wekî ku ji van çavkanîyan jî tê fêmkirin dîroka Dêrikê ya xweser bi awayeke zanistî heya nuha nehatîye lêkolîn. Li gor me ji bo dîroka Dêrikê û herema wê were zelalkirin divê bi awayeke xurt alîkarî ji zanista arkeolojîyê were girtin. Qada ku em behs dikin ne qadek pir mezin e, tenê qada navçeyekê û gundên wê ye. Ji ber wê ne pêkan e ku dîrokek wê yî ku tenê wê eleqeder bike hebe. Ango dîroka Dêrikê dê bi awayeke xwezayî bi dîroka Mêrdîn, Amed, Ruha, Şemrex, Wêranşar, Serêkanîyê, Qoserê ve têkildar be. Ji xwe Dêrik wek pirekê van jingehan bi hev ve girêdide.

Sedema ku em dibêjin di vî warî de dê arkeolojî ji me re bibe alîkar ev e. Li navenda Dêrikê, li çîyayên Dêrikê, li berîya Dêrikê û li gundê wê yî li hêla fersê

Qerecdax em karin bibêjin cih tuneke ku şûnwarên şaristanîyên kevn lê tunebin. Bêyî kolan gelek ji van bermayîyan bi çavan xuya ne. Li deverna mirov dibîne ku di tat û zinaran de sarinc hatine kolan û bi cihokan ev sarinc bi hev hatine girêdan, li deverna mirov şikeftên çêkirî dibîne ku hindurê wan wek odeyan hatine dabeşkirin û di hinek ji wan şikeftan de mezêlên tatîn hene.¹¹ Li hinek gund mirov dibîne gir û girikên axê yê dîrokî hene û di nav van giran hinekan de, di cihên hilşiyayî de dîwarên kevira xuya ne. Bi xebatên arkeolojîk, antropolojîk û dîrokî, di navbera bermayîyên şaristanîyên çiyê û yê beriyê de ji aliyê dîrokî, çandî û netewî ve çî têkilî û cudayî heye divê were lêkolîn.

Lêkolîneke arkeolojîk li gundê Eynterîyê li herêma Kerkuştî hatîye kirin. Kolana yekemîn di sala 1981'ê de ji aliyê Muzeya Mêrdîn ve hatîye kirin. Di sala 1981'ê de di dema çêkirina rêya di navbera Qoser û Wêranşar de li gundê Dêrikê Eynterîyê li devera ku jê re dibêne "Kerkuştî" karker li hin bermayîyan rast tên. Ev bermayîyên hatibûn dîtin hin avahî, mozaîk û mezêlên ji kevîrên bazalt yê serdema Romayîyan bûn. Li heman herêmê di sala 2005'an de ji bo rê were firekirin xebat tê destpêkirin. Tê dîtin ku ev şûnmayîyên Kerkuştî ji ber firekirina rê dê xera bibe, di bin serokatîya Doç. Dr. Aslı Erim Özdoğan de kolanên rizgarkirinê dest pê dike. Savaş Sarialtun dibêje li gor encamên van her du kolan û tezên li ser wan hatîye nivîsandin, ev bermayîyên girê Kerkuştî mînakê ji çanda Xelef e û ji şeş tebaqeyan pêk tê. 1. Serdema navîn û dû wê, 2. Serdema Roma (heremî) 3. Serdema navîn ya tûncê 4. Serdema dawî ya kalkolîtîkê 5. Serdema Xelef 6. Girê Kerkuştî Serdema Xelef. (Sarialtun, 2009)

Wekî li jor jî me behs kir, ji bo ku dîroka Dêrikê û herêma wê bi awayeke berfireh zelal bibe, divê lêkolînên bi vî rengî pirtir werin kirin. Lê em zanin ji bo lêkolînên bi vî rengî werin kirin divê projeyên wan û aborîya projeyên wan were çêkirin. Lê berî wê jî divê di warê polîtîk de û di nêrîn û rûmetdayina çand û dîrokê de helwesta rayedaran were guhertin. Ji destpêka avakirina Komara Tirkîyê û vir de ji ber ku Kurd hatine înkarkirin, zimanê kurdî û dîroka Kurdan jî hatîye înkarkirin û îhmalkirin. Di vî warê de zanîngehan jî peywîrên xwe neanîne cih.

¹¹ wêne 1, 2 û 3.

Çavkanîyeke din ya di derheqê dîroka Dêrikê de dîroka bi devkî ye. Vegotinên devkî di formê çîrokan de ne. Wek mijar li ser dîroka eşîr û malbatan, yan jî li ser karesatên xwezayî ne û ji ber ku bi devkî ne, pir dûr narin. Vegotinên di nava gel de dijîn û yên ku dîroka nêzîk ya Dêrikê eleqeder dikin hinek jê ev in: Şerê Dêrikya, Şerê Qoto û Meqso, Teyarê Qereçolî, Şewlê Mezrayî, Berfa Sor, Fermana Fila, Xela mezin, Xela biçûk... Di nava van vegotinan de yên herî pir derdikevin pêş û bi kurtasî mijarên wan bi vî awayî nin:

I.5.2.1. Avakirina Dêrikê, Mala Dawidê Kalo û Mala Qeya

Li gor vê vegotinê: *“Mala Dawidê Kalo û Mala Qeya gi navekî wan î din jî Kayihan e, mervê hev in. Ji hêla Dêrsim Hozatê hatini û hinek ji wan li Carbekir li hêla Têrkan bi cî bûni. Navê gundê wan ê li vir avakirini jî Rûtan i. Ji vir jî ji ber gi mîrê bi navê Çiplaq Heso yanî Hesê Rût kuştini bar dikin tên li Dêrikê bi cî û war dibin û Dêrikê cara ewilî ev her du malbat ava dikin. Her du malbat ji eşîra Rûtan in. Navê gundê wan ê li Hozatê jî Rûtan i. Texmînen wexta vê hatinê li der dora 500-550 sal berê yi. Ji ber ki ji nav Têrkan hatini navê Dêrikê jî ji vî navî çêbûyi. Têrikî-Têrkî tê mana ê ji hêla Têrkan.”* (O. Dêrik, 2014)

Anha li nêzîkî navenda Dêrikê herêmên bi navê “Garê Rezê Dêwid”, “Mêrga Qeya” û “Xirbê Qeya” heye û yên ku vê vegotina li jor diparêzin dibêjin navê van herêman ji van her du malbatan tê. Her çend li Dêrikê vegotina herî pir tê gotin ev be jî gelek kêmanî û nakokî di vê vegotinê de hene. Pirsgirêka vê vegotinê ya yekemîn ev e, çima ev her sê herêmên navê wan derbas dibe ne li navenda Dêrikê ne? Di rewşeke weha de divê avahîyên nuh li der dora van malbatan çêbûbana. Qelsî û nakokîyên din yên vê vegotinê ev in. Mesîhîyên Dêrikê, ango Ermenî û Suryanî ji ku û çawa hatine Dêrikê? Ji ber ku li navenda Dêrikê serjimêriyeke girîng ya Mesîhîyan hebû, ev yek bi navê Dêrikê re çima ne têkildar be? Navê “Qeya” ji bêjeya tirkî ya ku tê wateya “tat” ango ji “kaya”yê hatibe û heger navekî din yê vê malbatê jî “Kayihanlîlar” be wê demê ev malbat divê bi eslê xwe Tirk be. Di vê vegotinê de pirsgirêkek mezin jî navê “Rûtî – Rûtan” e. Ev nav ji Dêrsimê hatîye yan ji ber navê mîrê dijminê Mala Dawidê Kalo û Mala Qeya, ango ji navê “Hesê Rût” hatîye, ne eşkere ye. Heger ji navê mîr

hatibe çima ev her du malbat navê dijminê xwe wek eşîr dê li xwe kin? Heger navê Dêrikê ji navê eşîra Têrkan çêbûbe navê gundê li Hozatê çawa dibe Dêrik be? Wê demê divê Rûtîyên li herêma Dêrsimê jî Têrkî bin? Li gor lêkolîna me, li herêma Dêrsimê eşîreke bi navê ‘‘Rûtan – Rûtanli’’ heye û ev eşîr xwe wek pîyekî ‘‘ Heyderîyan’’ dibîne, lê li vê herêmê gundekî bi navê Rûtan tune. Li Hozatê gundek bi navê Dêrikê heye û şênîyên vî gundî xwe ji eşîra Rûtan dipejirînin. Ya balkêş ew e ku Rûtîyên li vê herêmê jî dibêjin em ji Dêrika Çîyayê Mazî hatine.

Hinek Rûtîyên li Dêrikê vê vegotina li jor napejirînin û weha dibêjin: *‘‘Pêşîyên me serast ji Dêrsimê hatini. Navê eşîra me li wir jî Rûtan bû û navê gundê me yê li wir jî Dêrik bû. Pêşîyê me ev her du nav bi xwe ri anîni. Navê wî gundî li vê Dêrikê jî kirini û ji xwe navê Rûtan-Rûtî hîn jî li me yi.’’* (H2. Dêrik, 2014) Mirov dikare bêje heger yê ku Dêrik ava kiriye Dawidê Kalo be jî ev kes bi awayeke misoger nayê naskirin û kengî, çawa û ji ku hatîye Dêrikê, ne dîyar e.

I.5.2.2. Şerê Dêrikîyan

Sê vebêjên ku em bi wan re peyivîn, di derheqê vê bûyerê de bi kurtasî weha dibêjin:

‘‘Eşîrê Dêrikê giş di bin serkêşîya eşîra Rûtî di, li eşîra Mamûdî dibin yek û bi wan ri şer dikin. Wexta gi zilamê eşîra bi hev ri şer dikin, serokê eşîra Rûtan û ê Mamûdan li Xabê li ser mêrgê bi kişik dilîzin. Zilamê her du eşîra tên cem hev û ji hev ri dibên, vana me bi hev didin kuştin lê ew ji xwe ri bi kişik dilîzin, werin em her kê serokê eşîra xwe bikujin ji bo gi ev şer xelas bibi. Welhasilî li hev dikin û zilamê eşîra Mamûdî axayê xwe Reşo dikujin, lê Rûtî axayê xwe nakujin. Piştî kuştina Reşo, wî ji Turcelê davîjin jêr. Wexta Reşo tê kuştin hinek kesê ji xêndî qesasa bi wî dikenin. Mamûdî şer wenda dikin. Lawekî Reşo heyî navê wî Osman i, wexta bavê wî tê kuştin ew pir biçûk i. Malbatek Mamûdî wî ji kuştinê xelas diki, yek ji vê malbatê bi ca wî ri dizewici û bi dizî Osman dibin li der dora Carbekir mezin dikin. Mamûdîyê Reşo kuştini heger zanîbana Osman sax i, çer bikirana ew ê bikirana ew ji tirsax xwe ew ê ew jî bikuştina. Paşê Osman mezin dibi, bavmêriyê wî wî tîni Dêrikê. Mal û milkê bavê wî rê

wî didi. Dibê 'Ev gund, erd, rez û pez ê te ni.' Rojekê bavmarîyê wî ji rezê wî barek hijîr, tirî û hinar li serê kerê dijdîni û didi wî dibê heri vana bifroşî biki pere û bîni malê. Osman dibi barê xwe gişî li mervê xwe, li gundîyê xwe bela diki. Kêfa mervê jê ri tê û wî dikin axayê xwe. Vedigeri malê ji bavmarîyê xwe ri dibê 'Heger tiştê te dabû mi mi bela nekira û bifrota ez ê bibama etar, lê mi bela kir ez ketim dewsa bavê xwe. De îja yeko yeko ji mi ri bivê, ez ê heyfa bavê xwe hilînim.' Piranîya mervê wî li piştê radibin. Osman dest bi qetl û qitûlê diki, heyfa bavê xwe hiltîni, gelek kesî dikuji. Bi piranî ji mervê xwe ê gi xayintî bi bavê wî ri kirini dikuji. Osmanê Reşo piştî gi heyfa bavê xwe ji herkesî hiltîni û dibi mîr û dewsa bavê xwe digri wenî dibêji: 'Mi ê gi bavê mi kuştibûn kuştin, mi ê gi pê kenîyabûn jî kuştin. Mi heyfa wî ji her kesî hilanî, hew mi ji Turcelê hilnanî, Turcel pir qalind bû, destê mi li navê nedihat hev.' (N. Dêrik, 2014; H. Dêrik, 2014; K. Dêrik, 2014)

Ji vê bûyerê navek û biwêjek maye. Li Tûrcelê navê pozekî "Pozê Reşo" ye ku tê gotin Reşo ji wir hatîye têwerkirin. Biwêja 'Ma qey me Reşo kuştîyi?' di wateya 'Ma qey me tawaneke pir mezin kiriye?' de tê bikaranîn.

I.5.2.3. Şerê Qoto-Meqso

Çavkanîyên ku vê bûyerê zanin gelekî kêr in. Em gihîştin sê çavkanîyan û li gor vegotina wan ya hevbeş, çîroka vî şerî bi kurtasî weha ye:

"Ji ber dijminaçyê eşîrê çê dibin du hêl. Dest bi şer dikin. Şer gelek rojî dewam diki. Di dawîya şer di 12-13 însan tên kuştin û gelek jî birîndar çêdibin. Di nav kuşçîya di pîrekek jî heyi. Piştî gi esker tê dikevi nav her du alîya, şer disekini. Çiqasî navê vî şerî şerê Qoto û Meqso bi jî şerê mezin li ser sukra Meqso hatîyi kirin. Hinek gund di nav xwe de bûni du cî û her yekê alî hêlekê kiriye. Hinek gunda jî bi tamamî li hêlkê cî sitencyi." (Ş2. Dêrik, 2014; E. Bîrînî, 2014; Î. Dêrik, 2014)

Ji vî şerî jî biwêja "Ma bû şerê Qoto-Meqso?" maye ku ji bo nîqaş û pevçûnên dirêj yê bi devkî, di wateya "Ma qey nema biqede, ma qey xelas nabe?" de tê bikaranîn. Qedrîcan di çîroka xwe ya "Besreka Zêrîn" de vî şerî bi awayeke wêjeyî ji nû ve dihûne. Lê belê weha xuyaye Qedrîcan vê bûyerê tenê wek îlhamekê bikartîne. Ji

ber ku li gor çîroka Qedrîcan, ev şer di navbera eşîra Metînan û eşîrên çîyê de diqewime. Li gor çîroka Qedrîcan, navenda eşîra Metînan “Birca Metînan” e û navenda dijminê wan jî “Besreka Zêrîn” e. Mirov ji navê mîrê Besreka Zêrîn fam dike ku ev der navenda eşîrên çîyê ne. Ji ber ku navê mîrê Besreka Zêrîn “Mekso” ye. Em li alîyê çîyê, li gundê “Taşît”ê li navekî nêzîkî navê çîrokê ye rast hatin ku navê du heb girê nêzîkî hev “Zêr û Besrek” e. Di çîrokê de wek lehengekî, navê kurê Meks “Şewlo” ye. Em navê “Şewlo” jî ji çîroka gelêrî ya Dêrikê ji çîroka “Şewlê Mezrayî” nas dikin. Ji vir jî tê fêmkirin ku Qedrîcan di çîroka xwe ya bi navê “Besreka Zêrîn” de xwestîye ji çîrok û vegotinên gelêrî yên herêma Dêrikê sîd wergire û van vegotinên, ji bo wêjeya modern wek kereste bikarbîne. (Qedrî Can, 2009: 41)

I.5.2.4. Teyarê Qereçolî

Ev çîrok bi taybetî ji alîyê dengbêj Fadilê Kufragî ve tê vegotin, lê li gor vegotîna çend heb beşdarvanên me çîroka vê bûyera ku tê gotin qewimî ye, bi kurtasî weha ye:

“Li welatê jor (Hinek vebêjan gotin li Qerecdax hinekan gotin li hêla zozên.) xela çêdibi û mîrek ji Qereçolîyê gi navê wî Teyar i, ji bo nîşqê xwe û eşîra xwe pêde biki, bi şeş birayê xwe û xwişkê xwe ri bi rê dikevin gi werin gundê Dêrikê Qizilê. Ji Qizilê Mala Beg û Teyarê Qereçolî mervê hev in. Di rê di, di hêla eşîra Metînan ri derbas dibin, rîya wan bi gundê Gola Gulê dikevi. Li vir gavanê Gola Gulê, Nordo tê pêşîya karwana Teyarê Qereçolî, ewilî çend heb derbê tîfîngê ji wan dixwazi, didinê, dûr tîfîngê dixwazi, Teyar ji bo gi dengê wan nê û bi silametî di rîya xwe di herin tîfîngê jî didê lê belê Nordo qîma xe bi vana nîni, dûr xwişka wan jî ji wan dixwazi û dibêji ‘ne bi qewl û resûlê Xwedê lê bi darê zorê.’ Teyar êdî tamûl naki, derbekê bera gavan didi û wî birîn diki. Gavan diki haho gazî, ba êl û eşîra Metîni diki, wan li ser serê Teyar û şeş birayê wî dicivîni. Piştî şerekî dûr û dirêj, ji eşîra Teyar tu kes namîni. Ew jî di şer di tê kuştin û ji Metîni jî gelek kes tîn kuştin. (K. Dêrik, 2014; E. Zemberor, 2014; Ş2. Dêrik, 2014)

Ne Fadilê Kufragî û ne vebêjên me behsa berdewamîya vê bûyerê nakin lê ji ber ku me balkêş dî, vegotina beşdarvanekî ya ku di derheqê berdewamîya vê bûyerê de bi kurtasî weha ye: *“Xwoka Teyar bi hawakî xwe digihîni eşîra Rûtan û xwe davîji bextê wan. Rûtî jî reşa wê dibin davîn ser eşîra Dimilî (Ev eşîr li herêma Şemrex û Çinarê ye) û çend heb eşîrên din li der dora Dêrikê. Ev eşîr giş dibin yek û şevê her gundekî Metînî pêncî heb zîlamê bi tîfing datînin ber, dorê lê digrin. Şer dest pê diki, her ku ji gundekî zîlam derdikevin gi herin aliyê gundekî din ê Metînî, ev zîlamên li dora gundên wan bera wan didin. Bi vî hawî gelek ji wan tên kuştin.”* (E. Zemberor, 2014)

Agahîyên ku di derheqê civaka Dêrikê de me tomar kirine ev in:

I.5.3. Sosyolojîya Dêrikê

I.5.3.1 Serjimêriya Dêrikê

Li gor hejmarên TUIK'ê di sala 2013'an de serjimêriya Dêrikê û gundê wê bi giştî 61.226 kes e. Ji vana 30.437 kes mêr û 30.789 kes jî jin in. Serjimêriya navenda Dêrikê 21.364 kes e. 39.862 kes li gundan rûdinin. Ev hejmarên TUIK'ê li gor pergala navnîşana şênîyan hatîye derxistin.

Ji encamên anketa li DAL'ê û dibistana Ataturk'ê tê fêmkirin ku malbatên li navenda Dêrikê xwedî gelek zarok in. Li ser pirsên me yê li ser vê mijarê, ji bersîvên beşdarvanan ev derketin pêş:

“Mala zarok tê di tunebi xêr û berketa wê malê tuneyi.” (Z2. Dêrik, 2015)

“Zarok bi qismetê xwe ri tên.” (F. Dêrik, 2015)

“Ji berxwekirina zaroka guneh i.” (Ş2. Dêrik, 2015)

“Wek her tiştî çêbûna zaroka jî bi Xwedê yi.” (P. Dêrik, 2015)

“Dê û bavê mi bera pê lawika dan, ji ber wê gelek zarok çêkirin.” (K3. Dêrik, 2015)

“Malê qerebalix ji malê bêdeng xweştir i.” (O. Dêrik, 2015)

“Ji berê di dê û bava hesabê pîrbûna lawa kirini, ji bo di şer û pevçûna di xurt bin.” (A. Dêrik, 2015)

“Em nezan bûn me gelek zarok çêkirin.” (Ş3. Dêrik, 2015)

“Berê gotini, mala mêra; mala zêr û pera... Malek çiqas qelebalix bi hequsî jî zengin dibi. Mala zarokê wan kêr bin tim feqîr dimînin.” (K2. Dêrik, 2015)

Ji hevdîtînên bi kesên ji nîfşê biçûk li ser heman mijarê me bersîvên bi vî rengî girtin:

“Ji pîrbûna zaroka bêtir xwedîkirin û xwendina wan muhîm i.” (Z2. Dêrik, 2015)

“Ez nahêlim zarokê mi zêde bi, 2-3 heb bes i.” (M. Dêrik, 2015)

“Zarokê mere pir bi baş i, ya na Kurd nediman heya nuha.” (D. Dêrik, 2015)

Ji van vegotinên her du nîfşan tê fêmkirin piranîya malbatan xwedî gelek zarok in, rêjeya malbatên kêrzarok gelekî kêr in. Di vê mijarê de li ser nîfşê mezin bandora bawerîyên olî û nîrxên civakî heye. Li gor nîfşên mezin, sedemeke pîrbûna zarokan ya girîng jî kevneşopîyên eşîrî ne. Nîfşên mezin û li gor wan yê berî wan jî weha fikirîne ku ji bo xurtbûna eşîr û malbatê divê hejmara mîrên malbatên wan pir bin. Beşdarvanekî got, her ku bira yan jî pismamekî min çêdibû bapîrê min bi kêf digot *“Çoyekî me yî din jî zêde bû.”* Ji van vegotinên li jor rêzkirî tê fêmkirin ku di navbera her du nîfşan de cudayetî heye ku nîfşên nû naxwazin zarokên wan pir bin. Mirov ji vir dikare derxîne ku di demên pêş de hêza pîrbûna serjimêrîya Dêrikê ji alîyê xwedêdana zarokan ve wê kêr bibe.

I.5.3.2. Rewşa Perwerdeyê li Dêrikê

Li gor agahîyên Gerîndeya Perwerdeyê ya Netewî ya Navçê, li navenda Dêrikê dibistaneke destpêkî, 7 dibistanên seretayî – navîn (bi hev re) û 4 lîse heye. Tevî

dibistanên li gundan bi giştî 103 sazîyên perwerdeyê heye. Hejmara şagirtan li temama Dêrikê 16.848, hejmara mamosteyan bi giştî 601 e. Li dibistanên seretayî li serê polekê 57 şagirt û li dibistanên navîn jî 27 şagirt dikeve. Li dibistanên meslekî (pîşeyî) ev hejmar 21 e. Li gor hejmarên TUIK'ê yê sala 2013'an li Dêrikê yê temenê wan ji 15 salî û berjor, jê 5.300 jin û 1.051 mêr bi giştî 6.391 kes bi xwendin û nivîsandinê nizane. Jinên temenê wan ji 15 salî û berjor û bi xwendin û nivîsandinê zanin 12.633 kes, mêrên bi xwendin û nivîsandinê zanin 16.485 kes, bi giştî kesên ku bi xwendin û nivîsandinê zanin 29.118 nin. Jinên ku rewşa wan ya xwendin û nivîsandinê ne dîyar e 718, mêrên ku rewşa wan ya xwendin û nivîsandinê ne dîyar e 436, bi giştî yê rewşa wan î xwendin û nivîsandinê ne dîyar e 1.154 kes e. Li gor van hejmaran rêjeya jinên ji 15 salî û berjor ji % 67,5; ya mêran ji % 91,7 bi xwendin û nivîsandinê zanin. Ev rêje li hemî Tirkîyê weha ye: Jinên ji 15 salî û berjor yê bi xwendin û nivîsandinê zanin ji % 89,5; mêrên ji 15 salî û berjor yê bi xwendin û nivîsandinê zanin ji % 95,4 e. Li gor van hejmar û rêjeyan bi taybetî xwendin û nivîsandinê jinan gelekî di bin ya gelemperîya Tirkîyê de ye. Li gor heman çavkanîyê, xwendina jinên ji 15 salî û berjor weha ye. 2.714 dibistana seretayî, 3.942 dibistana navîn, 1.021 lîse, 434 dibistana bilind – fakulte, 13 lîsansa bilind, 3 doktora. Rewşa asta xwendina 718 jinî ne dîyar e. Li gor heman çavkanîyê rewşa xwendina mêran bi vî awayî ye: 4.120 dibistana seretayî, 6.042 dibistana navîn, 2.917 lîse, 1.058 dibistana bilind-fakulte, 31 lîsansa bilind, 3 doktora. Rewşa xwendina 1.154 mêrî ne dîyar e.

I.5.3.3. Rewşa Bingeha Civakî li Dêrikê

Ji bilî hinek peywirdarên fermî, niştecihên navenda Dêrikê bi tevayî Kurd in. Nasnameya li dû Kurd û Kurmanctîyê tê her çend lawaz bûbe jî malbat û eşîr in. Nifşên mezin hîn jî civata Dêrikê li gor eşîr û malbatan dabeş dikin. Lê di nava nifşê biçûk de aîdiyeta malbat û eşîran ne girîng e. Zimanê sereke yê tê peyivandin kurmancî ye. Şênîyên çend gundên berîyê wek eşîr Tat in ku ev eşîr xwe Erebbî dibîne û bi erebbî dipeyive. Lê li van gundan ligel erebbî, bi kurmancî jî tê peyivandin. Li hêla Qerecdax, li herêma ku wek "Sefa" tê bi navkirin şênîyên wê Kurdên Zaza (Dimilî) nin. Li van gundan jî li gel zazakî kurmancî jî tê peyivandin. Ji bilî van herêmên Tat û Kurdên Zaza lê dijîn, şênîyên deverên mayî Kurdên Kurmanc in. Bikaranîna peyva Kurmanc û

kurmancî ji bikaranîna Kurd û kurdî bêtir e. Di nava nifşê mezin de bi piranî ji bo netew peyva Kurmanc û ji bo ziman jî peyva kurmancî tê bikaranîn. Di nava nifşê temenê wan di navbera 18-35 salî de li gel Kurmanc û kurmancî bêjeyên Kurd û kurdî jî tê bikaranîn.

Wek ku me di beşa dîroka Dêrikê de jî behs kiribû, heya 30-40 sal berê jî rêjeyek girîng yê şênîyên navenda Dêrikê Ermenî û Suryanî bûn. Serjimêriya Ermenî û Suryanîyan ji ber sedemên guhertî her ku çûye kêmbûye. Lê ji destpêka salên 1980'yî û vir de ev kêmbûn bi leztir bûye. Li ser Ermenî û Suryanîyan vegotinên her du nifşan ji hev cuda nin. Ji ber ku nifşên nû, bi awayeke girseyî li Dêrikê Mesîhî nedîtine, tenê çîrokên li ser wan ji mezinên xwe bihîstine. Ji her du nifşan vegotinên derdikevin pêş, bi vî rengî nin. Nifşên mezin:

“File ji Dêrikê çûn, xêr û berketa Dêrikê nema.” (Ş3... Dêrik, 2014)

“Em wek malekê bûn.” (F... Dêrik, 2015)

“Ez jî xwarzîyê fila mi.” (B... Dêrik, 2015)

“Me xatrê wan nizanîbû, loma barkirin çûn.” (Q... Dêrik, 2015)

“Di fermana fila de hinek Dêrikya tade li wan kirini.” (M2... Dêrik, 2015)

“Hinek malan ew di axurê xwe di veşartin û nehêştin zirar bigêji wan.” (Ş3... Dêrik, 2015)

“Li Govê, li Aşkê Remê, li Zinara Sior gelek file hatin kuştin.” (H. Dêrik, 2015)

“Filên me giş sinetkar bûn, temama sinet û kar di destê wan de bû.” (H2. Dêrik, 2014)

“Wek me bi kurmancî dipeyivîn, wan bi zimane me zanîbû lê me bi ê wan nizanîbû, pir kêmbû me didît bi hev ri bi filekî dipeyivîn.” (K. Dêrik, 2014)

Vegotinên nifşên biçûk yê di derheqê Mesîhîyan de bi piranî bi vî awayî ne:

“Dê û bavê me qal dikin lê me ew nedî.” (C. Dêrik, 2015)

“Xwezî anka jî li Dêrikê file hebûna!” (L. Dêrik, 2015)

“Bavê mi dibêji em xwarzîyê wan in.” (O. Dêrik, 2015)

Ji vegotinên li jor tê fêmkirin ku gelê Dêrikê ji bo Ermenî û Suryanîyan bi piranî peyva “*file*” bikartînin ku ev peyv di wateya olê de ye, ne di wateya nijad de ye. Di hevdiştinan de hate diştin ku Kurdên misilman yê Dêrikê nizanin kîjan malên Mesîhîyan wek nijad gelo Ermenî bûn yan Suryanî bûn. Her çend îstatîstîkek di destê me de tunebe jî, ji hevpeyvînên me bi Mesîhîyên Dêrikê yê ku anha li Stenbûl dijîn re kiriye derdikeve holê ku di nava Mesîhîyan de Ermenî di piranîyê de bûne, li gel wan çend malbatên Suryanî jî hebûne. Lê belê gel ew giş wek “*file*” binavdikirin û heger navê nijad me dipirsî, nişê mezin bi tevayî digotin “*Filê me Ermenî bûn!*” Ango gelê Dêrikê nizanîbû ku malbatên Suryanî jî li Dêrikê hebûn. Xuyaye sedema vêya ya herî girîng ziman e. Ji ber ku Ermenîyan jî Suryanîyan jî bi kurmancî zanîbûn û bi kurmancî dipeyvîn. Zimanê têkilîyê di navbera her sê gelan de kurmancî bû. Ji ber wê jî niştecihên Kurd ê misilman yê Dêrikê tenegehîştînin ku kî Ermenî ye, kî Suryanî ye. Mebest ji “*filekî*”, li gor Ermenîyên ku li Stenbûl rûdinin em bi rîya telefonê gihaştîne, zimanê Ermenîkî ye. Ew çavkanîyên ku em gihanê weha dibêjin:

“Di nava fila di Ermenî bi awayeke gelekî zêde ji Suryanîyan bêtir bûn, tenê çend malên Suryanî hebûn li Dêrikê. Di nava Ermenîyan de jî nişê mezin bi zimanê Ermenîkî zanîbûn û di nava xwe de dipeyvîn, lê nişê dawîyê, bi kurmancî dipeyvîn û bi tirkî jî zanîbûn, belkî çend bêje yan jî hevok bi Ermenîkî jî zanîbûn.” (A. Stenbol (tlf), 2015)

Li gor hin vegotinan, berê li Dêrikê heft dêr hebûne. Ew cihên ku tê gotin dêr bû anha wek xanîyan tên bikaranîn û malbatên Dêrikê yê misilman xwedîyê wan in. Anha hew dêrek Ermenîyan li ser nîga ye û hew malbatek Ermenî li Dêrikê maye. Ev dêr li herêmê wek “*Dêra Sor*” tê zanîn, lê navê wê yî din “*Dêra Surp Kevork ya Ermenîyan*” e. Nifta dêrê di destê vê malbatê de ye û xizmeta dêrê ew bi xwe dikin. Ji ber ku li Dêrikê Suryanî jî hebûne, pêkan e dêra wan jî hebe. Lê belê îro ev zanyarî tune ye ku dêreke Suryanîyan li Dêrikê hebûye.

Hinek malbatên Dêrikî xwe wek xwarzîyê Mesîhîyan-xwarzîyê Ermenîyan dibînin. Sedema vê xal û xwarzîyê di bûyerên sala 1915'an de veşartî ye. Hin malbatên ku keçên Mesîhîyan yên bêxwedî mane, dê û bavên wan yan mirine yan jî hatine kuştin xwedî kirine û di demên pêş de ew bi zarokên xwe re zewicandine, ji ber wê gelek malbatên Dêrikê bi vî awayî bûne xwarzîyê Mesîhîyan. Ji van keçên Mesîhî yên ku bi misilmanan re hatine zewicandin hinek ji wan ji derveyî Dêrikê hatine. Di nav van cihan yên ku me tespît kirin de Bayburt, Melezgirt, Qop (Bûlanix) û Hezerom jî heye. Ji bilî van malbatên xwarzîyê Mesîhîyan, hin malbat jî hene ku bi eslê xwe Mesîhîyên Ermenî bûn, di navbera 80-90 sal berê de bûne misilman û anha wek malbatên Kurd û misilman li Dêrikê dijîn.

Barkirina Ermenî û Suryanîyan bi gelê Dêrikê ne xweş e û yên ku bi wan kêmetewan re jîyane dibêjin çawa ku Mesîhî ji Dêrikê çûne, xêr û bereketa Dêrikê nemaye. Di navbera gelek malên Mesîhî û misilmanan de kirîvantî hatibû danîn. Ji bilî wê jî di bûyerên sala 1915'an de hin eşîr û malbatên Dêrikî gelek malbatên Mesîhî ji kuştin û sirgûnê rizgar kiribûn, ew li cem xwe veşartibûn. Wan malbatên Mesîhî, ji ber ku pêşîyê wan ji alîyê serokeşîrên Salkî û Rûtîyan ve hatibûn xelaskirin xwe li ser van eşîran dihesibandin. Piranîya malbatên Mesîhî ji xwe li Dêrikê li Taxa Salîkan û Taxa Rûtan rûdiniştin. Di nava Mesîhîyan û Dêrikîyan de girêdaneke xurt heye, gel wan ji xwe cuda nabîne, wan wek merivê xwe dibînin. Dema ku behsa filên Dêrikê yên anha li Stenbolê dijîn bibe wan wek “*filên me*” bi nav dikin. Lê li gel van alîkarî û lê xwedî derketinan, di wê demê de hin kesên di nava gel de wek kujêr û diz dihatin naskirin, di bûyerên sala 1915'an de li hember Mesîhîyan neçê tevgerîyanin û mal û milkê wan talan kirinin, hejmarek ne dîyar ji wan kuştinin. Li gor vegotinan, hin deverên ku Mesîhî lê hatine kuştin ‘*Gov, Xerzîkê Korta, Aşê Remê, Qelbîkê Fila*’¹² ye. Li navenda Dêrikê hin tiştên ji Mesîhîyan mane û hîn jî bi navê wan tên xwendin ev in: Dêra Surp Kevork ya Ermenîyan, Mezelê Fila, Zeytûnê Çêço, Rezê Êlasê Meelim, Aşê Elîyê Fer’a...

¹² Ev navê “*Qelbîkê Fila*” tenê beşdarvanekî ji me re got (Ş. Dêrik, 2014), li nêzikî Govê girîkek heye ku mirov ji ser vê “*diqelibe*” li paş wê Mesîhî hatine kuştin, ji ber wê ev nav lê bûye.

I.5.3.4. Ol û Mezheb li Dêrikê

Bandora olê li ser nifşê mezin li gor nifşê biçûk bêtir e. Nifşê mezin nimêj dikan û di meha rojîyê de rojîyê digrin. Di nava nifşê biçûk de kirina nimêjê gelekî kêma e lê girtina rojîyê ji wê zêdetir e. Bicihanîna erkên olî di navbera her du nifşan de nabe pirsgirêk. Li gor bersîvên wan, nifşên biçûk, ji alîyê dê û bavên xwe ve tundîyek bi vî rengî li ser xwe nabînin. Piranîya nifşên mezin jî dixwazin zarokên wan erkên xwe yî olî bînin cî, lê vê yekê tenê bi awayê şîreta ji zarokên xwe dixwazin.

Piranîya Dêrikê û herêma wê li ser mezhebê Şafîî nin. Li navenda Dêrikê jî û li çend heb gundê wê jî kes û malbatên li ser mezhebê Henêfî jî hene. Di nava şênîyên navçê û herêma wê de ji bilî van her du mezheban em li tu mezhebeke din rast nehatin.

Li navenda Dêrikê komek terîqetê ku Neqşîbendî ne û bi ser mala Xiznewî ve ne heye. Li gor beşdarvanekî me yî mûrîdê vê terîqetê, li Dêrikê hejmara mûrîdê wan li dora pêncî kesî ye.

I.5.3.5. Rewşa Eşîrtîyê li Dêrikê

Li navenda Dêrikê û li gundên wê her çend bandora wê ya li ser jîyana civakî lawaz bûbe jî têkilîyên eşîrî hene. Her eşîrek ji çend malbatan pêk tê. Li vir “malbat”, divê di wateya “ezbet” yan jî “êl” de were fêmkirin ku bi piranî li Dêrikê bi peyva “mal”ê tê îfadekirin û bi piranî di nava peyvê de tê kinkirin û wek “ma” tê bi navkirin. Wek mînak em bibên li navenda Dêrikê Mamûdî eşîrek e, lê di nava Mamûdîyan de malbatên wekî Mala Hecî Osman, Mala Elê Eyyê, Mala Mistikê Efendî, û malbatên wekî din hene. Di navbera van malbatan de ne mecbûr e girêdaneke xwînî hebe. Lê her çend di navbera malbatan de têkilîyeke xwînî tunebe jî, hemî kesên di nava eşîrê de ne xwe wek merivê hev, merivantîya ji hêla bavê ve, ango xwe wek “pismam”ê hevdû dibînin. Ango mirov dikare bêje eşîrên Dêrikê ji malbatên ku bi merivantîyê bi hev ve girêdayî ne pêk tên. Di nava eşîrê de têkilîyeke aborî wek ya feodalên bi desthilatdarîya li ser ax û çandinîyê komekê birêve dibin tune. Di navbera hin malbatan de merivantîya xwînî jî heye, lê yên tunebin jî bi têkilîyên kevn xwe di nava eşîrekê de

dibînin. Di rabirdûya wan de sedemên van girêdanan dê hebin bêguman. Wek mînak beşdarvanekî me li ser têkilîya di navbera malbat û eşîra xwe de weha dibêje:

“Malbata me berî nuha bi 38-39 salan ji ber pevçûnekê ji gundekî çê radibi tê li nav Dêrikê bi cî dibi. Wê çaxê ez 15-16 salî bûm. Berî gi bav û kalên me û apanên me werin Dêrikê, bi malbatek Dêrikî ri alvêra pez û dewaran dikirin û ji ber wenî hevdi nas dikirin û dostayî di navbera wan di çêbûbû. Îja wexta gi ehlên me tén Dêrikê ev malbat pîbarî wan radibi. Bi ser wan di diherin û tén, di warê maddî-manewî di çi alîkarî hewce bi, bi wan ri dikin. Êdî mezinên malbata me, ji ber vê alîkarîya wan, xwe ji eşîra wan dihesibînin. Wextek dirêj di hîlbijartina di, ew li cem kê bana, mezinê me jî li cem wan bûn. Lê anka em zêde bi ser hevdi narin û nayin, yanî ne wek berê yi.” (F. Dêrik, 2014)

Beşdarvanekî din yê ji nifşê mezin li ser malbata xwe û eşîra xwe weha dibêje:

“Koka malbata me ji hêla Rihayê yi. Bav û kalê me digotin em Îzolî nin. Lê anka em li Dêrikê Rûtî nin.” (V. Dêrik, 2014)

Bi awayeke balkêş, li ser koka malbata xwe tu beşdarvanî negote em ji navenda Dêrikê ne, gişan bi awayekî têkilîya malbata xwe bi derve re danî. Çend heb mînakên van vegotinan ev in:

“Pêşyên me ji Dêrsimê hatini.” (H. Dêrik, 2014)

“Pêşyên me ji Swêregê ni.” (H2. Dêrik, 2014)

“Em ji Xarok hatini.” (A3. Dêrik, 2014)

“Li gora ku bav û kalê me ji me re digotin, pêşyên me ji Kerkukê hatini, sê bira bûn, anha ji wan sê malbat çêbûni.” (H3. Dêrik, 2014)

Li ser pirsê me ya ku “Di demên berê de têkilîya we û ya eşîra we çawa bû û îro çawa ye, çi guhertin di navbera îro û berê de heye?” vegotinên bi vî awayî derketin pêş:

“Berê em bêtir bi hev ve girêdayî bûn.” (I2. Dêrik, 2014)

“Merivê hev di ber hev de mêr dikuştin, lê anka kes kesî nas naki.” (S. Dêrik, 2014)

“Anka xwîn sar bûyi.” (A. Qizil, 2014)

“Berê kes nedîçû mehela kesî, lê anka kes guh nadê.” (R. Dêrik, 2014)

“Lêv ji dirana zêdetir i, berê mal û malbat tê, dûr i eşîr tê.” (C. Fitin, 2014)

“Berê serokê eşîra hebûn, axa hebûn, anka herkes axayê mala xwe yi.” (B. Bixur, 2014)

“Berê dijminatî pir bû, anka kê m bûyi.” (M. Bixur, 2014)

“Pêşîyê me gotini ‘bê Xwedê dibi, bê xwedî nabi.’ Birê mi mêr kuştibû û ketibû hefsê. Malbat û eşîra me bêş didan hev û jê ri dişandin.” (D2. Dêrik, 2014)

“Kesê xwedî eşîr ji ber xwe fedî dikirin, karê xerab nedikirin. Heger bikirana mere diçû cem mezinê wan, ew pê re dixeyidîn.” (F. Xarok, 2015)

“Merivê mere bêtir li mere xwedî derdikevi, lê mere ne xema xerîba ye.” (Z2. Dêrik, 2014)

“Me û malbatek din me mêr ji hev kuşt; me û mervê xwe me dikira hevdu bixwara, em li hev banîyabûn, em her roj li cem hev bûn. Lê piştî gi me dawa xwe çêkir êdî me kesî kes nas nedikir.” (Î. Dêrik, 2014)

Ji vê vegotina dawîn tê fêmkirin ku di demên şer û pevçûnan de têkilîyên eşîrî ji demên aşîtî xurttir in.

Ji vegotinên din jî tê fêmkirin ku têkilîyên eşîrî berê ji anha xurttir bû. Ev têkilî bi demê re lawaz bûye û piranîya mirovan jî vê lawazbûnê ne aciz in. Lê hin beşdarvanan başbûna eşîrvantîyê parastin û gotin di eşîrtîyê de tiştên xweş jî hebûn.

Li ser têkilîyên civatê eşîr, bi mîsyona xwe wek sazîyeke nîv-dewlet e, ji mirov û malbatan re ji bo parastina gîyan û mal wek sitargehekê ye. Li gor vegotinên nifşê mezin, ji ber vê pêdivîyê, her kesî û her malbatê bi awayekî xwe bi eşîrekê ve girêdaye.

Mirovên di nava heman eşîrê de li hember eşîr û malbatên din bi hev re tevdigerîyan, di şîn û şahîyan de, di şer û pevçûnan de alîkarîya hevdu dikirin. Ger pêdivîya hinekan ji wan ji alîkarîya aborî hebe, di nava hev de "bêş" berhevdikirin û didan wî kesî. Di hibijartinan de ger endamê eşîra wan heba, hemî eşîr li der û dora wî dicivîyan û bê nîqaş her endamê eşîrê dengê xwe dida endamê eşîra xwe. Ger endamê wan tuneba di hibijartinan de, mezinên eşîrê yan jî serokê eşîrê biryara alîkarîya kîjan partî yan jî kesî bidan, eşîrê bi hev re piştgirîya wî kesî dikir. Li gor vegotina nifşê mezin, êdî ev "tevdîr û tifaq" di nava tu eşîr û malbatê de nemaye.

Çend heb beşdarvanên ji nifşê mezin di derheqê serokatîya malbat û eşîrên berê de weha gotin:

Li serê her malbat û eşîrê serokeşîr hebûn. Serokeşîr, bi emir mezin bûn, dewlemend bûn, xwedî erd bûn. Serokeşîrtî ji wan ri, ya ji bavê wan, ya ji birayê wan ya ji apê wan ji wan ri dima. Serokeşîr ne hew meselê xwe û eşîrên dinê safî dikirin, ew mecbûr bûn eşîr û malbata xwe jî li hev biedilînin, wan li hev ragrin. Meselê di nav malbatê ya eşîrê di derdikestin meselê parêkirina erda bûn, meselê zewacê bûn, meselê wenî bûn. Ji bo wenî serokeşîrên jîr û zane û xwedî tecrube di meselê wenî di jêhatî bûn. Serokeşîran di çareserkirina gelek meselan di bi yextîyarên xwe jî dişewirîn. Hinek malbat jî hebûn serokekî wan tunebû. Sê çar heba bi hev ri serokatî lê dikirin. Çend kesên "mezinên eşîrê" wek meclîsekê bi hev ri qirar didan. Gelek serokeşîr ji xêndî serokeşîrtîya mala xwe, te didî mebûs bûn, belediye başqanî (şaredar)bûn ya muxtar bûn. Kîja eşîra li cem dewletê ba ew eşîr ji ê din xurttir bû. Hinek eşîr bi hawê kurmançî xurt bûn hinek ji wan bi hawê dewletê xurt bûn."(Ş. û M. Bixur, 2014)

Li herêma Dêrikê ev her sê mînak jî henin ku hin serokeşîr di heman demê de yan bûne parlementer, yan şaredar yan jî muxtar.

Li gor vegotinên nifşê mezin bi kurtasî têkilîyên eşîrtî li herêma Dêrikê bi vî awayî bûn. Lê îro em dibînin ev têkilî di 20-30 salên dawî de gelekî lawaz bûne. Dijminatîya di navbera eşîran de di asta tunebûnê de ye. Di navbera eşîrên cuda de zewac gelekî zêde bûye. Li gor ku di heyamên berê de kesek nedîçû taxa eşîreke din, ev yek guhertineke pir mezin e. Di qeydên daîra nifûsê ya Dêrikê de navê taxên Dêrikê li gor navê eşîra hatibû danîn. Wek *Mehela Rûtan*, *Mehela Mamûdan*, *Mehela Ebasan*,

Mehela Salikan... Di nasnameyên kevin de, di beşa taxê de ev navên kevin hatine nivîsandin.

Hevpeyvînên bi nifşên biçûk re, vê guhertinê eşkere dike:

“*Li gora mi eşîr ne muhîm i, a muhîm em giş Kurd in.*” (D. Dêrik, 2014)

“*Bavê mi raya xwe didi partîyekê, ez didim partîyekê.*” (C. Dêrik, 2014)

“*Heya dereng mi nizanîbû em ji kîjan eşîrê ni.*” (M2. Dêrik, 2014)

“*Ji her eşîrê hevalê mi heni û em tu kes guh nadin vêya.*” (M3. Dêrik, 2014)

Ji van vegotinan tê fêmkirin ku di nava ciwanan de takekesî xurt bûye, êdî pîranîya mirovan, bi taybetî jî keç û xort li ser peyva mezinên eşîra xwe dengê xwe nadin partîyekê yan jî endamekî. Heger di hîlbijartinan de endamê eşîra wan jî hebe, lê ne di fikra wan de be dengê xwe nadinê. Berevajîya vê yekê heger endamê partîya ku diparêze ji eşîreke din be jî dêdengê xwe bidinê. Di çar hîlbijartinên dawîn yê şaredarîya Dêrikê de endamên eşîran bi ser neketine. Di her çar hîlbijartinan de jî (1999, 2004, 2009, 2014) endamên partîyên HADEP, SHP, DTP û BDP’ê bi ser ketin. Ev vegotinên li jor hem nîşana berteka li hember têkilîyên eşîrî ne hem jî parastina helwesta takekesîyê ne. Wekî hinek beşdarvanên ji nifşê mezin jî gotin: “*Herkes bûyi axayê mala xwe.*” (R. Dêrik, 2014)

Li gor me sê sedemên girîng yê ku ev têkilî lawaz kirine hene. Ya yekemîn xurtbûna pêla netewperwerîya Kurd e. Wek nasname “*Kurbûn*” ketîye pêşîya nasnameya eşîrtîyê. Ya duyemîn pêşveçûna aborîya civakê ya ber bi başbûnê ve ye. Pîvanên vê sedemê ne dîyar in lê bi pêşketina amûrên cotkarîyê, avîbûna gelek zevîyan, koçberîya ji bo karê demsalî û kişfa bajarên rojavayê Tirkîyê ya ji alîyê kar ve, li gor demên berî xwe derfetên kar û qezenckirina pera zêdetir kiriye. Ya sêyemîn bi demê re modernbûna civaka Dêrikê ye. Di nava pîvanên modernbûnê de bilindbûna rêjeya xwendinê, xurtbûna derfetên ragihandinê, têkilîyên bi bajarên rojavayê Tirkîyê re, xalên sereke nin. Lawazbûna têkilîyên eşîrî, li navenda Dêrikê ji gundên Dêrikê xurttir e. Ev yek jî ji ber ku ev sedemên li jor rêzkerî li navenda navçê ji gundan bi bandortir e weha ye.

Ji alîyeke din ve qelsbûna hestên eşîrî, ji formguhertina têkilîyên feodal jî pêk tê. Hestên “malbatî” dewsa hestên “eşîrî” digire. Mirov dikare bêje çapa hestên feodal biçûk dibe, ji eşîrtîyê ber bi malbatê ve dicive. Ji ber ku têkilîyên malbatî ji têkilîyên eşîrtî zelaltir û nêzîktir e. Ango yekî ku ji malbatekê ye, bi awayeke zelal dikare bibîne ku merivantîya wî û yên din ê endamê malbatê çi ye. Lê wekî me li jor jî got, di navbera malbatên eşîrê de gelek caran têkilîyeke xwînî tune. Ango eşîr parçe dibin û dibin malbat bi malbat. Di hundirê heman malbatê de jî yên nêzîktirî hev, bi hev re bêtir têkildar in. Ev biçûkbûn heta malbata biçûk ya ji dê û bav û zarokan tenê pêk tê dadikeve. Ji ber wê mirov dikare bêje hest û têkilîyên eşîrtî her ku diçe lawaztir dibe û çembera bandora wê tengtir dibe. Alternatîfa ku wek nasnameya civakî dikeve dewsa wê, nasnameya “netewî” ye û wek helwesta tevgera jîyana rojane û civakî jî “takekesî” ye. Xuyaye mirovên ku takekesîya wan xurttir dibin, dixwazin xwe di nava neteweyê mezî de tarîf bikin lê ne di nava eşîr yan jî malbateke biçûk de.

Her çend têkilîyên eşîrî lawaz bûbin jî bi giştî ji holê ranebûye. Di têkilîyên eşîrî de yê herî pir derdikevin pêş şerên eşîrî nin. Şerê herî dereng di 07.09.2010’an de dest pê kiriye. Li nava Dêrikê di navbera du malbatan de şerê xwînî derket û di encama vî şerî de 3 kes hatin kuştin. Vê dijminatîyê pir dewam nekir û di 09.06.2011’an de bi aşîtî çareser bû. Ji nîfşê biçûk gelek beşdarvanan ev bûyer mînak dan ku refleksên eşîrî çiqas xerab in.

Hebûna hest û girêdanên eşîrî yan jî malbatî anha bi pîranî di şînan û dîlanan de xwe rêdide. Wek kevneşopîyekê, di şînan de û di dîlanan de yên têkilîya mervantîyê di navbera wan de hebe bêtir alîkarîya hevdu dikin. Li Dêrikê wek vegotîneke berbelav heye ku dibêjin “*Em giş bi hawakî digên hev, tew nebi em bi jina bûnin mervê hev, ya em xal û xwarzîyê hev in ya em ap û birazîyê hev in.*” (M. Dêrik, 2014) Ji ber wê nasnameyek din jî heye ku ew jî “Dêrikîtî”, bi gotîneke din “Dêrikanî” ye. Ev nasnameya “Dêrikanîyê” li derveyî Dêrikê xurttir e. Li bajarên rojavayên Tirkîyê ev hestê Dêrikantîyê, ji nava Dêrikê xurttir e. Bi vegotina nîfşên mezî “*Dêrikî li derve hevdi bêtir digrin.*” (R. Dêrik, 2014) Li navenda Dêrikê jî dema ku di navbera hin kesan de nakokîyek derdikeve, ji bo çareserîyê navbeynkarên dikevin navbera wan, gelek caran bi telkîna vê nasnamê pîrsgirikan çareser dikin. “*De Dêrikanî ye tişt nabi, em giş mervê hev in!*” (M. Dêrik, 2014)

I.5.3.6. Rewşa Zimên li Dêrikê

Li navenda Dêrikê û li piranîya gundên wê, zimanê di jîyana rojane de tê bikaranîn kurmancî ye. Li herêma Qerecdax, li herêma eşîra Sefa zaravayê zazakî; li alîyê berîyê li gundên eşîra Tatan jî bi erebî tê peyivandin. Lê hem welatîyên Sefî û hem jî welatîyên Tat li gel ziman û zaravayên xwe bi kurmancî jî zanin. Têkilîya wan bi navenda Dêrikê re û bi gundên der û dora wan re bi kurmancî ye.

Taybetmendîyeke Dêrikê ya girîng, di nava gel de bilindbûna asta peyivandina bi kurmancî ye. Li gel bilindbûna vê astê her weha kurmancîya Dêrikê jî kurmancîyeke zelal û paqij e. Nirxek Dêrikê ya taybet ku wê ji der û dora wê diqetîne ev taybetmendîya wê ya li ser kurmancî ye. Her çend piranîya mirovan bi tirkî zanibin jî, bikaranîna kurmancî gelekî xurt e. Ev yek bi nifşê mezin re, li gor yê biçûk xurttir e. Nifşê mezin yên ku me hevdîtin bi wan re pêk anî, bi awayeke xurt bi kurmancî hest û ramanên xwe anîn ziman. Tu kes ji wan bi tirkî nepeyvî û pir kêr peyvên tirkî tevî peyva xwe kirin. Lê ji nifşê biçûk 4 kesan gotin em nikarin fikrên xwe bi kurmancî bînin zimên, em dixwazin bi tirkî bipeyivin. Di nava peyvên vî nifşî de tevlêkirina bêjeyên tirkî jî pir bûn. Ev yek jî dide xuyakirin ku peyivandina bi kurmancî her ku diçe qels dibe. Sedema herî girîng ew e ku nifşên biçûk giş çûne dibistanê, hin ji wan diçin zanîngehê û di perwerdeya wan de kurmancî nayê bikaranîn. Nifşê mezin bi piranî neçûne dibistanê, yên çûbin jî ji ya seretayî û wê de nexwendine. Ger bergirî lê neyê kirin di heyamên pêş de ev taybetmendîya Dêrikê ya kurmancîaxêfî dê ji holê rabe.

Di hevdîtinên nifşên mezin de derkete pêş ku li herêma Dêrikê wêjeya bi devkî gelekî dewlemend e. Ji ber ku beşdarvanan di nava peyvê de gelek biwêj û gotinên pêşîya bikartanîn, serpêhatîyên xwe bi xwezayîya vebêjîya kurmancîya gelêrî vegotin. Mirov dikare ji her cûreyên wêjeya devkî berhemên hêjayî berhevdan û lêkolînê pêde bike. Gotinên pêşîyan, biwêj, mamik, çîrokên gelêrî, meselok, pêkenok, destan û cûreyên din yên wêjeya gelêrî yên herêma Dêrikê dibe bibe mijarên lêkolînên zanistî.

Di nava nifşên mezin de vebêjîyeke xwezayî serdest e. Ji ber wê, berhevkirina serpêhatîyan jî ji bo berhemên wêjeya nûjen dikare bibe kereste. Ji vê kevneşopîya vebêjîya kurmancî, di warê wêjeya nivîskî de jî ji Dêrikê gelek nivîskar û helbestvanên kurmancî derketîye. Mirov dikare bêje ev nivîskar û helbestvanên kurdînûs bi qasî ku

mînakên xurtbûna kurmançî ne li Dêrikê, di heman demê de bûne sedema kevneşopîya bikaranîna kurmançî jî. Çend heb nivîskar, helbestvan û zimanzanên nasdar yê ji Dêrikê derketine û di warê wêje, ziman û sîyasetê de bi kurmançî berhem dane ev in: Qedrîcan, Reşîdê Kurd, Bûbê Eser, Firat Cewerî, Enwer Karahan, Selahattin Bulut, Hamdullah Kovan Baqî, Fewzi Bilge, Osman Özçelik, Fuad Önen, Feyzullah Önen, Eyyüp Güven, Lokman Ayebe...

1.5.3.7. Rewşa Folklorê li Dêrikê

Vladimir Propp li ser folklorê dibêje *“Heger em ji perspektîfeke dîrokê lê binêrin folklor, hemî hilberînên afirîner yê gelan e.”* di dereke din de jî folklorê bi vî awayî tarîf dike: *“Folklor, hunera çînên asta herî jêrîn yê hemî gelan e, bêyî ku li pileya pêşketina van gelan were nêrin.”* (1998: 11,12) Li herêmên jîyana gundewar lê serdest e, her tiştê ku em ê bibînin, her cûre hilberînên gel yê maddî-manewî, mijarên folklorê ne. Lê belê folklor tê guhertin, wekî çarenûseke rev jê tunebe, çawa ku li her derê dinyê jîyana modern, jîyana kevn têk dibe, li Dêrikê jî kevneşopîyên gel, roj bi roj jî holê radibin, tên jîbîrkin, şikil diguherin yan jî xera dibin. Di vî warê de vegotinên nîfşê mezin vê rewşê datîne ber me:

“Anha sohbet nemayi, berê telewizyon û radyo tunebû, dê û bavê me bi çîrçîrokan em dikirin xwe.” (Y. Bixur, 2014)

“Di dema zarotîya me de gog hebû, çîrê hebû, sêqûçê hebû, kerkomiratî hebû, heftok hebû, xar û şaqûl hebû, cit hebû, çopelankê hebû, kab hebû, singê tapanê hebû, kevirê pîya hebû, me bi vana dilîst.” (A. Xarok, 2014)

“Me şelwer li xwe dikir, bi ser de komlek, êlek û çakêt û me qondere dikir nigê xwe.” (Ş. Xarok, 2014)

“Girêdana me jinên yextîyar anha çawayî berê jî wenî bû. Me kitan bi xwe de dadikir, me hubrî dida serê xwe, fîstan û kirasên me wek anha dirêj bûn.” (R. Xarok, 2014)

“Tê bîra mi jina kofî jî didan serê xwe.” (A. Fitin, 2014)

“Keç û bûkê anha kitan û hubrîyê nadin serê xwe, xwe bajarî dikin.” (G. Fitin, 2014)

“Bûk bi hespa dibirin, kulik bi serê wan ve dardedikirin.” (G. Dêrik, 2014)

“Dawetê me sê ra lê diket, anka gelek dawet di 2-3 seeta di li salona çêdibi û diqedî.” (F. Dêrik, 2014)

“Berê yek bimra heya çelê wî nedana kesî serê xwe nedişuşt, şûna wî dikşandin.” (E. Dêrik, 2014)

“Tu kes destvala nediçû şûna, me ya pezek dibir, ya tenekak rûn, ya kêsek şeker, anka ne pir nêzîk bi kesek tiştêkî nabi.” (M. Qizil, 2014)

“Me karê kurmancî dikir, me palûte datanî, herkesî alîkarîya hevdû dikir.” (B. Dêrik, 2014)

Li gundên Dêrikê ev guhertin li gor navçê kêmtir e. Li piranîya gundan hîn jî dîlan sê rojan didome. Cil û bergên jinên temenê wan li der dora 50-60’î hîn jî kitan, hubrî û kiras û fistanên dirêj in. Mêrên di wan temenan de jî bi gelemperî şalwer li xwe dikin. Bi ser şalwer de komlek, êlek, çakêt û şewqe heye bi piranî. Lê ev şewqeyên li serê mêran ji dema “şoreşa şewqe” ya Komara Tirkîyê maye. Li herêma Qerecdax ji berdêla şewqe bikaranîna çefiyên sipî bêtir e. Li navenda Dêrikê her çend awayên dîlanên berê berdewam be jî, dîlanên modern yên li salonan çêdibin ji awayên berê bêtir bûne.

Piranîya nifşên mezin ji van guhertinan aciz in. Lê hinek ji nifşên mezin jî dibêjin: “Heyat rehetir bûyî. Ji dêvla du sê ra, di du sê seeta di millet bûka xwe tînin. Şûn jî rehet bûnî, berê bi meha şûn dihat girtin, anka sê çar ro yi.” (S. Dêrik, 2014) Beşdarvaneke jin yê ji nifşê mezin weha got: “Di navbera du sê seeta di dawet çêdibi û herkes dehri mala xwe. Kincê pîrekê anha jî ê me yî berê rehetir in. Em di bin wan kum û kitan û hubrîya di dişewitîn. Pîrekê anka xavikekê davîn ser serê xwe û hew.” (E. Dêrik, 2014)

Li gor vegotinan şînen berê gelek rojan dewam dikirin. Lê şînen anha di konan de, yan jî li malên bi taybetî ji bo şînan hatine çêkirin de sê rojan dewam dike. Hinek şîn

çar, pênc rojan dewam dike. Her roj ji bo mêvana xwarin tê çêkirin. Xwarina herî pir tê çêkirin goştê pez û birinc e. Ji roja sisîyan re “sêrokî” tê gotin û di vê rojê de mewlûd tê xwendin û helaw tê çêkirin. Di demên berê de ku kurmancî qedexe bû mewlûd bi erebî dihat xwendin, lê ev nêzîka deh salan e bi kurmancî jî tê xwendin. Terqîna li ser mezelan jî êdî bi kurmancî jî tê xwendin, berê hew bi erebî dihat xwendin.

Ji van vegotinên li jor jî tê fêmkirin ku guhertinên mezin di kevneşopîyan de çêbûne. Cil û berg hatine guhertin, lîstikên zarokan û xortan hatine guhertin, dawet û şîn hatine guhertin. Bi guhertin û pêşveçûnên teknolojîk re awayê jîyana gelê Dêrikê jî hatîye guhertin. Mirov dikare van guhertinan normal bibîne, êdî zarok dev ji televîzyon û kompîturên xwe bernadin û danakevin kolanan bi şaqûlan nalîzin, lê belê ji bo ku wêjeya devkî wenda nebe divê berhemên wê bên hevdan. Çavkanîyên wêjeya devkî jî ev nifşên mezin in, heger em destê xwe zû negirin ew jî yek bi yek wenda dibin.

Pişî van agahîyên di derheqê taybetmendîyên civaka Dêrikê de, em ê derbasî agahîyên mijarên onomastîkê bibin. Mijara yekemîn “navê mirovan li herêma Dêrikê” ye:

II. NAVÊ MIROVAN LI HERÊMA DÊRIKÊ

Ji bo lêkolîna li ser navê mirovan ji navenda Dêrikê du dibistan û ji nava gundên wê jî çar gund hatîye hîlbijartin. Li her du dibistanan li ser navê şagirtan û li her çar gundan jî li ser navê şênîyan yên hîlbijêr û li ser navê şagirtên dibistanên seretayî yên van gundan hatîye xebitandin. Agahîyên vê xebatê ku me bi dest xistine bi vî awayî ne:

II.1. NAVÊ ŞAGIRTAN LI DERÏK ANADOLU LİSESİ

Derik Anadolu Lisesi di sala 2010'an de li navenda Dêrikê li taxa Kanîya Gwîzê hatîye avakirin. Di sala perwerdê ya 2013-2014'ê de li vê dibistanê bi tevayî 367 şagirt hebûn. Şagirtên vê dibistanê li gor encama azmûnên Wezareta Perwerdeya Netewî hatine vê dibistanê, ji ber wê jî ji navenda Dêrikê, ji gundên wê û ji Şemrex şagirt hene. Şagirtên ji Şemrex tî 15 heb in û ji ber ku sînorê lêkolînê Dêrik û herêma wê ye, beşdarî anketê nehatine kirin. Ji şagirtên mayî bi 278 hebî re anket hatîye çêkirin ku ev hejmar wek rêje dike ji %76 ê şagirtan. Şagirtên beşdarî anketan bûne nehatine hîlbijartin. Tenê şagirtên ji Şemrex tî jê hatine neqandin, yên mayî (li gor teknîka randomê) bi texmînî hatine hîlbijartin. Sê pol ji sala 9. sê pol ji sala 10. sê pol ji sala 11. û polek ji sala 12. beşdarî anketê bûne. Di roja anketê de di van polan de kî hebe ew beşdar bûne. Di van polan de bi giştî 4 şagirtan nexwestin beşdarî anketê bibin, yên mayî bi dilê xwe beşdar bûn. Anket di 24.02.2014'an de, katjimêr di 9:00'an de, bi destûra Midûriyeta Perwerdeya Netewî ya Dêrikê ya ku dîrok û hejmarê wê

‘‘14.02.2014 68832379-135.04/611’’ hatîye çêkirin. Li gor zanyarî û pirsên di anketê de taybetmendiyên şagirtan yên gelemperî û bersîvên wan bi vî awayî ne:

Tablo 1: Hejmar û Rêjeya Navan (DAL)

	Hejmara Şagirtan	Hejmara Navan	Rêje
Keç	162	107	0,66
Law	116	87	0,75
Bi giştî	278	194	0,70

Ji 278 şagirtên ku anket bi wan re hatîye çêkirin jê 162 kes keç û 116 kes jî law in. Ji bo 162 keçan 107 nav hatîye bikaranîn, ango li serê her keçekê 0,66 nav dikeve. Ji bo 116 lawan bi giştî 87 nav hatîye bikaranîn, li serê her lawekî 0,75 nav dikeve. Ev jî tê vê wateyê ku ji bo lawan bêtir navên guhertî hatîye bikaranîn, navê keçan yên wek hev bêtir e. Ji bo keç û lawan bi giştî rêjeya bikaranîna navan ji % 0,70 ye.

Tablo 2: Navê Keçan, yên Herî Kêm Du Caran Hatîye Bikaranîn (DAL)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi giştî
Ayşe	7	7
Büşra	6	6
Zeynep	5	5
Berivan, Sultan, Zilan,	4	12
Dilan, Halime, Kübra, Merve, Zelar	3	15
Bejna, Beritan, Derya, Esmâ, Esra, Fatime, Gülbahar, Hatice, Kadriye, Melek, Nurcan, Remziye, Rojbin, Rojda, Ruken, Songül, Şehadet	2	34
28		79

Li gor tabloya 2. ji bo keçan navê herî pir hatîye bikaranîn, “Ayşe” ye. Di vê tabloyê de hejmara navan 28 e û bi giştî navê 79 şagirtan e. Di nava van 28 navên herî pir hatîye bikaranîn de 16 nav bi erebî (Ayşe, Büşra, Zeynep, Sultan, Halime, Kübra, Merve, Derya, Esmâ, Esra, Fatime, Hatice, Kadriye, Melek, Remziye, Şehadet) ye û li 49 şagirtan belav bûye. Ev hejmar wek rêje di nava hemî navê şagirtên keç de dike ji %30,2. Di vê tabloyê de hejmara navên kurmancî 10 e û li 26 şagirtan belav bûye. Ew jî wek rêje dike ji %16. Di navê keçan de ji bilî navên erebî û kurmancî, xwerû ji zimanekî din ku navekî du cara hatibe bikaranîn tune. Du navê têkel heye, Nurcan bi erebî-kurmancî ye, Songül bi tirkî-kurmancî ye. Ev her du nav her yek ji bo du şagirtan hatîye bikaranîn û rêjeya her yekê ji %1,2 ye.¹³

Tablo 3: Navê Lawan, yên Herî Kêm Du Caran Hatîye Bikaranîn (DAL)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi Giştî
Ahmet	5	5
Mustafa	4	4
Doğan, Ömer	3	6
Abdulkadir, Abdullah, Azad, Baran , Emrah, Ferat, Fırat , Mehmet, Musa, Nurullah, Orhan, Özgür, Ramazan, Sefkan, Şeyhmus, Mehmet Emin	2	32
20	14	47

Li gor tabloya 3. ji navên lawan yê herî pir hatîye bikaranîn “Ahmet” e. Ji 15 navê lawan yê herî pir hatîye bikaranîn jê 12 heb bi erebî (Ahmet, Mustafa, Ömer, Abdulkadir, Abdullah, Emrah, Mehmet, Musa, Nurullah, Ramazan, Şeyhmus, Mehmet Emin) ye û li 30 şagirtî belav bûye. Ev hejmar wek rêje dike ji %25,9. Ji navê lawan yên herî pir hatîye bikaranîn jê 4 heb bi kurmancî (Azad, Baran, Ferat, Fırat) ye. Rêjeya navên kurmancî di nava lawan de dike ji %6,9. Navê lawan yên bi zimanê tirkî 3 heb in (Doğan, Orhan, Özgür) û navê 7 şagirtan e û wek rêje dike ji %6. Navek jê têkel e, bi

¹³ Navên ku hejmara bikaranîna wan wek hev in, di nava xwe de li gor rêza alfabetîk hatine rêzkirin.

erebî-tirkî (Sef-kan) ye û ev nav du caran hatîye bikaranîn û dike ji %1,7'yê navê lawan. Dunavekî ku du cara hatîye bikaranîn yek tenê ye û bi erebî-erebî ye (Mehmet Emîn) Dike ji %1,7'ê navê lawan.

Tablo 4: Hejmar û Rêjeya Navan, li Gor Zimanan (DAL)

Ziman	Navê Keçan	Navê Lawan	Bi Giştî	Rêje(%)
Erebî	86	59	145	%52,1
Kurmancî	45	20	65	%23,4
Tirkî	14	16	30	%10,8
Farisî	4	1	5	%1,8
Îbranî	-	3	3	%1,1
Moxolî	2	-	2	%0,7
Yewnanî	1	-	1	%0,4
Navên Têkel	8	5	13	%4,7
Navên Nedîyar	1	-	1	%0,4
Dunav	1	12	13	%4,7
Bi Giştî	162	116	278	%100

Li gor daneyên tabloya 4. navê şagirtan ji nêvî bêtir bi zimanê erebî ye. (ji %52,1) Li dû wê bi dorê kurmancî, tirkî, farisî, îbranî, moxolî û yewnanî tê. Ango navên hatîye tespîtîkirin bi tevayî ji 7 zimanan e. Koka navekê nehatîye tespîtîkirin (Dedîye). Ev nav dibe ji ‘te’dîye’ ya erebî jî hatibe guhertin û dibe ji ‘de-di’ya tirkî jî hatibe çêkirin. Di erebî de te’dîye tê wateya ‘dana pera, pere dan, dana deyneke’. Di erebî de rêyeke çêkirina navên zayendmê bi qertafa ‘-(y)e’ ye. Her çend di te’dîye de dengên ‘ye’ ye di koka bêjeyê de be jî navê jinan tîne bîre mirov. Wek Fewzî-(y)e, Remzî-(y)e, Helîm-e û hwd. Lê heger ji ‘de-di’ya tirkî hatibe çêkirin wê çaxê ‘-ye’ dibe qertafa zayendmêya erebî. Bi vî awayî wateya wê dîbibe ‘jina ku gotîye, peyivîye’ Heger piştî koka ‘de’ ye ‘dîye’ jî cihê were fikirandin wê çaxê bêje dibe ‘de-dîye’ û tê wateya ‘ji bo ku bêje’.

Bi farisî bi giştî 5 nav heye. Çar nav yê keçan (Ebru, Handan, Nalan, Mihriban) nevek jî yê lawan (Levent) e. Bi zimanê îbranî 3 heb nav heye û her yek ji bo şagirtêkî law hatîye bikaranîn. Îbrahim, Îshak û Bünyamin. Bi zimanê moxolî du nav heye, Ceylan û Meral. Bi yewnanî navek heye (Melis). 8 navê keçan û 5 navê lawan têkel e, ji du zimana çêbûne. Ev nav ev in:

Tablo 5: Navên Têkel (DAL)

Ziman	Nav
Kurmancî-Tirkî	Can-su, Can-er
Tirkî-Kurmancî	Bir-gül, Son-gül
Kurmancî-Erebî	Can-sel, Ser-hat
Erebî-Kurmancî	Seyit-han, Ali-han, Nur-can, Bedir-han
Tirkî-Erebî	Ilk-nur
Farisî-Tirkî	Sine-m
Firansî-Tirkî	Tül-ay

Piranîya navên têkel ji erebî û kurmancî çêbûne. 2 heb jê bi kurmancî-erebî ye; sê heb jê jî bi erebî-kurmancî ye.

Navê 13 şagirtan ji du navan pêk tê. Jê yek keç û 12 heb jî law in. Di navê lawan yê dunavo de yek jê du caran hatîye bikaranîn (Mehmet Emin) Lîsteya dunavan bi vî awayî ye:

Tablo 6: Şagirtên Dunavo (DAL)

Ziman	Nav	Keç (K); Law (L)
Farisî-Kurmancî	Sara Rojîn	K
Kurmancî-Erebî	Baver Ramazan	L
Erebî-Erebî	Mehmet Ali, Mehmet Emin (2) Mehmet Şerif, Mehmet Ziyad, Zeynel Abidin	L
Îbranî-Erebî	İbrahim Halil	L
Erebî-Kurmancî	Mehmet Can	L
Erebî-Farisî	Mehmet Şah	L
Erebî-Îbranî	Haci Davut	L

Navê 6 şagirtên law bi erebî-erebî ye. Bi giştî navê 9 şagirtan yên yekemîn bi erebî ye û ji wan 7 heb ‘Mehmet’ e. Di tabloya 4. de hejmara navên erebî yên xwerû 145 û rêjeya navên erebî ji %52,1 e. Lê ger em van dunavên erebî-erebî jî bavêjin ser van navan dê hejmara navên erebî bibe 151 û rêjeya bikaranîna navên erebî jî dê bibe ji %54,3. Tenê şagirteke keç dunavo ye. Di anketê de bersîva vê şagirtê dide zanîn ku navê yekemîn (Sara) di heman demê de navê dapîra wê ye.

Tablo 7: Rewşa Temenê Şagirtan (DAL)

Sala Jidayikbûnê	Hejmara Şagirtan	Rêje
1995	3	%1,1
1996	26	%9,4
1997	79	%28,4
1998	67	%24,1
1999	94	%33,8
2000	7	%2,5
2001	2	%0,7
Bi Giştî	278	%100

Temenê beşdarvanan li gor dîroka jidayikbûna wan di navbera 1995-2001'ê de ye. Şagirtên herî mezin 3 heb in û di 1995'an de jidayikbûnin. Yê herî biçûk 2 heb in û di sala 2001'ê de jidayikbûnin. Rêjeya van her pênc zarokan dike ji %1,8. Sedemên vê cudatîya di navbera temenê şagirtan de cudatîya destpêkirina dibistanê û wendakirina salan e.

Tablo 8: Navên Kurmancî, li Gor Temenê Şagirtan (DAL)

Sala Jidayikbûnê	Hejmara Şagirtan	Hejmara Navên Kurmancî	Rêje(%)
1995	3	-	%00
1996	26	4	%15,4
1997	79	26	%32,9
1998	67	13	%19,4
1999	94	22	%23,4
2000	7	-	%00
2001	2	-	%00
Bi Giştî	278	65	%23,4

Li gor temenê şagirtan rêjeya navên kurmancî ne bi rêkûpêk e. Di nava şagirtên ku di sala 1997'an de jidayikbûye rêjeya navên kurmancî ji %32,9 e. Ango ji 79 şagirtan navê 26 hebî bi kurmancî ye. Sala ku şagirtan herî pir navên kurmancî sitendîye ev e. Li dû wê, sala 1999 û li dû wê jî sala 1998 tê. Li gor van rêjeyan mirov nikane bêje di rêjeya bilindbûna navên kurmancî de guhertineke serast heye.

Tablo 9: Bernavê Şagirtan, Navê Duyemîn (DAL)

	Hejmar	Rêje
Bernavê min heye	42	%15,1
Bernavê min tune	229	%82,4
Vala	7	%2,5
Bi Giştî	278	%100

Ji 278 şagirtan 42 şagirtî gotîye bernavekî min yan jî navekî min yê duyemîn heye. Ev jî dike ji %15,1'ê şagirtan. Ji nava van 42 şagirtan yên ku bernavê wan wek kurtkirina navê wan hatîye çêkirin ev in. Memo (Mehmet), Ehmo (Ahmet), Rozê (Rozerin), Gulê (Gülbahar), Gulê (Gülistan), Canê (Cansel), Zînê (Zeynep). Têkilîya hinek bernavan jî qet bi navên şagirtan re tune, wekî ku wan jî gotîye, ‘*’Di nav hevalan de ji mi ri wenî dibên.*’ Wek Teoman (Levent), Ronaldo (Mustafa)... Hinek bernav ji aliyê dê û bavan ve li zarokan bûye û tu têkilîya van navan bi navê wan re tune, wekî ku şagirtan jî gotîye, ‘*’ji hezkirina*’ dê û bavê wan ev bernav li wan kiriye. Wek Gulê (Türkan), Zeycan (Zeyneb), Gulê (İlknur)... Ji van 42 bernavan 14 heb jê bi kurmancî ne: (Argeş, Zîlan, Serhildan, Canê, Rozê, Roza, Hêvron, Gulê (3), Pelda, Şînda, Giclok, Mert.) Ji piraniya bernavan xuyaye ku armanca lêkirina wan kurtbûna wan e. Bi vî awayî bi kedeke hindik navê kesan tê gotin. Hinek bernav jî li gel kurtkirin û hêskirina navan hestên mirovan jî tevî gotinê û binavkirinê dike. Wekî ‘*’Canê, Zeycan, Gulê...*’

Di anketê de şagirt di derheqê perwerdeya dê û bavê xwe de van agahîyan didin:

Tablo 10: Perwerdeya Dê û Bavê Şagirtan (DAL)

Asta Perwerdeyê	Perwerdeya Dê	Rêje (%)	Perwerdeya Bavê	Rêje (%)
Dibistana Seretayî	119	%42,8	122	%43,9
Dibistana Navîn	27	%9,7	41	%14,7
Lîse	7	%2,5	60	%21,6
Zanîngeh	4	%1,4	22	%7,9
Bi xwendin û nivîsandinê nizane	102	%36,7	16	%5,8
Bi xwendin û nivîsandinê zane	13	%4,7	16	%5,8
Vala	6	%2,2	1	%0,4
Bi Giştî	278	%100	278	%100,1

Di navbera dê û bavan de cudatîya xwendinê pir e. 102 dayik, angê ji %36,7 ê dayikan bi xwendin û nivîsandinê nizane. Ev hejmar ji bo bavan dadikeve 16 hebî angê

ji %5,8'ê bavan bi xwendin û nivîsandinê nizane. Di nava dayikan de 119 dayikan dibistana seretayî xwendîye û ev hejmar di nava hemî dayikan de dike ji %42,8. Rewşa bavan ya perwerdeyê ji ya dayikan çêtir e. Ji %43,9 ê bavan dibistana seretayî xwendîye, ji %21,6'ê bavan lîse xwendîye. Xwendina zanîngehê di nava dayikan de ji %1,4 e; di nava bavan de ji %7,9 e. 6 şagirtan ji bo rewşa perwerdeya dê û şagirtêkî jî ji bo ya bavê bersîv nedaye.

Me xwest em fam bikin 65 şagirtên ku navê wan bi kurmancî ye, perwerdeya dê û bavê wan çî ye. Têkilîya navê kurmancî û asta perwerdeya dê û bavan bi vî awayî ye:

Tablo 11: Navê Şagirtan bi Kurmancî be, Rewşa Perwerdeya Dê û Bavan (DAL)

Asta Perwerdeyê	Perwerdeya Dê	Rêje (%)	Perwerdeya Bavê	Rêje (%)
Dibistana Seretayî	27	%41,5	22	%33,8
Dibistana Navîn	6	%9,2	11	%16,9
Lîse	5	%7,7	20	%30,8
Zanîngeh	1	%1,5	7	%10,8
Bi xwendin û nivîsandinê nizane	23	%35,4	1	%1,5
Bi xwendin û nivîsandinê zane	1	%1,5	3	%4,6
Vala	2	%3,1	1	%1,5
Bi Giştî	65	%99,9	65	%99,9

Dema ku em li daneyên tabloya 11. dinêrin em dibînin ku asta perwerdeya dê û bavê 65 şagirtên ku navê wan bi kurmancî ye cudatîyeke mezin di navbera wan û perwerdeya giştîyê dê û bavan de (tabloya 10.) tune ye. Lê ku mirov bi giştî yên ku perwerde dîbin û nedîbin dide ber hev, hindik be jî cudayetîyek xuya dibe. Li gor tabloya 10. rêjeya asta perwerdeya dayikan ya seretayî, navîn, lîse û zanîngehê li ser hev dike ji %56,4. Heman rêje ji bo tabloya 11. %59,9 e. Ango dayikên ku navê zarokên wan bi kurmancî ye ji %3,5 bêtirî giştîyê dayikan perwerde dîtine. Rêjeya dayikên ku navê zarokên wan bi kurmancî ye û bi xwendin û nivîsandinê nizane ji %35,4 e. Ev rêje

ji bo giştîyê dayikan ji %36,7 e. Ev ferq jî dike ji %1,3 ku ne ferqek mezin e. Rewşa perwerdeya bavên ji ya dayikan guhertîtir e. Li gor tabloya 10. rêjeya asta perwerdeya bavên ya seretayî, navîn, lîse û zanîngehê li ser hev dike ji %88,1. Heman rêje ji bo bavên ku navê zarokê wan bi kurmancî ye ji %92,3 ye. Ango bavên ku navê zarokên wan bi kurmancî ye ji %4,2 ji giştîyê bavên bêtir perwerde dîtîye. Bavên ku navê zarokê wan bi kurmancî ye ji %1,5'ê wan bi xwendin û nivîsandinê nizane, ev rêje ji bo giştî bavên (Tabloya 10.) ji %5,8 e.

Ji bo perwerdeya dê û bavên mirov dikare bêje bi rêjeyek hindik be jî perwerdeya dê û bavên ku navê zarokên wan bi kurmancî ye ji rêjeya tevaya dê û bavê şagirtan bêtir e.

Me ji 278 şagirtên Derik Anadolu Lisesi pirsî ku navê wan kê li wan kiriye. Bi vê pirsê me xwest em fam bikin ku di nava malbatê de kî nava li zarokan dike. Li gor bersîvê şagirtan rewş weha ye:

Tablo 12: Navê We Kê li We Kiriye? (DAL)

Navê We Kê li We Kiriye?	Hejmar	Rêje	Navê We Kê li We Kiriye?	Hejmar	Rêje
Bavê min	84	%30,2	Bijîşk	4	%1,4
Dîya min	41	%14,7	Mela	7	%2,5
Dê û bavê min	7	%2,5	Birê min	5	%1,8
Bapîrê min	27	%9,7	Xwişka min	1	%0,4
Dapîra min	21	%7,6	Hevalê bavê min	3	%1,1
Apê min	11	%4	Nizanim	38	%13,7
Xalê min	7	%2,5	Cîranê me	1	%0,4
Metika min	8	%2,9	Vala	7	%2,5
Xaltîka min	7	%2,5	Bi Giştî	271	%100,4

Ji bersîvê şagirtan tê fêmkirin ku bi rêjeya herî bilind (%30,2) bavên nav li zarokên xwe kirine. Li pê wan bi %14,7'an dê tê. Li dû dê bapîr bi %9,7 û dapîr %7,6

tê. Merivên din yê nava li zarokan dikin ap, xal, metik, xaltîk xwişk û bira ne. Ji bilî merivê zarokan kesên din ku bi malbatê re di nava têkilîyê de ne yên wek bijîşk, mela, hevalên bavê û cîran jî bi rêjeyên hindik bin jî nava li zarokan dikin. 38 zarokan gotîye em nizanin kê ev nav li me kiriye. 7 zarokan jî bersîv nedaye vê pirsê.

Me ji zaroka pirsî ku bê navê wan ji bo çi li wan bûye. Bi vê pirsê me xwest em fam bikin ku di navdayina zarokan de çi sedem derdikevin pêş û bê zarok bi van sedeman zanin yan nizanin. Li gor bersîvên şagirtan sedemên navdayînê bi vî awayî ne.

Tablo 13: Hun Zanin Ev Nav ji bo Çi li We Bûye? (DAL)

Bersîvên Şagirtan	Hejmar	Rêje	Bersîvên Şagirtan	Hejmar	Rêje
Navê bapîrê min e	22	%7,9	Navê yekî navdar e	22	%7,9
Navê dapîra min e	27	%9,7	Navekî bi xêr e	25	%9
Navê apê min e	10	%3,6	Ji ber ku wateya wê xweş e	24	%8,6
Navê xalê min e	7	%2,5	Wekî din	61	%21,9
Navê metika min e	9	%3,2	Nizanim	52	%18,7
Navê xaltîka min e	5	%1,8	Vala	14	%5
			Bi Giştî	278	%99,8

Li gor bersîvên şagirtan ji %9,7'ê şagirtan navê dapîra xwe sitendîye. Dema ku em li gor hejmara şagirtên keç dihesibînin, di nava 162 keçan de navê 27 keçan yên dapîra wan e û dike ji %16,7'ê şagirtên keç. 22 şagirtan jî gotîye navê bapîrê min li min bûye. Di nava hemî lawan de ev hejmar wek rêje dike ji %19. Em navê dapîr, bapîr, ap, xal, metik û xaltî li ser hev bijmêrin; şagirtên ku navê merivê wan li wan bûye 80 heb in û bi giştî rêjeya wan ji %28,8 e.

Ji bilî navê merivan, bi rêjeya herî bilind sedema ku navê wan ‘navekî bi xêr e’ ev nav li wan bûye ji %9'ê navan e. Yên ku bi vî awayî bersîv dane, wek mînak navê wan ev in: ‘Fatime, Elif, Bûşra, Bilal, Abdülkadir, Merve, Kandil, Mehmet Emin...’ Di anketê de di nava bersîvên hazir de ev bersîv tune, şagirtan bersîvên xwe yên di vê

wateyê de li cihê vala nivîsîne. Me bersîvên wekî “navêkî bi xêr e, navê keça pêxember e, navê yê ku cara yekemîn azan xwendîye, ji Qur’anê hatîye girtin, ez di şeveke bi xêr de çêbûme, nav û nasnavê pêxemberê me ye û hwd.” ku şîrovevên olî ne, di bin kategorîya “navêkî bi xêr e” de tomar kire.

Ji %7,9’ê şagirtan wek sedema navê xwe gotine “navê yekî navdar e”. Navê şagirtên ku ev bersîv dane wek mînak “Emrah, Zilan, Ahmet, Seyithan, Şeyhmus...” e.

Ji %8,6’ê şagirtan li cihê vala wek bersîva vê pirsê, sedemên nêzîkî “Ji ber ku wateya wê xweş e” nivîsîne. Bersîvên bi vî rengî ev in: “Ji ber ku wateya wê xweş e, kêfa bavê min ji vî navî re hatîye, bapîrê min ji vî navî hez kirîye û hwd.” Me bersîvên bi vî rengî di bin kategorîya “Ji ber ku wateya wê xweş e” de tomar kir. Wek mînak yê ev bersîv dane navê wan ev in: “Emrah, Ayşe, Yasemîn, Bejna, Rojda, Berğedan...”

Di bin kategorîya “wekî din” de gelek bersîvên guhertî hatine tomarkirin ku ev sedem nedibûn kategorîyên xweser. Ji ber wê me ev bersîvên guhertî di bin kategorîya “wekî din” de tomar kir. Hin bersîvên şagirtan yê di bin vê kategorîyê de bi vî awayî ne: “Dîya min di xewna xwe de ev nav dîbû (Merve), ji ber ku navê împaratorîyeke Kurd e (Medcan), navê şêxa dîya min e (Kadrîye), dema ku ez çêbûme navê dûrikeke populer bû (Gamze), ji ber ku apê min li xerîbîyê bû (Gurbet), ji bo ku bi navê xwişka min re li hev ke (navê wê Berfîn, yê xwişka wê Mizgîn), navê ozanekî Kurd e (Sefkan), ji ber ku ez di meha remezanê de çêbûme (Ramazan), ji ber ku ez di roja erefê de çêbûme (Arif), navê fermandarê bapîrê min yê li leşkerîyê ye (Mehmet Ziyad), ji ber ku bi kurdî ye (Rojbin), ji ber ku navê birê min Mazlum e (Doğan), navê bijîşka min e (Başak), navê keça ku dilê bavê min ketibûyê ye (Rahime) û hwd.

52 şagirt (%18,7) nizanin ku navê wan ji bo çî li wan bûye, 14 şagirtan jî tu bersîv nedaye vê pirsê (%5).

Me ji şagirtan pirsî, bê bi wateya navê xwe dizanin yan na:

Tablo 14: Hun bi Wateya Navê Xwe Zanin? (DAL)

Bersîvên Şagirtan	Hejmar	Rêje (%)
Erê	210	%75,5
Na	65	%23,4
Vala	3	%1,1
Bi Giştî	278	%100

Li gor bersîvê şagirtan ji %75,5'ê şagirtan bi wateya navê xwe zanin. Ji %23,4'ê şagirtan bi wateya navê xwe nizanin. 3 şagirtan bersîv nedaye vê pirsê (%1,1)

Me ji şagirtan pirsî ku bê ji navê xwe hez dikin yan na.

Tablo 15: Hun ji Navê Xwe Hez Dikin? (DAL)

Bersîv	Hejmar	Rêje (%)
Erê	220	%79,1
Na	56	%20,1
Vala	2	%0,7
Bi Giştî	278	%99,9

Ji %79,1'ê şagirtan gotine em ji navê xwe hez dikin. Yê ku ji navê xwe hez nakin %20,1 e. Du şagirtan bersîva vê pirsê nedane (%0,7).

Me ji zaroka pirsî ‘‘Heger hun ji navê xwe hez nakin we dixwest navê we çi be?’’ Li gor bersîvê şagirtan navê wan yê anha û navên ku dixwestin li wan be ev in: Hamdîye (Tuana), Türkan (Arzu-Gizem), Azize (Eylül), Ayşe (Eylül-Deniz), Fahrîye (Ayşe), Rahime (Defne), Reyhan (Hejar), Yüksel (Yağmur), Ayşe (Eylül), Ayşe (Ceren), Berivan (Türkü), Esra (Yaren-Bahar), Gurbet (Damla-Gamze), Gülbahar (Asya), Kadriye (Menal), Mert (Polat), Mizgin (Çağatay), Rojda (Nehir), Sabriye (Tuana), Şeyhmus (Yusuf-Diljen), Zine (Zilan), Zeynep (Betül), Derya (Hira), Ayşe

(Şında), Berivan (Arjin), Esmâ (Ömür), Fatime (İrem), Nasır (Efe-Poyraz), Sultan (Derin), Sadîye (Yağmur), Şükran (Aşkın-Ömür), Yılmaz (Ahmet), Zilan (Bitanesi), Zelal (Elif), Bünyamin (Muhammed), Büşra (Ada-Ela), Demet (Gulfiroş-Mergajin), Derya (Ada-Defne-Deniz), Dilan (Yağmur), Fatma (Burçin), Fatime (Gamze), Gülan (Justine, Tylor), Handan (Damla), Halime (Şubat-Damla), Kübra (Gizem-Deniz), Lokman (Bahoz), Mustafa (Berk), Pirozhan (Piroz), Seçil (Derin), Şemsa (Asu-Buse), Vahit (Murat), Zeynep (Zehra), Melek (Hicran-Dicle-Nehir), Mehmet (Berk Can), Mehmet Şah (*Mi dixwest navekî bi kurdî bi, wek Jîyan*), Sezgin (*Ji ber ku navê lawan li min i, mi dixwest navê mi Damla bûya*).

Li gor van bersîvan em dibînin ku ji 56 şagirtan yê ji navê xwe hez nakin 11 heb jê law; 45 heb jê keç in. Hejmara keçan di nava hemî keçan de dike ji %27,8 ku ji navê xwe hez nakin. Di nava lawan de jî ji %9,5'ê lawan ji navê xwe hez nakin û dixwazin navekî din li wan be. Ji bo keçan navê herî pir tîn xwestin navên wek "Damla (4), Eylül (3), Deniz (3), Yağmur (3)" e. Di nava lawan de ji bilî navê "Berk" navekî ku du caran hatîye xwestin tune ye.

Hinek şagirt wek alternatîf didu yan jî sê nava dixwazin ku ji wan yek li wan bûya. Şagirteke keç ji ber ku navê wê yê lawan e ji navê xwe aciz e. Şagirtekî law dixwaze berî her tiştî navê wî bi kurdî be û wek mînak dixwaze "Jîyan" be.

Navê Mizgin bi giştî du caran hatîye bikaranîn lê carekê ji bo şagirtekî law, carekê jî ji bo şagirteke keç. Şagirtê ku ji navê xwe hez nake yê law e. Di nava şagirtên ku ji navê xwe hez nakin de 9 şagirtên ku navê wan bi kurmancî ye heye. Du şagirt jî tevî ku navê wan bi kurmancî ye û ji navê xwe hez nakin lê dîsa navên dixwazin jî bi kurmancî ye: Berivan (Arjin), Pirozhan (Piroz). Di nava navên ku şagirt dixwazin de 12 navê bi kurmancî heye: Hejar, Bahar, Zilan, Arjîn, Jîyan, Can, Gulfiroş, Mergajîn, Diljen, Şında, Menal, Bahoz.

4 şagirt dixwazin navê wan yê duyemîn, bibe navê wan yê yekemîn. Navê wan yê resen û navê wan yê duyemîn weha ye: Zine (Zilan), Zeynep (Betül), Derya (Hira), Ayşe (Şında).

Me ji şagirtan xwest navê xwişk û birayên xwe ji yên mezin dest pê bikin û binivîsin. Bi vî awayî hin agahîyên ketin destê me ev in: Di malbatan de bi giranî çend zarok hene, di nava malbatê şagirtan de bi giştî meyla navê kurmancî çiqas e?

Ji bersîvên şagirtan tê fêmkirin ku piranîya malbatan xwedî gelek zarok in. Malbatên ku zarokên wan sisê û kêmtir in tenê 21 in. Ango malbatên 257 şagirtên mayî bi kêmanî xwedî 4 zarok in. Hejmara malbatên ku zarokên wan 7 û ji 7'an zêdetir e 107 e.

Ji 65 şagirtên ku navê wan bi kurmancî ye, ji wan di malbata 47 şagirtan de kêmanî navekî din jî bi kurmancî heye. Di nava şagirtên ku navê wan ne bi kurmancî ye ango di malbata 213 şagirtên mayî de, ji wan di malbata 91 şagirtî de kêmanî navekî bi kurmancî heye. Hin mînakên van navan ev in: "Jîyan, Kanivar, Dilşa, Helin, Rojin, Baran, Berivan, Pelda, Dilan, Gülbin, Avşin, Havin, Şîyar, Demhat, Koçer, Şervan, Robin..." Di malbata 122 şagirtên mayî de navê kurmancî tune.

Di hinek malbat de navê zaroka giş bi kurmancî ne: "Baver, Mizgin, Gülçin." Di hinek malbat de navên kurmancî di piranîyê de ye: "Berivan, İzzettin, Havin, Avşin."

Di anketê de me ji şagirtan xwest ku navê dê û bavê xwe jî binivîsin. Bi vî awayî derfeta me çêbû ku em navê şagirtan û yên dê û bavê wan bidin ber hev. Rewşa navê dê û bavên weha ye: Ji 278 şagirtan navê dîya 18 şagirtan (%6,5) bi kurmancî ye: "Gülü (4), Bessi, Evin..." Ji yên mayî navê 208 dayikan (%75) bi erebî "Ayşe, Fatma, Zeynep, Hatice, Şükran, Emine, Zerga, Tarfa ..." navê 15 dayikan (%5,4) bi tirkî: "Türkan, Özlem, Yıldız..." navê 11 dayikan (%4) bi farisî: "Mihriban, Afitap, Yasemin..." navê 2 dayikan (%0,7) bi moxolî: "Meral (2)" navê dayikekê (%0,4) bi yewnanî: "Fidan" navê 17 dayikan (%6,1) têkel e: "Aynur, Songül, Nurcan..." Koka navê dayikekê (%0,4) nehatîye tespîtkirin: "Filyaze" 5 şagirtan (%1,8) navê dîya xwe nenivîsîye.

Ji 278 şagirtan tenê navê bavê 2 şagirtan (%0,7) bi kurmancî ye: "Sîyamed, Rüstem." Ji yên mayî navê 222 bavî (%79,9) bi erebî: "Mehmet, Ahmet, Ali, Ramazan, Mahmut, Osman..." navê 12 bavî (%4,3) bi îbranî: "İbrahim, İsmail,

Süleyman...” navê 8 bavî (%2,9) bi farisî ye: “Nevzat, Levent, Bülent” navê 7 bavî (%2,6) bi tirkî: “Yılmaz, Doğan, Gündeniz...” navê 18 bavî (%6,5) dunavo ye: “Mehmet Salih, Mehmet Şakir, Mehmet Emin...” Koka 3 (%1,1) navan nehatîye tespîtkirin: “Dîyap, Ferzende, Feremez.” 6 (%2,2) şagirtan jî navê bavê xwe nenivîsîye.

Dibistana me ya duyemîn ya li navendê Atatürk Ortaokulu, ango Dibistana Navîn ya Atatürk’ê ye. Me heman anket li vê dibistanê jî çêkiriye û wek kereste bikaranîye.

II.2. NAVÊ ŞAGIRTAN LI ATATÜRK ORTAOKULU

Avahîya Atatürk Ortaokulu li taxa Dağê, bi navê xwe yê berê li taxa Rûtan di sala 1972’an de hatîye avakirin. Bi piranî zarokên şênîyên vê taxê diçin vê dibistanê. Avahîya wê ya kevin di sala 2009’an de hatîye xerakirin û di serdema duyemîn ya sala perwerdeyê ya 2009-2010’an de avahîya nuh ya vê dibistanê dest bi peywirê kiriye. Di heman avahîyê de beşa şagirtên dibistana seretayî jî heye. Ev beş bi navê “Atatürk İlköğretim Okulu” karê xwe yê perwerdeyê didomîne. Ji salên 1970’yê û vir de bi piranî ji gundên çîyê, yê wêk Xarok, Mavan û Bîrîniyê gelek malbat hatine li vê taxê bi cî bûne. Bi gelemperî rewşa aborîya niştecihên taxê lawaz e, gelek malbat diçin li rojavayê Tirkîyê wek karkerên demsalî dixebitin. Mamosteyekî vê dibistanê anî zimên ku ev yek bandorê li xwendina zarokan jî dike û ji ber ku zarok jî bi malbatên xwe re diçin kar, di destpêka dibistanê de kêmanî bi qasî mehekê dereng dimînin.

Di sala perwerdeyê ya 2013-2014’an de li dibistanê, di dibistana seretayî de 285 û di dibistana navîn de 188, bi giştî 473 şagirt heye. Me di nava şagirtên dibistana navîn de anket çêkir. Ji 188 şagirtan 125 şagirt beşdarî anketê bû. Ev hejmar wek rêje dike ji %65,5’ê şagirtên dibistana navîn. Anket di 24.02.2014’an de, katjimêr di 11:00’an de, bi destûra Midûrîyeta Perwerdeya Netewî ya Dêrikê ya ku dîrok û hejmara wê “14.02.2014 68832379-135.04/611” ye hatîye çêkirin. Li gor agahî û bersîvên di anketan de, ev encam hatine bidestxistin:

Tablo 16: Hejmar û Rêjeya Navan (ATA. O.)

	Hejmara Şagirtan	Hejmara Navan	Rêje (%)
Keç	60	42	0,70
Law	65	54	0,83
Bi giştî	125	96	0,77

Ji 125 şagirtên ku anket bi wan re hatîye çêkirin jê 60 şagirt keç û 65 şagirt law in. Ji bo 60 keçê 42 nav hatîye bikaranîn, ango li serê her keçekê 0,70 nav dikeve. Ji bo 65 lawan bi giştî 54 nav hatîye bikaranîn, li serê her lawekê 0,83 nav dikeve. Li gor van hejmaran ji bo lawan bêtir navên guhertî hatîye bikaranîn, navê keçan yê wê hev bêtir e. Ji bo keç û lawan bi giştî rêjeya bikaranîna navan ji % 0,77 e.

Tablo 17: Navê Keçan, Yê Herî Kêm Du Caran Hatîye Bikaranîn (ATA. O.)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi giştî
Helin	4	4
Rojbin, Sultan	3	6
Berivan, Dilan, Emine, Esra, Fatime, Kübra, Pelşin, Remzîye, Yeşim, Yonca, Zilan	2	22
14		32

Di nava keçan de navê herî pir hatîye bikaranîn 'Helin' e. Li dû wê Rojbîn tê. Bi giştî di nava keçan de ji 10 navên herî pir hatîye bikaranîn jê 5 heb bi kurmancî ye. Ev pênc navê kurmancî ji bo 13 şagirtan hatîye bikaranîn. 5 navê din yê mayî jê 4 heb bi erebî (Fatime, Kübra, Remzîye), yek jî bi tirkî (Yonca) ye. (Navên ku hejmara bikaranîna wan wek hev e, li gor rêza alfabetîk hatîye rêzkirin.)

Tablo 18: Navê Lawan, Yên Herî Kêm Du Caran Hatîye Bikaranîn (ATA O.)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi giştî
Ramazan	4	4
Mustafa, Serhat	3	6
Abdullah, Baran, Bayram, Yusuf	2	8
7		18

Di nava navê lawan de yê herî pir hatîye bikaranîn ‘Ramazan’ e. Li dû wê ‘Mustafa’ û ‘Serhat’ tê ku her yek 3 cara hatîye bikaranîn. Di nava 7 navê lawan yên herî pir hatîye bikaranîn de yê bi kurmancî ‘Baran’ tenê ye û ji bo 2 şagirtan hatîye bikaranîn. Navên mayî jê 3 heb bi erebî (Ramazan, Mustafa, Abdullah); navek bi tirkî (Bayram); navek bi îbranî (Yusuf) û navek jî bi kurmancî-erebî (Serhat) têkel e.

Tablo 19: Hejmar û Rêjeya Navan li Gor Zimanan (ATA. O.)

Ziman	Navê Keçan	Navê Lawan	Bi Giştî	Rêje(%)
Erebî	23	32	55	%44
Kurmancî	26	15	41	%32,8
Tirkî	8	7	15	%12
Farisî	1	-	1	%0,8
Îbranî	-	3	3	%2,4
Navên têkel	2	7	9	%7,2
Dunav	-	1	1	%0,8
Bi Giştî	60	65	125	%100

Ji tabloya 19. tê fêmkirin ku ji %44’ê navê beşdarvanên şagirtên dibistana Atatürk Ortaokulu bi erebî ye. Li dû erebî zimanê kurmancî zimanê duyemîn e û rêjeya wê ji %32,8 e. Li dû kurmancî bi rêzê tirkî ji %12, îbranî ji %2,4 û farisî ji %0,8 e. Şagirtek tenê dunavo ye û navê wî yê yekemîn bi erebî; yê duyemîn bi kurmancî ye.

(Zeynelabidin Rojhat) Navê 9 şagirtan têkel e. Avabûna van navan û zimanê wan bi vî awayî ye:

Tablo 20: Navên Têkel (ATA. O.)

Ziman	Nav
Tirkî-Kurmancî	Aygül, Gökhan
Kurmancî-Erebî	Şennur, Serhat (3)
Erebî-Kurmancî	Emircan, Nebican, Seyithan

Ji navê têkel du heb bi tirkî-kurmancî ye. Du heb nav bi kurmancî-erebî ye, navê Serhat ji bo sê şagirtan hatîye bikaranîn. 3 navê têkel yê mayî bi erebî-kurmancî ye.

Tablo 21: Rewşa Temenê Şagirtan (ATA. O.)

Sala Jidayikbûnê	Hejmara Şagirtan	Rêje(%)
1998	2	%1,6
1999	9	%7,2
2000	33	%26,4
2001	35	%28
2002	23	%18,4
2003	23	%18,4
Bi Giştî	125	%100

Şagirtên beşdarî anketê bûne di navbera sala 1998'an û 2003'an de hatine dinyê. Şagirtên di sala 1998'an de jidayikbûye 2; yê di sala 1999'an de jidayikbûye 9 heb in. Ev şagirtna bi temen ji hevalên xwe yê polê mezintir in.

Tablo 22: Navên Kurmancî, li Gor Temenê Şagirtan (ATA. O.)

Sala Jidayikbûnê	Hejmara Şagirtan	Hejmara Navên Kurmancî	Rêje(%)
1998	2	1	%50
1999	9	4	%44,4
2000	33	11	%33,3
2001	35	11	%31,4
2002	23	5	%21,7
2003	23	9	%39,1
Bi giştî	125	41	%32,8

Rêjeya navên kurmancî li gor salan ne bi rêk û pêk e. Rêjeya herî bilind ya navên kurmancî sala 1998'an e. Li pê wê bi dorê salên 1999, 2003, 2000, 2001 û 2002 tê. Ji ber ku hejmarên şagirtan li gor salan ne wek hev e mirov nikare van rêjeyan wek pîvanekê binirxîne.

Me ji şagirtan pirsî ku bê navê wan yê duyemîn ango bernavên wan heye yan na. Bersîvê şagirtan bi vî awayî ye:

Tablo 23: Bernavê Şagirtan, Navê Duyemîn (ATA. O.)

Bernavekî we heye?	Hejmar	Rêje (%)
Bernavê min heye	25	%20
Bernavê min tune	95	%76
Vala	5	%4
Bi Giştî	125	%100

Li gor vê tabloyê 25 şagirtan ango ji %20'ê şagirtan gotîye navê min yê duyemîn heye. Ji van 25 şagirtan bernavê 7 şagirtan bi kurmancî (Dila, Pelin, Helin, Rojin, Delal, Avşin, Ruşen) ye. 4 şagirtên ku navê wan bi kurmancî ye wek bernav navên ji zimanên din nîşan dane: Berfin (Ela), Rojbin (Zeynep), Baran (Osman), Berivan (Ezo). 2 şagirtên ku navê wan Fatime ye, gotine bernavê me 'Fatoş' e. 3 heb şagirtên law, bernavê xwe navê futbolvanên navdar nîşan dane: Servet (Ronaldo) , Serhat (Messi), Yakup (Messi).

Tablo 24: Perwerdeya Dê û Bavê Şagirtan (ATA. O.)

Asta Perwerdê	Perwerdeya Dê	Rêje (%)	Perwerdeya Bavê	Rêje (%)
Dibistana Seretayî	36	%28,8	33	%26,4
Dibistana Navîn	32	%25,6	44	%35,2
Lîse	5	%4	32	%25,6
Zanîngeh	-	%00	5	%4
Bi xwendin û nivîsandinê nizane	38	%30,4	5	%4
Bi xwendin û nivîsandinê zane	5	%4	1	%0,8
Vala	9	%7,2	5	%4
Bi Giştî	125	%100	125	%100

Li gor agahîyên tabloya 24. di navbera dê û bavan de di warê perwerdeyê de cudatîyeke mezin heye. Rêjeya dayikên ku bi xwendin û nivîsandinê nizane ji %30,4 e. Bavên bi xwendin û nivîsandinê nizane tenê ji %4 e. Cudatîyeke din ya mezin di xwendina lîseyê de ye. Ji %25,6'ê bavan lîse xwendîye lê dayikên lîse xwendîye tenê ji %4 e. Rêjeyên nêzîkî hev di xwendina dibistana seretayî de ye. Ji %28,8'ê dayikan û ji %26,4'ê bavan dibistana seretayî xwendîye. Di nava dayikan de yê zanîngeh xwendîye tune, ji %4'ê bavan zanîngeh xwendîye. 9 şagirtan (%7,2) ji bo perwerdeya dîya xwe; 5 şagirtan (%4) jî ji bo rewşa perwerdeya bavê xwe bersîv nedaye vê pirsê. Li ser hev dayikên ku perwerde dîtîye ji %58,4; bavên perwerde dîtîye ji %91,2 ye.

Tablo 25: Navê Şagirtan bi Kurmancî be Rewşa Perwerdeya Dê û Bavan (ATA. O.)

Asta Perwerdeyê	Perwerdeya Dê	Rêje (%)	Perwerdeya Bavê	Rêje (%)
Dibistana Seretayî	13	%31,7	9	%22
Dibistana Navîn	10	%24,4	18	%43,9
Lîse	2	%4,9	8	%19,5
Zanîngeh	-	%00	3	%7,3
Bi xwendin û nivîsandinê nizane	11	%26,8	1	%2,4
Bi xwendin û nivîsandinê zane	1	%2,4	-	%00
Vala	4	%9,8	2	%4,9
Bi Giştî	41	%100	41	%100

41 şagirtê ku navê wan bi kurmancî ye asta perwerdeya dê û bavê wan li gor hemî şagirtan bilindtir e. Ji dayikê 41 şagirtên ku navê wan bi kurmancî ye yê bi awayekî perwerde dîtîye ji % 61 e. Bavê van şagirtan yê ku bi awayekî perwerde dîtîye ji %92,7 e. Bi rêjeyeke hindik be jî di navbera dayikê şagirtên navê wan bi kurmancî û hemî dayikan de ji %2,6 cudatî heye ku dayikên navê zarokê wan bi kurmancî ye bêtir perwerde dîtîye. Di navbera perwerdeya bavê şagirtên ku navê wan bi kurmancî ye û di navbera hemî bavan de ji %1,5 cudatî heye ku bavê şagirtên ku navê wan bi kurmancî ye ji hemî bavan bêtir perwerde dîtîye.

Me ji 125 şagirtên Atatürk Ortaokulu pirsî ku kê navê wan li wan kiriye. Bersîvê wan bi vî awayî ne:

Tablo 26: Navê We Kê li We Kiriye? (ATA. O.)

Navê we kê li we kiriye?	Hejmar	Rêje	Navê we kê li we kiriye?	Hejmar	Rêje
Bavê min	34	%27,2	Metika min	3	%2,4
Dîya min	22	%17,6	Xaltîka min	3	%2,4
Dê û bavê min	8	%6,4	Bav û apê min	2	%1,6
Bapîrê min	12	%9,6	Nizanim	15	%12
Dapîra min	9	%7,2	Cîranê me	1	%0,8
Apê min	8	%6,4	Vala	7	%5,6
Xalê min	1	%0,8	Bi giştî	125	%100

Li gor bersîvên şagirtan bi rêjeya herî bilind (%27,2) bav nava li zarokên xwe dikin. Li dû bavan bi dorê dê (%17,6), bapîr (%9,6), dapîr (%7,2), bav û dê bi hev re (%6,4) û ap (%6,4) tên. Bi rêjeyên hindik be jî metik, xaltîk, bav û ap bi hev re, xal û cîran jî nava li zarokan dikin. Ger em rêjeyên bav, dê û bav û dê bi hev re li ser hev bihesibînin rêjeya dê û bavan dike ji %51,2. Ji %5,6'ê şagirtan bersîv nedaye vê pirsê.

Me ji şagirtan pirsî ku bi sedema navê xwe dizanin yan na. Li gor bersîvên wan ev encam derkete holê:

Tablo 27: Hun Zanin Ev Nav ji bo Çi li We Bûye? (ATA. O.)

Bersîvên Şagirtan	Hejmar	Rêje	Bersîvên Şagirtan	Hejmar	Rêje
Navê bapîrê min e	11	%8,8	Navekî bi xêr e	4	%3,2
Navê dapîra min e	9	%7,2	Ji ber ku wateya wê xweş e	8	%6,4
Navê ap, xal, xaltîkê	3	%2,4	Wekî din	36	%28,8
Navê metika min e	4	%3,2	Nizanim	32	%25,6
Navê yekî navdar e	9	%7,2	Vala	9	%7,2
			Bi giştî	125	%100

Li gor bersîvê şagirtan ji %8,8'ê wan navê bapîrê xwe; ji %7,2'ê şagirtan navê dapîra xwe sitendîye. Ev rêje ji bo hemî hejmara navê lawan dike ji %16,9 û ji bo keçan jî dike ji %15. Şagirtekî navê apê xwe, yekî navê xalê xwe û yekê jî navê xaltîka xwe sitendîye. Şagirtên ku navê metîka wan li wan bûye 4 heb in. 9 şagirtan gotîye navê kesekî navdar li wan bûye. (Süleyman, İlkey, Baver, Sibel, Ebru, Dîyar, Fatime, Ayşe, Osman) Di bin kategorîya "Navekî bi xêr e" de 4 şagirtan sedemên olî nîşan dane, wek ku navekî xêrê ye, ji Quran'ê girtine, navê pêxemberê me ye, navê pêxemberekî ye. (Kübra, Merve, Muhammed, Yusuf) 8 şagirtan bersîvên wek "Ji ber ku wateya wê xweş e" û nêzîkî wê dane. Ji van bersîvan hinek jê ev in: "Kêfa bavê min jê re hatiye, dîya min ji vî navî hez kiriye, navekî xweş e..." Piranîya van navan bi kurmancî ye (Helin, Dilan, Pelşin, Pelveşin, Baran, Esra, Yeşim, Yonca) Di bin kategorîya "wekî din" de gelek bersîvên guhertî hene. Ji ber wê ji dêvla ku em ji bo her bersîvekê kategorîyekê ava bikin, me ev bersîvên guhertî giş di bin kategorîya "wekî din" de tomar kir. Ji van bersîvan hinek jê bi vî awayî ne: "Ji ber ku ez di meha remezanê de xwedê dame (Ramazan, ji 4 Remezana 3 heba bi vî awayî bersîv daye), ji ber ku ez roja cejnê çêbûme (Bayram), ji ber ku ez şeva Qadîrê jidayikbûme (Kadir), ji ber ku ez di demsala biharê de çêbûme (Nevroz), ez zivtanî çêbûme (Berfin), wesêta bapîrê min bû (Şevin), bavê min di xewna xwe de dîbû (Emine), dîya min di xewna xwe de dîbû (Mehmet) li ser zîyareta Siltan Şêxmûs (Sultan) ji ber ku bi kurdî ye (Helin, Dilan) û hwd. 32 şagirtan gotîye em nizanin navê me li gor çî li me bûye. (Mustafa, Gökhan, Barış, Ramazan...) 9 şagirtan tu bersîv nedaye vê pirsê.

Me ji şagirtan pirsî bê bi wateya navê xwe dizanin yan na:

Tablo 28: Hun bi Wateya Navê xwe Zanin? (ATA. O.)

Bersîvên Şagirtan	Hejmar	Rêje (%)
Erê	74	%59,2
Na	49	%39,2
Vala	2	%1,6
Bi giştî	125	%100

Li gor bersîvê şagirtan ji %59,2'yê şagirtan bi wateya navê xwe dizanin. Ji %39,2'yê şagirtan bi wateya navê xwe nizanin. 2 şagirtan bersîva vê pirsê nedaye. (%1,6)

Me ji şagirtan pirsî bê ji navê xwe hez dikin yan na:

Tablo 29: Hun ji Navê Xwe Hez Dikin? (ATA. O.)

Bersîvên Şagirtan	Hejmar	Rêje (%)
Erê	106	%84,8
Na	18	%14,4
Vala	1	%0,8
Bi giştî	125	%100

Bi rêjeyeke bilind şagirt ji navê xwe hez dikin (%84,8). Ji %14,4'ê şagirtan ji navê xwe hez nakin. Şagirtekî bersîva vê pirsê nedaye. (%0,8)

Me ji şagirtan pirsî ku heger ji navê xwe hez nakin, dixwestin navê wan çî be. Ji 18 heb şagirtên ku ji navê xwe hez nakin 12 heb jê keç û 6 heb jê law in. Li gor hejmara hemî keçan ku 60 heb e, ev 12 heb dike ji %20'ê şagirtên keç ku ji navê xwe hez nakin û dixwazin navekî din li wan bûya. Di nava hemî lawan de ku hejmara wan 65 e, rêjeya yê ji navê xwe hez nakin û navekî din dixwazin dike ji %9,2. Navê van keç û lawan û navên ku dixwazin ev in: Şevin (Aydanur), Dilan (Eda), Pelşin (Yasmin), Rojin (Eda), Rojbin (Berçem), Aygöl (Gülçiçek), Damla (Beyzanur), Fatime (Ece yan jî Eda), Gizem (Ada), Ebru (Elena), Kübra (Ronayi), Sultan (Deniz) Musa (Burak), Bayram (Yaman yan jî Çağatay), Nurettin (Muhammed), Recep (Emre), Süleyman (Emre), Seydoş (Seyit)

Şagirteke keç ji dêvla navê xwe yî kurmancî navekî din kurmancî dixwaze. 4 şagirtên keç ji dêvla navê xwe yî kurmancî navên ji zimanê din dixwazin. Her 6 şagirtên law ku ji navê xwe hez nakin, navê yekî jî ne bi kurmancî ye û navên dixwazin jî ne bi kurmancî ne.

Me ji şagirtan xwest ku navê xwuşk û birayên xwe ji yê mezin dest pê bikin û binivîsin. Bi vî awayî me xwest em agahdar bibin ku di malbata wan de hejmara zarokan çiqas e û rewşa navên kurmançî di nava malbatên wan de çawa ye. Ji bersîvên zarokan tê fêmkirin ku piranîya malbatan xwedî gelek zarok in. Hejmara zarokan tenê di malbata 8 şagirtan de 3 û jê kêmtir e. Ango di malbatên 117 şagirtî de hejmara zarokan tevî wan bi kêmanî 4 û ji 4'an bêtir e. Di malbatên 34 şagirtan de hejmara zarokan 7 û ji 7'an zêdetir e.

Ji nava malbatên 125 zarokan, di 82 malbatan de bi kêmanî navekî bi kurmançî heye. Di hin malbatan de navê zarokan giş bi kurmançî ye: "Sidar, Helin, Serdar, Şilan, Rubar.", "Berivan, Rojbin, Pelveşin, Şevin, Amed." Di hin malbatan de navên kurmançî di piranîyê de ne: "Dilan, Berçem, Mustafa, Fatma, Avşin.", "Berfîn, Havin, Îsa, Nevroz." Di 43 malbatên mayî de navê bi kurmançî tune: "Şeyhmus, Engin, Abdullah, Mazlum.", "Ramazan, Sibel, Sara, Büşra, Esra, Fehmi."

Di anketan de me xwest şagirt navê dê û bavê xwe jî binivîsin. Bi vî awayî me xwest em wek du nifşên cuda nifşên dê û bavan û yê zarokên wan bidin ber hev. Ji vê agahîyê tê fêmkirin ku ji 125 dayikên şagirtan navê 7 (%5,6) heba tenê bi kurmançî ye: "Gülstan (3), Gülçin (2), Besi, Besse." Ji yê mayî navê 98 (%78,4) dayikan bi erebî (Remzîye, Fatime, Ayşe...), navê 13 (%10,4) dayikan têkel (Aygül, Birgül, Songül...); navê 2 (%1,6) dayikan bi tirkî (Yeter, Türkan), navê 2 (%1,6) dayikan bi farisî (Yasemin, Arzu), navê dayikekê (%0,8) bi yewnanî (Fidan) ye. 2 (%1,6) şagirtan navê dîya xwe nenivîsîye.

Di nava nifşê bavan de ji 125 bavî navê kurmançî tune. Tenê di navekî dunav de navê duyemîn bi kurmançî hatîye tespîtîkirin. (Mehmet Şirin). Navê 110 (%88) bavî bi erebî (Mehmet, Ahmet, Mustafa...); navê 5 (%4) bavî bi tirkî (Turan, Yılmaz, Yaşar...); navê 2 bavî bi îbranî (İbrahim, Yusuf); navê 5 (%4) bavî dunavo (Mehmet Şirin, Mehmet Salih, Mehmet Sait...) ye. 3 (%2,4) şagirtan navê bavê xwe nenivîsîye.

Li dû her du dibistanên li navendê, em ê li çar gundên ku me hilbajartibû li rewşa navê mirovan binêrên. Pêşî agahîyên ku me di derheqê taybetmendiyan van gundan de daye hevdû em ê binirxînin, dîv re em ê ji listeya hilbijêran û listeya dibistanên seretayî yê van gundan li navê mirovan binêrin.

II.3. QIZIL Û REWŞA NAVÊ MIROVAN LI QIZILÊ

Lêkolîna me ya li ser Qizilê ji du alîyan pêk tê. Alîyê yekemîn agahîyên sosyolojîk in ku li ser taybetmendîyên gund yên wek dîrok, civak, aborî, kevneşopîyan û hwd. e; alîyê duyemîn li ser awayê lêkirina navê mirovan e. Ji bilî hin agahîyên fermî yên di derbarê cotkarî û ajalvanîya gund de, agahîyên mayî yên hemî cûreyên sosyolojîk me ji 28 şênîyên gund sitend. Ji van 28 şênîyên ku hevpeyvîn bi wan re hatîye kirin 4 heb jê jin in. Ji bilî hevpeyvînên bi van beşdarvanan re, bi awayê çavdêrîyê jî hin agahî hatine berhev kirin. Ji bo agahîyên li ser awayê lêkirina navan me lîsteya hilbijêran yan “Hilbijartinên Herêmî yên 30.04.2014” an û lîsteya şagirtên “Dibistana Seretayî ya Qizilê” wek kereste bikaranîye. Ji bo her sê gundên din jî em ê heman tiştî bikin, ango pêşî em ê li taybetmendiyên wan yên wek dîrok, aborî, sosyolojî û hwd. binêrin, dûv re em ê li rewşa navê mirovan ya li van gundan binêrin.

II.3.1. Cih, Erdnîgarî û Serjimêrîya Qizilê

Qizil wek cih li başûrê rojhilata Dêrikê ango li berîyê dikeve. Ji ber wê ye ku li gund beşên wek tat, gir û zinar tuneye. Tenê çemekî ku ji bakurê gund û bi ava berf û baranan, salên şilî pir be ziftanî û derbuharî diherike heye. Li başûrê gund zevîyên hene li gor bakurê gund di kortê de dimîne. Ev herêm heya nêzîka rîya îpekê (D100) her ku diçe nizm dibe.

Li rojavayê wê gundê “Heboşî”yê, li rojhilatê wê gundê “Xirbê Herîyê”, li bakurê wê gundê “Remok”ê, li başûrê wê gundê “Kendêl” heye. Navbera wê û navenda Dêrikê 27 km ye. Nêzîka 3 km li başûrê wê gundê “Qizila Xerabe” heye. Herçend navê vî gundî Qizila Xerabe be jî anha şên e û mal lê hene.

Qizil, ji alîyê serjimêrîyê ve di nava gundê Dêrikê de, yê herî mezin e. Li gor sazîya TÜİK’ê di sala 2013’an de serjimêrîya Qizilê 2089 e. Çend malbatên ku ji gund derketine hene lê belê ji ber ku ji gundên der û dorê jî hin malbat hatine li vir bi cî bûne, serjimêrîya gund kêm nebûye, zêde bûye.

II.3.2. Dîrok û Binyada Civaka Qizilê

Navekî Qizilê yê din jî “Qizila Şên” e. Bi tirkî navê wê “Boyaklı” ye lê belê ji listeya hilbijêran tê fêmkirin ku navê gund yê bi kurmancî, di karên fermî de jî heya sala 1964’an hatîye bikaranîn. Ji ber ku em di listeya hilbijêran de, di cihê ku jidayikbûna hilbijêran dinivîse herî nêzîk heya sala 1964’an dibînin ku li ber navê hinek hilbijêr wek cihê jidayikbûnê “Kızıl” dinivîse. “Kızıl” (Qizil) bêjeyek bi tirkî ye û wateya wê ya bi kurmancî “sor, sorî, sorîn, sorikî, sorgûnî” ye. Ji ber vê wateyê mirov dikare bêje di navbera vî navî û navê eşîra “Sorkî” de têkilî heye. Ji ber ku Qizil di heman demê de gundê eşîra Sorkî yê herî mezin e, pêkan e ku navê eşîrê bi vî awayî li gund jî bûbe. Lê ji bo çî navê gund ne wek navê eşîrê bi kurmancî “Sorik, Sorikî, Sorkî” ye, beramberîya wê ya bi tirkî ye? Wekî endamên vê eşîrê jî dibêjin, pêşîyên wan ji Paloya Elezîzê hatine, li wir jî gundek bi navê Sorikan heye û navê wê yî bi tirkî îro “İğdeli” ye. Lê ev gund îro li ser navçeya Elezîzê “Kovancılar” e. Ev gund berê li ser Palo bû, piştî ku bi navê Kovancılar gundek hatîye avakirin û bi demê re mezinbûye û bûye navçe, gundê Sorikan jî bi wê ve hatîye girêdan. Wê demê mirov dikare bêje Sorikîyên Dêrikê ji gundê Sorikan rabûye û yan bi hev re yan jî dembidem hatine li der û dora Dêrikê bi cî bûne. Bi vê hatinê re navê eşîra xwe, ango “Sorikî, Sorkî, Sorikan, Sorkan” jî bi xwe re anîne. Û piştî ku hatin, navê gundê wan ê mezin jî bi tirkî hate danîn, wek wate beramberîya navê eşîra xwe lêkirin. Sedema ku vêya bi vî awayî bi me dide fikirandin bêguman pênasa “beg”îyê ye ku ji bo du malbatên Sorikî tê bikaranîn. Mala Beg ya li Qizilê û Mala Sêlim Beg ya li Girê Sor. Pênasa begîyê ji aliyê wateya xwe ya dîrokî ve pênaseke dewlemend e. Ev pênas ji bo rêveberê herêmekê, ji bo kesekî xwedîyê timarê ango xwedîyê zevîyên pir û li gor pergala aborî ya Împaratorîya Osmanî, yê ku ji gundîyên li ser van zevîyan dijîn bacê distîne û li hemberî wê ji împaratorîyê re leşkeran xwedî dike, ji bo kesên dewlemend, ji bo kesên xwedî maqam û mewkî, ji bo kesên alim û navdar û ji bo hin rewşên din dikare were bikaranîn.¹⁴ Pênasa begîyê bi çî sedemê hatibe bikaranîn bila hatibe bikaranîn, ev yek tê vê wateyê ku rolek vê malbatê ya burokratîk û tîkileyeke wê ya sîyasî yan jî rêveberî bi dewleta Osmanî re hebûye. Ji ber vê tîkîlyê jî dibe ku navê gund bi bêjeyek tirkî hatibe danîn.

¹⁴ Bnr. <https://tr.wikipedia.org/wiki/Bey>

Lê tevî ku navê gund yê kevin bi tirkî ye jî, navê wê di serdema Komara Tirkîyê de dîsa bi navekî din yê tirkî re hatîye guhertin û bûye ‘‘Boyaklı’’.

Îhtîmaleke din jî, dibe ji ber ku axa Qizilê û der û dora wê sor e, navê gund bûbe Qizilê. Lê heger weha be jî dîsa ev nav li gor wateya xwe ya tirkî dê hatibe dayin. Lê belê têkilîya di navbera wateya navê eşîrê ‘Sorikî’ û wersiyonên wê û wateya Qizilê de vê îhtîmala dawîyê lawaztir dike.

Li Qizilê wek şûnwarên şaristanîyên kevin hew dêrek li ser pîya ye. Ev avahîya ku gundî jê re dibêjin dêr, bi pîranî bi kevirên reş hatîye çêkirin. Avahî li ser dirêjayê yekpare ye. Dirêjahîya wê li der û dora 20 metrî ye. Bi ser wê ve aniha tu avahîyê din tune. Li ser wê tu lêkolîneke zanistî nehatîye kirin ku ev dêr di kîjan demê de çêbûye, ji kîjan şaristanîyê maye û bi rastî jî dêr e yan avahîyeke din e. Li gor şênîyekî gund, li ser dîwarekî dêrê li alîyê derve wek nivîsekê hebû lê anha ev nivîs naye dîtin, xerabûye. Ev avahî anha di nava hewşa malekê de ye. Derîyê wê yî orjînal xerabûye û xwedîyê malê jê re derîyekî hesinî çêkiriye. Li ser hêleke avahîyê xanîyê malê yê nuh hatîye çêkirin û derîyê wê di hindur hewşa vê malê de ye. Avahî ji hundir ve zexm xuyaye, lê dema ku mirov ji derve lê dinêre, xerca di nava keviran de qels xuyaye. Heger ev avahî bi rastî jî dêr be divê di demên berê de li vira cemeetek ku ola wan Mesîhî be hebe. Şênîyekî li gund li ser vê mijarê ji me re got ‘‘*Berê ev gund yê fila bû.*’’ (K. Qizil, 2014) Lê belê ji vê avahîya ku gundî jê re dibêjin dêr e û pê ve tu hêmayeke vê vegotinê piştrast bike tune.

Ji bilî vê avahîyê me navên ‘‘Tirozî, Hoçim û Curnik’’ jî tomarkiriye ku li van herêmên gund jî wek bermayîyên kevin hebûn, lê anha tiştek li dewsa wan nexuyaye. Li gor gundîyan, kevirê van xirbena hatîye hevdan û ji bo ku çandinî li wan deran were kirin, ev herêm hatine paqijkirin. Di gera me ya li Qizilê de em li hewşê hin malan li şopên van şaristanîyên kevin rast hatin ku ji kevirên reş û ji yên sipî histûn, curn û destar hebûn.¹⁵ Li van herêmên ku li jor navê wan derbas dibe lêkolînên arkeolojîk divê were kirin.

Qizil wek eşîr gundê Sorkî (Sorikî) tê hesêb. Ji bilî Sorkîyan çend malên ji eşîra Metînan û ji gundên der û dorê jî çend mal hatine li vir bi cî bûne. Em li du wariantên

¹⁵ Wêne 4.

çîroka avakirina gund rast hatin. Li gor waryanta yekemîn yên ku gund ava kirine Mala Beg in. Li gor waryanta duyemîn, yên pêşî gund avakirine ji eşîra Sorkî ne lê ne Mala Beg bi xwe ne. Mala Beg jî wekî hemî Sorkîyan ji Palo hatine. Dema vê hatinê ne dîyar e, lê li gor beşdarvanekî ku anha li Stenbolê dijî, dîroka vê hatinê li der dora 300 sal berê ye. (B. Stenbol (tlf), 2014) Ji ber ku merivên wan li Qizilê bûne, xwe li wan girtine, hatine li cem wan bi cî bûne. Birayên ji Palo rabûne çar heb in. Ji wan yek hatîye Qizilê cem Mamûd Beg. Her sê birayê din yek jê çûye alîyê Sûrîya anha, yek çûye Meşkînan'a Mêrdîn, yê din dihere alîyê Ruhayê. Pêşîyê Mala Beg ango vî birayê ku tê Qizilê Keleş Beg e. Mamûd Beg keçek xwe dide Keleş Beg û wî dike zavayê xwe. Donzdeh lawê Keleş Beg çêdibin. Dûv re ev zarokên Keleş Beg xurt dibin û begtîyê ji mala xalanê xwe, ango ji zarokên Mamûd Beg distînin. Mala Mel Hesen jî, ku di demên nêzîk de diherin Ofî û Xirarê dikirin, ji nevîyên Keleş Beg in. Di vî warî de vegotinên endamên Mala Mel Hesen û yên Mala Beg, ligel hin cudayetîyên biçûk nêzîkî hev in.

Ji van her çar birayên ku ji Paloyê hatine û ji Sorkîyên ku berê hatine, li Dêrikê çend gundên din jî çêbûne. Li Dêrikê wek eşîr gundên Sorkî yên din ev in: Ofî, Maşmaşk, Erbeta, Kufîrlê, Girêsor, Remok, Kendal, Germika Jêr, Qindefî û Xirar. Ji van gundan hinek jê her çend ji alîyê xwedîyê ve ango ji aliyê mulkîyeta piraniya erdan ve gundên malbatên Sorkî bin jî ji alîyê şênîyên gund ve piranî ji eşîrên cuda ne. Li hin gundan jî malbatên Sorkî û malbatên ji eşîrên cuda bi hev re dijîn. Wek mînak piranîya Xirarê yê mala Mel Hesen e, lê tu kes ji mala Mel Hesen li vî gundî wek şênîyê gund najî, ev malbat li Ofîyê dijîn. Li Qizilê jî hin malbatên zevîyên wan gelek in û li gund najîn û ne Sorkî ne hene. Malbatên di vî sedsalê dawîn de ji derve hatine li Qizilê bi cî bûne, her çend ne Sorkî bin jî bi piranî êdî xwe Sorkî dihesibînin.

Li Qizilê çend heb malbatên ku me navê wan tomar kir ev in: Mala Beg, Mala Kose, Mala Elîyê Heso, Mala Kûro, Mala Hermûş, Malên Metînî... Di navbera van malbatan de tu dijminatî tune, ji bilî eşîrtîyê di navbera malbatan de bi dan û sitendina jinan mervantî heye. Di navbera hemî gundîyan de alîkarî heye. Bi piranî di şînan de alîkarîya hevdû dikin. Di gund de ji ber sedemekê nakokîyek çêbibe cara yekemîn muxtarê gund mudaxele dike. Bi piranî muxtar wekî dadgerekî pirsgirêkên di nava gundîyan de çareser dike. Heger muxtar nikaribe çareser bike, wê çaxê mezinên

malbatan li hev dicivin û pirsgirêkê çareser dikin. Lê peyva muxtar bi piranî ji alîyê gundîyan ve tê pejirandin.

II.3.3. Aborîya Qizilê

Li gor agahîyên Gerînendeya Xurek, Çandinî û Ajalvanîyê ya Qeymeqamtîya Dêrikê (Derik Kaymakamlığı Gıda Tarım ve Hayvancılık İlçe Müdürlüğü) li Qizilê di sala 2013'an de zevîyên ku hatine çandin û berhemên wan bi vî awayî ne: 34 hezar û 7 donim û 229 metre zevî bûye genim. 28 hezar û 932 donim û 557 metre zevî wek berhemê duyemîn bûye garis. 656 donim û 648 metre zevî wek berhemê yekemîn bûye pembo. 19 donim û 96 metre zevî xerzikê tirî ye. 44 donim û 643 metre zevî jî darên zeytûna ye. Ji bo berhemê yekemîn û duyemîn bi giştî 58 hezar û 660 donim û 173 metre zevî ji bo hilberînên cotkarîyê hatîye bikaranîn. Hejmara cotkarên van zevîyan bi giştî 433 ye. Lê li gor agahîyên ku me ji gund sitende her çend bi awayê fermî hejmara cotkaran ewqas be jî, ya rast zêdetir e. Ji ber ku her çend li gor qeydên gerînendeyê parçeyek zevî li ser navê cotkarekî hatibe tomarkirin jî di rastîya xwe de dibe ev zevî di navbera çend cotkaran de hatibe dabeşkirin û çandin.

Zevîyên avî giş bi kolandina bîra bûne avî û ji vê ava bin erdê pê ve tu jêderên avê tune. Ev zevîyên avî wek berhemê duyemîn dibin garis. Heger em ji beşê zevîyên genim beşê zevîyên garis derxînin bi awayeke nêzikayî em ê zevîyên ku naye avdan bibînin. Ew jî dike nêzîka 5 hezar donim zevî.

Li gor qeydên gerînendeya çandinîyê li Qizilê 22 dewar û 1573 mîh û 138 bizin tê xwedîkirin. Lê li gor agahîyên ku me ji şênîyên gund sitende, hejmara dewara zêdetir e û hema bêje her malek li gund ji bo pêdivîyên xwe çêlekekê xwedî dikin. Bi vî awayî pêdivîyên xwe yî bi şîr, mast û penîr bidest dixin. Lê ji bilî vê armancê, yên ji bo aborîyê ajalvanîyê dikin û pez xwedî dikin jî hene. Li Qizilê 10-15 mal ji bo vê yekê pez xwedî dikin. Ji ber ku hemî zevîyên gund bi qîmet in û ji bo çandinîyê guncan in, ajalvan piştî ku genim tînin çînin, pezên xwe li pîrêzên genim diçêrin. Ji ber ku zevîyên gund gelek in, di van deman de ji gundên der û dorê jî ajalvan tînin pez li vir diçêrin.

Wekî ji van daneyan jî tê fêmkirin debara gund bi awayeke mezin li ser çandinîyê ye. Di dora duyemîn de ajalvanî tê. Bi qasî 15-20 malên ku qet zevîyên wan tune, wek avdankar di zevîyên garis, pembo û genim de dixebitin. Ji van malên ku zevîyê wan tune hinek jê pez xwedî dikin. Malek ku bi ajalvanîyê ve dadikeve herî zêde xwedî 150 mîh û bizin e. Hinek malên ku zevîyên wan hindik in yan jî qet tune, wek karkerên demsalî diçin rojavayê Tirkîye, li bajarên wek Bursa, Sakarya, Manisa karên fîndeq, bacan û xîyara dikin. Hindik kes jî hene ji sazîyên sîgortayê malnişinî bûne û mehanîyên xwe distînin, hejmara van kesan ne dîyar e, li gor texmîna beşdarvanekî ev hejmar li der dora 20'î ye. Ji bilî cotkarî û ajalvanîyê bi qasî 10 malî jî xwedî tir û kamyon in û karê guhastinê dikin. Bi qasî 15-20 kesî jî li ser kamyon û tiran wek ajovan bi mehane dixebitin. Ev kamyon û tir ji bilî di nava bajarên Tirkîyê de bi piranî di navbera Tirkîyê û Iraqê de dixebitin.

Di gund de sazîyeke ku cotkaran birêve bibe, wek kooperetîfekê yan jî komeleyekê tune. Ji ber wê her cotkarek berhemên xwe bi serê xwe difroşe tucaran. Di hin salan de berhemên wan bi erzanî ji destê wan derdikeve. Cotkar bi piranî ji mesrefan digazinin. Bi piranî gazina wan ji buhabûna karûbayê, mazotê, toxim, gubre û dermanên çandinîyê ye. Ji alîyê teknîkî ve jî qelsbûna karûbayê û arizeyên ku bi rojan dewam dikin û çareser nabin, wan dixin astengîyê. Cotkar, alîkarîyên zanyarî û teknîkî ji endezyaran nastînin. Bi piranî cotkar di vî warî de bi hev dişewirin û li gor zanebûna xwe tevdigerin.

II.3.4. Jîyan li Qizilê

Xanîyên gund bi piranî yên nuh in. Lê di nava gund de hin xanîyên kevin jî bala mirov dikşîne. Xanîyên kevin ji kevir û axa zer e. Li ser wan dîrek, beşt û mircaq hene. Dîwarê wan yê derve û yên hundir bi axa zer hatîye seyandin. Dîwarên derve bi piranî bê boyax in, yên hundir yan bi kilsê hatîye sipîkirin yan jî bi kilsê re rengên din hatine boyaxkirin. Xanîyên nuh bi kelpîçên çîmento yan jî bi tuxla hatine lêkirin. Ev xanî ji alîyê hundir û derve ve bi çîmento hatine sewaxkirin û boyaxkirin. Hin xanîyên nuh duqato ne. Piranîyê xanîyên nuh ji du ode û salonekê pêk tên, yên aborîya wan baş e

xanîyên mezintir û yan jî du qato çêkirine û di bin xanîyên xwe de ji bo berhem û alavên çandinîyê dikan çêkirine.

Di nava gund de şênayî kêm e. Wek baxçe hew baxçeyek zeytûna li ber çavê mirov dikeve. Ji bilî wê di piranîya hewşên malan de darên zeytûn, tû û dêlî yan jî mêwên xerzika xuya dibe. Ji alîyê cotkarîyê ve baxçevantî tuneye. Wek ceribandin tenê cotkarekî baxçeyek zeytûna danîye. Lê agahîyên ku me ji gerînendeya cotkarîyê ya navçê girte, axa gund û rewşa avûhewa wê ji bo baxçevantîyê jî guncan e.

Li gund ava vexwarinê ji qûleya avê tê dabînkirin. Ji vê kûleyê av dihere her malê. Lê herçend ava vexwarinê bi vî awayî hatibe dabînkirin jî binesazîya kanalîzasyonê ya gund tuneye. Her malekê ji bo vê yekê di hewşa mala xwe de çalek foseptîkê kolaye û ser wê girtîye. Pêdivîya kanalîzasyonê gelekî mezin e. Rêya ku ji Îpekê tê nava gund asphalt e lê ev asphalt di nava gund de xelas dibe. Rêkên di nava kuçeyên gund de derbas dibin ax in. Ev rêkên di nava gund de diherin, ji ber ku binesazîya kanalîzasyonê ya gund tuneye bi avên ku ji malan diherike dibin herî.

Di gund de dibistana seretayî û ya navîn û navendek tenduristîyê heye. 5 dikanên bakkalîyê vekirî ne. Li gund firne tuneye, jin li tenûran nêr lêdixin. Ji bilî nanê tenûrê nanê sêlê jî li mala li ser kuçikan tîr çêkirin. Heger nexweşîyeke giran hebe gundî bi piranî diherin Qoserê, Mêrdîn, Dîyarbekir bajarên wekî din yê rojavayê Tirkîyê. Danûsitendina gundîyan, ji ber ku bazara wê mezintir e, derfetê kirîn û firotinê guncantir e, bi piranî li ser Qoserê ye. Lê ji ber ku gund bi Dêrikê ve girêdayî ye, ji bo karên fermî gundî diherin Dêrikê. Navbera Qizilê û Qoserê li dora 25 km ye. Di gund de asta xwendinê li gor hejmara serjimêrîyê kêm e. Ji gund heya nuha 2 heb dermançêker, parêzerek, 2 endezyarê çandinîyê, 2 hîndekarên zankoyê derketîye. Ji bilî vana nêzîkî 20 şagirtên ku anha di zankoyên cûrbecûr de dixwînin hene. Di nava vana de şagirtên keç jî hene.

Biroj xortên ku karê wan tunebin bi gogê dileyizin. Ji bo ku lê bi gogê bilîzin xortan ji xwe re wek seheyek gogê avakirine. Mêrên ku temenê wan hebekî mezin jî ji bo ku dema xwe derbaskin carinan bi şaqûla dileyizin. Jin bi piranî karê malê dikin. heger li malê ajalek wek çêlek yan pez tê xwedîkirin, bi piranî jin li wan dinêrin. Jin xwarinê çêdikin, li tenûrê yan jî li ser sêlê nan dipêjin. Di karên zevîyan de jî jin

alîkarîya mêran dikin. Li her malê televizyon heye. Bikaranîna telefonên mobîl jî gelekî bela ye. hema bêje her kesek jin ya mêr xwedî telefonek mobîl e. Li gelek malên gund înternet heye.

II.3.5. Çand û Kevneşopî li Qizilê

Li gund ji sedî sed bi kurmancî tê peyvandin. Piranîya gundîya bi tirkî jî zanin lê zimanê têkilîyê bi kurmancî ye. Di peyva gundîyan de em li tu taybetmendîyên devokî rast nehatin ku ji navenda Dêrikê cude be. Li gund wek berhemên wêjeya devkî ya kurmancî di demên berê de çîrokên ‘‘Teyarê Qereçolî, Sîyamedê Silîvî, Rustemê Zal’’ dihate gotin. Lê anha çîrokbêjî kême e. Li gund ‘‘Odeya Gund’’ heye û bi şevê ev ode vekirî ye, mêrên gund lê vedihewin. Li odê li gel mijarên aktuel, behsa çandinîyê, aborîyê û hwd. tê kirin.

Di gund de mizgeftek heye. Giştî gundîyan misilman in û piranîya gundîyan li ser mezhebê Şafî nin. Lê li gund Henêfî jî hene. Wek mînak malbata Beg Henêfî ne. Sedema vê yekê dibe ku ji ber ku koka wan ji Palo be. Li derveyî Qizilê, li nava Dêrikê û gundên din yê Sorkîyan jî me dît ku gelek malbatên Sorkî li ser mezhebê Henêfî ne. Bi awayeke hindik be jî hin malbatên Sorkî ku gotin em Şafî ne hene. Xuyaye ev malbatên Şafî, bi bandora der û dora xwe bûne Şafî.

Malbatên gund bi piranî malbatên fireh in. Keç û xortên ku nuh dizewicin bi piranî tevî malê nin, lê malbatên aborîya wan baş be malek cihê ji bûk û zavayên nuh re çêdikin. Zewaca keç û xorta bi piranî bi dilê wan e. Keç û xort hevdû dibînin, hevdû diecibînin û dûv re malbata lêwik diherin keçikê dixwazin. Di demên berê de keç û xortan hevdû nedidîtin. Lê anha rewş guherîye. Bi qasî ku di navbera mirovên malbat û eşîrê de zewac çêdibe, ewqas jî ji derveyî malbatê û ji derveyî gund jî çêdibe. Malbata keçikê bi awayeke sembolîk qelen ji malbata zavê distîne. Qelenê ku tê sitandin dîsa ji bo bûkê tê xerc kirin. Mîqdara qelen li gor malan tê guhertin lê di navbera 2000 û 10.000 lîreyê tirkî de ye. Gelek malbat jî qet qelen nastînin. Di demên berê de berdêlî pir dihate kirin lê anha pir kême bûye, di van deh panzdeh salên dawî de du sê heb zewacê bi berdêlî ya çêbûye ya nebûye.

Dîlanên gund berê li gund çêdibûn, lê di van salên dawî de bi piranî li Qoserê li salonan çêdibin. Hindik be jî li gund dîlan çêdibin. Dîlanên gund di roja îne de piştî nîvro dest pê dike û heya roja bazarê piştî nîvro didome. Ji bo dîlanan sazband tîn, bi sazê elektro dîlan tîn çêkirin. Berê def û zûrne bûn. Lîstikên tîn lîstin bi piranî *“di cîdi”* û *“delîlo”* ye. Di van salên dawî de keç û xort hin lîstikên guhertî jî dilîzin.

Dema ku zarokê nû yê malekê tê dinyê, xizmên malbatê bi piranî jî jin, diherin serdana wê malê. Wek xelat yan zêrek, yan cil û berg û yan jî wek betanîyekê dibin ji zarokê nû çêbûyî re. Malbata ku zarokê wan çêbûye ji bo bixêrhatina zarokê xwe mewlûdekê datînin û bang der û dora xwe dikin, ji wan re xwarinê çêdikin û wan diezimînin. Heger zarokê wan yê yekemîn be û demek dirêj zarokê malbatê çênebûbe, yan jî zarokên wan çêbûbin lê miribin, ji bo zarokê xwe heftekê datînin. Herçend navê wê heftek be jî dibe pîrozbahîya heftekê here mehekê jî. Di şahîya heftekan de qurban tîn şerjêkirin, ji bo mêvanan xwarin tê çêkirin, mewlûd tê xwendin.

Navê zarok, dê û bav yan jî bapîr, dapîr lê dikin. Carinan ap, xal, metik, xaltîk yan jî xizmekî din yê malbatê jî nav dikare li zarok ke. Her çend gelek kes dikare nav li zarok kin jî, biryara dawî ya dê û bav e. Bi piranî navên ku ew kesên din dibêjin, ji bo dê û bav wek pêşniyar in. Dema ku biryara nav tê dayin û şûn de ya melayê gund yan jî kesekî zane, di guhê zarok de azanê dixwîne û piştî sê cara navê zarok di guhê zarok de dibêje. Di hîlbijartina navan de tiştên girîng ev in ku navekî bi xêr be, navekî wateya wê xweş be, navekî ku gotina wê sivik û xweş be. Dê û bavên ku navê dê û bavên xwe yan jî xizmekî xwe yî bi qîmet li zarokên xwe dikin gelek in. Bi vî awayî ji alîyekî ve rûmetê didin mezinên xwe û ji alîyê din ve jî hevî dikin ku zarokên wan jî wek xwedîyên vî navî baş û serkeftî bin.

Dema ku li gund mirovek jîyana xwe wenda bike, mirî li gor kevneşopîyên olî tê veşartin. Berî nuha bi 15-20 salan, li mal şîr dihate danîn lê anha konê şîrê tê vegirtin. Ev kon bi kêmanî sê rojan vekirî dimîne. Şîra hin kesan dibe deh rojan jî dewam bike, ev yek li gor firebûna der û dora malbatê tê guhertin. Ji gund û ji dervî gund mirovên xizm, dost û heval tîn konê şîrê. Li şîrê mela heye, her ji bo komeke nûh tê li ser gîyanê mirî sûretê Fatihê tê xwendin, sohbetên dînî tîn kirin. Carinan li ser mijarên rojevê jî tê peyivandin. Dema xwarina nîvro de ji bo heçê kesên li kon xwarin tê danîn. Di demên berê de her kesên ku dihatin şîrê bi xwe re ji bo alîkarîyê şeker, rûn, pez, çay

û birinc dianîn, lê ev nêzîka bîst salî ye êdî ev kevneşopî rabûye. Lê her çiqas ev kevneşopî rabûbe jî xizmên malbata şîne alîkarîyê bi malbatê re dîkin. Ne tenê xizmên wan, her şênîyên gund yên ku rewşa wan a aborî baş e, bi awayekî alîkarîyê bi malbata xwedîyê şîne re dîkin.

Cil û bergên gundîya bi piranî cil û bergên modern in. Piranîya mêran pantorên qumaş, gomlek û çakêt li xwe dîkin, qondera dixin pê. Hin mêrên temenê wan mezin şalwer li xwe dîkin. Yê şalwer li xwe dîkin, bi ser de komlek li xwe dîkin, hinek jî wan şewqe didin serê xwe. Dîsa bi hindikayî be jî hin mêrên bi temen jî kirasê sipî li xwe dîkin û çefî didin serê xwe. Xort jî sedî sed cil û bergên modern li xwe dîkin. Jinên gund yên bi temenê xwe mezin in, li dervî malê kirasên dirêj li xwe dîkin. Bi ser kiras de kitan û hubrî girêdidin. Yê temenê wan biçûktir, ango yê bûk, bi piranî etekan li xwe dîkin û ji bo serê xwe jî xavik, yazme, şarpe yan jî şarpeyên bêrîvanî bikartînin. Keçên cil û bergên modern, wek pantor û tîşort yan gomlek li xwe dîkin jî henin.

Cejnên olî, cejna Remezanê û cejna Qurbanê bi awayeke xurt tî pîrozkirin. Herkes cil û bergên xwe yî nuh û paqij li xwe dike. Piranîya mêrên gund pêşî diherin mizgeftê, nimêja cejnê dîkin. Piştî ku ji mizgeftê bela dibin, pêşî diçin ser mezel. Dûvre heger di gund de di demên nêzîk de mirî hebin diherin cejna malbata van mirîyan. Dûvre heger di gund de nexweş hebin diherin cejna wan nexweşan. Ê piştî herkes dihere malên merivên xwe. Dûvre herkes vedigere malên xwe û cejna endamên mala xwe pîroz dîkin, bi hev re navroja xwe dixwun. Ji bilî van herdu cejnên olî cejna din ya tê pîrozkirin cejna Newrozê ye. Lê pîrozkirina vê cejnê ne wek yê din e. Di van salên dawî de ji ber ku qedexebûn ji ser Newrozê rabûye, li meydana gund agir tê dadan û gundî li dora gund govendê digerin. Hin gundî jî ji bo pîrozkirina newrozê diherin beşdarî şahîya newroza Dêrikê, Qoserê yan jî ya Dîyerbekir dibin.

II.3.6. Rewşa Navê Mirovan li Qizilê

Ji lêkolîna me ya li ser navê şênîyên gund ku me lîsteya hîlbijartinê û lîsteya şagirtên dibistana seretayî ya gund wek kereste bikaranîye ev agahî bidest ketin. Pêşî em ê li rewşa navê hîlbijêran binêrin:

Tablo 30: Hejmar û Rêjeya Navan (li Qizilê)

	Hejmara Hilbijêran	Hejmara Navê Hilbijêran	Rêje
Jin	582	237	0,41
Mêr	540	289	0,54
Bi giştî	1122	526	0,47

Di lîsteya hilbijêran de bi giştî 1122 kes heye. Ji wan 582 kes jin; 540 kes mêr in. Ji bo 582 jinî 237 nav hatîye bikaranîn. Ango ji bo her jinekê wek rêje 0,41 nav hatîye bikaranîn. Ji bo 540 mêrî 289 nav hatîye bikaranîn. Ango ji bo her mêrekî 0,54 nav hatîye bikaranîn. Li gor vê daneyê navên ku ji bo mêra hatîye bikaranîn bêtir in. Bi tevayî ji bo hilbêjêran rêjeya navên ku hatîye bikaranîn 0,47 e.

Tablo 31: Navê Jinan, yê Herî Kêm 4 Caran Hatîye Bikaranîn (li Qizilê)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi Giştî
Fatma	24	24
Şemsa (Şemsi, Şemsi, Şemse)	16	16
Gazal (Gazali, Ğazal), Medine	14	28
Azize, Halime, Sultan	12	36
Ayşe, Sadîye, Cemile	11	33
Hülya, Türkîye, Şükran, Zerga,	8	32
Celile, Gülistan , Zeynep	7	21
Emine, Hedîye, Leyla, Nura, Nurîye, Remzîye, Türkan, Yıldız, Zehra,	6	54
Mekkîye, Selma	5	10
Boze (Bozi, Boza), Gemra, Zero	4	12
31		266

31 navê jinan yê herî pir hatîye bikaranîn wekî tabloya 31. e. Ev 31 nav ji bo 266 jinî hatîye bikaranîn. Bi giştî hejmara jinan 582 ye, ango ev 31 navên herî pir hatîye bikaranîn, navê ji %45,7'ê jinan e. Di nava jinan de navê herî pir hatîye bikaranîn "Fatma" ye û ev nav li 24 jinan e. Li dû wê, navên wek Şemsa, Gazal, Medine û yê din tèn. Navên "Gazal, Şemsa û Boze" her yek bi sê wersiyona derdikeve hemberî me. Wersiyonên "Gazal"ê, wek Gazali û Ğazal; wersiyonên "Şemsa" wek "Şemsi, Şemse" û wersiyonên "Boze" jî wek "Bozi, Boza" ye. Sedemên vê yekê nakokîya di navbera bilêvkirina kurmancî û tirkî de ye. Bi kurmancî bilêvkirina van navan wek "Xezalê-Xezal"; "Bozê-Boza"; "Şemsê, Şemsa" ye. Ji ber ku di tirkî de dengê "ê" yê tune ye û nivîsandina tîpa "ê" ya kurmancî jî qedexeya ev her sê nav her yek bi sê wersiyona hatîye nivîsîn. Me jî ev her sê wersiyon wek navekî hesabandin û li gor wê tomar kir.

Di nava vî 31 navê herî pir hatîye bikaranîn de tenê 3 navê bi kurmancî heye: "Gülistan, Boze, Zero" Navên mayî jê 24 heb bi erebî: "Fatma, Şemsa, Gazal, Gemra, Zerga..."; jê 3 heb bi tirkî: "Türkîye, Türkan, Yıldız" e. Di erebî de navê "Gemra" ji koka "qemer"ê hatîye û wek nav tê wateya "wek heyvê"; "Zerga" jî di wateya "şîn" de ye.

Tablo 32: Navê Mêran, yên Herî Kêm 4 Caran Hatîye Bikaranîn (li Qizilê)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi Giştî
Mehmet	29	29
İbrahim	15	15
Ramazan, Mehmet Ali	13	26
Abdulkadir	12	12
Mahmut, Şeyhmus	11	22
Ahmet, Ali	9	18
Süleyman, Mehmet Şerif	8	16
Abdullah, Necmettin	7	14
Davut, Hasan, Murat, Mustafâ, Osman, Ömer	6	36
Abdurrahman, Engin, Hatip, Hayrettin,	5	20
Eyüp, Erdal, Fadıl, İdris, İsmail, Mehmet Emin, Mehmet Nur, Mehmet Sıddık	4	32
31		240

31 navê mêran yên herî pir hatîye bikaranîn wekî tabloya 32. e. Ev 31 nav ji bo 240 kesî hatîye bikaranîn. Hejmara mêran bi giştî 540 e. Ango ev 31 navên di tabloya jor de ji bo ji %44,4'ê mêran hatîye bikaranîn. Navê herî pir hatîye bikaranîn ‘‘Mehmet’’ e û ev nav li 29 kesî ye. Li dû vî navî, navên ‘‘İbrahim, Ramazan, Mehmet Ali’’ tîn.

Ji bilî navên herî kêm 4 caran hatîye bikaranîn, navên 3 caran û 2 caran hatîye bikaranîn jî heye. Lê me xwest em navê herî pir hatîye bikaranîn bi hejmarekê bi sînor bikin, ji ber ku di nava navê mêran de hejmara yên herî kêm 4 caran hatîye bikaranîn 8 bûn, ev hejmar ji bo mêra jî wekî navê jinan bi awayeke tesadufî bû 31.

Di nava navê mêran de jî ji bo navên wek Mehmet, Mahmut, Necmettin, Hayrettin, Eyüp wersiyonên guhertî hene: ‘‘Mehmet-Mehmed; Mahmut-Mahmud; Necmettin-Necmeddin-Necmedin-Necmetin-Nejmedin; Hayrettin-Hayreddin; Eyüp-

Eyyüp-Eyup’’ Ji van navan wersîyona herî pir hatîye bikaranîn kîjan be, di tabloyê de ew hatîye nivîsandin. Wek mînak ji wersiyonên ‘‘Mehmet-Mehmed’’ yê herî pir hatîye bikaranîn ‘‘Mehmet’’ e.

Di nava vî 31 navê mêran yên herî kêr 4 caran hatîye bikaranîn de navê bi kurmancî tune. Ji van navan 25 heb bi erebî: ‘‘Mehmet, Ramazan, Mehmet Ali, Abdulkadir, Mahmut, Şeyhmus, Ahmet, Ali, Mehmet Şerif, Abdullah, Necmettin, Hasan, Murat, Mustafa, Osman, Ömer, Abdurrahman, Hatip, Hayrettin, Eyüp, Fadıl, İdris, Mehmet Emin, Mehmet Nur, Mehmet Sıddık’’ jê 4 heb bi îbranî: ‘‘İbrahim, Süleyman, Davut, İsmail’’ û 2 hebê mayî jî bi tirkî ne: ‘‘Engin, Erdal’’ Di nava van navan de 5 nav dunavo ne û di her pêncan de jî navê yekemîn Mehmet e: ‘‘Mehmet Ali, Mehmet Şerif, Mehmet Emin, Mehmet Nur, Mehmet Sıddık.’’

Tablo 33: Hejmar û Rêjeya Navan li Gor Zimanan (li Qizilê)

Ziman	Navê Jinan	Navê Mêran	Bi Giştî	Rêje(%)
Erebî	408	393	801	%71,4
Kurmancî	60	15	75	%6,7
Tirkî	45	24	69	%6,2
Îbranî	1	27	28	%2,5
Farisî	22	5	27	%2,4
Moxolî	3	1	4	%0,4
Yewnanî	4	1	5	%0,4
Îtalyanî	1	-	1	%0,09
Navên Nedîyar	20	4	24	%2,1
Navên Têkel	14	8	22	%2
Dunav	4	62	66	%5,9
Bi giştî	582	540	1122	%100,1

Ji 1122 şênîyên gund ku navê wan di lîsteya hîlbijartinê de ye jê navê 801 kesî bi zimanê erebî ye û wek rêje dike ji %71,4'ê navê hîlbijêran. Ji vî 801 kesî jê 408 kes mêt, 393 kes jî jin in. Li dû erebî bi dorê zimanê kurmancî, tirkî, îbranî û farisî tê. Navê 75 (%6,7) kesî bi kurmancî; navê 69 (%6,2) kesî bi tirkî; navê 28 (%2,5) kesî bi îbranî; navê 27 (%2,4) kesî bi farisî ye. Ji bilî van navan, navê 4 kesî bi moxolî (Meral, Ceylan, Cengiz); navê 5 (%0,5) kesî bi yewnanî (Menderes, Filiz, Fidan); û navê kesekê (%0,1) jî bi îtalyanî (Fulya) ye. Koka navê 5 kesan nehatîye tespîtkirin. Hejmara van navan jî bi giştî 5 e, 3 nav yê mêran e, 2 nav yê jinan e : ‘‘Dahin, Alan, Maaç, Momi, Ferso’’ ji van navan Dahin dibe ji Dahî’ya erebî, ya ku di wateya ‘‘pir zîrek, pir jêhatî’’ de be. Alan, wek navê eşîran li Dêrsim, Wan û hin derên din heye. Di tirkî de wek lêker tê wateya ‘‘yê ku distîne’’ û wek nav jî tê wateya ‘‘qad’’ê. Mom di ermenîkî de tê wateya ‘‘dê, yadê’’. Ji ber ku di tirkî de wek deng û tîp ‘‘ê’’ tune, ev nav her çend wek ‘‘Momi’’ were nivîsandin jî di nav gel de wek ‘‘Momê’’ tê bikaranîn. Heger em dengê ‘‘ê’’yê wek dengê bangê bipejirînin pêkan e ev nav ji koka bêjeya ermenîkî ‘‘mom’’ê hatibe. Li herêma Dêrikê bi taybetî jî li navenda wê em lê rast hatin ku ji delalî, ango ji hezkirinê ji hin kesên ku navê wan ‘‘Evdirehman’’ re malbata wan gotîye ‘‘Emança, Emaçê’’, ji Mistefa re gotine ‘‘Miçê’’ ji ‘‘Mûsa’’ re gotine ‘‘Emûska’’. Ev mînak bi me didin fikirandin ku pêkan e ji navên wek Mehemed yan jî Mamûd re, bi heman armancê gotibinn ‘‘Meeç, Meaç, Maaç’’. Li Dêrikê du malbatên cuda yên bi vî navî heye, ‘‘Mala Maaçê’’. Li Qizilê navê 22 kesî têkel e. Hejmara navên têkel bi giştî 19 ye:

Tablo 34: Navên Têkel (li Qizilê)

Ziman	Nav
Tirkî-Kurmancî	Özcan, Birgül, Songül, Gökhan, Ayhan, Ercan, Aysin Perivan, Erhan,
Kurmancî-Erebî	Serhat (2)
Erebî-Kurmancî	Nurhan (2), Nurcan, Hüsnügül, Seyithan, Bedirhan
Tirkî-Farisî	Ayfer
Tirkî-Firansîzî	Aytül
Erebi-Farisî	Neslişah (2), Nurten

Di nava navên têkel de 9 heb bi tirkî-kurmancî, 5 heb bi erebî-kurmancî ye. 2 nav bi erebî-farisî; navek bi kurmancî-erebî; navek bi tirkî-farisî, navek bi tirkî-fransîzî ye.

Tablo 35: Dunav (li Qizilê)

Ziman	Nav	Jin (J); Mêr (M)
Erebî-Farisî	Mehmet Ejder, Mehmet Şah,	M
Erebî-Tirkî	Yunus Emre, Semra Sibel	M-J
Erebî-Erebî	Mehmet Ali (13), Mehmet Şerif (8), Mehmet Emin (4), Mehmet Nur (4), Mehmet Sıddık (4), Mehmet Veysi, Mehmet Mustafa, Mehmet Nurettin, Mehmet Nezir, Mehmet Salih, Mehmet Halis, Mehmet Baki, Mehmet Faruk, Mehmet Sultan, Mehmet Şükrü, Mehmet Tahir, Ahmet Ramazan, Leyla Esra, Seyyit Hamza	M-J
Erebî-Îbranî	Mehmet İsa (3), Mehmet Süleyman,	M
Têkel-Kurmancî	Mehmet Şerin, Aysin Perivan	M-J

Di lîsteya hîlbijartinê de di nava 1122 kesên de navê 66 hîlbijêran dunavo ye. Ji bo van kesên bi giştî navên hatîye bikaranîn 28 e. Ji van navan yek wek nijad kesê elmanî ye ku li Qizilê bi cî bûye. Navê jinan bi erebî-erebî, erebî-tirkî û têkel-kurmancî ye. Ji 24 navê mêra 18 heb bi erebî-erebî ye, bi giştî navê 47 mêrî ye. Di nava van navan de yê herî pir hatîye bikaranîn Mehmet Ali (13) ye. Ji 24 navê mêra yê dunavo, ji bo 21 navî, navê yekemîn "Mehmet" e. Li gor tabloya 33. navê 801 hîlbijêrî wek navên xwerû bi erebî ye û dike ji %71,4'ê navan. Heger em van navên 47 hîlbijêrên ku dunavo ne û navê wan bi erebî-erebî ye bavîjin ser vê hejmarê dike ku navê 848 hîlbijêrî li qizilê bi erebî ye. Ev hejmar wek rêje dike ji %75,6'ê navan.

Tablo 36: Hejmar û Rêjeya Navên Kurmancî, li Gor Temenê Hilbijêran (li Qizilê)

Sala Jidayikbûnê	Hejmara Navên Kurmancî	Mînakên Navan	Rêje(%)
... – 1966	18	Boze, Besi, Gulistan,	%24
1967 – 1972	2	Besna, Güli	%2,7
1973 – 1978	6	Bahar, Gül, Zero	%8
1979 – 1984	7	Gulistan, Ferat, Ruşen	%9,3
1985 – 1990	9	Gülçin, Gulistan, Serkan,	%12
1991 – 1996	33	Berçem, Gulistan, Zero, Ğebat, Velat, Evindar, Mizgin, Nevroz, Bese, Medya, Rezan, Ruken	%44
Bi Giştî	75		%100

Hilbijêra ku navê wê bi kurmancî (Zero) û bi temenê xwe herî mezin e, di sala 1934'an de ji dayik bûye. Ji vê salê heya ku digê 1966'an ji jin û mêra bi giştî navê 18 kesî bi kurmancî ye. Di tabloya 36'an de ji her 5 salan carekê hejmara hilbijêrên ku navê wan bi kurmancî ye xuyaye. Ji sala 1967'an heya sala 1991'ê di her demên pêncsale de hejmara kesên ku navê wan bi kurmancî ye nêzîkî hev e. Di pêncsalên di navbera 1991 û 1996'an de bi awayeke eşkere hejmara kesên ku navê wan bi kurmancî ye zêde dibe. Heger em navên kurmancî wek 'navên klasîk yên kurmancî' û 'navên modern yên kurmancî' li ser du beşan dabeş bikin em ê bibînin ku navên kurmancî yên berî salên 1991'ê bi piranî navên klasîk yên kurmancî ne. Wek 'Bozê, Besê, Gulê, Gulistan, Zero û hwd.' Navên kurmancî yên modern ji sala 1991'ê û şûn de derdikevin hemberî me. Wek 'Berçem, Welat, Xebat, Newroz, Evindar, Rêzan, Rûken' Ji sala 1991'ê û vir de ji bilî navên kurmancî yên modern em navên kurmancî yên klasîk yên wek 'Zero, Bese, Gulistan' jî dibînin. Ev nav li gel hezkirina ji van navan, dibe navê dapîr û bapîran be ku li nîşên nuh hatibin kirin.

Ji bo ku em guhertina meyla navlêkirina mirovan çêtir bibînin me pêwist dît ku em ji hin çavkanîyên din li rewşa navê nîşên nuh binêrin. Ji bo vê yekê jî me li

lîsteya şagirtên dibistana seretayî ya Qizilê, ya ku me ji Gerfîndeya Perwerdeya Netewî ya Dêrikê sitendibû nêrî. Di lîsteya dibistanê de navê 186 şagirtî tomarkirî ye. Ji van şagirtan 88 heb keç; 98 heb law in. Li gor zimanan navê van şagirtan bi vî awayî ne.

Tablo 37: Hejmar û Rêjeya Navan li Gor Zimanan (li Dibistana Seretayî ya Qizilê)

Ziman	Navê Keçan	Navê Lawan	Bi Giştî	Rêje(%)
Erebî	50	61	111	%59,7
Kurmancî	19	16	35	%18,8
Tirkî	7	2	9	%4,8
Îbranî	-	11	11	%5,9
Yewnanî	2	-	2	%1,1
Navên têkel	1	3	4	%2,2
Dunav	4	10	14	%7,5
Bi giştî	83	103	186	%100

Dema ku em li tabloya 37. dinêrin em dibînin rêjeya bikaranîna navên kurmancî li gor lîsteya hîlbijêran, ku di vê lîsteyê de kesên kêmanî temenê wan 18 ye hene, nêzîka 3 qatan zêde bûye. Şagirtên dibistana seretayî di polên 1,2,3 û 4. de dixwînin û salên wan yê jidayikbûnê di navbera salên 2005 û 2008'an de ye. Di lîsteya hîlbijartinê de rêjeya navên kurmancî ji %6,7 e, di lîsteya dibistanê de ji %18,8 e. Bikaranîna navên erebî ji %71,4'an daketîye ji %59,7'an. Rêjeya bikaranîna navên tirkî jî kêr bûye, ji %6,2'an daketîye %4,8'an. (Tablo 33)

Navê ‘Yusuf’ 8 caran hatîye bikaranîn, wê jî rêjeya navê îbranî zêde kiriye. Di lîsteya hîlbijêran de rêjeya navên îbranî ji %2,5 e, di lîsteya dibistanê de bûye ji %5,9 û ketîye pêşîya navên tirkî. Navê keç û lawan yê herî pir hatine bikaranîn û hejmara bikaranîna wan bi vî awayî ye:

Tablo 38: Navê Keçan, yê Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Dibistana Seretayî ya Qizilê)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi giştî
Elif	8	8
Zeynep	4	4
Adul, Helin	3	6
Aylin, Berfîn, Bûşra, Filiz, Kübra, Leyla, Nurşin	2	14
11		32

Di nava navê keçan de yê herî pir hatîye bikaranîn 'Elif' e. Ji nava 11 navên herî pir hatîye bikaranîn jê 6 heb bi erebî (Elif, Zeynep, Adul, Bûşra, Kübra, Leyla) ye. Yê mayî jê 3 heb bi kurmancî (Helin, Berfîn, Nurşin); 1 bi tirkî (Aylin) û 1 jî bi yewnanî (Filiz) ye. Di navbera lîsteya navên şagirtên keç yê dibistanê û di navbera lîsteya hîlbijêrên jin de navên hevbeş 'Zeynep' û 'Leyla' ye. Di lîsteya hîlbijêran de 3 heb navê jinan yê herî pir hatîye bikaranîn 'Fatma, Şemsa, û Gazal' e, di lîsteya dibistanê de di navê keçan yê herî pir hatîye bikaranîn de em van her sê navan nabînin. (Tablo 31) Di temama lîstê de 'Fatma' û 'Gazal' her yek carekê tenê hatîye bikaranîn, 'Şemsa' qet nehatîye bikaranîn.

Tablo 39: Navê Lawan, yê Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Dibistana Seretayî ya Qizilê)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi Giştî
Mehmet (9), Muhammet(5)	14	14
Yusuf	8	9
Mustafa	7	7
Ferhat	4	4
Murat	3	3
Ahmet, Baran, Caner, Civan, Mert, Mehmet Salih, Nurullah	2	14
12		51

Di lîsteya şagirtan de navê herî pir derdikeve pêşîya me waryantên navê ‘Mehmet, Muhammet, Muhammed’ e. Ev nav bi tena serê xwe 14 caran, bi navekî din re jî 8 caran, bi giştî 21 caran hatîye bikaranîn. Bi giştî navê 10 lawan dunavo ye û jê 8 heb bi ‘Mehmet’ yan jî ‘Muhammet’ dest pê dike: ‘‘Mehmet Salih (2), Mehmet Emin, Mehmet Ali, Mehmet Şerif, Muhammet Azad, Muhammed Heja, Muhammet Mustafa’’ Her dû navê din ye lawan ye dunavo ‘‘Rumet Berken û Rupel Umut’’ e.

Di navê keçan de yê dunavo 4 heb in û her yek hew carekê hatîye bikaranîn: ‘‘Beyza Nur, Felek Naz, Gazal Nur, Zeynep Sude’’

Di lîsteya hîlbijêran û lîsteya şagirtan de tiştê ku balê dikşîne ev e ku di her du lîsteyan de jî navê herî pir hatîye bikaranîn navê ‘Mehmet’ e. Rêjeya bikaranîna navê Mehmet ye xwerû, di lîsteya hîlbijêran de di nava mêran de (ji 540 kesî navê 29 kesî) ji %5,4; di lîsteya şagirtan de di nava şagirtên law de (ji 98 kesî navê 14 kesî) ji %14,3 ye. Ji bilî bikaranîna wê yî xwerû, bi navekî din re jî bikaranîna wê di lîsteya hîlbijêran de 51 e. Bi awayê xwerû û bi navekî din re bi giştî di lîsteya hîlbijêran de ji bo 80 kesî hatîye bikaranîn. Li gor hejmara mêra wek rêje dike ji %14,8’ê mêra ku yan navê wan Mehmet’ e, yan jî di navê wan de ‘‘Mehmet’’ heye. (Tablo 32 û 35) Di lîsteya şagirtan de jî tevî kesên ku di navê wan de ‘‘Mehmet’’ yan jî ‘‘Muhammet’’ heye hejmara vî navî dike 22 û di nava hemî şagirtên law de wek rêje dike ji %22,5 ê lawan yan navê wan ‘Mehmet’ e yan jî di nava navê wan de ‘Mehmet’ yan ‘Muhammet’ heye. Ji bo temama Qizilê, navê şagirtên dibistana navîn ne tê de, mirov dikare bêje navê 102 kesî yan Mehmet e û yan jî di navê wan de ‘Mehmet’ û wersiyonên wê heye. Ev yek wek rêje dike ji %16 kesên mêr di gund de.

II.4. BIXUR Ê REWŞA NAVÊ MIROVAN LI BIXURÊ

Ji bo agahîyên Bixurê yê sosyolojîk, dîrokî, aborî, jîyana gund hwd. me bi 19 mirovî re hevdiştin pêk anî. Ji van mirovan jê 5 heb jin in. Ji bilî hevdiştinên rû bi rû bi awayê çavdêrîyê jî me hin agahî bidest xiste. Ji bo agahîyên li ser awayê lêkirina navan me lîsteya hîlbijêran ya ‘‘Hîlbijartinên Herêmî yê 30.04.2014’’an û lîsteya şagirtên ‘‘Dibistana Seretayî ya Bixurê’’ wek kereste bikaranîye.

II.4.1.Cih, Erdnîgarî û Serjimêrîya Bixurê

Bixur li bakurê rojavayê navenda Dêrikê dikeve. Navbera wê û Dêrikê 28 km ye. Li rojhilatê wê Xanok û Sêpnat; li rojavayê wê Kwêtê; li bakurê wê Xerabreşk û Şirîfbaba û li bakurê rojavayê wê Zembelorê heye. Rêya ji Dêrikê tê nav gund, ber bi bakur ve diheri Dîyarbekir. Dema ku şênîyên gund bixwazin herin Dîyarbekir û ger karê wan li nava Dêrikê tunebe vê rîyê bikartînin. Bi vê rîyê navbera gund û Dîyarbekir dadikeve der dora 60 km'yî.

Bixur li ser ferşê Qerecdax e. Ji ber wê wekî hemî gundên vê herêmê kevirê wê reş e. Axa wê bi qîmet e lê zevîyên wê yî ji çandinîyê re guncan e ji ber vê erdnîgarîya wê bela nin. Gund li binya şikefta Bixurê ava bûye. Di hundirê vê şikeftê de golek kûr heye û her dem av tê de heye. Navê vê golê di nava gel de "Dengiza Bixurê" ye. Ev gol ji berf û baranên Qerecdax sûd werdigire û di demên zivistan û biharan de ev gol di ser re dihere, ava wê ji devê şikeftê ve diherike û li derve dibe wek çemekî biçûk. Li gor agahîyên şênîyên gund, li ber vê ava diherike ji demên berê de çiltûk tê çandin. Lê di van salên dawîn de ji ber ku av kêm e êdî bi qasî berê nayê çandin. Birinca Bixurê bi nav û deng e û li nava Dêrikê û der û dora wê tê naskirin.

Piranîya erdnîgarîya Bixurê ji girikên biçûk û mezin, ji qîş û tatan pêk tê. Ji ber wê gund, ji alîyê beş û cûreyên erdnîgarî ve dewlemend e. Di nava van girik, gir û zinaran de newal û gelîyên biçûk, kort û guherên biçûk hene. Ev herêm bi awayeke giştî wek ferşê Qerecdax yan jî tatê Qerecdax tê binavkirin.

Li gor hejmarên TUIK'ê yên sala 2013'an serjimêrîya Bixurê 1333 ye. Ev hejmar ne li gor mezinbûna gund e. Ji ber ku ji gund gelek malan bar kirine bajarên rojavayê Tirkîyê, serjimêrîya gund kêmtir bûye. Li gund me gelek malên vala, xalî û xerabe dîtî.¹⁶ Ji bilî malên bi tevayî koç kirine, gelek mal jî wek karkerên demsalî diherin derveyî gund. Hejmara ciwanan jî li gor ya pîran gelekî kêmtir e. Li gor agahîyên ku şênî didin me, ji her malekê du sê heb keç û xort li derve, bi piranî jî li Stenbûl dixebitin. Tenê di cejnên de yan jî di şînan û şahîyan de tên gund û dûv re dîsa vedigerin karên xwe.

¹⁶ Wêne 5.

II.4.2. Dîrok û Binyada Civaka Bixurê

Di derheqê dîroka Bixurê ya kevnar de me tu çavkanîyeke nivîskî bidest nexist. Em li tu lêkolîneke ku li ser gund hatîye kirin jî rast nehatin. Ji ber wê agahîyên ku em li ser dîroka gund dibînin tenê yê bi devkî nin. Ev vegotinên bi devkî jî pir dûr narin.

Ji ber ku jêdereke avê ya xurt lê heye divê gund ji demên kevin de bûbe qada jîyanê. Li ser lêpîrsîna me ya bi vê gûmanê, beşdarvanên me behsa xirbeyên du heb keleyan kir. Navê yekê tenê “Kele” ye; yê din “Kela Kaska” ye. Ji bilî van her du xirbeyên li bakurê gund, wekî din jî li gund xirbe hene. Şênîyên cuda bi awayeke hevbeş navê van xirbeyan gotin: *Dêrkalos, Gîyarê Xiznê, Têzzerab, Qîşê Kêlê*.

Ji bo ku dîroka gund ya kevnare bi awayeke zanistî were zelalkirin divê li van xirbeyan lêkolînên arkeolojîk were kirin.

Pirsa me ya ku li ser navê gund, beşdarvanên ji nişê mezin bi vî awayî bersivandin: *“Navê gund ji ‘bixur’an tê. Em ji kevirên biçûk re dibêjin ‘bixur’ yan jî ‘buxar’. Gundê me gundekî bi kevir e, tat û qîşên me pir in. Giş jî ev kevirên reş in. Ji ber van keviran navê gund jî bûye Bixur.”* (M. Bixur, 2014)

Dîroka gund ya nêzîk û tê zanîn, weke dîroka malbatên anha li gund dijîn e. Li gor şênîyên gund yê temenmezin, bav û kalên wan ji Banqîr rabûne û hatine li Bixurê bi cî bûne. Yê ten zanîn sê mirov in. Li ser navê van her sê mirovên pêşeng di heman demê de li gund sê malbat hene. Mala Silo, Mala Mistefê, Mala Miêş.¹⁷

Li gor şênîyên gund, bi texmînê ev hatina van her sê kesên ku navê wan li malbatên wan bûye, di navbera sed û pêncî û du sed salî de ye. Lê berî pêşîyê wan kî di gund de bûne nizanin. Di demên pê wan de hinek malbat ji Kevirşînê û Mezrê hatine. Yê ji Banqîr hatine û gund avakirine û malbatên ji Kevirşîn û Mezrê jî hatine jî tê de gund giş wek eşîr Metînê ne. Malbatên li gund dijîn ev in: Mala Mistefê, Mala Silo,

¹⁷ Şênîyekî temenmezin (M. Bixur, 2014), ji bavê xwe neqil dike ku rojekê (bi qasî sed sal berê) yekî bi navê Raîf Beg ji Dîyarbekir hatîye û li gund xwedî derketîye, gotîye *“Ev gund ê min i, û va yi tapa wê jî di destê mi de yi.”* Me di lêkolîna xwe de kesekî bi vî navî nedî lê belê demeke kurt kesekî bi navê Arif Beg li Dêrikê qeymeqamtî kirîye, dibe ev her du nav tevlihev bûbe. Dîrokzan Hilmar Keiser di hevpeyvîneke xwe de behsa vî qeymeqamî dike û dibêje wî mal û milkê Ermenîyan birîye ser navê xwe. (<https://www.facebook.com/ImcTvDirok/posts/345868895514270>)

Mala Miêş, Mala Evqadir, Mala Xerêt, Mala Hecî Mistefa, Mala Hecî Humo, Mala Fatê.

Di navbera malbatan de dijminatî tune. Carinan di hîlbijartinan de, carinan jî ji bo çêrandina zevîyan di navbera hin malbatan de nakokî derdikeve lê mezin nabe. Alîkarî di nava gundîya de kêr bûye li gor berê. Anha her malbatek bêtir alîkarîya merivê xwe dikin. Berê herkesî di her warî de alîkarî bi hev re dikir, ji qewlê şênîyekî bitemen, *‘Anha dinya bi bava bava bûyi.’* (S. Bixur, 2014) Heger di navbera du malan de nakokîyek derkeve û ku ev nakokî mezin bibe yextyarê her du malan mudaxele dikin ji bo pirsgerêkê çareser bikin.

Tiştê herî zêde bandor li jîyana gund ya civakî kiriye di van panzde bîst salên dawî de valabûna gund e. Gund ji ber rewşa gundîyan ya aborî û tunebûna kar vala bûye. Li gor beşdarvanekî ji nişê mezin, *‘Ji ber gi erd kêr in, ji ber gi êdî xwedîkirina pez gundîya têr naki û ji ber gi tu karekî din jî tune, kesek li gund namîni, berê gundîya ber bi derve ve yi. Berê li gund du sud mal hebû, lê anka sî mal ya heyî ya tune.’* (B. Bixur, 2014) Gundîyên ku bar kirine bi rêjeyeke bilind li Stenbol bi cih bûne. Lê ji bilî wê li bajarên wek Dîyarbekir, Îzmîr, Edene û Mêrsîn jî bi awayeke girseyî Bixurî hene. Çend malên Bixurî li navendên Dêrikê, Wêranşar û Qoserê jî bi cih bûne. Têkilîya van malên ji gund barkirine û gundîyên di gund de qut nebûye, lê belê têkilîyê wan li derve di nava hev de ne pir xurt e.

Di navbera malbatên gund de bi dan û sitendina qîzan merivantî çêbûye. Lê dîsa jî ew germaya berê nemaye. Di şînan de herkes bi ser hev de dihere û tê. Dema ku şînan jî şahî hebe, Bixurîyên li derveyî gund dijîn jî vedihewin.

II.4.3. Aborîya Bixurê

Bingeha aborîya Bixurê li ser cotkarîyê û xwedîkirina pez e. Li gor agahîyên fermî yê ku me ji *‘Gerîndeya Xurek, Çandinî û Ajalvanîyê ya Qeymeqamtîya Dêrikê’* sitende di sala 2013’an de 6.029,043 donim zevî bûye genim; 2.988,522 donim zevî bûye garis, 173,598 donim zevî bûye çiltûk, 79,066 donim xerzîkê tirî li gund heye. Bi giştî zevîyên hatîye çandin 9.270,229 metrekare ji ber ku garis û çiltûk wek berhemê

duyemîn tê çandin di rastîya xwe de zevîyê gund bi giştî li der dora 6 hezar donimî ye. Hilberîna xerzikên tirî ne ji bo aborîyê ye, ji ber ku xerzikê herî mezin 10 donim û 750 metrakare ye. Ji ber wê heger em gundîyên xwedîxerzik ji nav derxînin bi giştî cotkarê ku bi karên çandinîya genim, garis û çiltûkê ve dadikevin bi giştî 65 kes in. Zevîyên tèn avdan bi pîranî bi ava dengizê tèn avdan, ji bilî vê avê di van deh salên dawî de cotkar di nava erdê xwe de bîran jî dikolin.

Dîsa li gor sazîya gerîndeyê çandinîyê li Bixurê 906 dewar û 15.930 heb mîh û bizin tê xwedîkirin. Li gor agahîyên ku me ji şênîyên gund sitende, ligel malên ku ji bo aborîyê ajalan xwedî dikin, her maleke gund ji bo pêdivîyên xwe yî malanî çêlekekê du çêlekan yan jî çend heb mîh yan jî bizinan xwedî dikin. Yên ji bo aborîyê ajalvanîyê dikin, ligel zêdebûna pez, penîr û mast jî difroşin. Di demên berê de rûnê nîvişk jî çêdikirin lê anha ev yek pir kêrêm bûye. Ji bilî ajalvanîya pez û dewaran, hema bêje hemî mal ji bo pêdivîyên xwe mirîşk, werdek, qaz û elokan jî xwedî dikin.

Di gund de 15-20 kesên ji parêzvantîya gund malnişînî bûne hene, ji xêndî vanê malnişînî û yê îstîfa kirine, 10-12 kesên parêzvantîya gund ya demdemî dikin hene. Ji bilî vana li der dora 10 mirovî jî ji sazîya sîgortayê malnişînî bûne. Li gund du heb dikanên beqalîyê vekirî ne.

Malên ku zevîyên wan hindik in û têra debara wan nake bi pîranî wek karkerên demsalî diherin alîyê Behra Reş û rojavayê Tirkîyê, bajarên wek Ordu, Trabzon, Nevşehir, Manisa. Karên ku ev mal dikin bi pîranî karên fîndeç, xîyar, firingî, îsot, kartol, komir û daristanê ye. Ji bilî van karkerên demsalî, gelek keç û xortên gund, li bajarên rojavayê Tirkîyê dixebitin û pera ji dê û bavên xwe re dişînin. Di debara malbatan de bandora vê alîkarîya zarokên wan girîng e. Me ji çend heb pîrejin û pîremêrên gund bihîst ku bi vê alîkarîya zarokên xwe jîyana xwe didomînin. Pîrejineke beşdarvana me ev yek bi vî awayî anî zimên: *“Ne ji karê çolê bûya milletê perîşan biba.”* (C. Bixur, 2014)

Cotkarên ku em bi wan re peyivîn ji buhabûna gubre, toxim, derman û karûbayê digazin. Ji ber ku lêçûnên wan zêde ye debara wan nabe û ji ber wê jî gelek mal dev ji gund berdidin û diçin li rojavayê Tirkîyê, bi taybetî jî li Stenbûl bi cî dibin. Gazineke wan î din jî ev e ku bi hêsanî nikarin ji bankeyan kredîyan bikşînin. Kooperatîf yan jî

komeleyeke cotkaran di gund de tuneeye. Ji ber ku cotkar bêrêxistinî jî çandinîyên xwe bi awayên zanistî nakin, li gor zanebûna xwe dikin.

II.4.4. Jîyan li Bixurê

Xanîyên gund bi piranî xanîyên kevn in. Ev xanî bi kevir û herîyê hatine çêkirin. Li ser wan beşt, mircaq û ax heye. Yekqato ne, li dora xênî hewşên bi kevirên reş û sipî hatine dorpêçkirin hene. Bi gelek xanîyan ve axurên dirêj hene. Di hin hewşan de ji dêvla axurên ser wan girtî, hefşoyên dora wan bi keviran lêkirî û ser wan jî heya nêvî vekirî hene. Di van axur û hefşoyan de dewar yan jî pez tê xwedîkirin. Xanîyê gelek cîranên hev bi hev ve lêbûye. Beşdarvanekî temenmezin, ji bo vê yekê sê sedemên cuda nîşan da: Veqetandina lawekî ji malê, ewlekarî û aborî. Her ku lawekî malê zewicîye û ji malê veqetîyaye, bavê wî jê re bi dîwarê malê ve xanîyek din ava kiriye. Ev yek hem ji bo ewlekarîya wan bikêr hatîye û hem jî ji ber ku bi dîwêr ve lêkirinê, lêkirina dîwarekî yan jî du dîwaran hewce nekiriye û ev yek ji wan re kar maye. Xanîyên kevn ji hêwaneke dirêj û ji du odeyan pêk tê. Odeyek biçûk jî wek medbexê tê bikaranîn. Serşok û daşir di van xanîyan de bi piranî di hundurê hewşê de ne. Beşdarvanek dibêje ev xanîyên kevn, her çend ji ber ku ne di hundirê hev de ne rehetîya wan ne li cî be jî, li hember germa havînê û serma zivistanê ji xanîyên nuh yên beton çêtir û tenduristtir in. Ji bilî van xanîyên kevn, hindik be jî xanîyên nuh yên bi kelpîç û beton hatine çêkirin jî hene. Ev xanî ji sê ode û hêwanekê pêk tînin, medbex û daşirên wan di hundir de ne. Binê van xanîyan hinekan wek qatekî axur hatîye çêkirin.

Ji ber ku çemê dengizê di nava gund re derbas dibe, ev çem gund dike du beş.¹⁸ Li ber şîpa çem darên bî, tû û çînanan yê mezin balê dikşîne. Ji bilî van daran, di hewşa her malê de kêm zêde darên wek hijîr, mişmiş, zeytûn, tû û hwd hene. Ax û av û hewa gund ji bo baxçevanîyê guncan e lê ji bilî çend xerzikan li gund baxçeyên bi rêkûpêk tune.

Gundî ava vexwarinê ji dengizê dabîn dikin. Her malekê santrîfujek xistîye nava çem û ji vir av kişandine malên xwe. Ji ber ku ev av havînî jî heye, ji bo ava vexwarinê

¹⁸ Wêne 6.

tu astengî dernakeve. Tenê wextê kareba tunebi mecbûr dimînin bi metera avê bikşînin. Li gund binesazîya kanalîzasyonê tune. Ji ber wê jî carinan havînan nexweşîyên wek tîfo, peretîfo wek halê bela dibe di nava şênîyên gund de. Rêyên di nava gund de jî rîyên kevn yên bi kevir û ax in, di berf û baranan de ev rê dibin herî. Rêya gund ya bingehîn ku ji Dêrikê tê gund asphalt e lê belê rewşa wê gelekî xerab e. Di gelek cihan de kortên kûr çêbûne.

Di gund de sê heb sazîyên fermî hene. Dibistana gund ya seretayî û ya navîn, qereqolek jandarma û navendek tenduristîyê. Lê li gor şênîyên gund, navenda tenduristîyê bi piranî girtî ye. Ji ber wê ku nexweşên wan çêdibin şerpeze dibin. Ev navend vekirî be pêşî nexweş serî li vir didin. Heger bijîşkê vir têrê neke wê demê nexweş diçin Dêrikê, Dîyarbekir, Mêrdîn yan jî yên derfetê wan hebe diçin Stenbûl û bajarên din yê rojavayê Tirkîyê. Li gund ji bilî van her sê sazîyan tu sazîyeke din tune.

Helwesta şênîyan li ser perwerdeyê erênî ye. Dixwazin keç û lawên wan bixwînin. Ji gund tenê 3 şagirtên zankoyê anha li derve dixwînin. Lê Bixurîyên ku ji gund bar kirine û li derveyî gund dijîn di zankoyan de şagirtên wan hene. Yên ku zanko xelas kirine û dest bi kar kirine jî hene. Her çend şênîyên gund van agahîyan didin me jî, xuya ye rêjeya xwendina bilind li gund di asteke nizm de ye.

Li gund serjimêrîya xortan gelekî kêr e. Yên li gund in jî bi piranî şivantîyê dikin, roja wan li ber pez derbas dibe. Yên ku şivantîyê nakin heger hevalan ji xwe re bibînin yan bi gogê dilîzin, yan li malên heval û merivên xwe dicivin, yan jî heger hewa xweş be diherin li der û dora gund digerin. Heger demsal havîn be, xort û pîr diherin dikevin şikefta dengizê, ji ber ku vir hênîk e, havînan hemî wextên xwe li vir derbas dikin. Wek sazî odeya gund tune, ji ber wê mêrên gund bi şevê yan li malên xwe li ber televîzyonê ne yan jî li malên merivên xwe dicivin. Wexta jinan bi piranî bi karên malê derbas dibe. Zaroka xwedî dikin, şivê çêdikin, li ser tenûrê nan dipêjin, paqijîya malê dikin. Heger pezê malê hebe, dema ku pez ji çêrê tê mal, karê wan yê li mal bi piranî di histûyê jinan de ye. Jin li mal pez êm dikin, av didin, binê wan paqij dikin, sergîna çêdikin, şîr didoşin, mast û penîr çêdikin. Jinên ku karên wan xelas dibe yan li malên xwe rûdinin yan jî ji bo şevbihurkê diherin malên cîran yan jî merivên xwe. Li her malê televîzyon heye. Hema bêje bi herkesî re telefonên desta heye. Bi giştî li sê çar

malan înternet heye. Xortên li gund bi telefonên xwe yî desta dikevin facebook û twitterê.

II.4.5. Çand û Kevneşopî li Bixurê

Li Bixurê zimanê bingehîn yê têkilîyê kurmançî ye. Piranîya gundîyan bi tirkî jî zanin, hin jinên navsere, pîrejin û pîremêrên ku bi tirkî nizanin henin. Lê şênîyên gund di nava xwe de ji bilî kurmançî bi ti zimanekî din napeyivin. Heger peywirdarekî fermî were gund, yan jî leşkerekî qereqolê were bi gundîyan re bipeyive wê demê gundî bi wan re bi tirkî dipeyivin. Di nava peyva şênîyan de bilêvkirina bêjeyên "Dîyarbekir", "gar" û "dîya" (dê) de hin taybetmendîyên devokî xuya dibin. Me ev taybetî li sê malên guhertî, di nava peyvên jin û mêran de dîtin. Van jin û mêrên ku em behs dikin, bêjeya Dîyarbekir wek "Gîyarbekir"; bêjeya "gar" wek "gîyar" û bêjeya dê jî di peyva "dîya min" de wek "gîya min" bi lêv kirin. Dengê 'g'ya di van bêjeyan de derbas dibe ne 'g'ya normal e. Dema ku ev deng tê derxistin, ziman bi ezmanê dev ve tê zeliqandin, bi vî awayî nêzîkayê li dengê "c"yê dike, dibe wek dengê di navbera 'g' û 'c'yê de. Ev deng dibe pêşengê ew dengê 'c'yê be ku ji dengê 'd'yê tê guhertin û di devokê Dêrikê de bi taybetî jî li herêma çîyê, di gelek bêjeyên din de jî tê bikaranîn. Wek Carbekir (Dîyarbekir), roja eycîyê (roja eydîyê), haçyi (hatîyi), goçyi (gotîyi), c(i)yi (dîyi)... Wê demê ev guhertin dibe li gor vê rêzê bûbe: Dîyarbekir => Gîyarbekir => Cîyarbekir => Carbekir. Ji ber ku ev guhertin di bêjeya "dîyar" de çêdibe, dema ku bêjeya "dîyar" bi serê xwe tê bikaranîn jî em vê guhertinê tê de dibînin. Pêkan e ev bêje li gor du pêvajoyan hatibe guhertin: Di pêvajoyekê de bêje wek dîyar => gîyar => cîyar => car hatibe guhertin; di pêvajoya din de wek dîyar => gîyar => gar hatibe guhertin. Ango ji "gîyar"ê û bi vir de pêvajoya guhertinê ji hev cuda dibe. Li Bixurê bilêvkirina van bêjeyan bi awayê "Gîyarbekir, gîyar û gîya min" e û ji bilêvkirina navenda Dêrikê ya bi awayê "Carcbekir, gar û ca min" cuda dibe. Li herêma Dêrikê ev taybetîya devokî li çend gundên din jî, li gundên wek Fêzkê û Seker jî me dît ku ev gund ji xwe mezrayên Bixurê nin. Li Banqîr, ku wek serkana Metînî tê qebûl kirin, bêjeya "gîyar" wek "car" yan jî "ciyar" tê bikaranîn. Di bikaranîna 'ciyar' de "i" pir kurt e û dengê "cy"yê wek dîftongê derdikeve.

Mustafa Aydoğan di gotara xwe ya bi navê “Çima Carbekir û ne Cêrik” de bi fireyî behsa di devokê Dêrikê de guhertina dengê ‘d’yê ya ber bi ‘c’yê ve dike. Aydoğan dibêje ev guhertin ne guhertineke tesadufî ye, mercên vê guhertinê kombînezona her sê dengên ‘d-î-y’ yê ye. Dema ku di bêjeyekê de ev her sê deng tên cem hev ‘d’ dibe ‘c’. (Aydoğan, 2008) Ev guhertina ku Aydoğan behs dike, li herêma çiyê, ango li gundên der û dora Xarok bi awayeke xurt xuya ye. Li herêma çiyê em li guherîna ji ‘d’ yê ber bi ‘g’yê rast nehatin. Aydoğan jî di gotara xwe de behsa guhertina dengê ‘d’yê ber bi ‘g’yê ve nake. Mînakên ku Aydoğan dide bi piranî navdêr in. Di nava mînakên wî de tenê lêkerê heye: ‘qedîya - qecîya’. Guherîn ne tenê di kombînezona ‘d-î-y’yê de çêdibe. Çi navdêr dibe çi lêker dibe li gel dengên ‘d-î-y’yê dema ku dengên ‘t-î-y’yê jî tên cem hev heman guherîn çêdibe. Di pêvajoya vê xebatê de me li herêma çiyê mînakên gelek lêkaran dît ku ev guherîn tê de çêdibin. Lêkerên ku di halê xwerû de bi dengê ‘d’yê yan jî ‘t’yê xelas dibin, dema ku li gor dema borîya dûdar dihatin kişandin em li heman guherînê rast hatin. Di dema vê guherînê de bi piranî dengê ‘î’yê diket, lê carinan hin beşdarvanan ev deng diparastin. Dengê ku diguheri heger ne ‘d’ be lê ku ‘t’ be, wê demê ‘t’ jî dêvla ‘c’yê dibe ‘ç’. Sedema vê yekê dibe ku ji sertbûna wan tê. Ango ‘d’ jî ber ku nerm e dibe ‘c’ û ji xwe ew jî nerm e; ji ber ku dengê ‘t’yê hişk e dema ku tê guhertin dibe ‘ç’ ku ew jî hişk e. Çend heb mînak: ‘*Wî berê jê ri goçyi (gotîyi)*’, ‘*Te nanê xwe kengî lêxisçyi (lêxistîyi)?*’, ‘*Me îsal genim çancyi (çandîyi)*’ ‘*Hela ka quçya (qutîya) xwe, a mi tûtin téd nemayi!*’ Aydoğan jî bo guherîna di serê bêjeyê de çar bêjeyan mînak dide. Ev bêje ‘‘carbekir, ca, cîyar, carî’’ ye. Ligel van bêjeyan di serê lêkera ‘dît-’ê de jî guhertinek çêdibe lê li vir a balkêş ew e ku di vê bêjeyê de kombînezona ‘d-î-y’yê yan jî ‘t-î-y’yê tune ye. ‘*Te cîyi (dîtîyi) hela ji bo Xwedê!*’. Weha xuyaye ev lêker bi vî awayî guherîye: ‘dîtîyi – dîyi – cîyi-ciyi’. Heya ku dengê ‘t’yê nekeve, kombînezona ‘d-î-y’yê çênabe. Di halê dawîn de dengê ‘î’ya yekemîn pir kin e. Li gor me ev taybetîyên devokî hêjayî lêkolînên dîyalektolojî ne ku dibe mijara xebateke xweser.

Li Bixurê ji berhemên wêjeya gelêrî ya kurmancî em li şopa tu çîrok yan jî destanan rast nehatin. Li ser vê pîrsa me bersîva beşdarvanekî ji nîfşê mezin balkêş e: ‘*Telewizyon li ser koka suhbetê rûniştîyi. Milet giş li ber telewizyonê ker û lal i. Berê şevê zivistanan, di wan şevên dirêj di wexta me bi çîrok û meselokan derbas dibû. Ana*

tiştekek nayi bîra mi ji wan çîrokan. Hew çîroka ‘‘Konikê Pîrê’’ tê bîra mi.’’ (M. Bixur, 2014)

Li gund mizgeftêk heye. Şênîyên gund giş li ser mezhebê şafîî nin. Di nava sînorê gund de mekanekî ku ji gelek cih mirov tî serdana wê heye. Ev mekan ‘‘Sîn’’ e. Mekanekî din jî heye ku di nava sînorê Sêpnatê de ye navê wê ‘‘Seydoş’’ e. Ev her du mekanên zîyaretê wek ‘‘Sîn û Seydoş’’ meşhûr in. Serdanvanên tî van zîyaretan, li gor bawerîyê divê serdana her du zîyaretan jî bikin. Ya na zîyareta wan belasebe dihere û diayê wan qebûl nabe. Ji bilî mezêlê Bixurê, mezêlê Sîn jî heye ku ji gelek cî mirov tî mirîyê xwe lê vedîşêrin.

Malbatên Bixurê bi piranî malbatên mezin in. Xortên nuh dizewicin tevî malê dimînin. Heger rewşa wan ya aborî baş be, cihê dibên û malek nuh ji xwe re ava dikin. Hin keç û xortên nuh dizewicin bardikin diherin li Stenbûl bi cih dibin. Zewaca di nava merivan de zêde ye. Ji bo zewacê ji malbata zavê qelen tî sitendin lê belê ne qelenekî pir e. Bi perê tirkî ji hezar lîreyî heya deh hezar lîreyî tî sitendin. Lê malbata qîzê piranîya vî pereyî ji bo keça xwe xerc dikin. Gundî ji vî perî re dibêjin ‘‘heqê şîr’’. Şiklekî zewacê jî bi rêya ‘‘berdêlî’’ ye. Bi piranî di navbera zarokên apan de çêdibe lê di nava zarokên xal û metikan yan jî di navbera zarokên xaltîkan de kêmbê jî çêdibe.

Keç û xortên dizewicin heger xerîb bin pêşî hevdu nas dikin, hevdu dibînin, hevdu dicibînin û dizewicin. Berê hevdu nedidîtin lê anha rewş guherîye. Keç û xort hevdu ecibandin şûn de, hêla zavê dihere berê ‘‘qal’’ dike. Heger mala keçikê qebûl bike, roja xwazgînî tî dîyarkirin. Xwazgînî di heman demê de ‘‘nîşanî’’ û ‘‘şêranî’’ ye. Di xwazgînî de heger hebe, mîkdara qelen û cûreyên zêra ku berê li ser li hev kirine, ji cemaetê re jî eşkere dikin. Şêranî tî xwarin û fatîhe tî xwendin. Êdî keç û xort destgirtî ne.

Dîlanên gund sê rojan didomin. Roja îne piştî nîvro dest pê dike û roja yekşemê piştî nîvro bi anîna bûkê xelas dibe. Di govendan de lîstikên herî pir tî lîstin ‘‘di cî de’’ û ‘‘delîlo’’ ye. Heger li gund şîr hebe dîlan nayê çêkirin, wê demê tenê mewlûd tî xwendin, xwarin tî xwarin û bûka xwe tînin. Di dîlanan de ji bilî şênîyên gund, nas û merivên hêla bûk û zavê yê li derveyî gund jî tî vexwendin. Ji gundên cîran jî gelek kes û malbat, li ser vexwendina alîyên bûk û zavê tî beşdarî dîlanê dibin.

Dema ku zarokekî malekê çêdibe, dost û merivên malikê diçin serdana malê. Bi taybetî jî jin diherin, lê ji merivên nêzîk be mêr jî diherin serdana malê. Ev dost, meriv û cîranên wê malê li gor aborîya xwe û li gor nêzîkbûna wan ya merivantîyê ji zarok re dîyarîyan tînin. Ev dîyarî dibe zêr be yan jî wek cil û berg be. Heger di malê de bapîr yan jî dapîr hebe û heger bixwazin, ew nav li zarok dîkin. Heger ew nexwazin nav lêkin wê demê dê û bav lê dike. Lê belê dibe hin kesên din jî nav li zarokan kin. Wek ap, xal, metik, xaltîk, mele, dostekî malbatê û hwd. Navên ku ji bo zarokan tên hîlbijartin bi piranî navên ku tên zanîn in. Heger dê û bav nava li zarokên xwe kin, navê dê û bavên xwe yan jî ji malbata xwe, navê kesekî xwedî rûmet, kesekî ku jê tê hezkirin ji bo zarokê xwe hildibijêrin. Dibe ku ev kesên ku navê wan hatîye hîlbijartin ne mirî bin jî. Hin mal ji bo zarokê xwe heftêkê datînin, lê anha ev kevneşopî gelekî kêr bûye. Heger mal ‘‘*motajzarok*’’ (hewcedarîya wan bi zaroka hebe, ango zarokê wan tunebe yan jî hindik be) be û bi taybetî jî zarokê çêbûye lawê yekemîn yê malê be dibe ku heftêkê jê re çêkin. Heger heftêk were danîn, di heftêkê de mewlûd tê xwendin, nan tê çêkirin. Kesên ku tên ezimandin meriv, dost, heval û cîran in.

Dema ku li gund mirovek jîyana xwe wenda bike, konê şînê tê vegirtin. Berê li mala yê mirî şîn dihate gerandin, lê ev deh donzdeh sal in êdî kon tên vegirtin. Şîn bi piranî çar pênc rojan dewam dike. Lê kesên mirî ji malbateke dewlemend û naskirî be dibe deh rojan jî dewam bike. Di şînan de mirovên gund alîkarîya hevdû dîkin. Malên ku rewşa wan ya aborî baş be ji bo cihê şînê tiştên ku hewcedarî pê hebe, yê wek pez, birinc, şekir, çay û tiştên wekî din tînin. Di şînan de bi piranî Bixurîyên li derveyî gund dijîn jî vedihewin.

Cil û bergê mêran du beş in. Nifşên biçûk cil û bergên modern li xwe dîkin. Cil û bergê nifşên mezin jî bi hin cudatîyên biçûk ji hev diqetin. Di nava nifşên mezin de şalwer, komlek û çakêt cilên herî pir tên bikaranîn. Bi ser van cilan de yê çefîyên sipî didin serê xwe jî hene, yê şewqe dîkin serê xwe jî hene. Kêr be jî yê serserqot jî li ber çavê me ketin. Di cil û bergên jinan de jî mirov li gor nifşa cudatîyên bingeîn dibînin. Jinên ji nifşên mezin, ji bo li derveyî malê, kitan û hubrî bikartînin. Di nava malê de kirasê dirêj û xavik pir tê bikaranîn. Nifşên biçûk jî di nava xwe de dibin du beş. Beşek jê kincên modern li xwe dîkin, girêdana beşê din senteza cil û bergên

modern û yên kevn in. Ev beş kirasên dirêj li xwe dikin û ji bo serê xwe simalên rengîn bikartînin.

Li ser cejn û rojên taybet du beşdarvanên ji nifşê mezin ev agahî dan me:

“*Li gund em eydya remezanê û a qurbanê pîroz dikin. Di her du eydîya di jî piranîya zilamên gund li mêja eydyê li camîyê dikin, dût re cemeet di camîyê de eydya hevdi pîroz dikin û li nav gund bela dibi. Herkes berê diheri mala mervê xwe ê mezin. Dû ri diherin eydya cîranê xwe. Di eydîya qurbanê di ê ji wan diqedî qurbanekê şerjê dikin û goştê wê li feqîra bela dikin. Bi qasî para malekê jî ji xwe ri hiltînin. Heya sî çel sal berê jî di sersalên kurmancî di kose û berkose digeryan. Lê ana zarokê me van tiştina nizanin. Me ser çav mavê xwe dikir tenî, me hinekan kincê zilama li xwe dikir, ê din jî kincê pîreka li xwe dikirin. Em li nav mala digeryan û me digo ‘Malê sersalê, Xwedê kurkî bidi vê malê!’. Xwedê malê jî gwîz, bastêq, sincoq, bêçik, kêsme welhasil tiştekan didan me, em destvala venedigarandin. Sersala kurmancî 13 ra li dû sersala tirkî yi.’” (M. û K. Bixur, 2015)*

II.4.6. Rewşa Navê Mirovan li Bixurê

Zanyarîyên ku me ji lîsteya hilbijartinên herêmi yên adara 2014’an û ji lîsteya şagirtên dibistana seretayî ya Bixurê bidest xistine ev in:

Tablo 40: Hejmar û Rêjeya Navan (li Bixurê)

	Hejmara Hilbijêran	Hejmara Navê Hilbijêran	Rêje
Jin	356	187	0,53
Mêr	321	178	0,56
Bi giştî	677	365	0,54

Di lîsteya hilbijêrên Bixurê de 356 jin û 321 mêr bi giştî 677 kes tomarkirî ye. Ji bo 356 jinî 187 nav hatîye bikaranîn ku li serê her jinekê 0,53 nav dikeve. Rêjeya mêra

jî nêzîkî rêjeya jinan e; ji bo 321 mêtî 178 nav hatîye bikaranîn û li serê her mêrekî 0,56 nav dikeve. Li ser hev ji bo hemî hîlbijêran 365 nav hatîye bikaranîn û wek rêje li serê her mirovekî 0,54 nav dikeve.

Tablo 41: Navê Jinan, yên Herî Kêm 3 Caran Hatîye Bikaranîn (li Bixurê)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi Giştî
Sultan	11	11
Fatma (Fatma 7, Fatime 3)	10	20
Emine (Emine 6, Amine 3)	9	9
Halime, Mekîye	8	16
Medine, Kudret	7	14
Hülya, Leyla, Şükran,	6	18
Ayten, Remzîye	5	10
Hayat, Hanife, Meral, Perihan, Sevdet, Sadîye, Şerife	4	28
Adul, Bedia, Fadile, Fahrîye, Ğezal, Hamdîye, Hevi, Nejla, Nurhan, Rafia, Sıdıka, Sitti, Süreya, Selma, Yıldız, Zehra	3	48
35		164

Di listeya hîlbijêran de di nava navê jinan de yê herî pir hatîye bikaranîn “Sultan” e. Li dû wê wersiyonên Fatma û Amîne tên. Navê jinan yên herî kêm 3 caran hatîye bikaranîn 35 heb e û bi giştî ev nav ji bo 164 jinan hatine bikaranîn. Ji van 35 navê jinan yên herî pir hatine bikaranîn jê 29 heb bi erebî ye. Ji yên mayî 2 heb bi kurmancî “Hevi, Perihan”; 2 heb jê têkel “Ayten: tirkî-farisî; Nurhan: erebî-kurmancî”; 1 jê bi tirkî “Yıldız”; 1 jî bi moxolî ye “Meral”.

Tablo 42: Navê Mêran, yê Herî Kêm 3 Caran Hatîye Bikaranîn (li Bixurê)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi Giştî
Mehmet	19	19
Ali, Ramazan	9	18
Ahmet, Mustafa	8	16
Mehmet Emin	7	7
Osman	6	6
Abdullah, Abdurrahman, Seyfettin, Şerin, Mehmet Ali	5	25
Eyyüp, Nurullah, Şeyhmus, Vedat	4	16
Abdulkadir, Bayram, Ferat, Hacı, İbrahim, Ömer, Sabri,	3	21
23		128

Di listeya hilibijêran de, di nava navê mêran de yê herî pir hatîye bikaranîn ‘Mehmet’ e. Li dû wê ‘Ali’ û ‘Ramazan’ tên. Navên herî kêm 3 caran hatîye bikaranîn bi giştî 23 heb in û ji bo 128 mêrî hatîye bikaranîn. Ji vî 23 navî jê 19 heb bi erebî; 2 heb bi kurmancî ‘Ferat, Şerin’; 1 bi tirkî ‘Bayram’; 1 jî bi îbranî ye: ‘İbrahim’.

Tablo 43: Hejmar û Rêjeya Navan, li Gor Zimanan (li Bixurê)

Ziman	Navê Jinan	Navê Mêran	Bi Giştî	Rêje(%)
Erebî	266	245	511	%75,5
Kurmancî	24	7	31	%4,6
Tirkî	21	16	37	%5,5
Îbranî	1	15	16	%2,4
Farisî	11	1	12	%1,8
Moxolî	4	1	5	%0,7
Yewnanî	6	-	6	%0,9
Navên Nedîyar	6	3	9	%1,3
Navên Têkel	17	4	21	%3,1
Dunav	-	29	29	%4,3
Bi giştî	356	321	677	%100,1

Di lîsteya hîlbijêran de ji 677 kesî navê 511 kesî bi erebî ye. Ev hejmar dike ji %75,5'ê hîlbijêran. Navê 31 kesî bi kurmancî, 37 kesî bi tirkî ye. Ji 29 kesên dunavo jê navê 27 kesî bi erebî-erebî ye. Bi vî awayî rêjeya navên erebî zêdetir dibe. Li Bixurê me ji aliyê zimên ve 7 navê koka wan ne dîyar tomar kir. Ev nav ‘Fersik, Niftede, Roan, Afrîke, Bubo, Sino û Seydoş e. Ji van navan yên wek Bubo, Sino, Seydoş, Fersik (Fersi, Ferse, Ferso) li herêma Dêrikê li gelek cihên din jî derket hemberî me. Li gor me navê Bubo û wersiyonên wê yî wek ‘Bub, Bube, Bubi’ ji ‘bav’ê kurmancî û ‘baba’ya bi farisî tê û li herêma Dêrikê wek nasnavê şêx û ûcaxa hatîye pejirandin. Ji ber ku di heman demê de ev nav navê zîyaretan in jî.¹⁹ Ji berê de wek kevneşopîyekê ye ji kesên şêx re, heger temenê wî jî mezin be, ‘bavo şêx, kalo şêx’ tê gotin. Navê Sîn û Seydoş jî di heman demê de navê du zîyaretan e. Ev her du zîyaret di navbera Bixurê û Sêpnatê de ne û du mekanên ji hev cuda ne. Yek ‘Sîn’ e û yê din ‘Seydoş’ e. Navê Sîn dibe ji ‘Sînan’ ê erebî hatibe kinkirin. Lê di mîtolojîya Sumeran de navê Yezdanê Heyvê di serdema Babîliyan de dibe ‘Sîn’. Di navbera van her du navan de têkilî heye yan ev

¹⁹ Ji van zîyaretan yek jê ‘Baba Emer’ e ku li der dora 20-25 km’yan nêzîkî Bixurê ye, di nava sînorê Talbeş’ê de ye.

wekhevî tenê tesadufek e em nizanin. (Schmökel, Sümer Dini). Navê ‘‘Seydoş’’ li gor me ji ‘‘Seyyîd’’ê bi erebî hatîye guhertin. Qertafa ‘‘-oş’’ê em dibînin ji bo hin navên din jî bi sedema delalî û hezkirinê tê bikaranîn. Wek Memo – Memoş, Leman – Lemoş, Dîlan – Dîloş û hwd. Navê Fersê û wersîyonên wê yî guhertî yên wek Fersik, Fersi, Ferso li gor me ji koka ‘‘Farîse’’ya erebî hatîye. Di erebî de ev nav tê wateyên ‘‘jina siwarî, delal’’. Navê Roan dibe bi xeletî hatibe nivîsandin, ji ber ku bi taybetî di lîsteya hîlbijêran de em li gelek navên xelet hatîye nivîsandin rast hatin, lê piranîya van navan yên kesên temenmezin in. Ev nav dibe ‘‘Rozan’’ yan jî ‘‘Rojan’’ be. Navê ‘‘Niftede’’ jî pêkan e ji dewsa ‘‘Uftade’’ya farisî bi vî awayî hatibe nivîsandin. Afrike divê navê parzemîna Afrîka be, ew jî wek ziman bi Latînî ye.

Tablo 44: Navên Têkel (li Bixurê)

Ziman	Nav
Tirkî-Kurmancî	Birgöl, Ercan, Songül,
Kurmancî-Tirkî	Gölay
Erebî-Kurmancî	Nurhan (3), Hüzniğöl (2), Aslıhan, Nurcan, Alican, Bedirhan
Tirkî-Erebî	Aysel (Ay-seyl)
Firansizî -Tirkî	Tölay
Tirkî- Farisî	Ayten (5)
Erebî- Farisî	Melekşah

Di lîsteya hîlbijêrên Bixurê de bi giştî 14 navên têkel heye û ji bo 21 kesî hatîye bikaranîn. Navên têkel yên herî pir hatîye bikaranîn yên bi erebî-kurmancî ye. 3 navên têkel yên mêra, 11 navên mayî yên jinan e.

Tablo 45: Dunav (li Bixurê)

Ziman	Nav	Jin (J); Mêr (M)
Erebî-Erebî	Mehmet Emin (7), Mehmet Ali (5), Mehmet Şerif (2), Mehmet Veysi (2), Mehmet Aziz, Mehmet Salih, Mehmet Baki, Mehmet Sıddık, Mehmet Nuri, Mehmet Reşit, Mehmet Nezîr, Mehmet Şefik, Mehmet Sıraç, Mehmet Sait, Mehmet Mustafa	M
Erebî-Kurmancî	Mehmet Şirin	M
Erebî-Farisî	Mehmet Şah	M

Kesên dunavo giş mêr in. Hejmara wan 29 e û hejmara navan 17 ye. Navê yekemîn di gişan de ‘Mehmet’ e. 15 nav bi erebî-erebî; yek bi erebî-kurmancî û yek jî bi erebî-farisî ye. Li gor tabloya 43’yan li Bixurê hejmara navên bi erebî 511 û rêjeya wê ji %75,5 e. Heger em navê 27 hilbijêrên ku dunavo ne û navê wan bi erebî-erebî ye jî bavêjin ser navên erebî, hejmara kesên ku navê wan bi erebî ye dê bibe 538 û wek rêje dê bibe ji %79,5’ê hilbijêran ku navê wan bi erebî ye.

Tablo 46: Hejmar û Rêjeya Navên Kurmancî, li Gor Temenê Hilbijêran (li Bixurê)

Sala	Hejmara Navên	Mînakên Navan	Rêje(%)
Jidayikbûnê	Kurmancî		
... – 1966	12	Hevi, Güli, Bessi	%38,7
1967 – 1972	3	Şirin, Bozo, Perihan	%9,7
1973 – 1978	2	Ferhat, Perihan	%6,5
1979 – 1984	2	Şerin, Zere	%6,5
1985 – 1990	3	Serdar, Mizginar, Kahraman	%9,7
1991 – 1996	9	Şerin, Mizgin, Rojbin, Menal	%29
Bi giştî	31		%100,1

Hilbijêra herî bi temen û navê wê bi kurmancî di sala 1926'an de ji dayik bûye. Ji %38,7'ê navên kurmancî di navbera 1926 û 1966'an de hatîye dayin. Navên berî 1985'an navên klasîk yên kurmancî ne. Ji sala 1991'ê û berjor rêjeya navên kurmancî bi awayeke vekirî zêde dibe. Ji 1991'ê û berjor li gel navên klasîk yên kurmancî em li navên modern yên wekî ‘‘Rojbîn, Menal’’ jî rast tên. Ji bo ku em ji 1996'an û vir de rewşa navê mirovan bibînin em ê li navê şagirtên dibistana Bixurê ya seretayî binêrin:

Tablo 47: Hejmar û Rêjeya Navan li Gor Zimanan (li Dibistana Seretayî ya Bixurê)

Ziman	Navê Keçan	Navê Lawan	Bi Giştî	Rêje(%)
Erebî	42	52	94	%49,7
Kurmancî	22	15	37	%19,6
Tirkî	9	13	22	%11,6
Îbranî	1	10	11	%5,8
Yewnanî	1	-	1	%0,5
Navên Têkel	5	1	6	%3,2
Dunav	4	12	16	%8,5
Navên Nedîyar	1	1	2	%1,1
Bi Giştî	84	103	189	%100

Li dibistana Bixurê ya seretayî 189 şagirt heye. Ji wan 89 heb keç û 100 heb jî law in. Şagirt di polên 1, 2, 3 û 4. de dixwînin û salên wan yê jidayikbûnê di navbera 2005 û 2008'an de ye. Dema ku em tabloya 43. û tabloya 47. didin ber hev em dibînin rêjeya navên erebî ji %75,5'an daketîye ji %49,7'an, rêjeya navên kurmancî ji %19,6'an hilkişyaye ji %19,6'an. Rêjeya bikaranîna navên tirkî jî zêde bûye, ji %11,6'an hilkişyaye ji %11,6'an. Rêjeya navên têkel û navên koka wan nedîyar pir nehatîye guhertin. Meyla lêkirina dunavan zêde bûye, ji %4,3'yan bûye ji %8,5. Li dibistana Bixurê ya seretayî rewşa navê keç û lawan bi vî awayî ye:

Tablo 48: Navê Keçan, yê Herî Kêrî 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Dibistana Seretayî ya Bixurê)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi Giştî
Fatma (3), Fatime (2)	5	5
Berfin	4	4
Elif, Merve	3	6
Adul, Dilan, Esmâ Nur, Esra, Havin, Kübra, Pınar, Rozerin, Songül, Zilan	2	20
14		35

Di navê keçan de yê herî pir hatîye bikaranîn wersiyonên ‘‘Fatma-Fatime’’ ye. li dû wê ‘‘Berfin, Elif û Merve’’ tên. Navê keçan yê bi kêmanî 2 caran hatîye bikaranîn 14 heb in û bi giştî ji bo 35 şagirtî hatîye bikaranîn. Ji van navan 7 heb bi erebî ‘‘Fatma-Fatime, Elif, Merve, Adul, Esmâ Nur, Esra, Kübra’’; 5 heb bi kurmancî ‘‘Berfin, Dilan, Havin, Rozerin, Zilan’’; 1 bi tirkî ‘‘Pınar’’; 1 jî têkel e: ‘‘Songül’’.

Heger em navê hilbijêrên jin (Tabloya 41.) û navê şagirtên keç yê dibistana seretayî (Tabloya 48.) bidin ber hev em ê bibînin ku di her dû lîsteyan de navên hevbeş ‘‘Fatma’’ û ‘‘Adul’’ e. Di nava navên hilbijêrên jin de yê herî pir hatîye bikaranîn ‘‘Sultan’’ e lê em vî navî di lîsteya şagirtan de qet nabînin. Navên ‘‘Emine, Nurhan, Süreyya’’ her yek hew carekê hatîye bikaranîn. Hinek navên kurmancî ku di lîsteya şagirtan de heye yê wek ‘‘Berfin, Havin, Rozerin, Zilan, Rojda, Rojin, Sosın, Dilan, Evin, Jinda, Nergiz, Nesrin’’ di lîsteya hilbijêran de, di nava navên hilbijêrên jin yê kurmancî de qet tune. Ango mirov dikare bêje ev nav ji bo gund navên nuh in.

Tablo 49: Navê Lawan, yê Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Dibistana Seretayî ya Bixurê)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi Giştî
Mehmet (5), Muhammed (3)	8	8
Baran	4	4
Ahmet, Ali, Hüseyin, Şeymus, Yusuf	3	15
Aydın, Berat, Doğan, Enes, Hacı, Harun, Hasan, İbrahim, Kerem, Ömer	2	20
17		47

Di nava şagirtên law de navê herî pir hatîye bikaranîn wersîyonên ‘‘Mehmet-Muhammed’’ e. Ji bilî awayê xwerû ev nav bi 8 navê din re wek dunav hatîye bikaranîn. Navê lawan yê herî kêm 2 caran hatîye bikaranîn 17 heb in û bi giştî ji bo 47 şagirtî hatine bikaranîn. Ji van navan 11 heb bi erebî ‘‘Mehmet-Muhammed, Ahmet, Ali, Hüseyin, Şeymus, Berat, Enes, Hacı, Hasan, Kerem, Ömer’’; 1 bi kurmancî ‘‘Baran’’; 3 heb bi îbranî ‘‘Yusuf, Harun, İbrahim’’; 2 heb jî bi tirkî ye: ‘‘Aydın, Doğan’’. Dema ku em navê hilibijêrên mêr yê (Tabloya 42.) û navê şagirtên law yê herî pir hatîye bikaranîn didin ber hev em dibînin ku di herduyan de jî navê herî pir hatîye bikaranîn hevbeş e. Di lîsteya hilibijêran de navê ‘‘Mehmet’’ û di lîsteya şagirtan de jî ‘‘Mehmet’’ û wersîyona wê ya din ‘‘Muhammed’’ navên herî pir hatine bikaranîn in. Ji bilî vî navî navên din yê hevbeş ‘‘Ahmet, Ali, Hacı, Şeymus, İbrahim, Ömer’’ e. Di lîsteya hilibijêran de, di nava navên mêra de hin navên pir hatine bikaranîn, yê wek ‘‘Ramazan, Osman, Abdurrahman’’ di nava navê şagirtên law de tune. Navên wek ‘‘Mustafa, Ferhat, Bayram’’ jî di nava şagirtan de her yek carekê hatine bikaranîn.

Di navên lawan de navê kurmancî hew ‘‘Baran’’ e û 4 caran hatîye bikaranîn. Em vî navî, di lîsteya hilibijêran de di nava navê mêran de nabînin, angê ev nav ji bo gund navekî nuh e. Hejmara navê kurmancî di nava şagirtên keç de (Tabloya 48.) ji ya lawan zêdetir e. Di nava navê keçan de, di navên herî kêm 2 caran hatîye bikaranîn de 5 heb navê kurmancî heye.

Di nava navê lawan de 12 hebê dunavo heye û di 8 heban de navê yekemîn, di navekî de jî navê duyemîn ‘‘Mehmet-Muhammed’’ e: ‘‘Mehmet Can, Mehmet Emin, Mehmet Necat, Mehmet Sait, Mehmet Salih, Mehmet Şerif, Mehmet Talha, Muhammed Ali, Nur Muhammed’’. Navên din ‘‘Mahmut Eren, Mert Can, Yunus Emre’’ ye. Ji van navan 8 heb bi erebî-erebî ye. Heger em vê hejmarê bavêjin ser navên din yên erebî, li dibistana Bixurê bi giştî hejmara şagirtên ku navê wan bi erebî ye dê bibe 102 û rêjeya navên erebî dê bibe jî %57,1. Ji ber ku Mert Can bi kurmancî-kurmancî ye hejmara navên kurmancî jî li dibistanê dê bibe 38 û rêjeya navên kurmancî li dibistana Bixurê dê bibe jî %20,1.

II.5. FITIN Ê REWŞA NAVÊ MIROVAN LI FITNÊ

Ji bo agahîyên li ser Fitnê, me bi heft mêt û 4 jinan re hevdiştin pêk anî. Ji bilî hevdiştinan bi awayê çavdêriyê jî me hin agahî ji gund dan hev. Agahîyên li ser zevî, çandinî û ajalvanîyê me ji sazîya Gerîndeyaya Xurek, Çandinî û Ajalvanîyê ya Qeymeqamtîya Dêrikê; listeyên dibistana seretayî ya Fitnê jî, ji ber ku dibistana Fitnê girtî ye û şagirtên wê bi awayê veguhastinê diherin Dibistana Zorava, ji Gerîndeyaya Dibistana Zorava sitende.

II.5.1. Cih, Erdnîgarî û Serjimêriya Fitnê

Fitin li bakurê rojavayê Dêrikê, di quntara Rêzeçiyayê Mazî de ava bûye. Navbera wê û Dêrikê 15 km ye. Li başûrê wê Beyrok; li rojavayê wê pêşî Rebet û dûvre Talbeş; li başûrê rojavayê wê Zorava û Ofî heye. Li bakurê wê zinarên bilind heye û li dû wan zinaran jî gundên Erbelûş, Mezra Gêrî, Mezra Newalê û Mezra Suravirkê heye.

Ji nava gund û ber bi bakur ve erdê wê her ku diçe bilind dibe û ber bi başûr ve jî ji bilî çend girên di navbera wê û Zorava de, her ku diçe nizm dibe. Ji ber vê bicîbûnê, axa gund li çiyê jî heye, li rastê jî heye û bi vî awayî di nava erdnîgarîya gund de her cûre beşên erdnîgarîyê yên wek zinar, gir, kur, sikur, tat, qîş, şikeft, newal, guher, kort, çem, kanî, delav, kedab û hwd. hene. Çiyayên Fitnê beşek ji Rêzeçiyayên Mazî ne û ev

çîya, anha lawaz be jî bi darên berî û mazî ne. Li gor vegotina şênîyên gund yên ji nifşê mezin, di demên berê de ev çîya ji alîyê daran ve dewlemendtir bûye. Demekê ev dar bi awayeke nezane hatîye jêkirin û bi qelihandinê re rûbirû maye. Lê anha ji wan deman çêtir e, ji ber ku birîna daran kêr bûye, Çîyayên Fitnê û Şewlê Fitnê dîsa şîn dike. Di gund de du heb jêderên avê yên girîng heye. Yek Zelx e û ya din jî Kanî ye. Ji bilî van her du jêderan, bi ava berf û baranan kedabên der dibe û çemê ji bakurê gund ji hêla Şewl tê û diherike jî heye. Di van salên dawî de ji ber ku li temama herêmê berf û baran kêr bûye, ava Zelxê û Kanîya Gund jî bi taybetî di demsalên havînan de kêr dibe. Tê bîra nifşên biçûk jî ku li ber ava Kanîya Gund pembo dihate çandin, bi vê avê genim, ceh û nîsk dihate avdan. Lê anha Hewqên Gund jî ji ber bêavbûnê li ber hişkbûnê ye.

Li gor sazîya TUIK'ê di sala 2013'an de serjimêriya Fitnê 49 e. Lê belê dema ku mirov li nava gund digere, li gor xanîyan ev hejmar kêr e. Gelek xanî vala ne û bi piranî yan xerabe ne yan jî li ber xarabûnê ne. Di wextekê de ev xanî giş tije bûne. Li gor agahîyên ku me ji gund sitend di van sî salên dawî de gelek şênîyên gund ji gund barkirine. Yên ji gund barkirine, li navenda Dêrikê, li Stenbol, li Dîyarbekir, li Îzmîr û Edenê bi cî bûne.

II.5.2. Dîrok û Binyada Civaka Fitnê

Di pêvajoya vê xebatê de di derheqê dîroka Fitnê de me ti çavkanîyeke zanistî nedîte. Lê ji ber ku hem di hundirê gund de û hem jî li der û dora wê şopa gelek şûnwarên şaristanîyên kevin heye divê li ser dîroka wê lêkolînên arkeolojîk werin kirin. Ev şûnwarên em behs dikin, kevirên şekirî yên mezin, histûnên biçûk û mezin, dîwarên kevnar ku li rûyê erdê şopê wan xûya ne, şikeftên li rojavayê gund ku derîyên wan û hundirê wan di demên kevin de bi desta hatine çêkirin û wekî din in.²⁰ Ji alîyê dîrokî ve divê têkilîya van şûnwaran û şaristanîya kevnare ya li Rebetê were zelalkirin. Navbera Fitnê û Rebetê bi pêkrêkan li der dora 2 km'yan e. Li Rebetê keleyek xerabe

²⁰ Wêne 7.

Heye û di hin çavkanîyên ku behsa Mêrdîn û Dêrikê dikin de ev keke jî tê nasandin û ligel wê di hinek çavkanî de behsa Xirbeyên Fitnê jî tê kirin.²¹

Li ser dîrok û navê Fitnê li gund vegotîneke bi vî awayî heye ku me jî sê beşdarvanên cuda guhdar kir. Vegotinên van beşdarvanan yê hevbeş bi vî awayî ye: *‘Ev gund berê gundê fila bû, gund di dema Xalid bîn Welîd di hatîyi fetihkirin. Pêşî Fitin hatîyi sitandin û dor hatîyi ser Rebetê. Ji ber gi kela Rebetê hebûyi û ev keke pir asê bûyi, Rebet nehatîyi sitandin. Mîrê Rebetê û eskerê xwe ketini kelê û bi meha li ber xwe dani. Rakê zilamekî ji Fitnê diheri cem Xalid bîn Welîd û jê ri dibê ‘Di hundirê kelê di rêyek bi dizî heyi û ev rê tê ser avê. Eskerê mîr bi şev tîn ser avê û avê dikşînin kelê. Heger hun vê rêyê ji destê wan dernexin hun nikarin vê kelê bistînin.’ Li ser vê fesadîya vî zilamî rêya avê tê girtin û eskerê bi şev tîn avê bibin, êsîr tîn girtin. Bi vî hawî ê di hundirê kelê di bê av dimînin mecbûr dimînin teslîm bibin. Navê gund heya wê rojê ‘Fîlos’ bûyi lê li ser vê olayê (bûyerê) ji wê rojê û vir de navê gund bûyi ‘Fitin’ yanî ‘cê fitne û fesadîyê.’* (A., O. û C. Fitin, 2014)

Wekî dîroka wê ya kevnare, dîroka avakirina wê ya nêzîk jî baş naye zanîn. Gund heya 80-90 sal berê gundê eşîra Hemzoya bûye. Li gor vegotîna beşdarvanekî, *‘Elayê Birê Hecî Elî’* bi vî awayî dibe xwedîyê gund: *‘Hemzoyî û Mala Hecî Osmanê Reşo dibin kirîbê hev. Li ser vê kirîbantîyê Hecî Osman wek hedîye (dîyarî) xeftanekî didi mezinê Hemzoya. Mezinê Hemzoya jî ji bo di bin vêya di nemîni nêvîyê gund didi Hecî Osman. Wextek dehri Hemzoyî nêvîyê gund ê mayî difroşin kalikê me Ela. Ela tê dikevi gund. Çend salekî bi vî hawî li gund dimîni. Dû ri cabekê ji Hecî Osman ri dişîni û dibêje ‘du hespê nêr di alîfekî di nikari êm bixwu, ya tu para xwe bifroşî mi û ya jî ez ê para xwe bifroşim te.’ Sebeba gi Ela ji Hecî Osman re wenî dibêji, dijminatîya berê a di navbera Rûtî û Mamûdî de yi. Ela Rûtî yi û Hecî Osman jî mezinê Mamûdîya yi. Hecî Osman qebûl diki gi para xwe bifroşî Ela. Bi mîqdarek zêr û hinek pez û dewar li hev dikin û Ela dibi xwedîyê temama Fitnê.’* (C. Fitin, 2014)

Li gor vî beşdarvanî, ev kirîn û firotin li der dora 80-90 sal berê bûye. Piştî ku malên Hemzoyî para xwe ya mayî difroşin, ji gund bar dikin. Hemzoyî bi eslê xwe

²¹ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. (http://www.derik.gov.tr/default_B0.aspx?content=209) û (Mardin II Yıllığı, Ajans-Türk Matbaacılık, 1967, Ankara, rp.128)

malbatek Heramî ye. Berî Hemzoya kî di Fitnê de bû û Hemzoyî kengî hatine Fitnê nayê zanîn.

Ji bilî keçan, tevî lawên wî yên hebûn, piştî ku tê gund jî bi giştî dibe heşt lawê Ela. Gund dîv re di navbera van heşt biranan de parve dibe. Li serê her lawekî, li der dora 600 donim zevîyên ku tê ajotin dikeve. Ji van birayan yek jê para xwe bi temamî difroşe çend birayên xwe yê din û ji gund bar dike, dihere li navenda Dêrikê bi cih dibe. Hinek ji van zevîyan dîv re hatîye vedan. Her weha di mera gund de jî her yek ji 8 paran xwedîyê parekê ne. Ji bilî Mala Ela di gund de tu malên din tune. Li gor agahîyên ku beşdarvanan daye me, heya bîst û pênc, sî sal berê, ji bilî mala Ela hin gundîyên din jî li gund dijîyan. Ev gundîyên ku di wan deman de li gund dijîyan bi eslê xwe ji gundên der û dorê yên wek Erbelûş, Heramy, Lalan û wekî din bûn. Lê di van sî salên dawîn de ji ber sedemên guhertî, van malan ji gund bar kirin. Sedema herî girîng ew bû ku zevîyê van gundîyan tunebû. Yan bi şîrkatî zevîyên Mala Ela diçandin yan jî ji ber derfeta çêra çîyayê Fitnê pez xwedî dikirin. Sedemeke din jî ew bû ku gund di sala 1993'yan de ji alîyê dewletê ve hatîye valakirin. Beşdarvanekî, li ser valakirina gund û wê demê ji me re weha got: *'Ji ber gi mezinê me, qoricîtiya (parêzvanîya gund) dewletê qebûl nekirin, eskera gundê me vala kirin. Sê çar mal hatin şewitandin. Di wan wextan di ez bîst salî bûm. Me gelek zulm û zor û zehmetî kişandi. Rakê esker hatin nav gund û zîlam giş li meydanê kom kirin. Bi kulm û piñnan li herkesî xistin. Dû ri wexta ji gund çûn, hinek zîlam jî bi xwe ri birin, girtin binçava û em tehdît kirin gi em ya bibin parêzvanê gund ya jî em ji gund derkevin. Em mecbûr man, di hundirê du sê ra di me gund vala kir. Ê hatibûn binçavkirin du sê meha li Mêrdîn, li tûxayê (lîva leşkerî) man. Ji ber gi me gund bi temamî vala kiribû, pezên me, erdê me, xerzîkê me, xanîyê me bêxwedî man. Em û çend malê mervê xwe em çûn li Dêrikê bi cî bûn. Hinek mervê me çûn Îstenbûl. Gundîyê me, ê ne ji Mala Ela, hinek ji wan çûn li Dêrikê bi cî bûn, hinek ji wan çûn li gundê der dora Carbekir bi cî bûn. Ji xwe ew gundîyê me yî wê çaxê ji gund derketin û çûn, êdî nema vegeyîyan. Em bi wan ri bûbûn wek malekê, me ferq nedixist navbera wan û mervê xwe. Ana jî di şûn û şaya di em bi ser hev di diherin û tên. Şeş heft meha gund wenî bêxwedî ma, dû ri me îzna (destûra) vegeyîyan. Ji bo gi em xisara xwe yî madî û manevî bistînin me dawê (doz) vekir, lê dawa me tişteke jê derneket. Valakirina bi zorê bû sebaba barkirina mezin gi gelek mervê me û gundîyê me ji gund çûn û êdî nema vegeyîyan.'* (C. Fitin, 2014)

Anha ji heyşt lawên Ela kesek sax nemaye, gund êdî di navbera zarokên van heyşt lawan de parve bûye. Ji ber wê jî zevîyên ku li serê her malekê dikeve biçûk bûye û êdî ev zevîyên ku para wan ketîye têra debara wan nake. Ev yek jî xuyaye bûye sedema duyemîn ya koçê. Ji ber ku wekî berê ajalvanî jî nayê kirin, derketina ji gund bûye wek bêgavîyeke aborî. Malên ku ji Fitnê bar kirine li cihên wek Dêrik, Stenbol, Dîyarbekir, Îzmîr û Edenê bi cih bûne. Malên ku barkirine û li derve dijîn gelek cûre kar dikin. Karê ku herî pir tê kirin, bazirganî ye. Li gor agahîyên ku beşdarvan didin, rewşa aborî ya hineka ji wan gelekî baş bûye. Ev malên ji gund bar kirine, bi piranî têkilîyên wan ji gund qut nebûye. Gelekê van malan li gund jî xwedî xanî ne û bi piranî di havînan de demên ku dibistan dikevin betlanê yan jî di dema çînîna tene de tîn li gund li malên xwe dijîn. Yên xanîyê wan li gund tunebe jî li malên xizmên xwe dimînin.

Rengêkî civaka gund jî koçer in. Li der dora sî salî ye ku her zivistan çend malên koçera, pezê xwe ji zozanên Hezerom û Elezîzê tînin li Fitnê qîşle dikin. Berê, koçerên dihatin li Fitnê diman Bêrintî bûn. Ev çar pênc sal in êdî Bêrintî nayin, ji dêvla wan hin koçerên din tîn. Koçer di dawîya payîzê de tîn û serê buharê vedigerên alîyê zozên. Di demên ku lu Fitnê dimînin, pezê xwe li mera gund diçêrînin. Ji bo vê yekê jî wek kirê, li gor bazara salê mîkdarek pere didin şênîyên Fitnê. Salên berê her maleke Fitnê, li gor para xwe ji vî perî distendin lê ji çer ku li gund mizgeft û mala şînê çêbûye, ev pereyên ku koçer didin, ev çend sal e ji bo mizgeftê û mala şînê tê xerckirin. Bêrintîyên ku dihatin gund anha li gundên Bismil û li Intabê rûniştine.

II.5.3. Aborîya Fitnê

Aborîya Fitnê li ser cotkarîyê ye. Li gor agahîyên ku me ji Gerînendeya Xurek, Çandinî û Ajalvanîyê ya Qeymeqamtîya Dêrikê sitendîye li Fitnê di sala 2013'an de 3.560,983 donim genim; 3.305,545 donim garis; 87,123 donim pembo hatîye çandin. 132,82 donim xerzîkê tirî; 268,824 donim zeytûn; 27,766 donim hinar; û 14,645 donim jî darên mêwên guhertî tevlihev wek hilberîna çandinî heye. Ango li gor van hejmaran bi giştî axa Fitnê ya ku lê cotkarî tê kirin, ji ber ku garis berhemê duyemîn e û dewsa genim dibe garis, tenê 4092,161 donim e.

Darên zeytûnan ji ber ku 10-12 salî ne, berhemên wan kêr in. Baxçeyê hinara jî ev du sal e hatîye danîn, ji ber wê hîn tu berhem bi dest neketîye. Ji ber ku mera gund gelekî mezin e ji baxçevantîyê re guncan e. Di demên berê de ev çîya û mera gund ji bo ajalvanîyê dihate bikaranîn lê di van 20-30 salên dawîn de ajalvanî gelekî kêr bûye. Li gor agahîyên gerînendeya cotkarîyê ya navçeyê, li gund 102 dewar û 73 pez tê xwedîkirin. Ji bilî her malek ku ji bo pêdivîyên xwe çêlekekê du çêleka yan jî pezekî du peza xwedî dike, malên ku ji bo debara xwe ajalvanîyê dike tenê du heb e.

Piranîya zevîyên gund bi kolandina bîra bûye avî. Li gor çandinîya garis, mirov dikare bêje ji %80'yê zevîyan bêtir avî ne. Berê li ber du jêderê avê yên xwezayî, hinek zevî dihatin avdan. Lê ji ber ku ev zevîyên dihatin avdan kêr bûn û ev jêderên avê jî qels bûn û zû zuha dibûn, di van 10-15 salên dawîn de gelek bîr hatine kolandin. Hinek şênîyên gund bi derfetên xwe bîr kolane hinekan jî ji bankeyan kredî sitendine û kolane. Şênîyên ku kredî bikaranîne anha jî deyndarên banka nin. Şênîyên bi cotkarîyê ve dadikevin ji buhabûna karûbayê, mazotê, toxim, gubre û dermanan digazinin.

Derfetên gund yên baxçevantîyê pir in. Di van salên dawîn de zeytûn û hinar hatine çandin lê li gor firehbûna mera gund ev rêje kêr e. Heger ev mera bi awayeke zanistî were bikaranîn, li gor ax û av û hewa herêmê, ji bo çandinîya darên zeytûn, qeresî û fîsteqan guncan e. Her weha ev derfet ji bo ajalvanîya modern jî dikare were bikaranîn. Li gund kooperatîfek heye lê anha tu çalakîya wê tune. Ji bo van derfetên ku li jor me behs kiriye, ev koperatîf ji bo birêvexistina şênîyên gund dikare were bikaranîn.

II.5.4. Jîyan li Fitnê

Piranîya xanîyên gund yên kevn in. Ev xanî bi kevir û axê hatine çêkirin. Ser wan dîrek û beş û mircaq in. Bi piranî ji du odeyan û holekê pêk tên. Biçûk mezin giş xwedî hewş in. Daşirên mala di van hewşan de ne. Cihê serşoyê û medbex jî wek odekên biçûk yan di hundirê malê de yan jî di hundirê hewşê de dûvre hatine çêkirin. Ji bilî van xanîyên kevn hindik be jî xanîyên nuh hatine çêkirin jî hene. Ji van xanîyên ku anha mal tê de dijîn, bi qasî wan jî xanîyên xerabe hene. Li ser pirsê me fam kir ku ev

xanîyên xerabe, yên malên ku ji gund barkirine. Bi awayeke xurt gund ji alîyê serjimêriyê ve vala xuya dibe.

Di navbera Fitnê û Beyrokê de, li ser pîyê rastê rezên zeytûna hene. Li hin cihan navber dikevê lê heya ku mirov digihêje nava gund li çend deverên din jî mirov dikare li darên zeytûna rast were. Berî ku mirov têkeve nava gund, ango li başûrê gund bi gotina şênîyan “hewq” hene. Di van hewqan de darên hijîr, hinar, gwîz, hurmî, zeytûn, mişmiş û cûreyin din hene. Li gor vegotina şênîyan ev hewqina di demên berê de ji alîyê dar û beran ve dewlemendtir bûye. Di wan deman de şênîyan hemî cûre fêkîyên xwe jî li van hewqan diçandin. Li gor vegotinê, şênîyên gund anha weke berê girîngîyê nade van hewqan. Li der û dora gund jî xerzikên tirî balê dikşîne.

Heya van salan jî li gund qûleya avê tunebû. Piranîya malan, ji Zelxê, malekê du malan jî ji Kanîyê bi santrufujan av dikşandin malên xwe û ava vexwarinê bi vî awayî dabîn dikirin. Lê ev sê sal e qûle çêbûye û êdî ava her malê ji wir bela dibe. Li gund binesazîya kanalîzasyonê tune. Avên zêde ya dihere ser kortalên foseptîkê ku şênîyan ji xwe re kolane û ser wan girtine yan jî wek cihokan diherike derveyî gund. Li gor şênîyên gund ev yek di salinan de dibe sedemê nexweşîyan. Kêmanîyeke din ya gund jî rêya wê ye. Rêya ku ji Dêrikê tê û ber bi Talbeş û Bixurê ve dihere asphalt e lê navbera vê rêyê û gund ne asphalt e. Ev rêya şose ku bi qasî 2 km û nîva ye, heya nava gund tê û disekine. Anha di navbera Rebetê û Fitnê de rêyek çêbûye lê di eslê xwe de ev rê ne rêya tirimbêla ye. Ev rê ji berê de pêkrê bû lê ji ber ku carinan tirimbêl tê de diherin û têt, bûye wek rêyekê. Ji ber ku ev rê gelekî xerabe ye, pir kêmtê bikaranîn. Kuçeyên di nava gund de jî neçêkirî ne û gelekî xerab in. Rêyên ku hene yên kevin in û bi tat û kevir in.

Li gund dibistana seretayî û ya navîn ji ber kêmbûna şagirtan girtî ye. Şagirtên gund diherin dibistana Zorava ya seretayî û navîn. Li gund tu sazîyeke din ya fermî tune. Dema ku li gund nexweşek çêdibe, diherin navenda Dêrikê. Heger nexweşxaneya Dêrikê têrê neke, herkes li gor derfetê xwe û pêdivîya nexweşîya xwe dihere Dîyarbekir, Mêrdîn, Stenbol yan jî cihekî din. Li gund dikan, firne, qehwexane, û oda gund tune. Çûn û hatina şênîyan li ser Dêrikê ye û hemî pêdivîyên xwe ji navenda Dêrikê dabîn dikin. Heger bazara Dêrikê têra wan neke wê demê diherin Qoserê, Dîyarbekir yan jî Mêrdîn.

Nêrîna şênîyan ya li ser xwendinê erênî ye. Di navbera xwendina keç û xortan de ti cudayîyekê nabînin. Bi awayeke balkêş xwendeyên gund gelek in. Di nava vana de yê tenenê wan mezin ji mamostetîyê malnîşinî bûne jî hene. Şênîyekî gund wek hejmara van xwendeyan û beşê xwendina wan bi vî awayî got: *“Heya nuha ji gundê me du doktorên ûzman (bijîşkên pispör), sê muhendîs (endezyar), deh panzde heb meelim (mamoste) ya jî ê gi meelîmtî xwendîye lê anka meelîmtîyê nakin heni. Ji xêndî vana keç û xortê me ê li unîversîteyan dixwînin jî heni. Teva ê gi xelas kirîyi di nava van xortan de 12 heb keç û jin heyi. Piranîya van kesên xwende ji ber karên xwe li dervî gund rûdinin. Di nava Fitinîyên ji zû de yi ji gund derketini û li Dêrikê ya jî li Îstebûl bi cî bûni jî ê dixwînin gelek in.”* (S. Fitin, 2014)

Jinên gund, di jîyana xwe ya rojane de, bi piranî bi karên malê ve dadikevin. Karên malê yê sereke çêkirina xwarinê, paqijî, xwedîkirina zarokan in. Jin ji bo nê bipêjin tenûra bikartînin. Jina ku karê xwe diqedîne yan li mala xwe li ber telewîzyonê rûdinê yan jî dihere nav mala. Ji ber ku di gund de herkes merivê hev e, derîyê herkesî ji yê din re vekirî ye. Xort û mêrên gund, heger karê wan hebe karê xwe yê cotkarîyê dikin, heger kare wan yê bi vî rengî tunebe yan diherin navenda Dêrikê; yan jî li malên xwe, li malên merivên xwe bi meriv û hevalên xwe re dema xwe derbas dikin. Heger hewa xweş be carinan li der dora gund derdikevin seyranê. Di her malê de telewîzyon heye. Li çend mala înternet jî heye. Bi jin û mêr û xortan re telefonên desta heye. Di telefonê hinek xortan de înternet jî heye. Şênîyekî ji nîfşê mezin di derheqê zarotîya xwe de weha got: *“Berê me bi şevê bi çavgirtînkê, bi kaba, bi dimyada (fîncan) dilîst; biro jî me bi nalkê, bi sêqûçê, bi çirê, bi cita, bi kevîrê qewetê dilîst. Her me yekî kevkanîyek me hebû, me bi wan dilîst. Şevê zizvistana yextyarekî gund hebû navê wî Mamedo bû. Wî meselok ji me ri digot, carna distira. Çîrokên tên bîra min çîroka Sîyamedê Silivî, Teyarê Qereçolî, Tehar û Zehar, Reşîd Paşa û Zeynebê bûn. Ji xêndî vana mezinên me pir qala serpehatîyên Apê Reşo û Qadê Ela dikirin.”* (O. Fitin, 2014)

II.5.5. Çand û Kevneşopî li Fitnê

Şênîyên gund di nava xwe de ji bilî kurmancî bi tu zimanekî din napeyivin. Ji çend heb jinên temenmezin pê ve herkes bi tirkî zane. Di navbera kurmancîya Fitnê û

navenda Dêrikê de em li tu cudayetîyan rast nehatin. Sedema vê yekê ya girîng ev e ku malbata ku anha li gund dijî bi eslê xwe ji navenda Dêrikê ye. Heger di navbera Fitnê û Dêrikê de, di bilêvkirina hin peyvan yan jî navlêkirina hin tiştan de cudayetî hebe jî ev yek dê bi bandora şênîyên gund yên berê be. Wek mînak li navenda Dêrikê ji bo baxçeyên dar û bera navê ‘rez’ tê bikaranîn. Li Fitnê ji bo baxçeyên dar û bera û yên fêkî dibêjin ‘hewq’. Ev nav, li navenda Dêrikê nayê bikaranîn. Di kurmancî de ‘Hewq’ di wateya ‘dik’ê de ye ku ji cihê ji rûyê erdê bi çend metrekekî bilind re tê gotin. Xuyaye ev bêje ji kevin de li gor rewşa nizmbûn û bilindaya di nava rezan de, ango ji bo dikên di nava van rezan de hatîye bikaranîn û weha maye. Ev rezên ku şênîyên gund jê re dibêjin ‘hewq’ bi rastî jî dik bi dik in. Herweha tê fêmkirin ku wekî vî navî, navên erdnîgarî û herêmên gund yên anha jî bi awayeke zindî tînan bikaranîn, bi piranî ji şênîyên gund yên berê mane. Mebesta me ji ‘şênîyên berê’ ne yên ku berî mala Ela tenê ne, ji ber ku hin nav hene ku pêkan e gelekî dûrtir here. Wek mînak di ola suryanîyan de nasnavê ‘Meqsî’ wek pênaseke olî tê bikaranîn. Li Fitnê navê hewqekê ‘Hewqa Meqsî Korko’ ye. Ji bilî wê, navê hin herêmên din jî yên wek ‘Şikefta Mîşo’, ‘Mezelê Fila’ dide xuyakirin ku ev nav di demên kevin de hatine dayîn û pêkan e ku şênîyên gund yên berê suryanî bin. Ji xwe wek vegotinekê jî di nava şênîyan de tê gotin ku ‘*Ev gund berê ê fila bû, navê wê jî Filos bû.*’ (O. Fitin, 2014) Lê navê hin herêman jî di dema şênîyên anha de çêbûye. Wek mînak, Silîmê ku navê wî li du deveran bûye, tê naskirin ku bi Mala Ela re hatîye gund û bi awayê xînamîyê merivantîya wan heye. Cihê ku Silîmo lê hatîye kuştin wek ‘Mêlava Silîmo, Kortika Silîmo’ tê bi navkirin. Ango bi gelemperî mirov dikare bêje ku pêvajoya navdayinê tu carî bi dawî nabe. Ji ber ku jîyan dewam dike, tiştên nuh çêdibin, pêdivîyên bi navên nuh derdikevin holê. Wek mînak mizgefta gund, mala şînê, qûleya avê û dibistana gund di demên dawîyê de çêbûne û nav li wan hatîye kirin û hinek cî jî êdî li dewsa navê wan ê berê wek navnîşan bi navê van deran tînan xwendin. Wek ‘*Pêtikên li paş mektebê, sergoyê li binya camîyê*’ û hwd.

Di nava şênîyan de biwêj û gotinên pêşîyan bi awayeke xurt tê bikaranîn. Wek berhemê wêjeya bi devkî navê çîroka ‘Husên Kurdî’ hate gotin ku vebêjê vê çîrokê Birehîmê Ela bûye û dema ku ev çîrok vedigot sê seetan dewam dikir. Lê anha yên vê çîrokê bi vê dirêjayê vebêje tune. Beşdarvanekî got berê şevên zivistana vebêjên çîrokan bi seetan dor bi dor çîrokên xwe vedigotin, lê anha ew kevneşopî nemaye.

Di van sê çar salên dawî de li gund mizgeftê û malek şîne hatîye çêkirin. Şênîyên gund giş misilman in û li ser mezhebê Şafî nin. Ji ber ku serjimêrîya gund hindik e, cemeeta mizgeftê jî kêr e. Li gund melayekî fermî heye. Şînen gund li vê mala şîne tên danîn. Di demên berê de bi piranî şîne li mala dihate danîn, lê piştî ku ev mal hatîye çêkirin êdî mêvan li vir rûdinîn.

Malbatên gund bi piranî malbatên biçûk in. Keç û xortên ku nuh dizewicin heger demek hindik tevî malê bimînin jî dûv re cihê dibin. Bi qasî ku di nava xizman de zewac çêdibe, ji derve jî çêdibe. Bi taybetî jî di van salên dawî de zewaca di nava xizmên nêzik de kêmtir bûye. Keç û xortên ku dêbizewicin heger merivên hev bin, ji xwe ji berê de hevdu nas dikin û heger ne merivê hev bin jî pêşî hevdu nasdikin, dûv re xwazgînî û dîlan tên çêkirin. Zewaca bi awayê berdêlî cara dawî deh donzde sal berê hatîye kirin. Malbata bûkê yan qelen nastîne yan jî pir hindik distîne. Qelenê ku distînin jî ji bo keçîka xwe xerc dikin.

Dîlan sê rojan dewam dike, roja îne ji nîvro û şûn de dest pê dike û roja yekşemê bi anîna bûkê xelas dibe. Yan jî roja sêşemê dest pê dike û roja pêşemê bi anîna bûkê xelas dibe. Di van sê rojan de xwarin tê çêkirin, bi sazê elektro dîlan tê gerandin. Di dîlanan de jin û mêr bi hev re dikevin govendê. Lîskên herî pir tên lîstin ‘di cî de’ û ‘delflo’ ye. Ji bilî van her du lîskan, şêxanî, şêrizdîn, bablekan, du nîgo û ormîye jî tên lîstin. Di dîlanan de merivên şênîyan yên li derve jî vedihewin. Her weha ji gundên cîran û kesên ji dûr ve merivên şênîyan jî tên dîlanê. Wekî ku li her derê di kevneşopîyan de guhertin çêbûne, li Fitnê jî ev guhertin pêk hatine. Beşdarveneke temenmezin li ser dîlanên berê weha got:

“Berê saz tunebû, dawetê me ya bi def û zurne bû ya jî li ber bilûrê bû. Bûk li hespekê siwar dikirin, kulîkekî sor bi serî de dadikirin. Bûk û zava heger ne mervê hev bûna hevdu nas nedikirin, dê û bavê wan bigota hun ê bi kê ri bizewicin wan jî ev yek qebûl dikir. Bûk û zavê nuh teva malê dibûn, heya dereng cihê nedibûn. Lê dînya anka fentezî bûyi, kesek bi tiştê qayil nabi, dibên her tişt gerek li gor dilê me bi.” (G. Fitin, 2014)

Heger zava ji derveyî gund be û bûk ji gund be, di dema erêkirina zewaca wan de xortên gund yên azîb, pezekê ji alîyê zavê dixwazin. Di kevneşopîyên gund de navê

vî pezî ‘‘peza aziba’’ ye. Ev pez divê di navbera xwazgînî û dîlanê de bê dayin. Ya na xortên azib nahêlin bûk ji gund derkeve. Dema ku xortên azib pezê xwe distînîn, wê dibin şerjê dikin û dixwun. Heger zava ji gund be, roja ku bûk tê, hevalên zavê wê rojê wek ‘‘şeva zavatîyê’’ yan jî ‘‘şeva paşatîyê’’ pîroz dikin. Hevalên zavê li hev vedihewin, li malekê kom dibin, heya dibi bi şev şahîyekê lidardixin. Demên berê, di vê şevê de xortan di nava xwe de bi lîstikan dilîstin, di nava xwe de pêşbirk çêdikirin, dûrik digotin, lê anha tenê dûrika dibêjin. Li gor demsalê, seet li der dora neha yan jî deha, zavê bi çepik, dûrik û lîrlîr dibin mala wî. Roja din jî karê hevalên wî xelas nabe, wexta nîvro diherin mala zavê ku wî ji mal derxînin. Zavê jî berî dîlanê amadekarîya hevalên xwe kiriye, ji her yekî re xelatek amade kiriye. Roja sisîyan jî hem ji alîyê bûkê hem jî ji alîyê zavê, jin diherin serdana bûkê û ji vê rojê re dibêjin ‘sêrokî’. Jinên ku diherin bixêrhatina bûkê û wê pîroz dikin jê re xelatekê yan dîyarîyekê dibin. Bi vî awayî şahîya dîlanekê xelas dibe. Heger li gund di demên nêzîk de şîn çêbûbe û bi taybetî jî yê mirî ciwan be, dîlan nayê çêkirin. Wê demê tenê mewlûd tê xwendin, nan tê çêkirin û bûk tê anîn.

Dema ku zarokê malê çêdibe piştî heftakê şahîyekê tê çêkirin. Navê vê şahîyê ‘‘heftek’’ e. di vê şahîyê de bi piranî mewlûd tê xwendin, xwarin tê çêkirin, û yên beşdar dibin xelatekê bi zarokê nuh vedikin. Lê dibe ku şahîyeke mezin jî were çêkirin. Li gor vegotina beşdarvanekî, îsal şênîyekê gund ji bo suneta lawekî xwe, şahîyeke mezin lidarxistîye. Ev şahî bi saz û govend û mewlûd hatîye çêkirin. Li gor heman beşdarvanî, bi qasî şeş heft sal berê jî şênîyekê din jî hefteka lawikê xwe bi vî awayî bi şahîyeke mezin çêkiriye.

Navê zarokê nûçêbûyî bi piranî dê û bav lê dikin. Bapîr û dapîr di rêza duyemîn de ye ku herî pir nava li zarokan dikin. Ji bilî wan ap, xal, metik, xaltîk yan jî xizmên din jî dikarin nava li zarokan kin. Di mijara navê mirovan de li Fitnê du tiştê ku balê dikşîne heye. Ya yekemîn di navê gelek mirovan de ‘xan’ heye. Ji van mirovan hinekan jê jîyana xwe wenda kiriye û hinek ji wan jî anha li gund rûnanîn. Hin mînakên van navan ev in: Bedîrxan, Elîxan, Seydxan, Mîrxan, Eyupxan, Şerefxan, Mehmed Xan, Zuleyxan, Eslîxan, Neslîxan... Ya din jî ji ber ku ji gund barkirine û anha li gund najîn, di lîsteya hîlbijêran de navê wan tune ye, bi rêjeyeke bilind navê kurmancî yê jin û mêran heye. Hinek mînakên van navan ev in: Şîyar, Şerzan, Rodî, Bahoz, Nejwan,

Hogir, Hêja, Zîlan, Zîlda, Dîlan, Hêvîcan, Rojbîn, Gulbîn, Mervîn, Pelveda... Temenê van kesan ji 18'an heya 40'î ye. wek kevneşopîyekê navê bapîr, dapîr, ap, xal, metik û xaltîkan tên hilanîn. Wek mînak navê Ela, Dilşa, Nûrê, Qadê Ela, Izedînê Ela, Birehîmê Ela, Emerê Ela û Birhanê Ela; wek Ela, Eladîn, Dilşa, Nûrhan, Evqadir (Qado), Izedîn, Îbrehîm (Birehîm), Emer û Birhan li nevîyên wan yan jî birazîyên wan hatine kirin.

Dema ku li gund şênîyek jîyana xwe wenda dike, li gor kevneşopîyên olî tê veşartin. Mezelekî gund heye û ji bilî vî mezeli wek herêmeke wek "Mezelê Fila" tê bi navkirin heye. Şîna yê mirî li mala şîne tê danîn. Ev avahî bi mizgeftê re çêbûye. Qatê binî wek mala şîne; yê ser jî wek mizgeft hatîye çêkirin. Berî vê malê, dema ku şînek çêdibû, wek cihê şîne bi piranî mala xwedîyê yê mirî dihate bikaranîn lê ji ber ku şênî giş merivê hev in, kîjan xanî guncan ba û pêdivî bi kîjan malê hebûya ew jî dihate bikaranîn. Şîn kêmanî çar pênc rojan didome. Carina hinek şîn bêtir jî didome. Di şînan de mal giş alîkarîya hevdû dikan. Ev alîkarî di warê xizmetê de jî tê kirin û heger pêdivîya malê pê hebe di warê aborî de jî tê kirin. Di şînan de piranîya Fitinîyên li derveyî gund rûdinin jî vedihewin. Heger herkes nikaribe were jî kêmanî ji her malekê kesek yan jî du kes tê. Di şînan de her roj navroj û şîv tê çêkirin. Kesên tên şîne fatîhê dixwînin. Di roja sisyan de mewlûd tê xwendin û xwarineke mezintir tê dayin. Ji vê rojê re 'sêrokî' tê gotin û ev roj ji rojên din qerebalixtir dibe. Di dema razanê de mêvanên li gund bimînin, şênî wan li hev parvedikin.

Cil û bergê jinên gund li gor temenê wan tê guhertin. Jinên bitemen kitan, hubrî û kirasê dirêj li xwe dikan. Di nava malê de dibe ji dêvla kitan û hubrîyê tenê xavikê bi serê xwe de dakin. Jinên bûk û ciwan bi piranî kiras li xwe dikan û ji bo serê xwe jî yan xavikê yan jî destmalê rengîn yên ku jê re dibêjin bêrîvan bikartînin. Keçên gund bi piranî cil û bergê modern bikartînin. Di dîlanan de bi piranî keç û bûk hiçik û fistanên dirêj li xwe dikan. Cil û bergê mêra giş modern in. Di navbera ciwan û mezinan de cudayeti tune. Lê li gor beşdarvanekî ji me re got, nifşekî mezin yê berî vî nifşê anha şalwer li xwe dikirin.

Li gund, ji bilî xwazgînî, dîlan û şînan, rojên taybet rojên cejnan e. Cejna Remezanê û cejna Qurbanê tê pîrozkirin. Di van rojan de biçûk diherin serdana mezinan. Yên nimêj dikan diherin mizgeftê, nimêja cejnê dikan pêşî. Dûvre li nav gund bela dibin, zû dereng herkes dihere mala hevdû. Ji ber ku ji bilî cejna kesan, divê cejna

malê bi xwe were pîroz kirin. Di cejnan de şekirê cejnê, qehwe, çay û vexwarinên din tînen îkram kirin. Wexta xwarinê li kîjan malê bigihêje li wir xwarin tê xwarin. Li gor beşdarvanekî, di demên ku cejna Newrozê qedexe bû jî salnan li der dora gund agir dihate vexistin, lê anha bi piranî şênî yan diherin Newroza Dêrikê yan jî diherin ya Dîyarbekir.

II.5.6. Rewşa Navê Mirovan Li Fitnê

Agahîyên ku me ji lîsteya hîlbijartinên herêmî û ji lîsteya dibistana gund ya seretayî û dibistana navîn ya Zorava sitendîye, li Fitnê rewşa navê mirovan bi vî awayî ye:

Tablo 50: Hejmar û Rêjeya Navan (li Fitnê)

	Hejmara Hilbijêran	Hejmara Navê Hilbijêran	Rêje
Jin	17	17	1
Mêr	15	13	0,87
Bi giştî	32	30	0,94

Di lîsteya hîlbijêran de 32 kes heye. Ji bo wan 30 nav hatîye bikaranîn. Li serê her kesekî 0,94 nav dikeve. Ji bo jinan li serê her kesekê navek, ji bo mêran li serê her kesekî 0,87 nav dikeve. Di lîstê de navên 2 mêran (Ömer, Fesih) heye ku her yek 2 caran hatîye bikaranîn. Jê pê ve her navek ji bo mirovekî hatîye bikaranîn. Li gor zimana hejmar û rêjeya navan bi vî awayî ye:

Tablo 51: Hejmar û Rêjeya Navan, li Gor Zimanan (li Fitnê)

Ziman	Navê jinan	Navê mêran	Bi giştî	Rêje(%)
Erebî	11	8	19	%59,4
Kurmancî	4	1	5	%15,6
Tirkî	-	1	1	%3,1
Îbranî	-	1	1	%3,1
Farisî	-	1	1	%3,1
Navên têkel	2	2	4	%12,5
Dunav	-	1	1	%3,1
Bi giştî	17	15	32	%99,9

Li gor zimanan navên herî pir hatîye bikaranîn bi rêjeya ji %62,5'an bi zimanê erebî ye: "Sultan, Hedîye, Ömer..." Ji %15,6'ê navan bi kurmancî ye: "Gülîstan, Gülbin, Menal..." Navek bi tirkî "Orhan"; navek bi Îbranî "İbrahim"; navek bi farisî "Şahin"; 4 nav têkel "Abdulhan (erebî-kurmancî), Şerefhan (erebî-kurmancî), Züleyhan (erebî-kurmancî) Nezişah (erebî-farisî)" û navek jî dunavo ye "Eyyüp Han" û "erebi-kurmancî" ye.

Şagirtên Fitnê yê dibistana navîn û yê dibistana seretayî bi awayê veguhastinê diherin dibistanên Zorava ya navîn û seretayî. Me lîsteya van şagirtan ji gerîndeya dibistana Zorava sitend ku em li navê nişên nuh binêrin. Di van her du lîsteyan de rewşa navê şagirtan bi vî awayî ye.

Şagirtên Fitnê yê diherin dibistana navîn 6; yê diherin dibistana seretayî 7, bi giştî 13 heb in. Ji van şagirtan 4 heb keç û 9 heb jî law in. Temenê van şagirtan li gor dîroka jidayikbûnê di navbera salên 2001-2008'an de ye. Ji navê 9 lawan 2 heb bi erebî "Ömer, Nesih"; 3 heb bi kurmancî "Baran, Lezgin, Civan"; 4 şagirt dunavo ne "Mehmet Ali, İbrahim Halil (2), Mehmet Berat". Ji navê 4 keçan jê yê 2 şagirtan bi kurmancî "Havin, Sernaz", 1 bi farisî "Sümbül" û yek jî têkel e, "Gülfidan" û wek ziman bi "kurmancî-yewnanî" ye.

Li Fitnê navê herî pir hatîye bikaranîn di nava lawan de ‘‘Ömer’’ e. Ev nav bi giştî 3 caran hatîye bikaranîn. Navê duyemîn herî pir hatîye bikaranîn ‘Fesih’’ e. Ev nav 2 caran hatîye bikaranîn. Di nava navên jinan de navekî ku dubare bûye tune. Di listeya hilbijêran de navê 17 jinî û di listeyên dibistanan de 4 keç tomarkirî ye. Di listeya hilbijêran de di nava navên jinan de 3 navê kurmancî yê modern heye: ‘‘Gülbin, Menal, Nazgül’’. Navek jî ji navên kilasîk yê kurmancî ye: ‘‘Gülistan’’

Tablo 52: Hejmar û Rêjeya Navên Kurmancî, li gor Temenê Hilbijêran (li Fitnê)

Sala Jidayikbûnê	Hejmara Navên Kurmancî	Mînakên Navan	Rêje(%)
... – 1966	1	Gülistan	%10
1967 – 1972	-	-	%0
1973 – 1978	-	-	%0
1979 – 1984	1	Gülbin	%10
1985 – 1990	2	Menal, Mervan	%20
1991 – 1996	1	Nazgül	%10
2001-2008	5	Baran, Havin, Lezgin, Sernaz, Civan	%50
Bi Giştî	10		%100

32 hilbijêr û 13 şagirt bi giştî ji 45 şênîyên Fitnê, navê 10 kesî bi kurmancî ye. wek rêje dike ji %22,2'ê şênîyan ku navê wan bi kurmancî ye. navên kurmancî herî pir di navbera salên 2001-2008'an de li mirovan bûye. Ji %50 yê navên kurmancî di van salan de hatîye dayin. Hilbijêra ku navê wê bi kurmancî ye û bi temenê xwe herî mezin e ‘‘Gülistan’’ e û di sala 1952'an de jidayikbûye.

II.6. XAROK Û REWŞA NAVÊ MIROVAN LI XAROK

Ji bo agahîyên li ser Xarok bi giştî me bi bîst û du mêt û bi heşt jinan re hevdiîtin pêk anî. Ligel van hevdiîtinan bi gerên me yî li nav gund, bi awayê çavdêriyê jî me agahî ji gund dane hev. Agahîyên fermî yên li ser cotkarî û ajalvanîyê me ji Gerîndeya Xurek, Çandinî û Ajalvanîyê ya Qeymeqamtîya Şemrex sitend. Lîsteya hîlbijêrên Xarok, ya hîlbijartinên herêmî yên 30.03.2014'an me ji Lijneya Hilbijartinê ya Navçeya Şemrex û lîsteya şagirtên Dibistana Seretayî ya Xarok jî me ji Gerîndeya Perwerdeya Netewî ya Şemrex sitend.

II.6.1. Cih, Erdnîgarî û Serjimêriya Xarok

Xarok li bakurê Dêrikê dikeve. Navbera wê û Dêrikê 18 km; navbera wê û Şemrex 20 km ye. Lê ev mesafe li gor rê ye. Bi pêgrêkan Dêrik li der dora 7-8 km'yan e. Cîranên gund bi vî awayî ne: li bakurê wê Hezaz, li bakurê rojhilatê wê Xirbê Ezîm, Lalan, li rojhilatê wê Melebî, li başûrê rojhilatê wê Şêb, li başûrê wê Meşkînan, li başûrê rojavayê wê Sadan û Tilbisim, li rojavayê wê Mavan heye. Zinara Tûrcel li başûrê rojavayê gund dimîne û heremek Xarok xwe digihîne zinara Tûrcelê. Li gor vegotina çend heb beşdarvanan, bi pêgrêkên lir ser Tûrcelê navbera gund û Serê Xabê û Tûrcelê li der dora seetekê ye.

Herêma ku Xarok û gundên cîranê wê yên li jor navê wan derbas dibe lê ye, zozanên rêzeçiyayên Mazî ne. Li herêma Dêrikê ji vê herêmê re û ji herêma alîyê gundên Banqîr, Taşît, her sê Mezra û gundên wekî din li der dora wan jî tê de bi giştî dibêjin "ça, çîya" û ji van gundan re bi giştî dibêjin "gundên çê". Sînorekî vî çiyayê Mazî yê dîyar tuneye lê mirov dikare bêje ji hustuyê Dêrikê dest pê dike û li bakurê rojava heya Qerecdax û ji alîyê bakur û bakurê rojhilat ve jî heya herêma Siltan Şêxmûs û herêma Surgucîya dihere.

Erdnîgarîya vê herêmê bi gelemperî ji gir û zinarên biçûk û mezin, ji tat û qîşan, ji newal û rast û guherên biçûk pêk tê. Li hinek gundên çiyê zevîyên ku tên ajotin ji yên din pirtir in. Li ser van zinaran wekî devîyan darên berî û mazî hene. Li deverna darên mezin bûye jî heye. Darên mazî gelekî kêmbûne. Li gor şênîyekî temenmezî:

“Heya sî çel sal berê jî li vî çayî ji darê berî û mazî mere nikarîbû bi rehetî bimeşya. Ji çer gi ça hatîyi birîn êdî mere gelek heywanê kovî jî nema dibîni. Me jî çayê xwe birî û ji Dêrikê yan jî ji Şemrex jî ê gi tîcareta (bazirganîya) êzing, qurmik û hejika dikirin dihatin dibirîn. Me bi destê xwe mala xwe xerakir.” (O. Xarok, 2014)

Li vê herêmê avûhewa bejayî serdest e. Zivistan sar û havîn germ derbas dibe. Baran pir nabare, li gor beşdarvanên ji nifşên mezin, ev deh panzde sal in berf jî wek berê nabare. Ji ber wê jî serma berê nemaye, çêre jî wek berê dewam nake, gîha zû hişk dibe. Demên berê ev çîya bi daristana xwe ya berî û mazî, bi berfa xwe û bi serma xwe meşhûr bûye.

Li gor TÜİK'ê di sala 2013'an de li Xarok 257 kes dijî. Lê ev hejmar ne li gor mezinbûna gund e. Gelek şênîyên gund ji gund barkirine Dêrikê û deverên din. Ji malên li gund mane jî kêmanî li serê malê xortek du xort li bajarê mezin dixebitin. Ji bilî van xortan, malên li gund jî gelek ji wan di demên kar de wek karkerên demsalî diçin li bajarên rojavayê Tirkîyê dixebitin. Gelek xanîyên gund vala ne û piranîya van xanîyan bi xeterîya hilweşînê ve rûbirû ne.

II.6.2. Dîroka Xarok û Binyada Civaka Wê

Li ser dîroka Xarok em li çavkanîyeke nivîskî rast nehatin. Xarok, li herêma xwe gundê herî kevin tê qebûlkin. Ev bawerîya ku “li herêma çiyê gundê herî kevin Xarok e” li navenda Dêrikê jî serdest e. Li gor me du sedemên vê yekê heye. Sedema yekemîn ev e ku di nava sînorê Xarok de gelek şûnwarên şaristanîyên kevin hene. Ev şûnwar anha bi giştî xerabe ne. Ji nêzîkî gund û bi taybetî ber bi rojhilatê wê ve mirov li gelek xirbeyên bi vî rengî rast tê. Lê ya rast li herêma Dêrikê li gelek gund mirov dikare li şûnwarên şaristanîyên kevin rast were. Ya ku bûye sedemê vê bawerîyê ku Xarok ji gundên din gişan kevintir e sedema duyemîn e. Ev sedem jî ev e ku li navenda Dêrikê û li gelek gundên wê gelek malbat hene ku koka xwe bi Xarok ve girêdidin. Gundên wek Bîrînî, Mavan, Melebî, Golika Geryayî, Sûsik û hwd. ji alîyê kesên ku ji Xarok rabûne hatîye avakirin. Li hêla berîyê jî gundên wek Zembelor, Kose Welî û Dêşî (Mala Melo), Êsibê Pîrê (Êsib bi xwe ji Xarok e) ji alîyê Xarokîyan ve hatîye avakirin û bi

taybetî li gundên wek Tilbisim, Heboşîyê, Balfîsê û li gelek gundên din malbatên bi eslê xwe ji Xarok in hene. Li navenda Dêrikê eşîra Şaqûlîkî û gelek malbatên biçûk û mezin koka xwe bi Xarok ve girêdidin. Gelek malbat jî dibêjin pêşîyê me ji devernî din hatine lê belê wek li herêma Dêrikê qonaxa yekemîn pêşî hatine li Xarok bi cih bûne û dûv re hatine nava Dêrikê yan jî gundekî wê. Esomikî, Şaqûlîkî, Mala Elîyê Eysê, Mala Osmên (ji Heramya) hin ji van eşîr û malbatan in. Ji ber van vegotinan tê qebûlîkirin ku Xarok gundekî gelekî kevn e.

Ji bo ku dîroka Xarok ya kevin bi awayeke zanistî were lêkolîn, divê lêkolînên arkeolojîk werin kirin. Di nava sînorên Xarok de gelek navendên hêjayî lêkolînê hene ku her yek bi qasî du sê kîlometreyan dûrî hev e. Her weha li gundên nêzîkî Xarok jî gelek şûnwar hene, heger têkilî di navbera van şûnwaran de hebe ew jî divê werin zelalkirin ku li van deran kîjan şaristanî bûne desthilatdar. Ji bilî lêkolînên arkeolojîk divê vegotinên endamên van eşîr û malbatên ku koka xwe bi Xarok ve girêdidin jî were berhevîkirin, da ku dîroka wê ya nêzîk jî were ronîkirin.

Wekî dîroka xwe ya kevnare, dîroka avakirina Xarok ya nêzîk jî ne dîyar e. Li gor şênîyên gund, Xarok di demên kevin de hatîye avakirin û navber neketîye nava wê û avakirîna îro. Di gund de du eşîr hene: Eboyî û Şêxalîkî. Ji van her du eşîran pêşî kîjan hatîye gund, yan kîjan eşîrê gund ava kiriye, berî wan gund ava bû yan ne ava bû, heger ava bû şênîyên gund yê berê kî bûn ahha ne dîyar e. Ji her du eşîran jî beşdarvanên ku me bi wan re hevdîtin pêk anî, bersîva vê yekê nizanîbûn. Beşdarvanekî ji nifşê mezin ji me re got li gor ku me ji mezinên xwe bihîstîye, di demên gelekî kevin de li van deran Mesîhî jî hebûn. Şênîyekî din jî got li herêmekê hin şûnwar hene ku gundî jê re dibêjin dêr e.

Di navbera Eboyîyan û Şêxalîkîyan de anha tu nakokî tune. Li gor vegotinên di derheqê Şerê Qoto û Meqso de em fêm dikin ku hemî çîya bûye du beş û ev her du eşîrên di Xarok de jî her yekê li cem beşekê cih sitendîye. Dîroka vî şerî ne dîyar e lê li gor hesabê vebêjan li der dora 1900'î ye. Li gor şênîyekî, ev şer nebûye sedema ku ji her du eşîran yek gund biterikîne, anha jî di navbera wan de tu şer û pevçûn tune û heger di demên berê de dijminatîyek çêbûbe jî anha hatîye jibîrkirin.

Xarok bi awayê fermî bi Şemrex ve girêdayî ye. Piştî ku Şemrex di sala 1937'an de ji Dêrikê tê veqetandin, wekî gelek gundên ku anha bi Şemrex ve girêdayî ye, Xarok jî bi wê re ji Dêrikê tê veqetandin û bi Şemrex ve tê girêdan. Lê sedema ku me Xarok jî di vê xebatê de wek gundekî Dêrikê hesibande ne tenê ev têkilî û veqetandina fermî ye. Li gor me ev veqetandin tenê biryareke erdnîgarî û rêveberî ye. Ji ber ku bi vê veqetandinê re li aliyê bakurê rojavayê Dêrikê gundên Metînî; li aliyê bakurê rojhilatê Dêrikê jî gundên Rûtî, Ebasî û Mamûdî ji Dêrikê hatîye veqetandin. Ango wek nêrîneke erdnîgarî, hatîye xwestin ku gundên li Çîyayê Mazî giş bi Şemrex ve were girêdan. Her çend ev veqetandina fermî pêk hatibe jî li her du aliyên çiyê jî, gundên ku hîn jî xwe Dêrikî qebûl dikin hene. Gundên Metînî yên li ser Şemrex û Çinarê jî giş xwe Dêrikî dihesibînin; gundên li çiyê, xwe ji eşîrên Dêrikê dihesibînin û dan û sitendina wan li ser Dêrikê ye lê bi awayê fermî li ser Şemrex in Xarok, Bîrînî, Mavan, û Golika Geryayî ye. Bi van gundan re gundên bi awayê fermî jî bi Dêrikê ve girêdayî ne, yên wek Taşît, Gundikê Hecî Hesen û Berkevîrê jî bi giştî "gundên çiyê" tên qebûlkirin û tên binavkirin. Malbatên di Gundik de bûn malbatê Dêrikî bûn. Ji ber wê me di vê xebatê de wek mînak "gundên çiyê" cih da Xarok. Gundên Metînî yên li çiyê yên wek Banqîr, Sîsan, Mezra Suravîrkê, Mezra Newalê, Girê Sor, Gola Gulê û hwd. wek "gundên çayê Metînan" tê binavkirin ku di eslê xwe de ev peyv ne ji bo çiyayekî bi vî navî; ji bo herêma gundên Metînî yên li çiyê tê bikaranîn.

Wekî me li jor jî gotîye di Xarok de du eşîr tenê hene û ev her du eşîr jî xwe ji beşên du eşîrên Dêrikê dihesibînin. Eboyî xwe wek Rûtî û Şêxalîkî jî xwe wek Ebasî dihesibînin. Gundên çiyê yên din jî Bîrînî, Berkevîr, Gundik û Mavan xwe Rûtî dibînin; Golika Geryayî jî xwe Mamûdî qebûl dike. Ji ber vê têkilîya eşîrî ya berê ye ku çûn û hatina van gundan hîn jî li ser Dêrikê ye. Sedemeke din ku bi vê sedema yekemîn ve girêdayî ye jî ev e ku ji ber ku Xarokî, Bîrînî, Mavanî, Golika Geryayî xwe Dêrikî dibînin, gelek malên ji van gundan barkirine li navenda Dêrikê bi cî bûne. Ev rêje ewqas bilind e û ji ber ku malên ji van gundan hatine li Dêrikê li nêzikî hev mal çêkirine, li navenda Dêrikê li hin taxan, kolanên ku li ser van gundan tên xwendin hene. Wek "*Mehela Mavanîya, Mehela Bîrînîya*", yan jî bi awayeke gelemperî "*Mehela Çaya*".

(²²) Di van salên dawî de kesên ji van gundan tên li dûrî van malan jî bi cih dibin. Heman tiştî mirov dikare ji bo malên Metînî jî bêje. Li navenda Dêrikê gelek malên Metînî ku ji gundên Metînî yên wek Banqîr, Sîsan, Girê Sorê Metînan, Şemika û hwd. hatine hene. Lê belê malên Metînîyan ne wek kolanekê nêzîkî hev in, bi piranî ji hev bela in.

Malên ku ji Xarok rabûne û li navenda Dêrikê bi cî bûne bi piranî Eboyî ne. Anha li gund 30 mal heye, li navenda Dêrikê jî nêzîkî 30 malê Xarokîyan heye. Ji eşîra Şêxalîkî malên ku ji gund barkirine bi piranî çûne li Stenbûl û li hin bajarên din yê rojavayê Tirkîyê bi cih bûne. Bi gelemperî jî Xarokîyên çûne derve li bajarên wek Stenbol, Îzmîr, Edene û Mêrsînê bi cî bûne. Şênîyekî ji me re got: *“Hema bivê serê her maleke ji gund li Dêrikê maleke me heyi. Zarokê me ê ilk mektebê (dibistana seretayî) xelas dikin, ji bo orte mektebê (dibistana navîn) diherin Qesrîk, ê lîsê jî dehrin Dêrikê. Carna gi şûnê me çêdibin, em şûnên xwe dibin li Dêrikê datînin. Hema ez karim bivêm şûnê me ê dikevi zivtanê em gişa dibin Dêrikê. Ji ber gi hem piranîya mervê me li Dêrikê ni, em naxwazin biteebin werin vir û hem jî zivtanî Dêrik ji gund germtir i û îmkanê wê yî din jî bêtir in. Rê din jî heger karekî me yî fermî tunebi em narin nava Şemrex, alvêra (dan û sitendin) me giş li ser Dêrikê yi. Ana ji her du eşîra ji her yekê malbatek li gund maye. Ji Eboyan Mala Ahmedê Dewrêş û ji Şêxalîkîyan jî Mala Mencê.”* (Ş. Xarok, 2014)

Sedema yekemîn ku gelek şênîyan ji gund barkirine tunebûna derfetên kar e. Ji ber ku zevîyên gund hindik in, bi pezê hindik jî ajalvanî têra debara malekê nake şênî neçar mane ku ji gund barkin. Sedemên din jî pêdivîyên modern yên wek perwerdeyê, hêsantîya jîyana bajarên, gihajtina xizmetên tendurustî, derfetên civakî ne. Di dîroka gund de sedemeke din ya koçê jî ev e ku di sala 1993’an de gund ji alîyê leşkeran ve hatiye valakirin. Di derheqê valakirina gund de şênîyekî ji me re weha got: *“Gundê me di sala 1993’an di bi sebeba gi qaşo PKK’yî tên nav gund û şênîyê gund alîkarîyê didin wan hati valakirin. Malên me bi piranî çûn Dêrikê, lê hinek mal jî çûn bajarên wek Stenbol, Îzmîr, Edene û Mêrsînê. Gelek malên çûn derve, teva gi anha dinya xweş bûyi jî ji ber gi li wa dera ji xwe ri kar dikin li gund venegerîyani. Lê malê çûbûn Dêrikê*

* Pênasa “çayî” tîyê pênaseke ji bo şênîyên gundên çiyê gişî tê bikaranîn. Ji bêjeya “çiyayî” guherîye. Ev pênas ne pênaseke neyînî ye. Li nava Dêrikê gelek caran dema ku behsa şênîyên gundên çiyê dibe, peyvên wekî “zarê me yî çê” “zarên çaya” “mehela çaya” tê bikaranîn.

gelekê wan li gund vegeyîyan lê li Dêrikê jî ji xwe ri mal çêkirin. Ji bo gi em tazmînata xisara xwe bistînin me serî li mahkemê da lê hîn me tiştek nesitencyî. Ebûqatê me dibêji heger li vir safî nebi em ê herin mehkema Ewrûpa. Hela ka em binêri bi Xwedê çer diki.” (E. Xarok, 2014)

Di civaka gund de di nava şênîyan de alîkarî heye. Bi piranî di karên xerzikan de, di lêkirina benan û xanîyan de şênî alîkarîya hevdû dikin. Di vî warî de, di nava Eboyî û Şêxalîkîyan de jî cudayî tune ye. Ji ber ku bi jina jî merivantî di navbera wan de çêbûye herkes bi çavê merivantîyê li hevdû dinêre. Di navbera şênîyan de heger nakokîyek derkeve, pîrên gund di navbera şênîyan de navbêntîyê dikin û pîrsgirêkê çareser dikin. Lê belê li gund pîr nakokî dernakeve.

II.6.3. Aborîya Xarok

Aborîya Xarok li ser ajalvanîyê ye. Zevîyên wê yî ku ji bo çandinîyê guncan e gelekî kê m e. Li gor agahîyên ku me ji Gerînendeya Xurek, Çandinî û Ajalvanîyê ya Qeymeqamtîya Şemrexê sitendîye di sala 2013’an de li Xarok ceh, genim, nîsk û xerzikên tirî jî tê de bi giştî 289 donim zevî hatîye bikaranîn. Dîsa li gor agahîyên heman sazîyê li Xarok 4576 pez tê xwedîkirin. Li gor tomarên fermî, li gund dewar nayê xwedîkirin, hejmara ajalên kedanî jî 118 ye. Lê li gor agahîyên ku me ji nava gund sitende li gund dewar jî tên xwedîkirin, lê ne ji bo hatina wan î aborî, ji bo pêdivîyên malê.

Wekî ku ji van agahîyan jî tê fêmkirin, ji ber rewşa Xarok ya erdnîgarî, ji ber kêmbûna zevîyên çandinîyê, aborîya gund bi awayeke berbiçav li ser xwedîkirina pez e. Pezê her malê ne qasî hev e. Pezê hinek malan li der dora 150 hebî ye, yê hinek mal jî 30-40 heb e. Pezên ku tên xwedîkirin bi piranî bizin e, lê mîh jî tên xwedîkirin. Malên ku pez xwedî dikin ji şîrê wan mast û penîr çêdikin û dibin li Dêrikê yan jî Şemrex û Dîyarbekir difroşin. Ji bilî mast û penîr, hatineke pez ya din jî firotina kar û berxê nêr e. Ew jî bi piranî li bazara Dêrikê, carinan jî li bazara Şemrex û Dîyarbekir tên firotin.

Hatineke şênîyan jî ji karên demsalî ye. Ji her malê yên ku karibe kar bike dihere rojavayê Tirkîyê karên demsalî dikin. Bi piranî ev kar yan li Bursa’yê karê firingîya ye

yan jî li bajarên wek Adapazari û Ordu'yê karê findeqan e. Malên ku diherin karê derve dikin, di dawîya kar de bi pereyên ku qezenc dikin, salekê debara xwe dikin. Heger perê ku qezenc kirine baş be, pê zarokê xwe dizewicînin, yan jî pêdivîyeke xwe yî din çareser dikin. Şênîyên ku pezê wan pir hindik jî hene ku tenê debara wan li ser van karên demsalî ye. Ji bilî van karan, hin Xarokîyên ku karên daristana dikin û rewşa wan ya aborî baş jî hene. Lê vana ji zû de ji gund derketine û êdî tenê bi mêvantî yan jî di şîn û şahîyan de tên gund.

Li gor erdnîgarîya Xarok ajalvanî dikare were pêşvexistin. Derfeteke din ya kar jî pêşvexistina baxçevantîyê û parastin û xurtkirina daristana darên berî û mazî ye. Li gor bilindaya wê, rewşa av û hewa wê li herêma Xarok baxçeyên fisteqa, behîva, gwîza, qeresîya dikare were çêkirin. Ji bo xurtkirina daristanê jî divê pêşî di vê daristana xerabûyî de dar û devîyên hene werin parastin û dûv re jî darên nuh werin çandin. Li temama herêma çîyê mera her gundî, wek "hemî" di nava gundîyan de hatîye parvekirin. Her xwedîyê van hemîyan li gor pêdivîyên xwe yan ji bo bikin ardû yan jî ji bo ku bifroşin, darên di van hemîyan de dibirin. Ev çîya ji berê de serkana darên berî û mazî ye. Tevlî ku ewqasî bi nezanî hatîye jêkirin jî, di gelek hemîyên hene û hatine parastin de devîyên nuh çêdibin û heger neyên jêkirin di çar pênc salan de ev devî mezin dibin, dibin dar. Lê belê ji bo pêşdexistina ajalvanîyê jî ji bo danîna baxçeyan jî û ji bo parastin û xurtkirina daristanê jî alîkarîya komarê hewce ye. Ji ber ku ji ber rewşa şênîyan ya aborî, derfetên wan ên ku van karan pêşde bixin tuneyî.

II.6.4. Jîyan li Xarok

Xarok li ser girekî ava bûye. Xanîyên gund bi piranî yên kevn in, bi kevir, ax, dîrek û beştan çêbûne. Hema bêje hewşa her xanîyî heye. Di her hewşê de jî axurek biçûk yan jî mezin heye. Piranîya xanîyan ji du odeyan û holekê pêk tê. Hin xanî sê ode ne. Ji bilî van xanîyên kevn çend heb xanîyên nuh, bi beton û kerpîçan çêbûne jî heye. Di hin hewşan de darên tûyan heyî. Ji bilî van daran li serê gund li ber zîyareta Şêx Hesên darên kevnare yên berî û mazî hene. Devîyên berî û mazî heya nav gund tên.

Ji bo ava vexwarinê li gund bîrek hatîye kolan û ji vê bîrê av dihere li nava malan bela dibe. Lê ev av, ji ber ku kêr zêde li her malê pez tê xwedîkirin, têra gund giştî nake, her dem av tune. Ji ber ku ev av ne paqij e, şênîyên gund jê nexweş dikevin. Li gund binesazîya serebê tune. Di nava gund de kuçe nehatine çêkirin, rêyên hene yên berê ne ango pêkrêkên bi kevir û ax in. Rêya ku Xarok bi Dêrikê û Şemrex ve girêdide asphalt e, lê rê li gelek cih xera bûye.

Li gund dibistana seretayî vekirî ye, ji bilî wê sazîyeke fermî tune. Mizgeftê heye li gund. Li gund dikan tune. Şênî, pêdivîyên xwe bi piranî ji Dêrikê carinan jî ji Şemrex dabîn dikin. Bi giştî li gund sê heb seyare û çar heb terextor heye. Ev seyarena dema ku diçin nav Dêrikê û Şemrex, pêdivîyên şênîyan jî tînin. Ji ber ku li gund navenda tenduristîyê tune, nexweşên xwe dibin Dêrikê, Şemrex, Mêrdîn, Dîyarbekir û yan jî heger hewce bike bajarên wek Stenbûl û Enqerê.

Li gund li her malê televîzyon heye. Ji bilî înterneta telefona desta ya çend xortan, xeta înternetê li gund tune. Jin jî tê de ji telefonên desta yên piranîya şênîyan heye. Ji ber ku havînan şênî diherin karê derve, di vê demsalê de xort û mêrên kar dikin li gund namînin, gund jî pîr û jinan re dimîne. Yên şivantîyê dikin havînan jî zivistanan jî li gund in lê belê karkerên demsalî ji ber ku karê wan havînî dest pê dike tenê di zivistanan de li gund in. Dema ku li gund bin, û heger ku ne şivan bin, xort dema xwe bi lîstina futbolê, bi gera li der dora gund û yan jî li malê, li ber televîzyonê derbas dikin. Li gund "odeya gund" tune. Mêrên navsere û yên pîr bi rojê heger karê wan yên wek şivantîyê, karê xerzikan, lêkirina benan û wekî din hebe karê xwe dikin heger tunebe li nava gund yan li ber sîyekê, yan li ber berojkekê li hev dicivin û sohbet dikin. Bi şevê li malên merivên xwe yên mezin kom dibin û şevbêrka xwe dikin. Di şevên weha de xort jî li wan vedihewin. Di van sohbetên biro û şevbêrkan de mijarên wek ajalvanîyê, qal û behsa zemanên berê, serpehatîyên xwe, li gor pêvajoyê mijarên di rojeva Tirkîyê û dinyê de tên peyivandin. Beşdarvanekî ji nîfşê mezin, li ser demên berê ku wextê xwe çawa derbas dikirin ji me re weha got: *"Di demên berê di, wextê em zarok bûn ya em xort bûn me bi gelek lîskan dilîst. Çirê, gogê, çopelankê, şaqûl, cit hinek ji van lîstikan bû. Bi şevê em li dora pîrik û kalikê xwe dicivîyan wan jî ji me ri çîrok digotin. Lê ji ber gi ji zû de yi em nabêjin me jî ji bîr kiriyi. Xwezî bi wan salan, anka tam di tiştê di nemayi."* (A. Xarok, 2014)

Çêrandina pez, ango şivantî karê xort û mêran e. Lê di xwedîkirina pez de jin jî bi qasî wan xwedî ked in. Jin ji bilî karên malê yên wek çêkirina xwarinê, paqijîyê û xwedîkirina zarokan, karên pez yê di nava malê de jî dikin. Êmkirina pez, ji çend rojan carekê paqijkirina binê wan, dotina wan, çêkirina mast û penîr, çêkirina sergînan gişî jin dikin. Çêkirina nê û anîna hejîk û êzingan jî bi piranî para jinan e.²³ Jin di civata mêran de jî bi hêsanî rûdinin û tevlî gotûbêjên wan dibin. Gelek caran jin bi serê xwe hilberînên xwe yên wek mast û penîr dibin li Dêrikê difroşin û pêdivîyên mala xwe dikin. Jinek ji nifşê mezin ji me re weha got: *‘Heya deh panzde sal berê jî karê firotina hejîk, êzing, mast û penîr tenê me pîreka dikir. Me diçû bi destê xwe hejîk ya jî êzingê xwe dikir, li kerê xwe bar dikir û heger heba mast, şîr ya penîrê xwe yê firotinê dikir têra kerê xwe û peya di Firêşîyê re me xwe bera nav Dêrikê dida. Me tiştê xwe difrot û em diçûn çarşê me asûkên xwe dikirî û em vedigerîyan gund hîn nedibû nîvro. Di van salên dawî de ji ber ku erebe çêbûni êdî zilam tiştê firotinê bi xwe ri dibin difroşin.’* (R. Xarok, 2014)

Li Xarok asta xwendinê ne zêde ye. Pênc şagirtê ku li zanîngehê dixwîne heye. Xarokîyên ku bi temamî barkirine Dêrikê û cihên din yên dixwînin hene lê hejmara wan ne dîyar e. Dê û bav dixwazin keç û lawên wan bixwînin. Di vî warî de astengîyan ji zarokên xwe re dernaxînin. Yên ku diherin lîse, li Dêrikê dixwînin, heger malê wan li Dêrikê tunebin jî ev şagirt li mala xizmên xwe dimînin.

II.6.5. Çand û Kevneşopî li Xarok

Li Xarok ji bilî kurmancî bi tu zimanekî din nayê peyivandin. Li gor çavdêriya me jinên bi giştî li gund dijîn bi piranî bi tirkî nizanin, yên zanin jî pir kêman. Ev rêje di nava mêran de hebekî zêdetir e. Ji bilî mêrên ku qet bi tirkî nizanin bi pirsê me fêmkir ku gelek mêr li leşkerîyê hînî peyivandina bi tirkî bûne. Ji nifşên mezin, yên ku dibistan xwendine gelekî kêman in. Di nava xortan de em li yên ku bi tirkî nizane rast nehatin. Bi tirkî zanibin nizanibin zimanê têkilîyê ji sedî sed bi kurmancî ye.

²³ Wêne 8. û 9.

Di kurmancîya Xarok de, wekî ku di beşa Bixurê de jî me behs kiribû, taybetmendîyeke devokî heye. Ev taybetmendî ne tenê li Xarok, li gundên çîyê gişî, li hin gundên din yên Dêrikê û li navenda Dêrikê jî heye. Lê ev taybetmendî herî pir li herêma çîyê, ango li Xarok, Bîrînî, Mavan, Taşît, Golika Geryayî û gundên din yên bi ser Şemrex ve, yên wek Hezaz, Dêşan û hwd. xuyaye. Li ser vê taybetmendîya devokî tiştê ku bala me kişand yek jê jî ev bû ku ev taybetmendîya devokî bi piranî di nava nifşên mezin de xuya dibe. Di nava xortan de kêmtir e. Ji ber ku di beşa Bixurê de me behsa vê taybetmendîyê kiribû li vir dîsa em qal nakin. Bes bêjeyên ku me bihîste û mînakên vê taybetmendîyê ne em ê binivîsin. Di gerên me yî li Xarok, li gundên çîyê yên din, li navenda Dêrikê û li hin gundên din yên Dêrikê bêje û peyvên mînakên vê taybetmendîyê ku em lê rast hatin, wek bikaranîna şênîyan, di nava hevokan de bi vî awayî ne: “*Lawikê mi li **Carbekir** (Dîyarbekir) dixwîni*”, “*Leyê mi, hela ba **ca** (dîya) xwe ki!*”, “*Te **cîyi** (dîtîyî, dîyi) hela!*”, “*Kê **goçyi?** (gotîyi)*”, “*Ra **e(y)cyê** (eydîyê) em ê werin.*”, “*Hela ji xwe lê binêrin **gicyano!** (gidyano)*”, “*Mirî pir in ya **zincî?** (zindî)*”, “***Guncîno** (gundîno), **cîranino!***”, “*Berê telewzyon tunebû, **racya** (radya) Êrîwanê hebû.*”, “*Hela bala xwe **bicyê!** (bidyê)*”, “*Te pezê xwe **doçyi?** (dotîyi)*”, “*Te ava xwe **dagirçyi?** (dagirtîyi)*”, “*Ez **xwecyê** (xwedîyê) sed pezî mi.*”, “*Peyva te **qecya?** (qedya)*”, “*Qeymeqamê nuh **haçyi** (hatîyi) gelo?*”, “*Derîyê me ji sared di **keçyi** (ketîyi)*”, “*Xanîyê me wek **zincîyanê** (zîndanê) yi.*”, “*Di **aqrabaçyê** (aqrobatîyê) di tiştê wenî dibi.*” “Do em çûn **parçyê** (partîyê).” Mirov dikare bêje di van mînakên de bêjeyên “Carbekir” û “ca” (dîya, dê) li gor yên din êdî rûniştîye û bi gelemperî li temama herêma Dêrikê tê bikaranîn. Di mînakên din de jî bikaranîna hin bêjeyan li gor yên din belatir e. Wek mînak bêjeya ‘xwecyê (xwedî)’ ji bêjeya ‘eycyê’ (eydî) ew jî ji bêjeya ‘qecya’ (qedîya) belatir e. Divê ev jî were gotin, di nava keç û xortên xwenede de bêjeyên “Carbekir û ca (dê)” bi bandora çanda modern ya kurdî, bi bandora înternet, telewîzyon û rojnameyan, wek “Dîyarbekir” û “dîya” tê bilêvkirin. Disa bi vê bandorê, kêm be jî, ji dêvla “Carbekir” bêjeya “Amedê” jî tê bikaranîn.

Di nava peyva şênîyan de bandora tirkî xuya nabe. Bi taybetî di nava peyva şênîyên ji nifşê mezin de em li bêjeyên tirkî rast nehatin. Lê kêm be jî di nava peyva şênîyên ji nifşê biçûk de hin bêjeyên bi tirkî derbas bûn. Wek mînak, şênîyekî ji nifşê biçûk, li ser pirsê me ya ku “Hun bi şevê çi dikin, dema xwe çawa derbas dikin?” bi vî awayî bersîv da: “*Em xort bi şev li mala apê xwe yî mezin ‘toplannîş’ dibin.*” Li vir

bêjeya ‘toplanmîş’ di dewsa ‘dicivin’ de hatîye bikaranîn. Biwêj û gotinên pêşîya bi awayeke xurt tên bikaranîn. Tê fêmkirin ku gelek çîrokên gelêrî hatine jibîrkirin. Şênîyeke jin ji me re weha got: *“Di zarotîya me de, dê û bavê me, kalik û pîrikên me ji me ri çîrokên Kevirê Ting Ting, Sîsalk, Hebhinarkê, Gurîyê Qaza, Sêwîya li Ber Destê Ap û Amojnê û gelekê din digotin. Qala şerê Qoto-Meqso dikirin. Wekî din jî gelek çîrok ji me re digotin, me giş ji bîr kiriya.”* (R. Xarok, 2014) Pêkan e ku çîroka “Kevirê Ting Ting” çîrokek xweser ya Xarok be. Ji ber ku ev nav di heman demê de li Xarok navê tatekî mezin û herêma wê ye.

Şênîyên Xarok giş misilman û Şafîî nin. Li gund mizgeftê heye. Nimêjkin di nava nifşên mezin de li gor yê biçûk bêtir e. Li hember kesên nimêj nakin tu bertek tune. Girtina rojîyê ya meha remezanê ji nimêjê belatir e. Ji ber ku ligel nifşên mezin, nifşên biçûk yê ku temenê wan ji 15-20’î mezintir jî bi piranî digrin.

Malbatên gund bi piranî yê mezin in. Ligel jin, mêr û zarokan, dapîr, bapîr, ap û metikên azib bi hev re dijîn. Heger rewşa malê ya aborî baş be, xortên nuh dizewicin piştî du sê salan ji malê cihê dibin. Lê heger rewşa wan ne baş be tevî malê dimînin. Yê cihê dibin jî ji ber ku li gund kar tune bi piranî jî gund diherin. Ango yê li gund dimînin bi piranî tevî malê ne û pez xwedî dikin.

Di nava xizman de zewac pir dibe. Bi piranî pismam û dotmam bi hev re dizewicin. Ji bilî wan zarokên xal û xaltîk û metikan jî bi hev re dizewicin. Di navbera her du eşîran de jî zewac çêdibin. Lê bi piranî her eşîr, keç û xortên xwe di nava xwe de dizewicînin. Ji bilî gund, ji derve jî dizewicin lê li gor zewaca ji hundir gelekî kêma e. Keç û xortên ku dizewicin hevdû nas dikin. Heger bûk yan jî zava ji derve be jî pêşî hevdu dibînin, lê ji nêzîk ve hevdu nikarin nas bikin. Dîlan li gund çêdibin û sê rojan dewam dikin. Di dîlanan de ji Dêrikê komên dîlanan tên, li sazê elektro dixin, dûrikê bi kurmancî dibêjin û herî pir ji listikên herêmê yê wek “di cî de” û “delîlo” tên listin. Dema ku li gund di demên nêzîk de şîr çêbûbe wê demê dîlan nayê çêkirin. Di demên weha de tenê mewlûd tê xwendin û nan tê çêkirin, dûv re bûka xwe tînin. Di van salên dawî de hinek mal dîlanên xwe li Dêrikê çêdikin. Sedema vê yekê ew e ku, ji ber ku gelek malên xizmên wan li navenda Dêrikê ne, xwedîyê dîlanê naxwaze wan bitaabînin û bînin Xarok.

Dema ku zarokek çêdibe, bapîr, dapîr, dê û bav, ap, xal, metik yan jî xaltîk nava lê dikin. Gelek dê û bav navê dê û bavê xwe hiltînin. Li gor bersîvên guhertî yên şênîyan, nav divê navê xêrê be, gotina wê xweş be, sivik be, wateya wê xweş be. Mela yan jî yekî zane di guhê zarok de azan dide û navê ku li zarok bûye di guha de sê caran dibêje. Hin mal ji bo zarokê xwe heftêkê çêdikin, hinek çênakin. Di nava Xarokîyên li Dêrikê dijîn rêjeya navê kurmancî ji gund bêtir e.

Dema ku li gund yek bimire, konê şînê tê vegirtin. Heger zivistan be xwedîyê şînê carinan şîna xwe dibin li Dêrikê datînin. Armanc ew e ku merivên wan yê li Dêrikê dijîn her roj neyên gund û neteebin. Di şînan de her roj xwarin tê çêkirin û mêvanên tîzmandin. Ajotina şînan li gor malan û li gor kesê mirî tê guhertin. Yê mirî heger ciwan be, ji malek xuyanî be, dewlemend be şîna kêmanî şeş, heft rojan didome. Ya na di sê çar rojan de xelas dibe. Yê tîzmandî ji malbata yê mirî re sersaxîyê dixwaze û ji van peyvan yekê yan çend heba bi hev re dibêje: ‘*Bira serê we sax bi, ê mayî sax bi, Xwedê bi rehma xwe xelas ki, Xwedê sebr û deyxê bîdi we, cê wî cinet bi, mekanê wê cinet bi...*’ (S. Xarok, 2014) Heger yê mirî zarok bi ligel van peyvan bi piranî ‘*Xwedê we ji xêra wî marûm neki!*’ (S. Xarok, 2014) tê gotin. Mêvanên tîzmandî û xwedîyê şînê destê xwe didin hev, lê heger xwe nêzîktir bibînin hevdu maçî dikin. Di demên berê de yê dihatin şînan destvala nedihatî. Bi xwe re şekir, birinc, rûn, pez dianîn. Lê anha ev kevneşopî rabûye, yê tîzmandî bi xwe re nînin. Ev qebûlnekirina alîkarîyê pêşî li gundên berîyê rabûye dûv re li hêla çiyê jî rabûye. Di şînê de çay û qehwa tal tê îkramkirin. Demên berê di şînan de cixare dihate îkramkirin lê anka di konê şînê de xwedîyê şînê ciyarê îkram nakin û tu kes di bin kon de cixarê nakşîne. Ev yek li hemî herêma Dêrikê bûye serdest.

Li Xarok cil û bergê mêran li gor nîşîya bi du awayan e. Mêrên ji nîşîya mezîna bi rêjeyeke bilind şalwer, çakêt, gomlek û heger zivistan be qazax û sako li xwe dikin. Qonderayan dixin pê û bi piranî şewqe dixin serê xwe. Xort bi rêjeyeke bilind cil û bergên modern li xwe dikin. Pantorên qot, gomlek, tîşort, qazaxa li xwe dikin û solên spor û qondera dixin pê. Bi rêjeyek kêmtir be jî hinek xort di demên kar de şalwera li xwe dikin. Di navbera nîşîya jinan de jî cudayeti heye. Jinên ji nîşîya mezîna fîstanê dirêj li xwe dikin, hubrîyê girêdidin û kitanê pê de dadikin. Nîşîya biçûk jî fîstanê dirêj li xwe dikin lê ji bo serê xwe simalên rengîn bikartînin. Hin bûkên nuh jî wekî nîşîya mezîna kitan û

hubrîyê pê de dadikin lê piranîya bûkên nuh kirasê dirêj li xwe dikin û yan xavikê pê de dadikin yan jî simalên rengîn. Jin carinan di nava malê de û bi piranî dema ku karên pez dikin şalwer li xwe dikin.

Li Xarok cejnên olî, cejna Remezanê û cejna Qurbanê tên pîrozkirin. Li ser cejnan şênîyekî ji me re weha got: *“Di rê eycyê di em sibê şifaqê radibin. Em kincê xwe yî paqij ya jî ê nuh li xwe dikin. Ewilî em dehrin camîyê li mêja eycyê dikin. Dûr em dehrin ser mezela. Em eycya wan jî dikin. Dûr em tên li nav gund bela dibin. Em dehrin malê mezinê xwe. Em destê mezina maçî dikin. Mezin jî tê rê me. Em jî çavê biçûka maçî dikin ew jî tên destê me. Mala gi em dehrinê çay, qehwe, cixare û qola îkramî me dikin. Carna dibi wexta nîro, em li kîjan malê bin me bernadin em li wir nê dixwun. Eycyê me bi vî hawî derbas dibi. Newroz li gund çênabi. Ê dixwazi dehri li Dêrikê ya jî li Carbekir dikevi Newrozê.”* (M. Xarok, 2014) Ji peyvên vî şênîyî jî tê fêmkirin ku li gund ji bilî cejnên olî tu cejn nayin pîrozkirin. Ji ber ku cejna Newrozê wek çalakîyeke sîyasî tê dîtin şênî wê wek *“dikevin Newrozê”* bi nav dikin. Bêgûman sedema vê yekê ev e ku ji aliyê komarê ve pîrozkirina cejna Newrozê heya van salên dawî jî qedexe bû û di her Newrozana de li gelek bajar û navçeyan di navbera beşdarvanên Newrozê û leşker û polîsan de pevçûn derdiketin, gelek caran mirovan jîyana xwe wenda dikirin, birîn dibûn, gelek kesên ku beşdarî çalakîyan dibûn dihatin darizandin, dihatin girtin.

II.6.6. Rewşa Navê Mirovan li Xarok

Agahîyên ku me ji listeya hîlbijêran û ji listeya şagirtên dibistana Xarok ya Seretayî daye hevdû, li Xarok rewşa navê mirovan bi vî awayî ye.

Tablo 53: Hejmar û Rêjeya Navan (li Xarok)

	Hejmara Hilbijêran	Hejmara Navê Hilbijêran	Rêje
Jin	68	58	0,85
Mêr	62	52	0,84
Bi giştî	130	110	0,85

Li Xarok di hilbijartinên herêmî yê 30'yê Adarê de mafê 130 kesî hebû ku dengê xwe bikarbîne. Ji van hilbijêran 68 heb jin û 62 heb jî mêr in. Ji bo 68 jinî 58 nav û ji bo 62 mêrî 52 nav hatîye bikaranîn. Li serê her jinekê 0,85 û li serê her mêrekî 0,84 nav dikeve. Ango mirov dikare bêje ev pîvan nêzikî 1'ê ye û ji ber wê jî navên hevbeş ne zêde ne.

Tablo 54: Navê Jinan, yê Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranîn (li Xarok)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi Giştî
Hediye, Sultan	3	6
Dilşah, Emine, Gülistan, Hülya, Medine, Zeynep	2	12
8		18

Di nava jinan de navên herî pir hatine bikaranîn navên "Hediye" û "Sultan" in ku her yek 3 caran hatîye bikaranîn. 6 navê din jî her yek 2 caran hatîye bikaranîn. Ango hejmara navên ku bi kêmanî 2 caran hatine bikaranîn 8 in. Ev nav bi giştî ji bo 18 jinan hatîye bikaranîn ku dike ji %26,5'ê jinan. Di nava van 8 navên herî pir hatîye bikaranîn de 2 navê kurmancî heye: "Dilşah, Gülistan" 6 navê mayî bi erebî ye.

Tablo 55: Navê Mêran, yê Herî Kêm 2 Caran Hatîye Bikaranî (li Xarok)

Nav	Hejmara Bikaranînê	Bi Giştî
Ali, İbrahim	3	6
Abdurrahman, Aziz, Cuma, Hamdullah, Sadun, Mehmet Emin	2	12
8		18

Bi awayeke tesadufî navê mêran yê herî pir hatine bikaranîn jî 8 in. Ji van navan "Ali" û "İbrahim" her yek 3 caran, yê mayî her yek 2 caran hatine bikaranîn.

Ev 8 nav bi giştî ji bo 18 mêrî hatîye bikaranîn û ev hejmar dike ji %29'ê mêran. Ji van navan navek bi îbranî, 7 navên mayî bi erebî ne.

Tablo 56: Hejmar û Rêjeya Navan li Gor Zimanan (li Xarok)

Ziman	Navê Jinan	Navê Mêran	Bi Giştî	Rêje(%)
Erebî	42	45	87	%66,9
Kurmancî	13	1	14	%10,8
Tirkî	1	4	5	%3,9
Îbranî	-	4	4	%3,1
Farisî	3	1	4	%3,1
Yewnanî	2	-	2	%1,5
Navên Nedîyar	-	1	1	%0,8
Navên Têkel	7	1	8	%6,2
Dunav	-	5	5	%3,9
Bi Giştî	68	62	130	%100,2

Ji %66,9'ê navan bi erebî ye. Li dû erebî wek zimanê duyemîn kurmancî tê, ji %10,8'ê navan bi kurmancî ye. Navê ku koka wê nedîyar 'Sarhan' e. Ev nav dibe ku bi mebesta 'Serhan' hatibe nivîsandin. 7 navê jina û navekî mêra têkel e. Li gor pêkhatina wan ev nav bi vî awayî ne:

Tablo 57: Navên Têkel (li Xarok)

Ziman	Nav
Tirkî-Kurmancî	Yazlihan, Songül
Kurmancî-Erebî	Gülşan, Serhat
Farisî-Erebî	Benazir
Tirkî-Erebî	Aysel
Tirkî-Farisî	Ayten
Kurmancî-Farisî	Gülten

Navê ‘‘Yazlihan’’ bilêvkirina navê ‘‘Aslihan’’ e. Navên têkel bi 6 awayan çêbûne. Navên tirkî-kurmancî û kurmancî-erebî her yek 2 heb in, yê din yek in.

Tablo 58: Dunav (li Xarok)

Ziman	Nav	Jin (J); Mêr (M)
Erebî-Erebî	Mehmet Emin(2), Mehmet Ali, Mehmet Şerif, Mehmet Resul	M

Bi giştî 5 mêr dunavo ne. Ev nav giş bi erebî ne û di gişan de navê yekemîn Mehmet e. Rêjeya bikaranîna du navan ji %3,9 e. Li gor tabloya 56. Navê hilibijêran yê bi erebî 87 e û rêjeya navên erebî ji %66,9 e. Heger em van dunavan jî bavîjin ser navên erebî, hejmara hilibijêrên ku navê wan bi erebî ye dê bibe 92 û rêjeya navên erebî dê bibe %70,8.

Tablo 59: Hejmar û Rêjeya Navên Kurmancî, li Gor Temenê Hilibijêran (li Xarok)

Sala Jidayikbûnê	Hejmara Navên Kurmancî	Mînakên Navan	Rêje(%)
... – 1966	4	Hani, Buhari, Bessi, Gölüstan	%28,6
1967 – 1972	3	Bahar, Dilşah, Güli,	%21,4
1973 – 1978	1	Gülçin	%7,1
1979 – 1984	3	Gül, Ferman, Naze	%21,4
1985 – 1990	1	Gülhan	%7,1
1991 – 1996	2	Gülîstan, Sozda,	%14,3
Bi Giştî	14		%99,9

Hilbijêra ku navê wê bi kurmancî û bi temenê xwe herî mezin, "Gölüstan" e û di sala 1942'an de jidayikbûye. Ji vê salê û heya 1966'an bi giştî 4 jinan navên kurmancî sitendine. Ji navên kurmancî "Sozda" tenê navekî modern e, yê mayî giş navên klasîk in. Ji bilî navê "Ferman" navê din giş yê jinan e. Navên ku di qeydên fermî de wek "Hani, Güli, Bessi, Naze, Bahar, Buhari" hatine nivîsandin di nava şênîyan de wek "Xanê, Gulê, Besê, Nazê, Biharê" tên bilêvkirin. Nivîsandina "Gölüstan" xelet e. Şênî, hemî navan ne li gor nivîsandina wan lê wek xwe û resenîya van navan ya kurmancî wan bi lêv dikin. Ev nav jî wek "Gülîstan" tê bilêvkirin.

Li dibistana seretayî ya Xarok, di polên 1, 2, 3 û 4. de me navê 40 zarokî tomar kiriye. Ji van zarokan 13 heb keç û 27 heb law in. Di nava keçan de navekî dubare bûye tune. Ji van 13 navan 8 heb bi erebî "Elif, Gamze, Hamdîye, Mekîye, Melek, Şemsi, Şükran, Tuba"; 2 heb bi kurmancî "Berfîn, Dilber" 1 bi tirkî "Çiğdem"; 1 bi moxolî (Meral); 1 jî têkel e. "Ayfer: tirkî-farisî"

Ji 27 navê şagirtên law yê herî pir hatîye bikaranîn wersiyonên "Mehmet-Muhammed" e. 2 caran Mehmet û carekê jî Muhammed bi awayê xwerû hatîye bikaranîn. Ji bilî van 3 navên xwerû, 2 caran jî bi awayê dunavo wek "Mehmet Emin, Muhammed Nur" hatîye bikaranîn. Du navên din ku her yek 2 caran hatîye bikaranîn "Ramazan" û "Yusuf" e. Ji bilî van navan, navê lawan yê ku dubare bûye tune.

Li gor zimanan rewşa navê lawan bi vî awayî ye: Navê 16 şagirtê law bi erebî "Mehmet-Muhammed (3), Ramazan (2), Abdulkadir, Ahmet, Cesur, Cihan, Delil, Hüseyin, Kadir, Kerim, Miraç, Resul, Süphan"; navê 4 şagirtan bi îbranî "Yusuf (2), İsmail, Süleyman"; navê 3 şagirtan bi kurmancî "Dersim, Mizgin, Polat" û navê şagirtê jî bi tirkî ye, "Tuncay". 3 şagirt jî dunavo ne: "Mehmet Emin, Muhammed Nur, Ömer Faruk". Ji ber ku ev her sê nav bi giştî ji navên erebî pêk tên, hejmara navên erebî dike 19 heb. Wek rêje dike ji %70,4'ê navê şagirtên law bi erebî ye. Tevî navên şagirtên keç, di dibistanê de rêjeya navên erebî ji %67,5 e. Bi giştî hejmara navên kurmancî li dibistanê 5 e û wek rêje dike ji %12,5'ê navê şagirtan. Di navbera nifşan de guhertineke pir mezin tune. Ji ber ku di nava navên hilbijêran de rêjeya navên kurmancî ji %10,8 e.

II.7. ENCAMA BEŞÊ

Di beşa “Navê Mirovan li Herêma Dêrikê” de li navenda Dêrikê li ser navê şagirtên du dibistanan û li çar gundên Dêrikê jî li ser navê hîlbijêran û navê şagirtên dibistanên seretayî yên van gundan hatîye lêkolîn. Li van çar gundan ligel rewşa navê mirovan me agahîyên sosyolojîk jî dan hevdu, da ku em van gundan jî nêzîk ve nas bikin. Di bin xebata sosyolojîya gundan de me li cih, erdnîgarî û serjimêrîya wan, li dîroka wan, li avakirin û binyada civaka wan, aborîya wan, li her gundekî awayê jîyana şênîyan, li çand û kevneşopîyên wan nêrî. Me agahîyên di derheqê sosyolojîya navenda Dêrikê, di beşa “Destpêk”ê de dabû. Di vê beşa “Encam”ê de em ê agahîyên sosyolojîk û agahîyên li ser navê mirovan binirxînin. Her çend sernavên ku me agahîyên xwe di bin de tomarkirine zêdetir bin jî di vê beşa “Encam”ê de em ê nirxandina van agahîyan di bin sê sernavan de tomar bikin. Ev sernav “Rewşa Sosyolojîya Herêma Dêrikê”, “Rewşa Çanda Gelêrî li Herêma Dêrikê” û “Rewşa Navê Mirovan li Herêma Dêrikê” ye.

II.7.1. Rewşa Sosyolojîya Herêma Dêrikê

Dêrika Çîyayê Mazî, her çend hin vegotinên cuda li ser hebin jî, di demên nedîyar de li quntara Çîyayê Mazî hatîye avakirin. Ji şûnwarên li ser rûyê erdê xuyaye ku navenda Dêrikê û gelek gundên wê, di demên kevnar de bûye qada şaristanîyan. Ji ber ku di derheqê van şûnwaran gişan de lêkolînên zanistî nehatîne kirin, em nikarin bibêjin Dêrik û herêma wê di filan demê de ji alîyê filan şaristanîyê yan jî ji alîyê filan qewmî ve hatîye avakirin.

Navenda Dêrikê di quntara Çîyayê Mazî de ye lê gundên wê li çîyê, li berîyê û li quntara Qerecdax bela bûye. Ji ber vê yekê herêma Dêrikê ji alîyê cûreyên erdnîgarî ve herêmeke dewlemend e. Her weha vê erdnîgarîya wê bandor li ser jîyana şênîyan, li ser aborîya wan, li ser têkilîyên di navbera gundên cuda de kiriye. Herêmên Dêrikê li gor vê erdnîgarîyê hatîne binavkirin. Herêma çîyê, herêma berîyê, herêma Qerecdax sê herêmên bingehîn in. Ji bo şênîyên van herêman jî bi piranî têgehên wek “çayî”

(çîyayî) û “berîvanî” tê bikaranîn. Têgeha “Qerecdaxî” wek wan ne berbelav be jî tê bikaranîn. Gundên di quntara çîyê de ne, wek gundên “lêf” tê binavkirin.

Aborîya herêma berîyê li ser cotkarîyê ye û rewşa aborîya şênîyên vê herêmê bi gelemperî ji şênîyên her du herêmên din çêtir e. Bi hatina ava Bendava Atatürkê ev rewş dê çêtir bibe. Li navenda Dêrikê jî gelek malbatên ku li herêma berîyê yan jî li her du herêmên din zevîyên wan hene û cotkarîyê dikin hene. Ango mirov dikare bêje di aborîya herêma Dêrikê de beşa herî girîng cotkarî ye. Wek beşa duyemîn ajalvanî derdikeve pêş lê ev beş li gor salan her ku diçe lawaztir dibe. Beşa sêyemîn ya aborîyê bazirganî ye. Cûreyên bazirganîyê jî bi piranî li ser berhemên cotkarîyê, yên ajalvanîyê, bazirganîya navdewletî, dikandarî û karmendîya fermî ye. Agahîyeke fermî ya bêkarîyê tuneye lê li navenda Dêrikê malbatên ku qet karkerê wan tuneye û di asta “xizanîyê” de dijîn hene. Malbatên ku yan qet hatineke wan a aborî tuneye yan jî yên ku hatina wan têra debara wan nake, wek karkerên demsalî diherin li rojavayê Tirkîyê dixebitin. Bajarên ku herî pir diherinê, bajarên wek Bursa, Sakarya, Ordu, Manisa, Çorum û Ankara ye.

Ji sedemên wek şerê di navbera PKK’yê û komarê de, valakirina gundan ya ji alîyê hêzên leşkerî ve, kuştinên qesasedîyar yan jî ji sedemên wek bêkarî û aborî, malbatên ku ji navenda Dêrikê û gundên wê bi tamamî koçkirine hene. Her çend hejmara van malbatan û kesan ne dîyar be jî di nava gel de bawerîyeke weha heye ku bi qasî serjimêriya Dêrikê, Dêrikeke din jî li derve ye. Ev koç bi piranî ber bi bajarên wek Stenbol, Îzmîr, Mêrsîn, Edene û Dîyarbekir ve ye û hîn jî didome. Malbatên çûne li navçeyên cîran yên wek Qoser û Wêranşar bicî bûne jî gelek in. Dêrikîyên çûne derve bi piranî li nêzîkî hev bi cîwar bûne. Wek mînak li Stenbol semtên wek Şirinevler, Kocamustafapaşa û Samatya ji berê de navendên Dêrikîyan e. Mesîhîyên ji Dêrikê koçkirine jî bi piranî li van semtan bi taybetî jî li Kocamustafapaşa û Samatya bi cih bûne. Di van salên dawîn de li semtên wek Kartal, Sultançiftliği û Avcılar jî malên Dêrikîya pir bûne. Navendeke din ya koçê jî welatên Ewrûpa ye. Lê agahîyên di derheqê wan de jî ne dîyar in ku li kîjan welatî çiqas malên Dêrikî hene. Li gor tespîtên me yî çavdêrîyê ku di nava şênîyên herêma Dêrikê de me dît, welatên wek Elmanya, Fransa, Swêd û Hollanda ji van welatan hinek in.

Ligel ewqas koçê, serjimêrîya navenda Dêrikê di sala 2013'an de 21.364 e. Serjimêrîya gundên Dêrikê 39.862 ye. Ev hejmar li gor sînorê Dêrikê yê fermî ye. Ango di van hejmaran de gundên wek Xarok, Mavan, Banqîr û hwd. yên ku bi awayê fermî bi Şemrex ve girêdayî ne tune. Mirov dikare bêje bi qasî ku Dêrikê koç daye her weha sitendîye jî. Kes û malbatên ku koçî nava Dêrikê kirine bi taybetî ji gundên derdora wê, ji gundên herêma çiyê û Qerecdax in. Du sedemên vê yekê yên girîng ewlekarî û aborî ye. Sedemên di rêza sêyemîn de, derfetên modern yên wek perwerde, tenduristî û bajarvantîyê ye. Gundên Dêrikê bi piranî gundên biçûk in. Ligel gundên ku serjimêrîya wan li dora 30-40 kesî, gundên serjimêrîya wan digihêje 2000 kesî jî heye.

Malbatên li navenda Dêrikê jî yên li gundan jî bi piranî malbatên mezin in. Keç û xortên nuh dizewicin pêşî tîne tevî malê dibin. Heger aborîya malê baş be, di çend salan de ji malê cihê dibin û maleke nuh ji xwe re çêdikin. Heger ji malê cihê nebin û zarokên din yên zewicî jî hebin, ligel zarokên azib, bi hev re di heman malê de dijîn. Ji ber ku ji alîyê merivantîyê ve pederşahî serdest e, lawên zewicî tevî malê dimînin, keçên dizewicin diherin cem mêrê xwe, bi malbata mêrê xwe re dijîn. Bapîr û dapîrên tenê dimînin bi piranî diherin li cem lawên xwe dimînin. Lê dê û bavên li cem qîzên xwe dimînin jî hene. Rêjeya ji malê cihêbûnê li navenda Dêrikê ji gundan bêtir e. İsmail Beşikçi (2014: 192) ji bo eşîra Alikan jî tespîtek bi vî rengî dike, meyla malbatan ber bi malbatên biçûk ve dihere.

Li herêma Dêrikê mirov li gor eşîr û malbatên xwe tîne naskirin. Eşîr ji malbatan ango ji ezbetan pêk tîne. Di eşîrekê de gelek malbat hene lê di nava van malbatan de merivantîyeke bi xwîne ne pêwîst e. Ango dibe her malbatek ji dereke din hatibe lê ev malbat di bin banê eşîrekê de di forma konfederasyonan de civîyane. Lê di navbera hin malbatan de jî merivantîya xwîne heye. Di pêvajoya xebatê de, ji hevdiîtinên me, yên ku me bi beşdarvanên ji nifşê mezin re pêk anîye, tê fêmkirin ku 30-40 sal û berî wê, bandora eşîr û malbatan li ser civatê û li ser jîyana kesên xurtir bûye. Hebûna eşîr û malbatan ji bo kesên û malan wek hêzekê, wek sitargehekê û nasnameyekê bûye. Ji ber wê pirsê yekemîn ya kesên ji nifşê mezin, dema ku bixwazin yekî nas bikin, hîn jî bi vî awayî ye: *“Tu ji (mala) kê yi?”*. Pirsê *“Tu ji ku yi?”* jî di eslê xwe de ji bo heman armancê tê pirsîn. Yê ku lê tê pirsîn heger ji navenda Dêrikê be yan jî ji gundekî mezin be, wek pirsê duyemîn tê pirsîn *“Tu ji kê yi, tu leyê kê yi?”* Balkêş e, kesên ji nifşê

mezin kêma zêde temama herêma Dêrikê nas dîkin û zanin di kîjan gundî de kîjan eşîr û malbat dijîn. Di nava nîfşê biçûk de ev bernasîya tune. Li gor beşdarvanên nîfşê mezin, di wan demên berê de mirov bi eşîr û malbata xwe serbilind bûye. Dema ku hewce kiriye mirovan ji bo eşîr û malbatên xwe bi eşîr û malbatên din re şer kirine. Eşîr û malbat jî ji bo merivantîyê li endamên xwe xwedî derketine. Dema ku hewcedarîya endamên wan çêbûye alîkarîya aborî bi wan re kirine. Ew li hember kes, malbat û eşîrên din parastine. Pirsgirêkên di navbera wan û kesên din de çareser kirine. Ango mirov dikare bêje eşîr yan jî malbatan, wek sazîyeke rêveber, gelek pêdivîyên jîyana civakî yên wek aborî, ewlekarî, dadî û hwd. anîye cih.

Ji ber ku pergala eşîr û malbatan wek sazîyeke nîv-komar kar dikir, gelek pirsgirêkên di navbera kes û malbatan de, nedigîhaşt dadgehên komarê. Di wan deman de gelek pirsgirêkên di navbera kes û malbatan de bi dadgerîya ‘‘cemaet’’ê dihate çareserkirin. Ev rêbaza çareserîya pirsgirêkan, herçend kêma bûbe jî, hîn jî wek kevneşopîyekê dewam dike. Wek mînak, bûyerên keçrevandinê, nîqaşên li ser sînorên zevîyan, pirsgirêkên di kirîn û firotina hin tiştan de derdikeve, dijminatîyên di navbera malbatan de ku kuştin yan jî birîn tê de çêbûne û pirsgirêkên hwd. yên bi vî rengî bêyî ku bigihêjin dadgehên fermî, bi çûna cemaetê yan jî bi midaxeleya cemaetê safî dibe. Mirov dikare bêje ku di vê kiryarê de ‘‘nasnekirina desthilatdarîya komarê’’ jî heye. Divê were gotin, kesên ku wek cemaet tînanaskirin, ew kesên ku di nava civakê de wek ‘‘zana, bîrbir, serok, rêber, serpêhatî’’ tînanaskirin. Yê ku wek dadgehê tevdigerin ji çend kesan pêk tîne. Carinan kesên ku nakokî di navbera wan de heye diherin cem van kesan, carinan jî bêyî ku ew herin cem wan, ew bi xwe mudaxeleyî bûyerê dîkin. Bi taybetî jî di rewşên lezgînî de pêşniyara çareserîyê li her du alîyan dîkin. Cemaet li her du alîyan jî guhdar dike û li dû gelek nîqaşan biryara xwe dide. Li gor pirsgirêkê, awayê çareserîyê tê guhertin. Wek mînak heger kuştin çêbûbe, wek ceza li alîyê kujêr mîqdarek pere tê birîn. Dibe ku cemaet biryar bide ji bo aşitîyê keçek ji alîyê kujêr bê sitendin û ji alîyê kuştî bi xortekî re were zewicandin. Bi vî awayî cemaet dixwaze merivantî jî di navbera her du alîyan de çêbibe û aşitî xurttir û mayinde bibe. Heman awayê çareserîyê ji bo keç û revandinê jî dibe were kirin. Ango dawê bi pera yan jî bi dana keçekê dikare were çareserkirin. Heger cemaet têkeve daweyekê, her du alî jî divê biryara cemaetê bipejirînin. Nepejirandina biryara cemaetê ewqas nebaş tê dîtin ku li ser wê di nava gel de biwêja ‘‘Xwedê mere ji cime’etê neki!’’ çêbûye. Di hundirê vê peyvê

de wateyên din yê civakî jî veşartî ne lê mebesta peyvê ya yekemîn ew e ku di rewşeke bi nakokî de divê mirov li peyva civatê, li ya piranîyê guhdar bike. Ji bo kesên ku heqîyê qebûl nake jî weha tê gotin: *‘Filankes xwe ji cime’etê kiriyi!’* Dema ku nakokî di navbera du kesan de çêbibe, ew jî ji hev re wekî ku bibêjin ka em herin dadgehê, dibêjin *‘Ka em herin cime’etê!’* yan jî dibêjin *‘Ka em herin heqyê!’*. Şîreteke ku mezin li biçûkan dikin jî ev e: *‘Xwe ji heqyê neki! Xwe ji cemeetê neki!’* Gelek caran di nava endamên cemaetê de mela jî hene.

Di van salên dawîn de vê peywira cemaetê, bi awayê bilêvkirina gel, *‘partî’* tîne cih. Partî sererast dibe PKK be jî, dibe partîyên legal yan jî hin sazîyên din yê nêzîkî PKK’yê bin jî. Lê bi piranî partîyên legal vî karî dikin. Di sala 2010’an de dijminatîya di navbera du malbatên li navenda Dêrikê, bi navbêynkarîya Partîya Aşitî û Demokrasîyê (BDP), Kongreya Civata Demokratîk (DTK), Meclîsa Tirkîyê ya Aşitîyê (Türkîye Barış Meclisi) û Komeleya Dêrikê ya Çand û Piştevanîyê (Derik Kültür ve Dayanışma Derneği) çareser bû. Di vê dijminatîyê de ji her du malbatan bi giştî sê kes hatibûn kuştin, çar kes birîn bûbûn û sê kes jî li dadgehên fermî hatibûn darizandin û di encamê de ceza xwaribûn. Ev bûyer û pêvajoya çareserîyê gelek rojan di çapemenîya herêmê de di rojevê de mabû.²⁴

Her çend di van salên dawîn de di nava malbat û eşîran de bûyerên bi vî rengî qewimî bin jî li gor demên berê di jîyana civakî de eşîr û malbatan, bandora xwe ya li ser kesan û li ser civakê her ku çûye wenda kiriyê. Li gor me sedemên vê yekê gelek in. Yê bingehîn xurtbûna pêla netewperwerîya Kurd, başbûna rewşa aborî ya mirov û malbatan, bilindbûna asta xwendinê, bandora navgînên ragihandinê, xurtbûna nasnameya takekesîyê ye. Bi van sedeman re guhertineke mezin di navbera hestên eşîrî û hestên malbatî de jî çêbûye. Hestên eşîrî lawaz bûne, li dû hestên malbatî mane. Ji ber ku di nava malbatê de merivantîyeke eşkere ya li ser xwînê heye, her eşîr wek malbat bi malbat, parçe bûye. Lê ligel hestên malbatî, hestên Kurdîtîyê, hestên takekesîyê jî xurt bûye. Encameke vê guhertinê ev e ku di her çar serdemên dawîn de, di hîlbijartinên şaredarîyê de endamên eşîra tîk çûne, endamên partîyên ku nimînendeya hestên Kurdperwerîyê dikin biserketine.

²⁴ <http://www.kiziltepe.bel.tr/icerikGoster?sayfa=haber&lang&Id=1198>

Nêzîkî ji %65'ê serjimêrîya Dêrikê li gundan dijîn. Gundên Dêrikê li gor erdnîgarîya xwe dibe sê beş. Ev beş, berî, çîya û herêma Qerecdax e. Herêmên di navbera çîyê û berîyê de, ango gundên wek Fitnê, Beyrokê, Rebetê, Talbeşê, Germika jor, Sûsikê û yên wek wan, bi piranî di nava şênîyên van gundan de wek “*lêf*” tên bi navkirin. Mirov dikare bêje li herêma Dêrikê awayê jîyana şênîyan ya civakî, rewşa wan ya aborî, çanda wan ya gelêrî û gelek taybetmendiyên wan li gor vê erdnîgarîya wan dîyar dibe. Gundên ku zevîyên wê ji çandinîyê re guncan in ji gundên din dewlemendtir in. Ji ber ku derfetên wan yê çandinîyê kêmtir in, gundên çîyê ajalvanîyê dikin. Bi vî awayî mirov dikare bêje li herêma berîyê çanda cotkarîyê; li herêma çîyê jî çanda ajalvanîyê çêbûye. Cudayetîya dewlemendîya di navbera çîyê û berîyê de bi piranî ji rewşa xaniyan ve xuyaye. Hêmayên din ev in, ku em bi rêya çavdêrî û bersîvên beşdarvanan têgihiştin, bi qasî ku karkerên demsalî ji gundên çîyê derdikevin, ewqas ji gundên berîyê dernakevin; asta xwendina xortên berîyê ji gundên çîyê bilindtir e; hejmara terextor û seyareyan li gundên berîyê bêtir in.

Li herêma Dêrikê gundên biçûk û serjimêrîya wan kêmtir, bi piranî homojen in ango şênîyên gund ji heman malbatê yan jî ji heman eşîrê ne. Gund çiqas mezin dibe ewqas jî heterojen dibe. Di gundên mezin de ligel gelek malbatan, dibe çend heb eşîr jî bi hev re bijîn. Li hin gundan di navbera eşîr û malbatên guhertî de nakokî qet tune, lê li hin gundan jî di navbera malbatekê de malên ku li hev nakin heye. Ango cudayetîya eşîr û malbatan ne sedem e ku nakokî di navbera şênîyan de derkeve. Lê di demên berê de ji ber nakokîyên bi rengî, malbatên gund terikandine jî çêbûne. Wek ku ji berê de şênîyan xwestine pêşîya vê yekê bigirin, keç û xortên xwe ji malbat û eşîrên cuda jî zewicandine û bi vî awayî di navbera malbat û eşîrên xwe de merivantî çêkirine. Li gundên weha, nasnameyên “ji gundekî” çêbûye. Wek Qizilî, Xarokî, Bixurî û hwd. Ji ber wê di jîyana gundan de alîkarî, hevkarî xurt e. Li gor vegotinên beşdarvanên ji nifşê mezin, berî ku navgînên wek terextor, biçer, patoz û yên din derkevin, şênîyan di karê zevîyan de bêtir alîkarîya hevdu dikirin. Li herêma Dêrikê anha jî ji vê hevkarîyê re dibêjin “*palûte*”. Ev bêje xuyaye ji bêjeya “*pale*” çêbûye, di wateya hevkarîyê, alîkarîyê de tê bikaranîn. Wek mînak şênîyekî li Xarok di derheqê alîkarîya demên berê de, dema ku ji me re behsa serpêhatîyeke xwe kir, weha got: “*Me palûtak danî û me xerzikê Evdo di sê ra di esirand. Wê çaxê xêr û berket hebû, ana ji wî xerzikî kewdak tirî nayi.*” (M. Xarok, 2014) Her çend kêmtir jî bûbe, di karê xerzikan de, di lêkirina benan

de di lêkirina xanîyan de, ev alîkarî dewam dike. Ji bilî van karan, wek mînak li Fitnê me dît ku dema ku terextora şênîyekî têra ajotina zevîyên wî neke, yan jî dem teng bûbe û pêdivî bi terextoreke din hebe, şênîyên ku terextorên wan heye alîkarîya hevdû dikin. Li Qizilê me dît dema ku alavên teknîkî yên wek soxilî, kultvetor, mazot û yan jî tiştêkî din hewce bike, şênî alîkarîya hevdû dikin. Ango mirov dikare bêje palûtetîyê xwe li gor şerdên modern guhertîye û bi awayeke nuh didome.

Di gera me ya li gundan de me dît ku gundên dewlemend jî gundên xizan jî ji alîyê binesazî û xizmeta fermî ve kêr zêde wek hev in. Li ti gundekî Dêrikê binesazîya kanalîzasyonê tune. Rêyê gundan bi rêjeyeke bilind xerabe ne. Sedemek gazina şênîyên gundan jî di warê perwerde û tendurustîyê de ye. Li piranîya gundan dibistanên seretayî hene. Li herêma Dêrikê tenê li çend gundên mezin dibistanên navîn hene lê lîse li ti gundî tune. Şagirtên dibistanên lîse bi rêya veguhestinê tên li navenda Dêrikê perwerde dibin. Şagirtên dibistana navîn jî yan li gundekî cîran yan jî li navenda Dêrikê diherin dibistanê. Ava vexwarinê li gelek gundan têra şênîyan nake. Karûba li her gundî heye lê ne serast e. Di zivistanan de ji ber ba û baran û berfê dîrek dikevin, têt qut dibin, şênîyên gundan gelek rojan bê karûba dimînin. Di havînan de jî ji ber ku bi bîran garis yan jî tene tên avdan, di van deman de karûba gelekî lawaz e, carinan qut dibe û bi rojan nayê, çandinîyên cotkaran dixesirin. Pirsgirêka av û karûbayê li navenda Dêrikê jî heye. Mirov dikare bêje di warê xizmetê de gelek peywîrên komarê û şaredarîyê nayên cih û şênî ji van kêmanîyan digazin. Ev rewş carinan di demên hîlbijartinan de, dibe sedema îstîsmarê jî. Şênîyekî ji me re got: *“Salekê me di seçimê (hîlbijartinê) di bi şerdê gi rêya me û ava gundê me çêkinê me rayê xwe dan partîyakê. Lê ê gi soz dabûn me ava me çêkirin, rêya me çênekirin. Xwedê heqê me ji wan ri nehêli o rayê me li wan heram bi.”* (E. Bixur, 2014)

II.7.2. Rewşa Çanda Gelêrî li Herêma Dêrikê

Di bin vî sernavî de em ê wek encam li herêma Dêrikê li rewşa kurmancî, li rewşa devokê Dêrikê û li rewşa kevneşopîyan binêrin.

II.7.2.1. Rewşa Zaravayê Kurmancî li Dêrikê

Dêrik herêmeke kurmancîaxêf e. Li çend heb gundên li herêma Qerecdax zazakî û li çend heb gundên herêma berîyê jî bi erebî jî tê peyivandin lê belê şênîyên van gundan ligel zimanên xwe bi kurmancî jî dipeyivin. Nifşê mezin yên bi tirkî qet nizanin jî hene lê belê yên zanin bêtir in. Di nava nifşê mezin de yên herî kêr bi tirkî zanin jin in. Ji ber ku mêrên neçûbin dibistanê jî li leşkerîyê bi awayeke kêr be jî fêrî peyivandina bi tirkî bûne. Her çend gelek kes bi tirkî zanibe jî zimanê têkilîyê bi kurmancî ye. Lê belê nifşê mezin, her çiqasî bi kurmancî bipeyive jî bi xwendin û nivîsandina bi kurmancî nizane. Di gera me ya li navenda Dêrikê û li gundê wê di nava beşdarvanên me de pênc heb melayên ku li medreseyan perwerde dîtibûn hebû. Van melayan bi tîpên erebî dikarîbûn bi kurmancî bixwînin û binivîsin. Van melayan di hevdîtinan de gotin ku em bi tîpên erebî lê bi kurmancî mewlûdê, terqînê, mesnewîya Ahmedê Xanî Mem û Zînê û hin berhemên din dixwînin. Ji van melayan çar heban bi tîpên latînî jî dikarîbûn nivîsên bi kurmancî bixwînin û binivîsin, melayekî got ez lê ne serbest im.

Di nava nifşê biçûk de, bi taybetî bi bandora dibistanan û bi bandora navgînên ragihandinê ev rewş tê guhertin. Kurmancîya nifşê biçûk ne bi qasî ya nifşê mezin xweser, zelal û paqij e. Nifşê biçûk, bi bandora tirkî hinek daçekan yan bikarnînin yan jî xelit bikartînin. Gelek şagirt jî bêjeyên tirkî tevî peyva xwe dikin. Wek mînak, di hevdîtînen bi şagirtan re em li gelek bikaranînen bi vî awayî rast hatin: “*Ez navê xwe hez dikim.*”, “*Ez nizamim em kêra hatinin?*”, “*Mi mektebê ew dî.*”, “*Ez mal rûniştibûm.*”, “*Ez dersa xwe çalîmiş dibim.*” û hwd. Taybetîyeke nifşê biçûk din ku em lê rast hatin jî bikaranîna biwêj û gotinê pêşîyan e. Hinek şagirtên ku me hevdîtin bi wan re pêk anî û di dema çavdêrîyê de, di heşê xwe de biwêj yan jî gotinên pêşîya yên bi tirkî li gor mentîqa tirkî, bi awayê motemot (yekayek) wergerandin kurmancî û bikaranînin. Çend heb mînak: “*Xweşîya mi dehri. (Hoşuma gidîyor)*”, “*Ji birçîna zikê mi li zilê dixi. (Açlıktan karnım zil çalîyor.)*”, “*Xewa mi revya. (Uykum kaçtı.)*”, “*Yekî çavvekirî yi. (Gözaçık biridir.)*”, “*Ji beecandina li kûpa siwar bûbû. (Öfkeden küplere binmişti.)*”, “*Bi dilop dilop dibi behr. (Damlaya damlaya göl olur.)*” Ev biwêj û gotinên pêşîyan divîyabû li gor devokê Dêrikê bi vî awayî bihatina bikaranînin: “*Kêfa mi*

jê ri tê.”, “*Ji birçîna zikê mi bi hev vi zeliqîyi.*” yan jî “*Ez dikim ji birçîna bimrim.*”, “*Xew li mi herimî.*”, “*Guhê wî dilivî.*”, “*Ji hêrsa dîn bûbû.*”

Li dibistanan şagirt ligel kurmancî bi tirkî jî bi hev re dipeyivin lê li gor şagirtan ev yek ne ewqas bela ye. Rêjeya şagirtên keç yên ku bi hevalên xwe re bi tirkî dipeyivin ji ya şagirtên law kêmtir e. Me li dibistana Derik Anadolu Lisesi ji 32 şagirtên law û ji 28 şagirtên keç pirsî ku “*Di nava sînore dibistanê de hun bi hevalên xwe re bi tirkî dipeyivin yan bi kurmancî?*” Li gor bersîvê wan encameke weha derket holê:

Tablo 60: Hun li Dibistanê bi Hevalên Xwe re bi Kîjan Zimanê Dipeyivin? (DAL)

	Ez tenê bi kurmancî Dipeyivim. (Hejmar û Rêje)	Ez tenê bi tirkî Dipeyivim. (Hejmar û Rêje)	Ez bi her du zimanan jî dipeyivim. (Hejmar û Rêje)	Bi Giştî (Hejmar û Rêje)
Şagirtên Keç	17 - % 60,7	5 - % 17,9	6 - % 21,4	28 - %100
Şagirtên Law	28 - % 87,5	1 - % 3,1	3 - % 9,4	32 - % 100
Bi Giştî	45 - % 75	6 - % 10	9 - % 15	60 - %100

Li gor vê tabloyê ji %75’ê şagirtan bi hevalên xwe re tenê bi kurmancî dipeyivin. Ev rêje ji bo lawan ji %87,5 e; ji bo keçan ji %60,7 e. Ji % 17,9’ê keçan tenê bi tirkî dipeyivin; ji 32 şagirtên law hew yek tenê bi tirkî dipeyivi. Bi giştî ji % 15’ê şagirtan her du zimanan jî bikartînin.

Di peyva wan a tirkî de jî di bikaranîna biwêj û gotinê pêşîyan de em li heman şêwe bikaranîna xelit rast hatin. Vê carê şagirtan di peyivandina tirkî de biwêjên bi eslê xwe kurmancî, bi awayê yekayek werdigerandin tirkî û bikardianîn. Çend heb mînak: “*Üzerimde biraz dolaşacağım. (Ez ê bîskê li ser xwe bigerim.)*”, “*Kendimde göremedim.*” (*Min bi xwe ri nedî.*), “*Suçunu boynuma koydu. (Sûcê xwe kiri hustê mi.)*” Ev cûre bikaranîn ne tenê di nava şagirtan de xuyaye, di nava nifşê mezin de, yên ku dixwazin bi tirkî dipeyivin, yan jî ku mecbûr dimînin bi hin kesên peywirdar yên ku bi kurmancî nizanin re dipeyivin jî heye. Hetta mirov dikare bêje ji ber ku asta

peyvandina bi tirkî di nava vî nifşî de lawaztir e, bikaranînên bi vî rengî jî dê pirtir be: “*Olmuşsun olmamışsın. (Tu bûyi nebûyi.)*” (N... Selmê, 2015) “*Karnım ona yanıyor. (Zikê mi bi wî dişewiti.)*” (M... Heramya, 2015), “*Çocuklar kendilerine oynuyorlar. (Zarok ji xwe ri dilîzin.)*” (S... Qero, 2015) Biwêj û gotinê pêşîyan ji ber ku peyvên biqalib in û yên her zimanekî, di demên gelkî dirêj de, li gor mentiq û pergala wî zimanî çêbûye, peyvên xweser in. Ji ber wê di wergera wan ya ber bi zimanekî din ve divê mirov li gor vê xweserîya wan wergerên wateyî çêke yan jî biwêj û gotinên pêşîya yên wî zimanî yên ji aliyê wateya xwe ve herî nêzîk bikarbîne. Mirov dikare bêje ev xeletiyên rêzimanî ku di bikaranîna biwêj û gotinê pêşîyan de em dibînin, bi hemî kesên ku du zimanan bi hev re bikartînin re çêdibe. Me di peyva çend şagirtan de dît ku carinan di hundirê hevokê de kurmancî û tirkî jî tevlihev dikin: “*Em carna dehrin Uğur Kaymaz Çocuk Parkı.*” (B... DAL, 2015), “*Ez li malê ev ödeviya xwe çêdikim.*” (Z... DAL, 2015), “*Li gundê me herkes kendi halinde yi.*” (A... DAL, 2015) Salih Akin, di nava Kurdên li Fransayê dijî de anketek çêkiriye û di encameke vê anketê de li ser tevlihevkirina zimanan dibêje: “*Büyerek ku ne tenê li Fransayê diqewime lê taybetmendîyeke civata koçberan e bikaranîna gelek zimanan di heman hevokê de ye: %13yê beşdarên gelek caran û %47’ê beşdarên carna du an sê zimanan di heman hevokê de bikar tînin.*” (Akin, 2013: 154) Ji peyva nifşê biçûk yên li Dêrikê û herêma wê xuyaye ne tenê di nava koçberan de û li dîyasporayê, li her cihê ku du ziman bi hev re tên bikaranîn ev rewş derdikeve holê. Xeletiyên rêzimanî yên ku di peyvê de çêbibin dikare normal were dîtin lê heman xeletî di nivîsê de divê neyê kirin. Ji ber ku mirov dikare nivîsa xwe serast bike lê di pêvajoya peyvê de mirov bikartîne û şûn de li xeletîya xwe hayil bibe jî nikare vê xeletiyê serast bike. Pêvajoya “peyvê” di hiş û mejîyê mirov de çêdibe û pêvajoyeke gelekî zû ye. Di vê pêvajoya zû de mirov dikare pergala her du zimanên ku bikartîne tevlihev bike. Ev pêvajoya bîyolojîk û lînguîstîk hîn ne zelal e ku bi çi awayî pêk tê. (Chomsky, 2012: 64, 84)

Di nava şagirtên dibistanên seretayî û dibistana Derik Anadolu Lisesi de me dît ku pîranîya şagirtan nizanin bi kurmancî binivîsin û bixwînin. Çend heb şagirtên ku bi xwendin û nivîsandina bi kurmancî dizanîbûn, di hevdîtinan de gotin em li şaredarîya Dêrikê, li fêrgeha “*Gula Sor Mala Piştgirîya Perwerdeyê*” fêrî xwendin û nivîsandina bi kurmancî bûne. Tişteki din ku bala me kişande, ji nifşê biçûk gelek beşdarvanan, dema ku li ser mijarekê hest û ramanên xwe dianîn zimên, bi awayeke xuyanî zehmet

dikşandin. Li bêjeya digerîyan, hevokên xwe temam nedikirin, carinan hin bêje yan jî hevok dubare dikirin, li peyva xwe disekinîn û dûv re dîsa dewam dikirin. Bi giştî sedemên vê tabloya li jorîn çi ne? Nifşê mezin çima nikare bi kurdî bixwîne û binivîse? Kurmancîya nifşê biçûk çima ne wek yê nifşê mezin herikbar e? Gencîneya nifşê biçûk ya bêjeyan, biwêjan, gotinê pêşîyan çima li gor yê nifşê mezin ewqas lawaz e? Nifşê biçûk çima bêje û peyvên tirkî tevî kurmancîya xwe dike? Di navbera nifşan de, ji alîyê zimên ve wekî din çi cudayetî heye? Bersîvên van pirsan bi xwe sedemên lêkolînên cuda ne û li gor me ne tenê li herêma Dêrikê bi awayeke giştî ji bo hemî Kurdistanê Bakur heman şêwe pirs dikare were pirsîn. Me pêwîst dît em bersîva van pirsan bi kurtasî bidin:

Zarokek dema ku nuh çêdibe, bi demê re zimanê dê û bavê xwe nas dike. Ev ziman, bi bêjeyên xwe, bi rêzimana xwe, bêyî zarok, amade û li bendê ye. Bi demê re, her ku mezin dibe, bi vî zimanî der û dora xwe, hemî gerdûnê nas dike, bi vî zimanî difikire. (Aksan, 1999: 15) Bi vî zimanî hest û ramanên xwe, daxwaz û bertekên xwe tîne zimên. Ger li ber vî zimanê zikmakî fêrî zimanekî din jî bibe, gerdûna wî yê dewlemendtir bibe. Lê ger ku desthilatdarîyek zimanê wî yê zikmakî lê qedexe bike, derfetê nebîne bi vî zimanê zikmakî perwerde bibe, bi demê re wê ji nifşê dê û bavê xwe biqete û wê di anîna zimên ya hest û ramanên xwe de zehmetîyan bikşîne. Ev rewş ji vî alîyan ve dibe mijara pedagogan ku trawmayeke bi vî awayî dikare çi bandorê li kesan û civakê bike, were lêkolîn.

Bêguman her ziman di nava demê de guhertinên biçûk û mezin derbas dikin. Bi demê re normal e ku di ferheng, dengsazî, hevoksazî û taybetmendîyên din yê zimanekî de guhertinên biçûk yan mezin çêbibin. Lê ev guhertin di pêvajoya xwezayî de, bêyî zorê, ji xweber çêdibe. Bi avakirina Komara Tirkîyê re wekî hebûna Kurdan, kurdî jî hatîye înkarkirin û ji ber ku Kurd û hemû netew û kêmetewên din, li hember pêvajoya netewbûn û netewdewleta Tirk wek pirsgirêk hatine dîtin, bûne armanca bişavtinê. Ji bo bişavtinê jî wek gava yekemîn di makezagona duyemîn de tenê zimanê tirkî wek zimanê fermî hatîye pejirandin û pêşî li hemî zimanên din hatîye girtin. Ango qedexekirina kurdî bi awayeke fermî di Adara 1924'an de dest pê kiriye. Ji wê salê û pê ve di qadên fermî de peyivandina bi kurdî, li dibistanan bikaranîna wê hatîye qedexekirin. Bi guhertina navê jîngehan yê bi kurdî, qedexekirin û tundîya li ser kurdî

her ku çûye belavtir bûye. (McDowall, 2004: 266) Ligel perwerdeya bi kurdî, çapemenîya kurdî, pirtûkên bi kurdî jî hatîye qedexekirin. Demekê rojname, kovar û pirtûkên li Stenbolê çap bûne jî hatîye astengkirin ku nekevin nava herêmê. (KTHC, 2008: 41) Ligel ku kurdî ji derfetên komarê yê wek perwerdeyê bêpar maye, her weha destûr nehatîye dayin ku bi hewlên kesayetî yan jî rêxistinî jî berhemên bi kurdî bèn weşan, belakirin û xwendin. Kovar û rojnameyên ku bi kurdî derketine, hatine girtin, nivîskar û xwedîyên wan hatine darizandin û cezakirin. (Malmîsanij û Lewendî, 1992: 345) Qedexebûna li ser kurdî û zimanên ji bilî tirkî heya sala 2003'an dewam kiriye. Di 2003'an de destûr hatîye dayin ku bi zimanên ji bilî tirkî, fêrgeh werin vekirin. Fêrgehên kurdî yê yekemîn li Êlih, Wan, Riha û Qoserê vebûne. (Akin, 2013: 213)

Ji bilî komarê û sazîyên fermî, li Tirkîyê, rêxistin û kesên ku dibêjin em çepgir in jî ew hewlên ku armanca wan pêşxistina kurdî yan jî tenê peyivandin û nivîsandina bi kurdî be, bi "netewperestî" tawanbar kirine û heger ji destê wan hatîye, di vî warî de Kurd asteng kirine. Helwesta akademîsyen û zanîngehan jî bi piranî li gor îdeolojîya fermî bûye. (Beşikçi, 2014c: 578) Gelek der dor û rêxistinên Kurd, ji ber ku xwe şoreşger, çepgir, Marksîst û sosyalîst ditînin, ji ber tîrsa vê tawanbarîyê û ji ber ku wan jê bawer nekiribûn ku divê li zimanê xwe xwedî derkevin, girîngîya ku divîyabû bidin kurdî, nedanê. (Beşikçi, 1990: 147)

Ji ber qedexekirinê, li bakurê Kurdistanê her du zaravayên kurdî, kurmançî û zazakî ji pêvajoya xwe ya xwezayî qetyane. Ne ev qedexekirina bûya û heger bi avakirina Komara Tirkîyê re bi kurdî perwerde hatiba dayin dê îro kurmançî û zazakî dewlemendtir bûya, cudayîyên devokî dê îro kêmtir bûya, her du zarava jî dê standarttir bûya. Dîsa bi her du zaravayan berhemên ku dê derketibûna ji yê anha gelekî bêtir bûya, her beşê wêjeyê dê îro xurttir bûya. Heger pêşîya kurdî bi awayê zagonî û kiryarî nehatiba girtin mirov nikare texmîn bike ku dê bi her du zaravayên kurdî çiqas berhemên wêjeyî hatiba nivîsandin. Ji ber vê qedexekirinê ye ku îro zazakî di xeterîya wendabûnê de ye. Her weha ev cudayîyên ji alîyê zimên ve ku îro di nava nifşan de derketîye holê wê tunebûya yan jî dêkêmtir bûya. Girtina medreseyan jî bandoreke neyênî li kurdî kiriye. Ji ber ku di dewra Împaratorîya Osmanîyan de li medreseyên Kurdistanê dersên kurdî jî dihate dayin û berhemên wêjeya klasîk yê kurdî dihatin xwendin. Anha jî wek sazîyên ne fermî di perwerdeyên olî yê li ser kevneşopîya

medreseyan in, ev berhem tên xwendin. Lê piştî medrese jî hatin girtin, kurdî ji hemî sazîyên dewletê û derfetên wê bêpar ma. Bêyî sazîyên xwe, kurdî bi xebatên kesên rewşenbîr û mîlîtanên zimên ve hatîye asta xwe ya îroyîn, bi van xebatan û ceribandinan bûye xwedîyê vê alfabeya ku em bikartînin û ferheng û rêzimanên wê hatine nivîsandin. (Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Akin, 2013)

Her çend di şerê avakirina Komara Tirkîyê de Kurdan jî li gel Tirkan û neteweyên din şer kiribin jî di dawîya şer de, ango li pê avakirina komarê ji gelek mafên xwe yî rewa bêpar mane. Di tifaqa Tirk û Kurdan de hîmê herî girîng yê wê demê Misilmantî bû. (Beşikçi, 2014: 144-147) Di dawîya vî şerî û serkeftinê de Tirk bûne netew lê Kurd ji pêvajoya netwbûnê dûr ketine. Netewbûna Tirkan di destê komarê de bi demê re ketîye awayeke nijadperstîyê û li hember netewbûna Kurdan bûye asteng. (Beşikçi, 2014b: 152-154) Ji bo netewbûnê navgîna herî girîng ziman e bêgûman. Ji bo bişavtinê jî êrîşa herî mezin li kurdî hatîye kirin. Ji ber van sedemên li jor rêzkirî, kurdî derfet nedîye ku pêşkeve. Mehmed Uzun (1992: 22) dibêje, ‘‘*Ji ber perçebûna welêt û jîyana civakî û zor û zordariya hêz û quwetên dervayî welêt, kurdan tu carî fersend nedîtin ku bikaribin ziman, çand û edebîyata xwe pêş xînin.*’’

Ji sala 2012’an û vir de ango ji destpêka pergala perwerdeyê ya 4+4+4’ê ve li dibistanên navîn wek waneya bijartî waneyên kurdî tên dan lê li lîseyan hîn jî perwerdeya bi kurmancî tuneye. Îro li Tirkîyê tenê li sê zanîngehan, li zanîngehên Mardin Artukluyê, Muş Alparslanê û Bingölê beşên ku mamosteyên kurdî têbigihîne heye lê ev yek li gor serjimêrîya Kurdan gelekî hindik e. Ji ber ku mamosteyên kurdî tunene, ev dersên bijarte ji alîyê ‘‘mamosteyên bi kurdî dizanin’’ ve tên dayin. Bi gel re hêvîyeke weha çêbûye ku bi pêvajoya çareserîya pirsgerêka Kurd re di warê perwerdeya zimanê zikmakî de ji alîyê hikmet û komarê ve dêgavên hîna xurt bên avîtin.

II.7.2.2. Rewşa Devokê Dêrikê

Zanista li ser devok, şêwe û zaravayan dixebite dîyalektolojî ye. Xebatên dîyalektolojîyê divê ji alîyê kesên di vî warî de pispor in û di bin banê zanîngehekê de werin kirin. Bi vî awayî nexşeya devok, şêwe û zaravayan dikare were derxistin. Wek

têgeheke dîyalektoljîyê “devok” bi piranî taybetmendîyên fonetîk; bi hindikayî taybetmendîyên morfolojîk û hîna kêmtir taybetmendîyên sentaksê yên di zimanê peyvê de îfade dike. Li gor vê pênasê, gelo taybetmendîyên kurmancîya ku li Dêrikê û li herêma wê tê peyivandin, têrê dike ku mirov wê wek devokekê bipejirîne yan na, wekî me li jor jî got gihaştina vê encamê bi xebateke dîyalektolojîk pêkan e. Her çend di vê xebatê de armanca me ne tespîtkirina taybetmendîyên devokî yên herêma Dêrikê bû jî di hemî xebatê de her ku me peyvê beşdarvanan neqil kiriye, me ew bi nivîsa îtalîk, di nava nîşaneka dunikê de û bê guhertin, beşdarvan çawa peyivîbin û bi lêv kiribin me bi wî awayî daye. Bi vê yekê armanca me ew bû ku di vê xebatê de taybetmendîyên devokî yên herêma Dêrikê jî tomar bibe. Li vir em ê tenê çend heb tespît û mînakên li ser van tespîtan, bi taybetî ji peyvên nifşê mezin bidin:

Kurmancîya Dêrikê û herêma wê kurmancîyeke paqij û danisilî ye. Di nava peyvên nifşê mezin de bêje û peyvên ji zimanên din pir kêmtir in. Bêje û peyvên bîyanî bi piranî ji zimanê erebî, bi hindikayî jî ji zimanê tirkî û yên din in. Ev kategorî bêje û peyvên bîyanî, di kurmancîya herêmê de rûniştine. Mînak: “*Selam û eleykum.*”, “*Merheba ji te ri.*”, “*Li mekteba me meelim tuneyi.*”, “*Mi kitêbek û defterek ji leyê xwe ri kirî.*” “*Îşev şîva me dolme û aprax i.*”, “*Alvêra me li ser Dêrikê yi.*”, “*Ez çûm bajêr ser dixtor.*”, “*Qîza mi dehrî unîwersîtê.*”

Peyva nifşê mezin ji alîyê vegotinzanîyê ve jî hêjayî lêkolînên cuda ye. Gelek kesên ji nifşê mezin bi taybetî dema ku behsa serpêhatîyên xwe dikirin, bûyer bi şêweyeke xweser vedigotin. Her çend ev şêwe vegotin weke kevneşopîyekê be jî, mirov nikare bêje hemî kesên ji nifşê mezin di heman astê de serkeftî ne.

Daçek bi awayeke xurt tên bikaranîn: “*Hela ji xwe ri lê binêr.*”, “*Mi tu li bajêr dî.*”, “*Di gund di em fetisîn.*”, “*Tu jî bi wî ri herî.*”

Hin bêjeyên ku hîn neketine ferhengan û li herêmê tên bikaranîn hene. Çend heb mînak: **xaxot**: Awayên erdnîgarî yên karstîk in ku li rûyê erdê xuya ne, di awayê şikeft, tatên mezin û yan jî girikan de ne. **xarxoz**: Ew jî teşeyeke erdnîgarî ye, bîrên karstîk in, ji hezazan biçûktir û nizimtir in û di hinekan de av heye, hinek ji wan jî zuha ne. Abdurrahman Önen (2008:77) vê teşeya erdnîgarî di pênasa “bîrên karstî (obruk, düden)” de dide naskirin. **jîyok**: Perçeyek ji mêwê tirî û dêlîyan e ku zirav e, dema ku

mêw yan jî dêlî bi têt, ben yan jî bi darekê ve radipelike bi xêra jîyokan xwe pê ve digire. Di serê biharê de şîn in lê her ku ber bi payizê ve dihere hişk dibin. Du navê wê yî din jî “zencik” û “zincîr” in ku ew jî li herêma têt bikaranîn.” **hesu**: Dema ku ji dût ve mirov dinêre ew cihê rast yan jî gir be lê belê paş wê vala be, kûr be û ji ber wê jî bi dîmena esmên ve bûbe yek. Ji ber vê wate û fonetîka wê, ev bêje dibe koka bêjeya “aso” be. Wê demê divê dengê ‘h’yê ketibe û dengê ‘u’yê jî bûbe ‘o’: hesu→aso “**guhpeîl**: kesên ku guhê wan “bel” in bi vî awayî têt bi navkirin. **Guhbelîsk**: nexweşîyeke guhan e ku wîrusek dibe sedem û guh pê diwerime. Di ferhenga Kurdî – Tirkî ya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê (2004: 723,) de ji bo beramberîya bêjeya “guhpeîl” bêjeya “guhpehn” hatîye bikaranîn. Ji bo beramberîya bêjeya “guhbelîsk” jî di ferhenga heman sazîyê, di cîlda Tirkî – Kurdî de (2000: 624) bêjeyên “binguhk, bingok, gurep, gepok, gelpik, alagoşk, gewrîêş” hatine dayin. **Çimkirin**: Xwe avêtina tiştêkî. Mînak ‘Xwe çimî mi kir.’ Ev lêker di wateya ‘çengkirin’ê de tê bikaranîn, li herêma Dêrikê di vê bêjeyê de bi piranî dengê ‘g’ yê dikeve û lêker wek ‘çenkirin’ tê bikaranîn. ‘Ezê ê xwe ji ser vê cihokê çenkim hêla din.’ Di vê hevokê de ji dêvla ‘çenkim’ ê di nava gel de “çimkim” yan jî “çipkim” jî tê bikaranîn.

Bi taybetî li herêma çîyê di hin bêjeyan de dengê ‘d’yê û ‘t’yê; dibe ‘c’ û ‘ç’. Dema ev guhertin çêdibe dengê ‘i’yê yan jî ‘î’ya li pêşîya ‘y’yê bi piranî dikeve: ‘Ez çûm **Carbekir**.’ ‘Ca wî nexweş i.’, ‘Tûtî di quçya mi di nemayi.’, ‘Ji do di haçyi.’, ‘Hey belqîçyo!’’, ‘Hela rabi gicyano!’’, ‘Ra ecyê em ê heri(n).’, ‘Ji Elî ri goçyi ez nayi(m).’ Li Banqîr bêjeya “gar” wek “car” tê bilêvkirin: ‘Em ê herin vî carî.’ Li Bixurê, Fêskê û Seker beşdarvanan bêjeyên “Dîyarbekir” û “dê” wek “Gîyarbekir” û “gîya” bi lêv kirin: ‘Ez do çûbûm Gîyarbekir.’, ‘Mi gîya xwe jî biri dixtor.’ Di van her du mînanan de dengê ‘i’ yê pir kurt e, di navbera gotin û negotinê de ye. Pêkan e ku ev dengê ‘g’yê guhertina ‘d’ya berî ‘c’yê be. Ango dibe guhertineke bi vê rêzê çêbûbe: d-g-c.²⁵

Li herêma çîyê di kişandina lêkeran de, di dema borîya dûdar de û di dema niha de qertafên kesa û qertafa pirjimarîyê ji holê radibe, ji bo her kesî li gor kesê sêyemîn yê yekjimar tê kişandin: ‘Di wextê di ez jî gelkî çûyi ber pez, tu jî çûyi ber pez, ew jî çûyi

²⁵ Di beşa “II.4.6. Li Bixurê Çand û Kevneşopî”yê de agahîyên firehtir hatîye dayin.

ber pez, em jî çûyi ber pez, hun jî çûyi ber pez, ew jî çûyi ber pez.” “Ez dimeşi, tu dimeşi, ew dimeşi, em dimeşi, hun dimeşi, ew dimeşi.”

Dengê ‘-e’ya di dawîya lêkeran de, qertafa lêkera bûnê ‘-e’yê û ‘-e’yên di daçekan de giş dibin ‘-i’: ‘Navê wî Dawid **i**.’, ‘Îro hewa pir xweş **i**.’, ‘Ev sê ro **yi raneketîyi**.’, ‘Jê pê **vi** çi heyî?’, ‘Bi te **ri** nehat?’ ...

Qertafa pirjimarîyê ‘-an, -ên’ bi piranî wek ‘-a, -ê’ tê bikaranîn: ‘**Zaroka** go em ê herin bigerin.’, ‘**Darê** xwe yî **zeytûna** dibiri.’, ‘Li **hevala** bigeri.’ ...

Qertafa dema bê ‘-ê’ ye: ‘Ez **ê** werim.’, ‘Ger li gor kesê duyemîn were kişandin qertaf bi cînavkê re dikeliye: ‘**Tê** heri ku?’ (tu yê)

Meyla kurtkirinê di gelek bêjeyan de berbiçav e: ‘**E(z)** dixwînim.’, ‘**Ro(j)** çû ava.’, ‘**Dixtor** ji **ter go(t)** çi?’, ‘**Mi(n)** zanîbû ne wenî yi.’, ‘**T(u)** (**y**)ê kengî wer(**i**) mal(**ê**)?’ ... dengên di nava kevanê de dikevin.

Daçeka ‘re’yê dibe ‘-r’ û bi piranî bi bêjeya berî xwe re dikeliye: ‘Heri ji **xwer** karekî biki.’, ‘Ez ji **ter** dibêm.’, ‘Bi **mir** napeyivi’ ...

Herêm ji alîyê biwêj û gotinên pêşîya ve dewlemend e û ev berhemên wêjeya gelêrî bi awayeke xurt tên bikaranîn. Hin mînakên me dan hev ev in:

Gotinên pêşîya: ‘Çê kiro bi xwe kiro; xerab kiro bi xwe kiro.’, ‘Mirin hespa sipî yi; li ber deryê herkesî yi.’, ‘Dest desta dişo; dest vedigeri dev û ra dişo.’, ‘Aqlê sivik barê giran i.’, ‘Bexê nêr ji kêrê re yi.’, ‘Çavê li derya; xwelî li serya.’, ‘Dara xwezîya şîn nabi.’, ‘Gîhayê hewşê tal i.’, ‘Mêrê qels du cara şer dixwazi.’, ‘Ji xezalê bezatir tuneyî ji qismetê xwe pêvtir nikari bixwo.’, ‘Benîştê dîna ji lîtirê yi.’, ‘Ava bîra bi tevdîra...’, ‘Kevirê havînê; bavî binê kulînê.’, ‘Mala pîrê, gora pîrê...’, ‘Zilamê fedyok bi kundekî; pîreka fedyok bi gundekî.’, ‘Bûk i bê zar û ziman i; xwesû yi bê dîn û bê îman i.’ ...

Biwêj: ‘Nanê me bê xwê yi.’, ‘Tu ket serê mi.’, ‘Tu ji çavê mi ket.’, ‘Lê sor bû.’ Xwe li ber nexî (nekeribi). Li ber neket (fam nekir). Çavfire, destteng, destbela, çavbirçî, rûnerm, nan pê xweş ê kar pê jar, serê mi şuştî; gulîkê mi hûnayî...

Berhemên din yên wêjeya gelêrî jî hene lê li gor gelek beşdarvanan gelek berhemên ji zargotina kurmancî hatine jibîrkin. Ji ber wê divê xebatên berhevkirina berhemên wêjeya gelêrî werin kirin da ku ev berhem wenda nebin. Hin berhemên ku me navê wan yan jî mînakên wan tomar kirine ev in:

Çîrokên gelêrî: “Şewlê Mezrayî, Teyarê Qereçolî, Zir Mehemedê Dêrikî, Sîyamedê Silivî, Mîr Mehemed, Ristemê Zal...” Ji van çîrokên gelêrî her sêyên pêşî wek navend çîrokên herêma Dêrikê nin. Çîroka Şewlê Mezrayî cara yekemîn ji aliyê helbestvanê Dêrikî Reşîdê Kurd ve derbasî nivîsê bûye û wek mînakek berhemên wêjeya gelêrî di “Antolojîya Edebîyata Kurdî-1”ê de ku Mehmed Uzun amade kiriye, hatîye tomarkirin (Uzun, 1995: 223). Çîrok wek cara duyemîn ji aliyê me ve hatîye tomarkirin û ji ber ku di wan salan de kurmancî qedexe bû, wergera wê ya bi tirkî di kovara “Zeytindalî” de, ku hejmarek tenê derketîye, hatîye belakirin. (Öçal, 2008: 41) Ev çîrok, bi awayeke balkêş dişibe çîroka gelêrî ya tirkî “Köroğlu Destanı”.

Meselok: “Sêwîya li Ber Destê Ap û Amojnê, Hebhinarkê, Hûtê Berşaşa, Pîra Hûta, Hûtê Heftserî, Dîk û Pîrê, Çûk û Histirî, Sê Bira, Mîrmircan, Kerkê Herînî, Hirçê Kela Benê, Rêvî û Qulung, Hemlûlik Memlûlik (Şemberîk Memberîk, Hembelîko Şembelîko), Pepûk, Kêzaxatûnê, Qûnpankê, Pîrê û Rêvî, Peqilkê Buharê...” Ji van meselokan divê navenda “Hirçê Kela Benê” Dêrik be, ji ber ku bi navê “Kela Benê” li navenda Dêrikê cihek heye.

Pêkenok: “Mele Nesredîn, Gurîkê Qaza, Jîrikê Mehelya...” Ev pêkenok her yek ji rêzeçîrokan pêk tên.

Nifir: “Miradê te di qirika te di bimîni.”, “Xwedê te nehêli”, “Qansêr di bengiloşka te di weri”, “Çûna te hebi vegera te tunebi”, “Tu li şûna wara bimîni.”...

Dia: “Xwedê te bihêli.”, “Xwedê te bi dewrana gihîni.”, “Tu neki Xwedê bi te di.”, “Xwedê warê te şên biki.”, “Xwedê te bi bavê (yan jî ca) heft lawa ki.”...

Tiştanok: “Simê gê tije xwê. (hinar)”, “Tenûra humhumî, tije nanê genimî. (gwîz).”, “Apê cûno duqûno. (gundorê ser xanîya).”, “Hilindir, bilindir; law ji bavê bilindir. (agir û dûman).”, “Tiştêkî mi heyî bi şevê pepûk i biro bûk i. (kulîna nivîna)”...

Çîvanok: ‘Serê malê binê malê Xwedê kurkî bid vê malê.’, ‘Kurm qurm qul kir.’, ‘Mi bûkek anî bi lez û bez; sivka malê tim û tim ez. Qaşo sê bûkê mi heni; di mi di anîn derd û merez!’ ...

Lorî: ‘Pir bijî karik bijî, heçê dilê wan bibijî, her du çavê wan zo birjî.’ (Dema zarok dibêniji tê gotin) ‘Lorî lorî kurê mi lorî, ez qurbana xalê te, ez dam bavê te, ne ji bavê te ba, tê ji ku heba.’, ‘Memanê memanê, kejîya min a panê, avît gola hanê, gola han bi qamîş i, mara têd fiş e fiş i, kekê min çawîş i, çawîşê biçûk i, mi jêr anî bûk i, bûka qelender i, xwecyê şara zer i, şara zer li ba kir,(...?) şara zer genî yi, avît piş xênî yi, diza ji xwer birîyi’ ...

Di vê lorîya dawîyê de wek derek hatîye jibîrkirin. Piştî ku ‘şara zer li ba kir’ li gor boşavenda wê divê dewam bikira.

II.7.2.3. Rewşa Kevneşopîyan li Herêma Dêrikê

Li navenda Dêrikê û li herêma wê bi hevdîtînên ku me bi beşdarvanên ji nifşê mezin re kir derfeteke weha da me ku di civakê de em guherînên di navbera 70-80 sal berê û îro de bidin ber hev. Li ser pirsên me yê ‘Di zarotîya we de jîyan çawa bû û anha çawaye, jîyana berê xweş bû yan a anha, di dema xortanîya we de zewac çawa bû, dîlan çawa bû, mervantî çawa bû? û hwd.’ (Kaxeza pirsax) bersîvên hatin dayin balkêş bûn. Di van bersîvan de carinan guhertina di civatê de, di çand û kevneşopîyên wê de xuya dibûn carinan jî serûbinbûn û matmayina derûnîya nifşê mezin ya li hember guhertinan. Bersîvên herî pir em lê rast hatin, li gor nêzîkbûna wan ya ji alîyê mijara wan ve ev in:

‘Bext û bawerî nemayi. Her tişt bûyi pere. Bûyi êdî bira bi birê bawer nabi.’, ‘Kes nema kani şirikatîyê bi kesî ri biki. Berê yekî sozek bida, serê wî jî tê di biçûya ji soza xwe venedigerîya.’, ‘Kesî kesa tuni, herkes li a xwe dinêri.’, ‘Bi qirdê hesen mi pere dabû dostekî xwe. Pênc sal ket ortê dostê mi nikarîbû deyhne xwe bida. Ji dêvla deyhne xwe erdê xwe da mi, mi qêmîşî wî nekir, mi qebûl nekir. Sal zîvirî nêvîyê wî erdî firot, perê mi da mi.’ (A, M2., K. û R... Dêrik, 2014)

‘‘Berê şevê zivistanê em ya li ber pixêrya êgir, ya li ber manqilê rûdiniştin û ya pîrika me ya jî kalikê me çîrok ji mer digotin. Berê heçê ê aqrabê hev li hev vedihewîyan, ji xwe ri suhbet dikirin. Lê anka telewîzyonê suhbet betal kiriya. Telewîzyon, keç û xorta ji rê derdixi.’’, ‘‘Berê biçûktî hebû, mezinatî hebû. Berê kincê me kitan bû, hubrî bû, kirasê dirêj bû. Xwedê wekîl bi heya ra ez zewicîm jî mi mêrê xwe nedibû. Ana ji berê çêtir i, heya qîz pê qayil nebi bavê wan wan nadi.’’, ‘‘Telefon derketîyi, xêra Xwedê yi û bi xêra telewîzyonê haya me ji her derê çêdibi. Bi xêra van erebana û telefona êdî xerîbî nemayi.’’ (M3., T. û Ş2. Bixur, 2014)

‘‘Berê xwarin wek ana ne pir bû, ana xêra Xwedê yi her tişt heyî. Hineka tiştêkî neba bixwesta me digo ‘tu çelê zivtanê seleta xîyara ji me dixwazi’ lê em ana dinêrin her wext mere kani seleta xîyara çêki. Berê te bilxurek çêkira bîna wê diçû di kur ri derdiket. Xwarinê ana bê tam in, xwezî bi zemanê berê, sal bi sal xwezî bi par.’’ (B. Xarok, 2014)

‘‘Însanê berê ji ê ana saxlemtir bû, nexweşî tunebû, mirin kêmbû, dixtor tunebû. Yek bimra çel rî şûna wî dihat kişandin. Rûnê wîta derket nexweşî pir bû, berê me rûnê malê dixwar, me zeyta Dêrikê dixwar.’’ (F. Dêrik, 2014)

‘‘Me diçû av bi dewla ji bîra ya ji kanîya dadigirt. Me têr serê xwe nedîşuşt.’’ (L. Xarok, 2014)

‘‘Temama gund bi şelwerekî bû, kî biçûya bajêr, dişand ew şelwer dianî, li xwe dikir, pê diçû bajêr û dîsa dibir dida xwedya.’’, ‘‘Zemanê berê heri û venegeri. Dinya ana bûyi rehetî.’’ (O. Xarok, 2014)

‘‘Berê dujminatî hebû, em kes nikarîbûn biçûna mehela kesî.’’ (S. Dêrik, 2014)

‘‘Me bi tirkî nizanîbû, em nikarîbûn biçûna ber deryê hikumetê. Wa wextna mehkûm pir bûn, esker li wan digeryan. Berê qaçore hebû, baca serya hebû. Du cendirme bihatna gund kanîbûn em giş bidana ber ça.’’ (M. Bixur, 2014)

‘‘Debara mala zor bûyi. Karê berê karê kurmancî bû, rez bû, pez bû, êzing bû, paletî bû, qaçax bû, karê qazme û bêrê bû lê îdara me dibû. Pez biqîmet bûn, erd bêqîmet bûn. Anha qîmet ji tiştêkî ri nemayi.’’ (S. Dêrik 2014)

“Di wextê di hikûmetê gundek dida bavê mi, bavê mi qebûl nekir, digo ez nikarim wergîya (bac) wê bidim.” (M. Tilbisim, 2014)

“Nêzîka hezar donim erdê bavê mi hebû, em heyşt bira bûn, serê me her yekî sed û bîst donim erd mayî, têra me naki, ê mi çar leyê mi heyî, ew ê ji her yekî ri 30 donim bimîni, ka ew ê çawa pê debara xwe bikin.” (Y. Heboşî, 2014)

“Berê etara xwê, şeker, mewîj, dims, kinc, cil û cor li gunda digerlandin, me bi du tas genim tasek dims ya xavikek, ya tasek mewîj dikirî, kesî pere nas nedikir. Karê kê heba, ardimîya wan tuneba me palûte datanî, me diçû alî wan dikir. Ana mîza xelkê derman bi bi tilîya mere namîzin.” (F. Bixur, 2014)

“Berê ev çaya tije darê berî û mazî bû, ana req û rût mayî. Me diçû hejîk û êzingê xwe ji a vê birekê dianî. Dengê kewa dihat, heya diket mala me. Karek ya berxek me li çolê bima, ji tirsê wahşê em nedîçûn lê nedigerîyan, heya sibê heger sax ma hey sax ma, nema dibû sibe me diçû berata wê didî.” (H. Bîrînî, 2014)

Wekî ku ji van vegotinan jî tê fêmkirin di civatê de gelek guhertin çêbûne. Ev guhertinên çêbûne di warê civakî, aborî, çandî de, em dikarin bibêjin di her qadê de ye. Xweza jî li gor berê hatîye guhertin. Li gor vegotinên nîfşê mezin, hin kes ji van guhertinan aciz in, hin kes jî ji pêşveçûnan kêfxweş in. Bi piranî acizî ji têkilîyên modern in ku takekesî ketîye pêşîya hestên malbatî û civakî. Nirxên berê yê pir bi qîmet “bext û bawerî” êdî di demên berê de mayî. Guhertinên di kevneşopîyan de, di çandê de çêbûne hin kesan kêfxweş dike û bi hin kesan jî ne xweş e. Wek mînak guhertinên di awayê zewacê de çêbûne, hevaskirina bûk û zavê bi awayê erênî tên pêşwazîkirin. Lê serbestîya keç û xortan hin kesan jî aciz dike. Pêşveçûnên di teknolojîyê de, îcadên wek tirimbêl, telewîzyon, telefon û hwd. bi sedema ku jîyana mirovan hêsan dikin bi piranî bi kêfxweşî tên pêşwazîkirin. Lê yê ku ji van pêşveçûnan aciz in jî hene. Gazinên wan bi vî awayî ne: *“Berê em peya diçûn Dêrikê û em dihatin, em nexweş nediketin.”*, *“Telewîzyonê sohbet nehêştîyi.”* û *“Mirovan ji rê derdixîni.”* û hwd.

Li Dêrikê û li herêma wê di warê pîşesazîyê de heger em LÎMAK’ a ku di 2009’an de çêbûye nehesibînin, ji bilî çend heb atolyeyê biçûk yê kelpîçan çêdikin ti

kargeheke din tuneze. Di dema xwe de hin kargehên wek zeytxane, atolyeyên kulavan çêbûbin jî hem ji alîyê kapasîteyên xwe ve gelkî biçûk bûne ku hejmara karkerên wan pir hindik bûne û bi piranî wek kargehên malî bûne ku bav û zarok tê de xebitîne û hem jî ji alîyê demê ve ne pir demdirêj bûne. Komarê jî pêşengîyek nekiriye ku pîşesazî bi pêşkeve û kesên dewlemend ku mirov wan wek ji çîna “bûrjûwazî”yê bi nav bike jî bi karekî weha ve daneketine. Ji ber wê heya roja îro jî mirov li vê herêmê nikare behsa çîna “karkeran” bike. Wê demê mirov dikare bêje li herêma Dêrikê heya 60-70 sal berê, awayê jîyana modern tunebûye, jîyaneke seretayî serdest bûye û nirxê civakê jî li ser vî awayê jîyanê hatîye avakirin. Immanuel Walerstein (2005: 45) dibêje bingeha “pergala dinyê ya modern” di sedsala 16. de li parzemîna Ewrûpayê hatîye danîn û ev pergala pergaleke kapîtalîst e. Lê kapîtalîzm li her derê dinyê di heman demê de û bi heman hêzê serdest nebûye. Li gor tesnîfa Komînternê ya ku di salên 1930’î de kiriye, ji bona Tirkîyê weha tê gotin: *“Tirkîyê, di demên berê de welatekî niv-mêtingeh bû, piştî şoreşa xelasîyê ya netewî, xwe ji serdestîya emperyalîstên bîyanî xelas kir. Anha welatekî ku aborîya wê li ser çandinîyê ye û welatekî di asta navîn de kapîtalîst e. Pîşesazîyên wê yî çandinîyê û zeneetê şûndemayî ne. Binyada hukumeta wê komareke burjûwa ye.”* (Popov û Dobrov, 1991: 148) Di destpêka avakirina Komara Tirkîyê de rewş weha bûye. Li herêma Dêrikê ji alîyê aborîyê ve karê sereke hîn jî çandinî ye. Pîşe tuneze, qada kar, hilberîna aborî li ser çandinîyê ye. Ango gel li vê herêmê cotkar û ajalvan e. Heya salên 1950 li herêmê awayên çandinîyê seretayî ye, ji ber wê jî hilberîn gelekî lawaz e. Ji 1950 û şûn de wekî li hemî Tirkîyê, li herêma Dêrikê jî bi berhemeke teknolojîk di warê çandinîyê de şoreşek çêdibe û ev şoreş dibe sedemê hilberînên çandinîyê yê xurt û ev jî dibe sedemê dewlemendîyê. Navê vê amûra teknolojîk ku di warê aborîya gel û nirxê erdê de şoreşê çêdike “terextor” e. Her çend di demên berî wê de jî li Tirkîyê terextor hebin jî, bi awayeke rêk û pêk ji sala 1949’an û pê ve di çarçoweya alîkarîyên Marshall li her derê Tirkîyê bela bûne. (Oktar û Varlı, 2010: 10) Di pêvajoya xebatê de me ji sê beşdarvanan bihîst ku terextor li herêma Dêrikê cara yekemîn di serê salên 1950’î de hatîye bikaranîn. Li gor beşdarvanekî, yê ku cara yekemîn terextor anîye herêmê û li nava zevîyên xwe bikaranîye, Qadê Ela ye. Nevîyê Qadê Ela F. (52) jî ev yek piştrast kir û got: *“Min bi xwe nedî lê li gor ku bavê mi û wekî din gundîya jî behs dikirin, terextora ewilî li Şabana bavê mi Qado bikaranîyi. Tekelikê vê terextorê ne lastîk bûyi, paletê wê hebûyi. Li gor texmîna mi sal ew ê li der û*

dora 1953 bi.” (F. Şabana, 2015) Li ser vê mijarê em bi 5 beşdarvanên ji nişê mezin re yê li berîyê dijîn û bi 2 heb beşdarvanên li gundên çîyê dijîn re peyivîn. Ji van hevdiştinan me ev bersîvên li jêr tomarkirin:

“Berê çiqas erdê yekî pir ba jî ji ber gi nîkarîbû gişî hilîni û dîni, tenê miqdarek diçandi. Nîfqê xwe jê hiltanî û heger ji ber bima ê mayî difroti.” (F. Qizil, 2015)

*“Cot bi ga bû bi dewara bû, bi ker û bergîra bû. Me bi heywên cercere dikir, ka û genim ji hev diqetand. Dûr ê feqîr ji xwer dihatin liqatê”.*²⁶ (M. Qizil, 2015)

“Pez, xerzik û zeytûn ji erda biqîmettir bû.” (H. Dêrik, 2015)

“Xalê mi, gundê xwe bi keryak pez dayi.” (Ş. Mavan, 2014)

“Dewletê erd belaş dida xelkê, xelkê qebûl nedikir. Tişteke jê nedihat û xelkê nîkarîbû wergîya (bac) wê bida.” (H. Dêrik, 2014)

“Di wa wextna di ça şên bû, berî vala bû. Berî germ bû, av lê tunebû, mêş û mahol lê pir bû. Ji ber wê, gelek gundê berîyê ê gi anka şên in, wan çaxina ya tunebûn ya jî pir hindik mal lê hebûn. Însana bêtir xwe li cê bilind, cê bi av û li cê hênîk digirtin.” (E. Fitin, 2014)

“Bi hatina terextora û biçera, qîmeta erda zêde bû.” (F. Şabana, 2014)

“Wextê gi hikumet erda bela diki, mamûrê dewletê ji bavê mi ri dibê apo heya tu karibi birevi, cê gi tu lê bisekîni em ê heya wir li ser navê te tapu bikin. Bavê mi direvi lê feqîro yextyar bû zû dibetili, 110 donim erd li ser navê wî tapu dikin.” (M. Heramiyê, 2014)

Bi bikaranîna terextor û navgînên din yê wek biçer, mîbzer û yê din, derfet çêbûye ku gelek donim zevî were çandin û çînîn. Bi vî awayî pêdivîya bi karkeran kêmbûye lê li hêla din xwedîyên zevîyan dewlemend bûne. Bi taybetî terextoran cihê ga, bergîr û gîsînan girtîye. Ji ber ku bandora cotkarîya bi makîne, bêtir li herêma berîyê rûdide, herêma çîyê qîmeta xwe ya berê wenda dike. Li berîyê cotkarên dewlemend

²⁶ Li gor pênasa vî beşdarvanî liqat, piştî ku tenê tê çînîn simîlê li dewsa benderê yan cercerê dimîne, tê hevdan û bi desta ji hev tê firidandin û ji kayê tê neqandin. Liqat belaş bû, ê ku dikirin tu heq nedidan xwedîyê benderê û ev genim ji xwe re dibirin.

çêdibin. Bi gelemperî şênîyên berîyê jî ji vê dewlemendîyê sûd werdigirin. Her çend daristanên berî û mazî yên herêma çîyê bi awayeke hovane hatibe qelilandin jî, anha jî jîyana çîyê, xwezaya çîyê, av û hewa çîyê ji ya berîyê xweştir e. Lê belê gundên çîyê van awantajên xwe bikarînin. Li dewsa daristanên xera bûye daristanên nuh bèn çêkirin, yên lawaz werin xurtkirin, ji ber ku Dêrik qadeke mîkro-klîma ya ji avûhewayaya Behra Spî ye, (Yıldırım û Karadoğan, 2010: 129) darên fêkî yên wek behîv, gwîz, fisteq, qeresî, zeytûn, hurmî û wekî din werin çandin, herêma çîyê dîsa wê vegere qîmeta xwe ya berê. Li gor avûhewa herêma Dêrikê û daxwaza darên van fêkîyan ya axê û avûhewayê gelek cûre darên din jî dikare were çandin. (Esen û Yiğit, 2003: 50)

Di salên destpêkê yên Komara Tirkîyê de, li temama Tirkîyê ligel dewlemendên erdan, gundîyên bêerd jî hene. Ev yek di mijara belakirina erdên xezîne de, di nava kadroyên ku komar avakirine de dibe sedemê nakokîyekê. Hin kadro dibêjin divê em çîna bûrjûwazîyê ava bikin, ji bo wê jî divê em erdên xezîne yên dewletê bidin çend kesan. Hin kadro jî dibêjin divê em van erdên ku malê dewletê ne, li gundîyên cotkar yên bêax belakin. Di dawîya van niqaşan de Atatürk jî fikra ku axê li cotkarên bêax belabikin diparêze û ji bo vî karî dem bi dem zagonên nuh tên çêkirin. Di hin zagonan de ne tenê behsa belakirina axa xezîneya dewletê tê kirin, her weha hin zagon rê didin ku axa hin kesên dewlemend ku axa wan gelek in jî ji wan were sitendin û li gundîyên bê ax weri belakirin. Lê ji ber gelek sedemên guhertî ev zagonên ku hatine çêkirin nayên pêkanîn. Cara yekemîn ew zagonên ku heya wê rojê yên li ser vê mijarê hatine çêkirin, di sala 1947'an de tên pêkanîn û hikumet dest bi reformekê dike ku axê li gundîyên ku cotkarîyê dikin lê belê yan bi tûmî axa wan tune ye û yan jî axa wan hindike, belabike. (Çamurcuoğlu, 2009) Lê ev reform jî bi sînor dimîne, ji ber gelek sedeman bi awayeke giştî nakeve jîyanê. Li gor agahîyên ku bi taybetî me ji herêma berîya Dêrikê daye hevdû, di salên 1950'yi de li herêma Dêrikê mîqdarek ji axa xezîne li gundîyan hatîye belakirin. Ji navenda Dêrikê jî hin malbatan ji bo ku ji van erdan bistînin, di wan salan de malê xwe birine li gundên berîyê bi cî bûne. Hinek mal, piştî wextekê dîsa vegeerîyane Dêrikê lê hinek mal jî li wan gundan mane. Wek mînak malên Heramî ku anha li gundên berîyê dijîn, di wan salan de çûne li wan gundan bi cih bûne. Bêguman hinek ji wan malan ji bilî erdê ku komarê di derbarê reforma erdan de daye wan, wan jî piştî reformê ji xwe re li vê herêmê erd kirîne. Ji bilî malên Heramî ji herêma çîyê jî ji gundên cûrbecûr malbat hatine li berîyê bi cih bûne û erd ji komarê

sitendine. Ji ber wê mirov dikare bêje gelek malbatên ‘‘çiyayî’’ jî ji destpêka salên 1950 û vir de çûne li herêma berîyê û li herêma lêf bi cih bûne. Wek ku me jî malbatên Heramî mînak da malbatên çiyê jî ji bilî van erdên bi reformê bidest xistine, jî xwe re erd kirîne jî. Bi vî awayî tê fêmkirin, piştî ku çandinîya bi makîne dewsa çandinîya seretayî digre, li herêma Dêrikê di warê serjimêrîya hin gundan de û di cihguheztina serjimêrîyê de guhertinên girîng çêdibe.

Ji ber ku wekî hemî herêma Kurdistana bakur, civaka herêma Dêrikê jî herêmeke ku çandinî lê serdest e û pişesazî lê pêşneketîye, têkilîyên di nava civatê de serdest e jî bi awayeke xwezayî têkilîyên çanda civaka çandinîyê ne. Li gel çandinîyê, jî berê ve bazirganîya li ser berhemên çandinîyê, zineetkarîya ku bi piranî di destê Ermenî û Suryanîyan de bû, li gor dem û der û dora xwe pêşketîbûna axa, şêx û melayên Dêrikê, di nava kevneşopî û çanda Dêrikê de taybetmendîyên civakeke xweser çêkiriye ku li gor me ev çand senteza çanda ‘‘feodal’’, çanda ‘‘modern’’ û çanda ‘‘bajarvanî’’yê ye. Bi taybetî li navenda Dêrikê di warê ol û bawerîyê de hişkebawerî tune. Di jîyana gel ya rojane de, hêmayên vê civaka biçûk lê belê nixê feodal û bajarvanîyê bi hev re di nava xwe de dihevine ev in: comerdî, dilsozî, bext, mêranî, hevaltî, biratî, welatparêzî, kêf û eşqa jîyanê, qerf, sifreyên şerab û araqê, vegotina dûr û dirêj ya serpêhatîyan bi kurmancîyeke herikbar, qedr û qîmeta jinê ya bilind, jinên mêranî û sermîyan û hwd. Em dikarin şopa van hêmayan di gelek anekdotên ku di nava gel de dijîn bibînin. Di warê jîyana civakî û kevneşopîyan de em gelek car li gazinan rast hatin ku civata Dêrikê roj bi roj tê guhertin, gel jî vê çanda ku me li jor behs kiriye hêdî hêdî dûr dikeve, bi taybetî koça Dêrikîyên resen ji Dêrikê û di dewsa wan de kes û malên ji derveyî Dêrikê hatine dibin sedemê vê guhertinê. Çend kesên ku ji nifşê mezin dema ev gazin dikirin mînaka wan ya hevbeş ev bû ku dema li çarşê digerin êdî kesekî nas nakin.

II.7.3. Rewşa Navê Mirovan li Herêma Dêrikê

Di lîsteyên hîlbijartinê û yên dibistanan de bi tevayî hejmara mirovên ku navê wan bûye mijara vê xebatê 2792 ye. Ji van kesan 1961 kes hîlbijêrê her çar gundan û 831 kes jî şagirtên her du dibistanên navenda Dêrikê û şagirtên dibistanên her çar

gundan e. Heger em rewşa hilbijêran û ya şagirtan bidin ber hev em ê rewşa guhertina meyla navan ya li gor zimanan bibîn.

Tablo 61: Rewşa Navê Hilbijêrên 4 Gundan, li Gor Zimanan

	Erebî	Kurmancî	Tirkî	Yên Din	Bi Giştî
Qizil	801	75	69	177	1122
Bixur	511	31	37	98	677
Fitin	19	5	1	7	32
Xarok	87	14	5	24	130
Bi Giştî	1418	125	112	306	1961
Rêje	%72,3	%6,4	%5,7	%15,6	100

Li gor vê tabloyê, di nava hilbijêrên çar gundan de rêjeya navên erebî %72,3; rêjeya navên kurmancî ji %6,4 û rêjeya navên tirkî ji %5,7 e. Di beşa ‘yên din’ de navên ji zimanên din, navên têkel, dunav û navên nedîyar hene. Hilbijêrê herî ciwan di sala 1996’an de ji dayik bûye.

Tablo 62: Rewşa Navê Şagirtên 6 Dibistanan, li Gor Zimanan

Dibistan	Erebî	Kurmancî	Tirkî	Yên Din	Bi Giştî
DAL	145	65	30	38	278
ATA.O.	55	41	15	14	125
DIB. QIZ.	111	35	9	31	186
DIB. BIX.	94	37	22	36	189
DIB. FIT.	2	5	-	6	13
DIB. XAR.	24	5	2	9	40
Bi Giştî	431	188	78	134	831
Rêje	%51,9	%22,6	%9,4	%16,1	%100

Di vê tabloyê de em navê şagirtên şeş dibistanan dibînin. Dema jidayikbûna van şagirtan, wek herî biçûk şagirtên dibistanên seretayî û herî mezin şagirtên lîseyê di navbera 2005 û 1995'an de ye. Rêza zimanên herî pir hatîye bikaranîn nehatîye guhertin lê di rêjeya navê her zimanekî de guhertin berbiçav e. Zimanê yekemîn yê navan dîsa erebî ye lê rêjeya wê ji %72,3'yan daketîye ji %51,9'an. Rêjeya navên kurmancî ji %6,4'an hilkişiyaye ji %22,6'an. Ev guhertin nêzîkayî 3 qat û niv e. Di rêjeya navên tirkî de jî zêdebûnek ji qat û nîvekê hinekî bêtir heye, rêjeya navên bi tirkî ji %5,7'an bûye ji %9,4.

Tabloya giştî ya navan ango hemî navên hilbijêr û şagirtan bi vî awayî ye:

Tablo 63: Rewşa Hemî Navan, li Gor Zimanan

Ziman	Hejmara Navan	Rêje(%)
Erebî	1849	%66,2
Kurmancî	313	%11,2
Tirkî	190	%6,8
Îbranî	81	%2,9
Farisî	51	%1,8
Yewnanî	17	%0,6
Moxolî	12	%0,4
Îtalyanî	1	%0,04
Navên Nedîyar	37	%1,3
Navên Têkel	89	%3,2
Dunav	152	%5,4
Bi Giştî	2792	%99,8

Li gor vê tabloyê, piraniya navê mirovan bi erebî ye. Ji 2792 kesî, navê 1849 mirovî bi erebî ye. Li dû erebî, kurmancî û tirkî tê. Navê 313 mirovî bi kurmancî û navê 190 mirovî bi tirkî ye. Ji bilî van her sê zimanan, em li navên bi îbranî, farisî, yewnanî,

moxolî û îtalyanî jî rast tèn. Mirov dikare bêje sedema ku navên erebî ji navên din bêtir in sedemên olî û bawerî ne. Navên îbranî “Îbrehîm, Yusuf, Îshaq...” ji ber ku navên pêxembera nin, di Qur’anê de derbas dibin, ji ber wê mirov dikare bêje ev nav jî navên olî ne û bi wê sedemê hatine bikaranîn, ne ku serast ji zimanê îbranî derbasî kurmancî bûne. Navên moxolî û îtalyanî jî ne serast ji zimanê van miletan derbasî kurmancî bûne, ihtîmala ku ev nav di ser tirkî re derbasî kurmancî bûbe xurttir e. Ji xwe navên bi îbranî ne wek bilêvkirina di îbranî de, li gor bilêvkirina erebî tèn bikaranîn. Bilêvkirina navên moxolî û îtalyanî jî li gor bilêvkirina tirkî ye...

Sedema yekemîn ku navên bi kurmancî kêr in, qedexebûna kurmancî û navên kurmancî ye. Dema ku em listeyên hîlbijêran û listeyên şagirtan didin ber hev em dibînin ku bi demê re her ku qedexebûna li ser kurmancî û navên kurmancî kêr bûye, rêjeya navên kurmancî jî li gor wê zêde bûye. Mirov dikare bêje di demên pêş de qedexebûna li ser tîpên kurmancî “x, w, q, î, û, ê”yê ku di elfabeya tirkî de tune ye rabe, dê navên kurmancî jî bêtir were bikaranîn.

Sedemeke din ku navên kurmancî di nava nîfşên nuh de zêde kiriye, pêla Kurdperwerîyê ye. Dema ku em li listeyên hîlbijêran dinêrin em dibînin di nava kesên di salên 1990’î û li pê wê ji dayikbûne de, li gel ku di wan salan de hîn jî lêkirina navên kurmancî qedexe ye, navên kurmancî bêtir bûye. Ji bo ku em vê yekê ji hev veqetînin me navên kurmancî yê hatîye bikaranîn wek navên kurmancî yê klasîk û navên kurmancî yê modern dabeş kir. Di nava kesên di salên berî 1990’î de jidayikbûye, bi rêjeyeke bilind em li navên kurmancî yê klasîk, navên wek Gulê, Gulîstan, Besê, Zero û hwd. rast tèn. Lê ji 1990’î û vir de em li navên kurmancîya modern yê wek Rojda, Rojbîn, Zîlan, Hêlîn, Dîlan, Bawer û hwd. jî rast tèn. Navên wek Berîtan, Azad, Rojbîn, Zîlan û hwd. di heman demê de xwedî peyamên sîyasî ne jî. Wekî ku tê zanîn salên 1990’î li herêmên kurdan şerê PKK û komarê gur bûye, netewperwerîya kurdî êdî bi xwepêşandanên gel re ber bi girseyîbûnê ve çûye. Di wan salan de Dêrik jî herêmeke bi tevger bû.

Me navên bi kurmancî û yê bi farisî çawa ji hev qetand? Navên di kurmancî û farisî de hevbeş in, yê wek Gulîstan, Perîxan, Ferman, Baran û hwd. me wek kurmancî pejirandin. Lê navên wek Ebrû, Şahîn, Handan, Nalan ji ber wateya wan me bi farisî pejirand. Ligel wateyê wan şiklê çêkirina van navan jî bû sedemek vê

pejirandinê. Wek mînak herçend ji heman kokê bin jî me navê “Nalîn” bi kurmancî; navê “Nalan” wek farisî tomar kir.

Di nava gel de gelek navên bi zimanên bîyanî dema ku tên bilêvkirin ji bo ku kintir bibin û bilêvkirina wan hêsantir bibe tên kurdîzekirin. Wek mînak li gor me navê “Zîn”ê ji “Zeyneb” û “Zînet”a bi erebî hatîye kurdîzekirin. Di nasnameyan de jî hinek nav wekî ku tên bilêvkirin hatine nivîsandin. Hin navên ku tîpên di tirkî de tunene vedihewînin, bi awayê xwendin û bilêvkirina tirkî hatine nivîsandin. Wek mînak navê “Zînê” wek “Zini, Zine”; navê “Besê” wek “Besi, Bessi, Bese, Besse” navê “Gulê” wek “Güli, Güle” hatine nivîsandin. Ji bilî navên bi zimanên din, navên bi kurmancî jî tên kinkirin. Di kinkirina navê mêran de bi piranî nav bi dengê “o”yê xelas dibe, navê jinan jî bi piranî bi dengê “ê”yê tê xelaskirin ku ev her du deng ji bo her du zayendên cuda di heman demê de dengê “banglêkirinê” ne jî. Lê di hinek navên jinan de jî nav bi dengê “o”yê xelas dibe. Çend mînak: Mihemed (Hemo), Hemdilla (Hemo), Mamûd (Mamo), Sadedîn (Sado), Evdilqadir (Evdo, Qado), Evdirehman (Evdo), Osman (Oso, Osê, Osmên, Ozmên), Xetîb (Xeto), Türkîye (Tirkê, Tirko), Cemîle (Cemê, Cemo), Bedrîye (Bedê), Qasim (Qaso), Emîne (Emo), Zeyneb (Zeynê, Zînê, Zeyno), Şerîfe (Şero), Zerê, Zero, Gulê, Gulo ...

Ji kîjan zimanî dibe bila bibe, di nasnameyan de çawa hatibe nivîsandin bila hatibe nivîsandin, awayê bilêvkirina navan di nava gel de xweser e. Wek mînak hin navên nivîskî û li herêma Dêrikê, bilêvkirina wan ya di nava gel de bi vî awayî ne: Mehmet (Mehemed, Memo, Hemo), Mustafa (Mistefa, Misto, Mistik, Mistiko, Mistê), Abdulkadir (Evdilqadir, Evqadir, Qado), Ayşe (Eyşê, Eyşo, Eyşikê), Hatice (Xecîce, Xecê, Xeco, Heyce), Fatma-Fatime (Fatê, Fato, Feto) ... Mirov dikare bêje bilêvkirina navên bi erebî di nava gel de ji awayê bilêvkirina tirkî bêtir nêzîkî bilêvkirina wan ya bi erebî ye. Bi tirkî navê “Mehmet” wek ku tê nivîsandin tê bilêvkirin, lê heman nav di nava gel de bi piranî wek “Mehemed” tê bilêvkirin. Dengê “h”yê wek “ح”ya bi erebî tê bilêvkirin. Bi vî awayî bilêvkirina bi kurmancî ji bilêvkirina bi tirkî bêtir nêzîkî bilêvkirina bi erebî ye. Wek mînak navê “Ali” bi “ع”ê; navê “Halit” bi “ح”yê dest pê dike û bilêvkirina van dangan wek bilêvkirina wan ya bi erebî ye. Ev deng di tirkî de tunene, di tirkî de ji dêvla wan wekî ku tê nivîsandin tên bilêvkirin.

Di nava navê mêran de navê herî pir hatîye bikaranîn Mehmet û wersiyonên wê Mehmed, Muhammed in. Li pê wê Ramazan, Ahmet, Mustafa, Ali û İbrahim tên. Di nava navê jinan de yê herî pir hatîye bikaranîn Fatma û wersiyona wê ya din Fatime ye. Li pê wê Sultan, Şemsa, Emine-Amine û Elif tê. Dunav 152 caran hatîye bikaranîn. Di nava dunavan de navê herî pir hatîye bikaranîn wek navê pêşî Mehmet e. Ji bo jinan du nav pir kêr hatîye bikaranîn. Tiştêkî din ku bala mirov dikşîne wersiyona navê “Muhammed” ji sala 2000’an û pê ve derdikeve hemberî me. Di salên berî wê de wersiyonên vî navî wek “Mehmet” hatîye nivîsandin. Li gor me ev yek bûye wek tabûyekê û sedema wê jî ev bawerî ye ku ji bo rêzgirtina li hemberî navê pêxember, navê wî yê herî pir tê zanîn ango ji berdêla “Muhammed”; navên wî yên din “Mehmet, Mahmut, Ahmet, Mustafa” didan zarokan. Ji van navan Mehmet bilêvkirina “Muhammed” ya bi tirkî ye. Li Dêrikê ev nav, di nava gel de wek “Mehemed” tê bilêvkirin. Herçend qedexekirinek eşkere li ser navê “Muhammed” tunebe jî, sazîya nifûsê jî li gor vê tabûyê tevgerîyaye.

Di nava hemî navan de 89 navên têkel heye. Navên têkel giş ji du zimanan pêk hatîye. Navên têkel yên herî pir bi erebî-kurmancî û tirkî-kurmancî ye. Li gor me di sazkirina van navan de terciheke bi zanebûn tune ye, ji ber ku ev nav navên kevn in û li gor çandê wek kevneşopeke navan hem di tirkî de hem di kurmancî de dewam kiriye: Nur-can, Seyit-han, Bir-gül...

Li gor anketên me li du dibistanên Derikê çêkirin û pirsên ku di hevdiştinan de me ji beşdarvanan pirsî, li herêma Dêrikê bi piranî bav û di rêza duyemîn de dê nava li zarokên xwe dikin. Lê ligel bav û dayikan bapîr, dapîr, ap, xal, metik, xaltîk, bijîşk, mela, dost û hevalên malbatê, cîran, xweh, bira jî nava li zarokan dikin.

Li gor bersîvên şagirtan ku me li navenda Dêrikê li du dibistanan pirsîbû, şagirt bi piranî ji navên xwe hez dikin. Yê ku ji navê xwe hez nakin bi piranî keç in. Di daxwaza wan ya navekî din de em dibînin ku bi piranî keç bi navgîna telewîzyonê di bin bandora çanda populer de nin û hejmara keçên ji navê xwe ne razî, nêzîkî du qata ji hejmara lawên ji navê xwe hez nakin bêtir e. Navên ku şagirt dixwazin bi piranî navê lehengên rêzefilmên in. Navên herî pir hatine xwestin û rêzefilmên ku ev karakter tê de dilîzin weha nin: Eylül, Deniz, Eda, Ada, Yaman (Medcezir); Damla (Pis Yedili); Polat (Kurtlar Vadisi); Yağmur (Yağmurdan Kaçarken) Emre (Kiraz Mevsimi).

Li gor encama anketan û hevdiînên me yê bi her du nişan re, ji bilî navên fermî, hin mirov wek navê duyemîn bernavekî jî bikartînin. Li gor bersîvên şagirtên her du dibistanên navenda Dêrikê ji %16,6'ê şagirtan xwedî bernavekî ne. Hem di nava şagirtan de hem jî agahîyên ku me ji beşdarvanan sitend, di nava bernavan de navên kurmancî gelek in. Beşdarvanekî li ser vê mijarê ji me re weha got: *‘‘Ana lawekî min î 23 salî heyi. Navê wî di nifûsê di Mehemed i lê em li mal jê ri dibên Hogir. Wexta gi mi ew qeyd kir mamûrê nifûsê ev nav qebûl nekir, go ew ê mahkeme li te vebi. Mi jî go ez nikarim bi mahkema ri biştexilim û mi navê birayê xwe yî dêmarîyê lê kir.’’* (T. Dêrik, 2014) Demek dirêj qedexebûna kurmancî û navên kurmancî bi vî awayî nehiştîye gelek dê û bav navê kurmancî li zarokên xwe kin. Ji ber wê jî gelek kesên di nava vê rêjeya ku li jor me diyar kiriye de ne, ji xwedî bernavekî wêdetir, xwedî navekî fermî û navekî kurmancî ne. Di nava gel de ji bilî navên dê û bav didin zarokan, bi armancên wek hezkirin, qerf û yan jî heqaretê jî bernav li hin mirovan tên kirin. Hin mînakên ku me diîtin ev in: Çiço, Kinê, Kino, Kûto, Xemşê, Jaro, Xaxot, Kevir, Tato, Gupê, Beroş, Qerê, Gewrê, Bozê, Bozo, Reşo, Qero, Jîjo, Quto, Keftar, Soro, Porsor û hwd.

Li gor bersîvên şagirtên her du dibistanên navendê ji %70,5'ê şagirtan bi wateya navê xwe zanin. Ev rêje di nava nişên mezin de ne ewqas xurt e, ji ber wê jî mirov dikare bêje nişên biçûk û xwende, bêtir li wateya navê xwe digerin û hîn dibin. Gelek beşdarvanên ku me ji wan pirsî bê bi wateya navê xwe zanin ya na, bersîvên wan bi piranî neyênî bûn. Hin kesên bi wateya navên xwe nizanîbûn, navê wan û bersîvên wan bi vî awayî ne: Mehemed: *‘‘Navê pêxemberê me yi lê ez mana wê nizanim.’’* Feyzullah: *‘‘Pîrika mi navê bavê xwe li mi kiriye, lê ez mana wê nizanim.’’* Şemsê: *‘‘Xwoka min a ji mi mezintir dimri, navê wê li mi dikin, ez bi mana wê nizanim.’’* (Dêrik, 2014)

Şagirtên her du dibistanan navê dê û bavê xwe jî nivîsandin. Dema ku em navê nişê dê û bavan didin ber ê şagirtan em dibînin navên kurmancî li gor nişên berê bi awayeke eşkere pirtir dibe. Ji ber ku qedexebûna navên kurmancî ji sala 1995'an û berjor sisttir bûye, hejmara navên kurmancî jî ji vê salê şûn de pirtir dibe.

Dema ku em li gor temenê şagirtan li hejmar û rêjeya navên kurmancî dinêrin em guhertineke bi rêk û pêk nabînin. Di salinan de rêjeya navên kurmancî zêde dibe, di salinan de kême dibe. Sedemeke eşkere ya vê guhertinê me nedî. Lê li gor navên xwişk û birayên şagirtan ji 403 şagirtên her du dibistanan, di malbatên 238 şagirtî de kêmanî

navekî bi kurmancî heye. Ev jî wek rêje dike ji %59'ê malbatan. Encameke din ya ne bi rêk û pêk, asta xwendina dê û bavê şagirtên ku navê wan bi kurmancî ne. Guhertineke berbiçav di navbera asta xwendina dê û bavên û navê şagirtan yên bi kurmancî de tune. Ji ber wê li gor vê encamê mirov nikare bêje dê û bavên xwende yan jî yên ne xwende bêtir navê kurmancî li zarokên xwe dikin.

Ji bilî qeydên dibistanan me di nava gel de bi awayê çavdêrî û bi rêya hevdîtinan dît ku navên wek Şêxmûs, Siltan, Emer, Sîno, Seydoş, Hesên, Osman di heman demê de bi piranî navê zîyaretan in ku hatine hilanîn. Wek mînak, beşdarvaneke jin li ser vê mijarê ji me re weha got: *“Zarokê jintîya mi çenedibû. Rakê çû xwe avît bextê Siltan Şêxmûs. Piştî çend salekî lawekî wê çêbû. Navê wî kirin Şêxmûs. Sê çar sal çû qîzek wê jî çêbû, navê wê jî kirin Siltanê.”* (S2. Dêrik, 2014) Dîsa bi awayê çavdêrî û bi rêya hevdîtinan me dît ku hin navên zinarên li der û dora Dêrikê wek nav li zaroka bûne. Bi taybetî wek navê lawan “Tûrcel” û “Mancel” ku du zinarên li navenda Dêrikê ne, di van salên dawîn de populer bûne. Di hevdîtinan de me ji gelek beşdarvanan bihîst ku ew dixwazin navên kurmancî li zarokê xwe kin.

Di hevdîtinan de li ser pirsê me ya ku “Navê ku hun li zarokê xwe dikin hun li gor çi hildibijêrin?” ev sedem û awayê lêkirinê derketin pêş: “Divê navekî xêrê be, wateya wê xweş be, navê kesên navdar be ji bo ku zarok jî wek wan serkeftî bin, gotina wê xweş be, herikbar be...” Ji bilî van sedeman, dem û roja çêbûna zarokan, wesête mirîyan, xewnên ku li ser hatina zarok hatine dîtin, rewşa malbatê ya dema ku zarok çêbûye û hwd. gelek sedemên guhertî hene ku bandorê li ser hilbijartina navê zarokan dikin. Wek kevneşopîyekê di giraniyê de navê bapîr û dapîran, navê ap, xal, metik, xaltîk yan jî merivên din gelek caran, bi awayê gotina gel *“tên hilanîn”*. Her weha di nava malbat yan jî eşîrê de kesên ku ji wan hatîye hezkirin û hatine naskirin jî navên wan tên hilanîn. Gelek caran ji eşîrên cuda jî navê kesên navdar tên sitendin. Ev kesên navê wan tên hilanîn dibe miribin jî û dibe sax bin jî. Lê bi piranî navê mirîya tê hilanîn.

Awayeke din ya navlêkirinê, li gor dema jidayikbûna zarokê hilbijartin. Wek mînak gelek zarokên di meha remezanê de çêbûne navê wê mehê li wan bûye. Dîsa wek vêya yên di şeva qadîrê, beratê, şabanê, recebê, newrozê de çêbûne navên Kadir, Berat, Şaban, Recep, Leyla, Newroz sitendine. Ji bilî vana, hin demê rojê jî bûne navê zarokan. Beşdarvanekî got *“Keçika min a ewilî çêbû, bi şev bû, mi navê wê kir Şevîn.”* (A3.

Dêrik, 2014) Carinan jî dê û bavan li gor rewşa xwe yî tê de bûne nav li zarokên xwe kirine. Beşdarvanekî weha got: *‘Em li Enqerê lî îsota bûn. Halê me ne xweş bû. Xwedê keçikek da me. Heftakê deh ra me tu nav lê nekir. Bavê mi jî li cem me li kar bû. Mi ji bavê xwe pirsî, mi go ‘Bavo ke em navê keçika xwe bikin çi?’ bavê mi go ‘Wele leyê mi, em di ezîyetê de ni, hema ji ‘Ezîyet’ê xweştir nav tuneji.’ Me navê keçika xwe kir Ezîyet.’* (H. Heryama, 2015) Beşdarvanekî din got: *‘Eyn wê sala Sedam li Helepçê qetlîam çêkir, lawekî min çêbû mi navê wî kir Ferman.’* (M. Tilbisim, 2015) Beşdarvaneke jin got: *‘Ez ji gul û çîçeka pir hez dikim. Mi navê keçikek xwe kir Gul û navê a din kir Lale.’* (E. Dêrik, 2015) Beşdarvanekî din got: *‘Navê gi mi li lawê xwe kirine giş sifetên Xwedê ni. Navê wan Evdîrezaq, Evdilwehab, Evdilsemed i.’* (K. Dêrik, 2015) Di malbatekê de me dît ku navê zarokên wan yê law giş navê pêxemberanin: *‘Mehemed, Îbrehîm, Ûsib, Mûsa’*

Awayeke din ya hîlbijartina navan lihevkerina navê zarokan gişan e. Me di hin malbatên şagirtan de û di hevdiîtan de mînakên bi vî rengî dîtîn: *‘Berfin, Gûlbin, Pervin’* Wekî di vê mînakê de jî xuyaye, di nava navê zarokan de beşavend heye. Yê vê kombînezonê tayin dike navê zarokê yekemîn e. Yê li pê vî navê yekemîn tîn li gor wê tîn hîlbijartin.

Kî nava li zarokan dike bila bike, wekî gelek tiştên din berpirsîyarîya navê zarokan jî li ser milê dê û bavan e. Hilbijartina navan bi taybetî ji bo derûnîya zarokan girîng e. Navên ku ji bo zarokan tîn hîlbijartin divê li gor zayendê wan be, wateya wê divê xweş be, gotina wê û nivîsandina wê hêsan be. Navê ku mirov li zarokê xwe dike divê nebe mijara qerfan û zarok di pêş de ji ber navê xwe fedî nekin. Ji ber ku ligel bankirinê û têkilîyên rojane, ev nav di karên fermî de jî dê were bikaranîn, divê dirêjîya wê bi paşnav re were hesibandin. Navên pir dirêj pêkan e ji bo zarokan pirsgirêkan derxîne holê.

Piştî navê mirovan em ê li navê jîngeh û teşeyên erdnîgarî binêrin, da ku em nexşeya herêma Dêrikê ji aliyê zimên ve bibînin.

III. NAVÊN ERDNÎGARÎ LI HERÊMA DÊRIKÊ

Di vê beşê de em ê li toponomîya Dêrikê û herêma wê binêrin. Ji bo wê em ê pêşî li navê Dêrikê û dûr jî li navê kuçe, tax û gundên wê; dûv re jî em ê li navê teşeyên erdnîgarî binêrin. Em ê bixwazin fam bikin bê li herêma Dêrikê navên jîngehan û teşeyên erdnîgarî bi çi awayî çêbûne, ev nav li gor çi û bi çi awayî hatine dayin û ev nav ji çend kategorîyan pêk tên. Beş, ji neh binbeşan pêk tê. Di binbeşa encamê de em ê encamên agahîyên beşê bi giştî binirxînin.

III.1. NAVÊ DÊRIKÊ Û TAX, KOLAN Û KÛÇEYÊN WÊ

Li ser navê Dêrikê sê heb teorîyên cuda hene. Li gor teorîya yekemîn navê Dêrikê ji ‘‘dêr’’ê tê. Qertafa ‘‘-ik’’ê ji ber ku qertafa biçûkkirinê ye, navê ‘‘Dêrik’’ê tê wateya ‘‘dêra biçûk’’. Li Dêrikê anha dêrek tenê heye, navê wê ‘‘Surp Kevork’’ e û ev dêr ya civaka Ermenîyên Dêrikê ye. Lê em nizanin Dêrikê navê xwe ji vê dêrê sitendîye yan ji dêreke din sitendîye. Ev dêr di sala 1650’î de çêbûye lê li gor hin şîroveyan ev dêra ku em behs dikin avahîya duyemîn e û ya yekemîn di demek ne dîyar de çêbûye. Li gor van kesan, tenê avahîya anha xuyaye di vê dîrokê de çêbûye lê dêra pêşî çêbûye avahîya li dawîya vê dêrê ye û ji avahîya duyemîn gelekî kevintir e. Li gor vegotinên gel, li Dêrikê nêzîka deh dêrê din hebûye, lê anha gelekê wan wek xanîyan tên bikaranîn, hinek ji wan jî xera bûne. Pêkan e Dêrikê navê xwe ji van dêran yekê jî sitendibe.

Li gor teorîya duyemîn, wek vegotîneke ji ya yekemîn lawaztir, yê ku Dêrik şên kirine ji eşîra "Têrkan" e. Ji kesên ji eşîra Têrkan re "Têrkî" tê gotin. Peyva Têrkî bi demê re bûye "Dêrkî" û dûv re bûye "Dêrikî" û wek navê jîngehê jî "Dêrik" maye.

Wekî ku endamê wan jî dibêjin du eşîrên mezin yên Dêrikê, koka xwe bi Dêrsimê ve girêdidin. Endamê eşîrên Rûtî û Ebasî dibêjin pêşîyên me ji Dêrsimê hatine. Li herêma Dêrsimê anha jî bi navê her du eşîran eşîr hene. Her du eşîr jî bi giranî li herêma Hozatê rûniştî ne. Dr. Vet. M. Nuri Dersimi (1952: 46, 48, 51, 53, 69) ji bilî Hozatê li herêma Erzînganê jî navê her du eşîran di nava eşîrên herêmê de dijmêre û li gor agahîyên ku ew dide, zimanê her du eşîran jî bi zazakî ye. Bi navê Derikan hem eşîreke cuda heye û hem jî li Hozat û Ovacikê gundên ku navê wan "Dêrik" e heye. Ya balkêş ev e çawa ku her du eşîrên Dêrikê, Rûtî û Ebasî dibêjin em ji Dêrsimê hatine, du heb rûtîyê Dêrsimê ku me bi rêya medya civakî xwe gihandê, ew jî dibêjin li herêma me bi taybetî di nava Rûtîyan de fikra serdest ew e ku pêşîyên wan ji Dêrika Çîyayê Mazî hatine. (H. û A. Dêrsim, 2015, bi rêya facebook'ê) Heger eşîrên li Dêrikê ji Dêrsimê hatibin pêkan e li vir bi awayeke xwezayî hatibin bişavtin û zazakî ji bîr kiribin û bi kurmancî peyivîbin. Berevajîya vê yekê jî pêkan e ku heger Rûtî û Abasîyên li Dêrsimê dijîn ji Dêrika Çîyayê Mazî çûbin, wê demê dibe ku ew li wir bi awayê xwezayî hatibin bişavtin û kurmancî ji bîr kiribin û fêrî zazakî bûbin. Mirov dikare ji bo mezhebê wan jî heman tiştî bêje. Ji ber ku her du eşîrên Dêrsimê jî Elewî ne lê her du eşîrên Dêrikê Sunnî ne. Heger yên Dêrik şên kiribin Rûtî û Ebasî bin wê demê ne pêkan e ku navê Dêrikê ji bêjeya Têrkî hatibe.

Li gor teorîya sêyemîn ku ji ya duyemîn jî lawaztir e, navê Dêrikê ji "dirîk"ê tê. Li gor vê fikrê li herêma Dêrikê, wan demên ku Dêrik nuh şên dibû, gelek dirîk hebûne û ji ber wê navê jîngehê bûye Dêrik. Ev şibandin tenê xwe dispêre fonetîka dengê "dirîk" û "Dêrikê". Ya na li her derê dibe dirî yan jî dirîk şên werin.

Di nava jîngehên Kurdan de em navê Dêrikê li gelek deverên din yên Kurdistanê dibînin. Gundên ku me li Kurdistana Bakur tomar kirine û navê wan Dêrik e deh heb in: Dêrika Hecî Îso (Agirî), Dêrika Îsmeîl Axa (Qoser), Dêrik (Kerboran), Dêrik (Melezgirt), Dêrik (Mûş), Dêrik (Pulur, Ovacik), Dêrik (Hozat), Dêrik (Silîva), Dêrik

(Xinis), Dêrik (Varto).²⁷ Dêrikeke din ya navdar Dêrika Hemko (Hesîçe) li Rojavayê Kurdistanê ye. Pêkan e li Rojhilat û Başûrê Kurdistanê jî gund yan jî bajarokên ku navê wan Dêrik e hebe. Ji bo ku navê wan wek hev e gel ew yan bi navê kesan yan jî bi navê erdnîgarî ji hev cuda kirine. Wek Dêrika Çîyayê Mazî, Dêrika Îsmêl Axa, Dêrika Hemko û hwd. Ji van jîngehan yê mezînan Dêrika Çîyayê Mazî û Dêrika Hemko ye. Li her du Dêrikan jî dêr heye û wek niştêcih li van navçeyan Mesîhî jî tevî Kurdan dijîn. Ji ber wê ihtîmala ku navê wan jî “dêr”ê hatibe xurttir e.

Li navenda Dêrikê navê kuçe û taxan sê beş in. Navên kevn, navên tirkî û navên nuh yê kurmançî ku şaredarîyê ji sala 2010’an şûn de dayê. Navên ku em ê bikin mijara lêkolînê navê kevn yê resen in ku ev nav ji alîyê gel ve û di pêvajoya xwezayî de hatine dayin. Her du beşên dawîyê navên çêkirî nin. Wek mînak navê çend heb kuçe, kolan û taxên bi tirkî ku ew jî ji alîyê şaredarîyên Dêrikê yê berê ve hatine dayin, bi vî awayî ne: Vatan caddesi, Anafartalar Caddesi, Dîyarbakır Bulvarı, Dağ Mahallesi, Kale Mahallesi, Keskin Sokak, 410. Sokak ... Şaredarîya Dêrikê di 09.04.2010’an de bi hejmara 2010/47’an biryar sitendîye ku navên nuh yê bi kurmançî bidin kuçe û kolan. Şaredarîyê bi vî biryarê re navê 30 heb kolan û 240 kuçeyê ku bi tirkî bûn, kiriyê kurmançî.²⁸ Ji van nava hinek jê, navê van kuçe û kolan yê kevn û bi kurmançî ne, hinek ji wan jî dîsa bi kurmançî ne lê navê nuh in. Çend heb navê kolan yê berê û yê ku şaredarîyê bi vî biryarê daye wan bi vî awayî ne:

Dîyarbakır Caddesi-Amed Caddesi, Anafartalar Caddesi-Azadî Caddesî, Ufuk Aydın Caddesi-Cigerxwîn Caddesi, Yavuz Sultan Selim Caddesi-Taxa Filla, Vatan Caddesi-Welat Caddesi, İnönü Caddesi-Qedrîcan Caddesi, Yunus Emre Caddesi-Reşîdê Kurd Caddesi, Cebeci Caddesi-Tahtê Gewr Caddesi, Milli Egemenlik Caddesi-Berdîn Caddesi, Hastane Caddesi-Roj Caddesî ... Wekî ku di van mînan de jî xuyaye

²⁷ Wezaretê Karê Hundirîn ya Tirkîyê di weşaneke xwe de hemî navên kevn yê gundan tomar kiriyê. Navê weşanê “Köylerimiz” e. (Ango gundên me)
(<https://www.tbmm.gov.tr/eyayin/GAZETELER/WEB/KUTUPHANEDE%20BULUNAN%20DIJIT%20AL%20KAYNAKLAR/KITAPLAR/DIGER%20YAYINLAR/197103165%20KOYLERIMIZ/197103165.pdf>)

²⁸ Guhertina navê kuçe, kolan û meydanan li gor Qanûna Şaredarîyan ku hejmara wê 5393 ye û xala wê 81 e tê meşandin. Li gor vî qanûnê ji bo ku nav li derekê bê kirin piranîya safî ya lijneya şaredarîyê hewce ye, Lê belê ji bo guhertina navekî, piranîya ji sisya duduyê lijneyê pêwîst e. Biryar diçe ber destê amirê mulkî yê herî mezînan û heger ew jî bipejirîne nav yan jî guhertina navê cî misoger dibe.
(<http://www.migm.gov.tr/Gorusler/Sokak%20ve%20Caddelere%20Ad%20Verilmesi%20C4%B0%20C5%9Flemleri.pdf>)

tenê navê kolanê hatîye guhertin, bêjeya “caddesi” wek xwe maye. Di van navan de tîpên kurmançî yên ku hîn jî qedexê nin lê bêyî ku di zagonê de serbest bibin, tenê çav jê re tîpên girtin yan jî ji aliyê şaredariyê ve bi awayeke rasterast hatine nivîsandin. Ji van navan “Qedrîcan” û “Reşîdê Kurd” du heb helbestvan û rewşenbîrê Dêrikî nin. Cigerxwîn jî helbestvanê Kurd yê bi nav û deng e û demekê li Dêrikê jîyaye. Navê “Berdîn” û “Tahtê Gewr” navên kevn yên resen in, navê “Roj” jî ber ku di demên berê de ev kolan tunebû, navekî nuh e. Bi guhertina şaredariyê re navê kuçeyan bi tûmî jî holê rabûye, ji bo her kuçeyekê jî dêvla navan hejmar hatine bikaranîn ku bi vî awayî hejmarkirina kuçeyan li temama tirkî serdest e.

Wek me li jor jî got, ya ku em ê bala xwe bidinê navê kuçe, kolan û taxan yên kevn in. Nifşê mezin û nifşê navîn ne bi navê tirkî zanin û ne jî bi yên kurmançî yên nuh zanin. Wek mînak hun li navenda Dêrikê ji nifşê mezin ji kesekî bipirsîn, hun bibêjin ka “Menekşe Caddesi” yan jî bi navê xwe yî nuh “Mancel Caddesi” li ku ye dênizanibe lê hun navê wê yî resen bibêjin “Rastika Fêrîko” li ku ye, navnîşanê dê ji we re bêje. Navçe her ku diçe mezin dibe, kuçe, kolan û taxên nuh lê zêde dibin û bi vî awayî pêdivî bi navên nuh jî çêdibin. Gel ji bo van tax, kuçe û kolanên nuh, navê wan herêmên kevn ku hîn nebûbûn kuçe, kolan yan jî tax li wan dike. Wek mînak taxa ku anha navê wê “Bahçelievler” e, ji 30-40 sal berê ve dest pê kiriye şên dibe. Lê ji berê de navê wê herêmê di nava gel de “Warê Kilorâ” bû. Ji ber wê anha di nava nifşê mezin û navîn de yê tê bikaranîn ev nav e. Nifşê nuh bi piranî navê taxê yê nuh, “Bahçelievler”ê bikartîni ku ev nav bi tirkî ye, ji ber ku herêmeke bi baxçe ku navê wê “Dahl” e, di nava vê taxê de maye û li vê taxê li gelek cihan xaniyên bi baxçe hene, di wateya “xaniyên bi baxçe” de ev nav lê kirine. “Bahçelievler” di heman demê de li Stenbol navê navçeyêke navendî ye jî. Ji ber ku Stenbol bajarekî populer e, navê gelek semt, navçe û taxên wê, li gelek bajar û navçeyên Tirkîyê hatine bikaranîn.

Li herêma Dêrikê ji bo taxan wek nav bêjeya bi erebî “mehele” tê bikaranîn. Berî ku taxên nuh lê zêde bibin li navenda Dêrikê 5 tax hebûn. Ev tax wek “Mehela Salîkan, Mehela Rûtan, Mehela Mamûdan, Mehela Ebasan û Heramyâ” dihatin binavkirin. Ji van taxan çar hebê pêşî di heman demê de navê çar eşîrên Dêrikê ne. Ango mirov dikare bêje di demên berê de, di navlêkirina taxan de ya bingeh dihate sitandin ew bû ku li wê taxê endamên kîjan eşîrê rûdinin. Heramyâ her çend taxeke

Dêrike be jî şênîyên wê, bi taybetî nifşê mezin, wê wek gund bi nav dikin. Me dît ku şênîyekî taxê dema behsa jîyana xwe ya rojane kir weha got: *‘Ez sibê zû radibim, têm Dêrikê asûkê xwe dikim, hîn seet nabi neh ez vedigerim gund jî.’* Ji bilî van taxên kevn, herêmeke kevn ku bûye tax û navê wê yî berê *‘Warê Kilora’* bû, di 30-40 salên dawî de her ku çûye şênîyên wê zêde bûye. Li gor beşdarvanekî, li vê herêmê şênîyan ji bo ku hejîran hişk bikin ew bi ser darikên ter vedikirin, û ew dikirin wek kilora gilover dikirin û darvedikirin. Ji ber wê navê herêmê bûye *‘Warê Kilora’*. Ji bilî van taxan sitatuya du gundê nêzîkî navendê *‘Tilbisim’* û *‘Qetaro’* jî hatîye guhertin û wek taxên Dêrikê yên navendî hatine ser navçê.²⁹ Bi vî awayî hejmara taxên Dêrikê bi giştî dike 8 heb. Jê pênc heb li gor navê eşîran, her sê mayî bi navê xwe yên berê tên naskirin. Divê were gotin ku şaredarîya Dêrikê bi wê biryara navborî de tu guhertin di navê taxan de çênekiriye. Ango ev taxên Dêrikê, di kar û barên fermî de bi navên tirkî yên berê ku di demên şaredarîyên Dêrikê yên berê de hatine dayin tên bikaranîn. Navê wan yê kevn û yê anha ku bi tirkî ne, bi vî awayî ne: Mehela Salikan- Kale Mahallesi, Mehela Rûtan-Dağ Mahallesi, Mehela Mamûdan-Küçükpınar Mahallesi, Mehela Ebasan-Cevizpınar Mahallesi, Heramya-Zeytinpınar Mahallesi, Warê Kilora-Bahçelievler Mahallesi, Tilbisim-Tepebağ û Qetaro-Söğütözü ye. Di nava navên gundan de me cih daye navê Tilbisim û Qetaro jî, ji ber ku em li gor dabeşkirina berê tevgerîyane. Navê *‘Heramya’* dibe ji bêjeya *‘heram’* a bi erebî jî hatibe û dibe ji navê *‘herem’* yan jî *‘herêm’* ê jî guherîbe. Wek etîmolojîya populer di nava gel de tê gotin li Qetaro diz û keleşan rê dibirîn ji ber wê di wateya *‘quta rê’* de navê wê bûye Qetaro û li Heramya jî ji ber ku *‘heramî’* ango kesên dizyê û xerabîyê dikin hebûne navê wê bûye *‘Heramya’*. Çîrokek bi navê *‘Çel Heramî’* di *‘Çîrokên Hezar û Yek Şevê’* de derbas dibe û ev nav ji bo navê Heramya referans tê dayin.

Ji ber ku di biçûktî û mezintîya taxan de sînorek tune ye, gel ji bo hin kolanan yan jî cihên ji çend kuçe û kolanan pêk tê jî navê *‘mehelê’* bikartîne. Wek mînak *‘Mehela Çaya, Mehela Xidra, Mehela Kulêbê, Mehela Binya Kêşik, Mehela Camîya Qesrîk û hwd.’* wekî ku ji van mînakan jî tê fêmkirin, navê eşîran dîsa tê bikaranîn. Navên din, *‘Kulêbe’* navê kanîyekê ye, *‘Camîya Qesrîk’* navê avahîyekê ye, *‘Binya*

²⁹ Ev guhertin berî ku sitatuya Mêrdîn bibe bajarê mezin çêbûye. Wek me berê jî gotibû, piştî ku Mêrdîn bû bajarê mezin, sitatuya hemî gundên Dêrikê bû tax û mezrayê gundan jî bûn kuçe û bi Dêrikê ve hate girêdan. Ne hew ji bo Dêrikê, ev guhertin ji bo hemî navçeyên Mêrdîn çêbûye.

Kêşik” herêmeke li gor taybetmendiyên xwe yî erdnîgarî hatîye bi navkirin. Hin herêm jî hene bêyî navê “mehelê”, bi serê xwe tîn bikaranîn lê carinan di wateya taxê de carinan di wateya kolanê de carinan di wateya qadê de tî bikaranîn. Çend heb mînak: “Pîyê Kepira, Kanîya Gwîzê, Beyarê Golika, Axreşkê, Karîskê, Dara Mamûda û hwd.” Ji van mînakan çarên pêşî navên xwe ji berhemên erdnîgarî û xwezayî sitendine. Di navê “Dara Mamûda” de hem navê xwezayî, ango navê rihekan û hem jî navê eşîrekê heye. Wateya “karîsk”ê ne zelal e, pêkan e bi çend awayan çêbûbe. “ka-rêzk” û “ka-rêsik” du ihtîmalê xurt in.

Navê kolanan di nava gel de ne wek “kolan” lê wek “rê” tî binavkirin. Bi piranî navê rêyan li gora ku ew rê diheri kîjan taxê, herêmê yan jî gund, navçê û bajarî li gor wê hatîye dayin. Çend heb mînak: “Rêya Carbekir, Rêya Qoserê, Rêya Qetaro, Rêya Tilbisim, Rêya Kulêbê, Rêya Xabê, Rêya Dahlê û hwd.” Bi rêyan re têkildar têgehên “çatrê, xaçrê, xaçerê, xaçrêk, duryan, pêkrê, papol, şose, rêya heywana” tîn bikaranîn.

Navên kevn yê kuçeyan li ber wendabûnê ne. Ev nav êdî tenê ji aliyê nifşên mezin û nifşê navîn tîn bikaranîn. Mirov dikare bêje nifşê biçûk van navan yan bi tûmî nizane û yan jî ji wan pir hindik kes zanin û bikartînin. Navê kuçeyan yê ku me tomar kirin bi piranî li gor malbat û kesan çêbûne. Çend heb mînak: “Kuça Mala Xerêt, Kuça Hecî Cemîl, Kuça Hecî Seydî, Kuça Hecî Sîdîq, Kuça Hecî Necîm, Kuça Asef, Kuça Dêrê, Kuça Camîyê, Kuça Dengê, Kuça Êş, Kuça Hesên Efendî, Kuça Mala Îso, Kuça Cihûda û hwd.” Wekî ji van mînakan jî tî fêmkirin heger di kuçeyekê de bi giranî ji malbatekê çend heb mal hebin kuçe li ser navê wê malbatê tî xwendin. Mala kesekî navdar tenê jî hebe di wê kuçê de, dibe kuçe li ser navê wî kesî were xwendin. Ji bilî malbat û kesan em dibînin hin kuçe li gor avahîyan (dêr, camî, deng, aş) hatine dayin. Navê Kuça Cihûda şikek weha bi mirov re çêdike ku gelo di wextê de li vir Cihû dijîyan? Ji ber ku ev kuçe gelekî teng û bi zîvirok e jî dibe bi vî awayî hatibe bi navkirin. Di nava van navan de Hesên Efendî mezinê Salikan, Hecî Necîm mezinê Rûtan, Hecî Cemîl mezinê Mamûdan e. Mala Xerêt malbateke Ermenî ye û di heman demê de ev malbat wek ji mezineke Mesîhîyên Dêrikê dihate naskirin.

Navê kuçeyan li cem sazîyên fermî bi piranî anha bi hejmaran tî zanîn. Wek “118. Sk.”(Kuçeya 118.), “132. Sk.”(Kuçeya 132.) û hwd. Ev hejmarê kuçeyan tenê

di navnîşanên nivîskî de derbas dibin. Ji ber ku navenda Dêrikê anha ne pir mezin e, ji aliyê gel ve pêwistî bi zanîna hejmara van kuçeyan jî çênabe. Çi nameyên fermî dibe çi yên taybet dibe, herkes navnîşaneke li çarşê bikartîne. Ji ber wê posteger û kargokar nakeve nava kuçeyan û li navnîşanan nagerin.

III.2. NAVÊ GUNDÊN DÊRIKÊ

Bi giştî 73 gund û 96 mezrayên Dêrikê hene. Ji ber ku me gundê wek Xarok, Mavan, Bîrînî û Golika Geryayî jî li ser Dêrikê hesibandîye ev hejmar dibe 173 gund û mezra û teva navenda Dêrikê dibe 174 jîngeh ku em ê li navê wan binêrin.

Ji 173 gund û mezrayî navê çar gund û mezrayan hevbeş in. Xirbê Gura, Xirbê Reş, Koder û Bizmaro, bi van navan her yekî du gund heye. Navê Bizmaro li gor eşîran ji hev hatîye veqetandin, “Bizmarê Metîna” û “Bizmarê Menda”. Dimîne 169 nav. Dema ku em li navê 169 gundî dinêrin, li gor awayê çêkirina navê wan em dikarin wan bi vî awayî dabeş bikin:

Tablo 64: Navê Gundên Dêrikê

Rêz	Beşên Navê Gundan	Hejmara Gundan
1	Yên li gor navê mirovan çêbûne	25
2	Yên li gor erdnîgarî û xwezayê çêbûne	21
3	Yên li gor riwekan çêbûne	10
4	Yên navê wan bi tirkî ne (Gundên dereng hatine avakirin)	8
5	Yên li gor rengan çêbûne	7
6	Yên li gor hêl û alîyan çêbûne	6
7	Yên di navê wan de navê xirbe û şûnwaran hene	6
8	Yên bi avahîyekê ve têkildar	5
9	Yên navê ajalekê tê de derbas dibe	5
10	Yên di heman demê de navê alavekê ye	4
11	Yên wekî din	18
12	Yên wateya wan nehatîye fêmkirin	54
13	Bi giştî	169

Heger em navên ku wateya wan nehatîye famkirin nehesibînin, beşa herî zêde di rêza yekemîn de em dibînin ku navê gundan li gor navê kesan hatîye dayin. Ev 25 nav ev in: Êlaska, Êlasko, Misûrî, Sîyamed, Lal Heso, Şirîfbaba, Şê(x)hebîb, Elî Beg, Şê(x)amed, Bîrebas, Qesra Qenco, Qizil Ahmed, Qizil Eyşan, Siltok, Hemîdiye, Şabana, Xalitwêran, Mamîcank, Ûsibê Pîrê, Temirling, Remok, Kosewelî, Warga Xensê, Seydoş, Gundikê Hecî Hesen.

Ji ber ku li Misûrîyê zîyaretek bi navê “Şêx Mensûr” heye, me şîroveya şênîyên gund maqûl dît ku navê gund ji vê zîyaretê tê. Wê demê navê gund divê pêşî “Mensûrî” be bi demê re bûbe Misûrî. Di nava van navan de em dibînin ku hinek jê di heman demê de xwedî nasavekê ne jî. Şêx Hebîb, Elî Beg, Qizil Ahmed, Şê(x) A(h)med, Qizil Eyşan, Lal Heso, Kose Welî, û Gundikê Hecî (H)esen. Di nava van kesan de sê heb jin ê ku navê xwe dane gund heye: Qizil Eyşan, Siltok, û Warga Xensê. Li herêma Dêrikê navê Siltanê bi awayê Silto jî tê bilêvkirin. Navê Xensa jî heger di

ravekekê de bibe raveker bêje dibe ‘‘Xensê’’. Temirling navê împaratorê Moxolan e. Şênî bawer dikin ku Temirling bi xwe ev gundan ava kiriye. Ji Ûsibê Pîrê bikeve, ev kesên ku navê xwe dane van gundan nayên naskirin. Şênîyekî ku em pê re peyivîn got ez nevîyê Ûsibê Pîrê me.

Di rêza duyemîn de em dibînin navê 21 gundekî yan li gor rewşa erdnîgarîya wan yan jî li gor taybetmendîyeke wan ya xwezayî hatîye dayin. Ev nav ev in: Sereb, Mezra Newalê, Mezra Gêrî, Bixur, Belik, Tatik, Goma, Textê Dêrikê, Bîra, Belotî, Guhera Dirêj, Keloşk, Girxank, Qurxî, Kendal, Girsarînc, Xarok, Bîrînî, Tilcim’a, Tilbisim, Berkevîrê. Navê ku şîrove jê re pêwîst e Qurxî, Xarok, Tilcim’a, Tilbisim û Bîrînî ye. Bêjeyên din yê ku ji van navan re bûye bingeş bi awayeke zindî li herêmê tên bikaranîn. Em li hineka ji wan binêrin: Du wateyên ‘‘Sereb’’ê heye. Yek jê jêdera avê ye, ya din kanalîzasyon e. ‘‘Mezra Newalê’’ di newalê de ye, ‘‘Mezra Gêrî’’ li jor e, ji ber ku bêjeya ‘‘gêrî’’ li herêmê di wateya jor de tê bikaranîn. Wek mînak ‘‘*Ez bi gêrî ketim gund ji min vi xuya bû.*’’ ‘‘Bixur’’ di wateya kevirê biçûk de ye. Li herêmê bi awayê ‘‘buxar’’ jî tê bikaranîn. ‘‘Bel’’ di wateya ‘‘tişt yan jî cihê qibe, bilind’’ de tê bikaranîn. ‘‘Belotî’’ di wateya ‘‘daqûlbûyî’’ de ye û weha xuyaye koka wê jî ji bêjeya ‘‘bel’’ê tê.

‘‘Qurxî’’ pêkan e ji bêjeya astronomîyê, ji ‘‘qurux’’ê hatibe ku li herêma Dêrikê wek pîvaneke demê ‘‘hilatîna qurixê’’ hîn jî tê bikaranîn. Di serê meha tebaxê de qurux dixulîqe û di navbera deh û panzdehê mehê de hiltê.

Koka navê ‘‘Xarok’’ li gor me divê bêjeya ‘‘xwar’’ be. Du wateyên ‘‘xwar’’ê li vir girîng e. Yek di wateya ‘‘jêr’’ de, ya din di wateya ‘‘nerast’’ de ye. Ji bo erdnîgarîya Xarok her du wate jî rast in. Herêma Xarok bi kaş û bilindayî û nizmâyî ye. Qertafa ‘‘ok’’ê ji navdêran navdêrên nuh çêdike. Wek genim – genimok, benîşt – benîştok û hwd. Wê demê divê navê ‘‘Xarok’’ bi ketina dengê ‘w’yê’ û di wateya ‘‘cîyê xwar, bi kaş, ne rast’’ de çêbûbe. Îhtîmaleke din jî heye ku navê Xarok ji bêjeya ‘‘xar’’ê hatibe. hemwateya vê bêjeyê ‘‘şaquîl’’ e û li herêma Dêrikê eşîreke bi navê ‘‘Şaquîlîkî’’ heye. Ev eşîr, li gor vegotina endamên wê, di demên ne dîyar de ji Xarok rabûye û anha li navenda Dêrikê bi cî bûne. Bi vî awayî navê ‘‘Şaquîlîkî’’ tê wateya ‘‘Xarokî’’.

Navê “tilbisim” divê ji du bêjeyan çêbûbe. Bêjeya yekemîn “til” e û di erebî de tê wateya “gir”. Lê em anha bi wateya “bisim”ê nizanin û em nizanin bi kîjan zimanî ye. Bêjeya “Cim’a” ji ber ku di erebî de wek nav jî tê bikaranîn, “Tilcim’a” yan di wateya “girê Cim’a” de ye û yan jî di wateya “girê civînê” de çêbûye. Li herêma Dêrikê û li herêmên din yê Kurdan navê jîngehên biçûk yan mezin yên bi “til”ê dest pê dikin hene. Wek “Tiledes, Tilelo, Tilkoçer, Tilebyed” û hwd. Ji ber ku “til” di wateya “gir” de ye; di çêkirina navên wek “Girsarînc, Girêsor, Girxank” û hwd. de heman şêwe bikaranîn heye. Li herêmê “gir”ê ku di navê jîngehan de yan jî di navê hin herêman de derbas dibe, hinek jê girikên dîrokî ne hinek jî yên xwezayî ne.

Navê “Bîrînî” yê jî li erdnîgarîya wê tê. Li Bîrînîyê gelek bîrên xwezayî û yên çêkirî ku di nava gel de ji wan re dibêin “sarinc” heye. Gundekî din ku navê wê ji “bîr”a tê gundê “Bîra” ye.

Di rêza sêyemîn de beşa navên ji riwekan çêbûne heye. Di vê beşê de deh nav hene: Tawîk, Sûsik, Kundir, Kerik, Dirik, Kanîzil, Kanîzeytûn, Simaqî, Darik, Rewşat (Roşat). Bi du navan re bêjeya “kanî” jî heye. Navê “Rewşatê” bi du awayan tê bilêvkirin, “Rewşat” û “Roşat”. Navê riwekê jî wek “rewşat” û “roşatk” tê bilêvkirin. Ahmet Kasimoglu (2013: 656) vê riwekê bi navê “rewşatik”ê dide nasîn. Li hin cihên bi navê riwekekê tên xwendin anha ji wan riwekan tune. Wek mînak li Kanîzeytûnê darê zeytûnan nemaye. Di van demên dawîn de di nava hin baxçeyan de çend heb darê zaytûnan hatine çandîn. Ji ber wê mirov dikare bêje di demên ku nav li van jîngeh û herêman bûne ev riwek hebûne lê bi demê re bi piranî ji holê rabûne.

Di rêza çaremîn de gundên ku navê wan bi tirkî ne heye. Ji van gundan Qizil, Demirlîyê û Şawêrdî gund in, yên mayî mezra nin. Piranîya van mezrayan di 40-50 salên dawîn de ava bûne û bi avakirina wan re navên tirkî li wan bûye û di nava gel de ev nav bi awayê bilêvkirina gelêrî tên bikaranîn, lê her sê gund nayê zanîn ku kengî avabûne. Gundên navê wan bi tirkî ne ev in: Qizil, Dimirlîyê, Şawêrdî, Subatan, Develi, Aslantepe, Dedê, Giriktepe. Ji van navan “Giriktepe” navekî têkel e. Nav, ji navekî bi kurmancî û ji navekî bi tirkî çêbûye ku her du nav hemwateyê hev in lê cudahîyek biçûk heye di navbera wan de. “gir” û “tepe” di heman wateyê de ne, “girik” girê biçûk e û beramberîya wê bi tirkî “tepecik” e. Li gel vî navî, tenê navê “Girik”ê jî ji bo vî gundî tê bikaranîn.

Di rêza pêncemîn de navên li gor rengan çêbûne heye. Girê Sor, Kevirşîn, Kunreş, Hedreş, Zikreş, Mizgewr, Qero. Di nava van navan de ji bilî rengan taybetmendîyên erdnîgarî, yên wek ‘‘gir, kevir’’, taybetmendîyên lebatê mirovan ‘‘zik’’ û navê alavekê ‘‘kun’’ tê de heye. Em nizanin ‘‘hed’’ û ‘‘miz’’ di kîjan wateyan de ji bo navê gund hatine danîn. Mirov dikare bêje ‘‘miz’’ di nava gel de, tê du wateyê guhertî. Yek jê ‘‘miz-dan’’ di wateya firmandinê de ye, ya dua di wateya ‘‘mêxweş’’ de ye. Navê ‘‘Qero’’ bi erdnîgarîya gund ve girêdayî ye. Kevirê gund qerango reş in.

Awayeke din navdayina jîngehan li gor hêl û alîyan çêbûye. Ji bo hêlan tenê rengdêrên jêr û jor hatîye bikaranîn. Sedema vê yekê jî taybetmendîyên erdnîgarî ne, xaka Dêrikê li bakur bilind e û her ku ber bi başûr ve dadikeve nizm dibe. Dibe ji ber vê taybetmendîyê be, alîyê jor, li herêma Dêrikê gelek caran di hundirê xwe de wateya ‘‘bakur’’ jî dihewîne: Germika Jor, Germika Jêr, Menteşîya Jor, Menteşîya Jêr, Xozberîya Jor, Xozberîya Jêr. ‘‘menteşî’’ dibe ji ‘‘bendkêşe’’ya bi farisî ku bi awayê ‘‘menteşe’’yê derbasî tirkî bûye hatibe. Wateya ‘‘xozberî’’yê ne zelal e. Xozberî dibe ji du bêjeyan çêbûbe. ‘‘xoz’’ di kurmancî de di wateya ‘‘prêze’’yê de ye. ‘‘berî’’ jî ji xwe di wateya xwe ya erdnîgarî de ye lê em nizanin ku ev nav li gor van wateyan çêbûye yan na. Heger weha be ‘‘xozberî’’ tê wateya ‘‘Pirêza li berîyê’’. Ji ber ku her du gund jî bi rastî jî li berîyê ne mirov weha difikire. Germik li gor der û dora xwe germtir e. Şênîyekî gund got ‘‘*Ji ber gi gundê me germtir e, tenê me berî e herkesî digêji.*’’ (M. Germik, 2015) Gundên ku navê wan hevbeş in lê bi rengdêrên ‘‘jor’’ û ‘‘jêr’’ ji hev hatine veqetandin, wek mesafe nêzîkî hev in.

Di navê şeş gundan de bêjeya ‘‘xirbe’’ derbas dibe. Xirbe di heman demê de hêmaya şûnwaran e: Xirbê Reş, Xerabreşk, Xirbê Belek, Xirbê Herîyê, Xirbê Gura, Xirbê Qeya. Me Qizila Xerabe nekir vê beşê ji ber ku pênasa ‘‘xerabe’’ ji bo vî gundî di wateya ‘‘ne şên’’de hatîye bikaranîn. Ji xwe ji bo ji Qizila mezin were veqetandin navê wê bûye ‘‘Qizila Xerabe’’ û navê Qizila mezin jî ‘‘Qizila Şên’’ e. Lê bêjeyên wek Xerabreşk û yên din bi awayeke eşkere bi sedema ku li van gundan şûnwar hene li wan hatine kirin. Em dibînin li gel navê ‘‘xirbe’’yan bi giranî navê rengan jî hatine bikaranîn. Reşbûna kevirên xirbeyan, belekbûna wan, yan jî ji ber ku girikê dîrokî nin, li rûyê erdê ji kevir û avahîyan bêtir ax xuyaye ev ax wek herîyê hatîye tarîfkirin ev nav li

wan bûne. Di ser navê ‘‘Xirbê Gura’’ vegotîneke efsanewî heye. Di pêş de em ê bi kurtasî behsa vê vegotinê bikin.

Navên li gor avahîyekê çêbûne pênc in: Birc, Dêra Çolê, Xanok, Qesrîk, Xanîka. Ji van gundan bi taybetî Birc devereke dîrokî ye û şûnwarên wê li rûyê erdê xuya ne. Di navê Dêra Çolê de di heman demê de navnîşaneke erdnîgarî jî heye. Bi navê ‘‘Dêra Metînan’’ gundekî din di nava sînore Dêrikê yê çandî de heye û ev her du nav bi vî awayî bi navê eşîrê û bi navê taybetmendîyeke erdnîgarî ji hev hatîye veqetandin. Dêra Çolê li berîyê ye, ji ber wê navê ‘‘çolê’’ dê hatibe lêkirin. Bi vî awayî ji bilî ‘‘Girê Sor’’ê bi awayê fermî gundê Dêrikê ye, gundekî din yê bi heman navî heye û ev gund jî her çend bi awayê fermî bi Şemrex ve girêdayî be jî di nava sînore Dêrikê yê çandî de ye, ji bo ji gundê hemnavê xwe were qetandin bi navê eşîra xwe wek ‘‘Girê Sorê Metîna(n)’’ tê xwendin.

Di beşek din ya navan de em navê ajalan dibînin. Hejmara van navan pênc in: Kurşêran, Kanya Ga, Korbeşk, Çemê Qêntir, Golika Geryayî. Di navê ‘‘Kurşêran’’ de ligel navê ajalekê em navê teşeyeke erdnîgarîyê; di ‘‘Kanya Ga’’ û ‘‘Çemê Qêntir’’ de li gel navê ajalan em navê jêderên avê jî dibînin. ‘‘Golika Geryayî’’ dişibe hin navê eşîrên Kurdan yên li herêmên din. Wek ‘‘Gabetilî’’, ‘‘Gawestîya’’ û hwd. Ji bo hin Metîniyan jî dibêjin ‘‘Metîniyê Gabetilî’’ ku li herêma Egilê, ya navçeya Dîyarbekir dijîn. Kanya Ga wek ‘‘Kanya Gê’’ jî tê bilêvkirin.

Navê hin gundan di heman demê de navê alavekê yan jî amûrekê ye: Qamçîya, Bizmaro (Bizmarê Metîni, Bizmarê Menda) Meşkîna, Kelek. Ji van navan ‘‘Bizmaro’’ du heb e û ji bo ji hev were qetandin li gor eşîrên wan nav li wan hatîye kirin. Şênîyekî ji Bizmarê Metîna ji me re got ji ber ku erdê gundê me hişk e navê gund bûye Bizmaro.

Navê hin gundan jî nakeve van beşan yekê jî. Ji ber wê me ev gund di beşa ‘‘wekî din’’ de tomar kir. Ev nav 18 heb in: Selamet, Fitnê (Fitin), Qubilme, Qubik, Heyalê, Kufîrlê, Heramîyê, Hoz, Tirbamamo, Zorava, Gamir, Zook, Çildiz, Şa(l)hênik, Şawelêt, Devşil, Peyamlîyê, Qizila Xerabe. Di nava van navan de navên razber yên wek ‘‘Selamet, Fitnê (Fitin), Heyalê, Kufîrlê, Heramîyê, Şawelêt’’; navên wek ‘‘Qubilme, Qubik’’ ku bi taybetmendîyên avahîyan ve têkildar; navên wek ‘‘Zorava, Gamir’’ ku di derheqê awayê avakirina xwe de agahîyan didin; navên wek ‘‘Çildiz, Zook, Şahênik’’ bi

rengdêrên cuda çêbûne hene. Hin beşdarvanan navê Şahênîk wek ‘‘Şalhênîk’’ bilêvkirin. Pêkan e dengê ‘‘l’’ yê ketibe, nav wê demê di wateya ‘‘şalê hênîk’’ de ye. Qizila Xerabe ji ber ku demek dirêj vala maye, navê gund bûye Qizila Xerabe. ‘‘Hoz’’ di wateya ‘‘eşîr’’ yan jî ‘‘ezbet’’ê de ye.

Ji ber ku me bi misogerî bi wateya wan nizanîbû me navê pêncî û çar gundî nekir tu beşekê: Talbeş, Karsan, Koder, Sîçana, Beyrok, Silik, Kato, Urt, Seker, Kumtere, Fêzkê, Mixat, Xirar, Ofî, Sêpnat, Rebet, Şerbê, Zembelor, Kwêtê, Buzzu, Taşît, Mezra Suravirkê, Dêşî, Eynterî, Olaqa, Heboşî, Hilêlî, Qizler, Belana, Balfis, Misrik, Çekem, Eynsilk (Insilk), Eyncil (Incil), Ernebî, Erbete, Qindefî, Xêdûk, Bedras, Hedbê, Maşmaşk, Eyndewl, Selmê, Şemlik, Reqaqî, Mavan, Bizdoxan, Sîsan, Kurkan, Sadan, Siftek, Erbelûş, Qetaro, Welik. Ji van navan mirov dikare li ser çend heban hin şîroveyan bike. Wek mînak di navê ‘‘Beyrok’’ê de ‘‘rok’’ heye, bêje dibe ji kelijandina ‘‘peya’’ û ‘‘rok’’ê çêbûbe. Îhtîmaleke din ev e ku nav dibe ji bêjeyên ‘‘beyar’’ û ‘‘rok’’ê çêbûbe. Mirov dikare bêje lêkolîneke bi vî rengî, ji aliyê etîmolojîyê ve bibe mijara xebateke xweser.

Di gera me ya li gundên Dêrikê de hin şênîyan di derheqê navê gundên xwe de hin vegotinên li gundê wan heye yan jî texmînen xwe ji me re gotin. Ji van vegotinan hinek jê her çend maqûl bûn jî piranîya wan wek etîmolojîya gelêrî bûn. Ji ber ku me şopê şîroveyên wan di navê gundan de û bi awayeke şênber li gundên wan nedîtin ku em wan bi wî awayî bipejirînin, me navê van gundan li gor van vegotinan dabeş nekir. Tenê wek ji bo mînak be em ê cî bidin çend heb ji van vegotinan û şîroveyên şênîyan yê di derheqê navê gundê wan de: Li ‘‘Dêşî’’yê şênîyekî ji nifşê mezin li ser wateya navê gund weha got: ‘*Li gora gi qal dikin berê li vir dêrek hebûyi. Navê vê dêrê Dêra Şîn bûyi, ji ber wê xelkê jê ri gotîyi ‘Dêrşîn’. Ev nav li gor texmîna mi dûr bûyi Dêşî.*’’ (A. Dêşî, 2015) Beşdarvanekî ji nifşê mezin yê ji Xirbê Gura li ser wateya navê gundê xwe ji me re weha got: ‘*Gora gi ji me ri hatîyi gotin, berê li vir rêwî tazî dikirin. Ji ber wê navê gund, di mana cê gurandinê di, bûyi Xirbê Gura. Li Çildizê jî çel heb diz hebûyi, ji ber wê navê gundê wan ana Çildiz i. Cakî din jî heyi, li wir jî vanê diz diketin pêşîya xelkê, navê wir jî mayi Girkemîn. Li ser wî girî kemîn datanîn û millet tazî dikirin.*’’ (M. Xirbê Gura, 2015)

Ev navê ku em bi wateya wan nizanin, em nizanin bi kîjan zimanî ne jî. Hinek ji wan dişibin navên erebî. Wek mînak yên di hundirê wan de “eyn” derbas dibe wek navên erebî ne: “Eynterî, Eyndewl, Eyncil, Eynsilk.” Hinek nav jî hene mirov nikare texmînekê di derheqê wan de bajo: Urt, Belana, Ofî, Kumtere û hwd. Navê “Qizler” ê pêkan e ji tirkî hatibe. “Kızlar” di heman demê de navê gund yê bi tirkî ye ku di wateya pirjimarîya “keç”an de ye.

Di dabeşkirina navan de mirov dikare hin beşên din jî çêke yan jî ev dabeşkirina ku me çêkiriye biguhere. Bi taybetî navên ji du bêjeya pêk tên ji bo dabeşkirinên cuda guncan in. Wek mînak me kanîbû navên wek “Xirbê Belek, Xerabreşk, Xirbê Reş” di nava “jîngehên ku navê wan bi rengan re çêbûne” kira. Sedema ku me ev nav cihê dabeş kir, girîngîya taybetmendîya wan a dîrokî bû. Yan jî me dikarîbû “Çemê Qêntir” di beşa erdnîgarî de tomar bikira. Çem beşek erdnîgarîyê ye lê ji ber ku yê ku nav li vê beşa erdnîgarîyê kirîye “qantir” e, me ev nav di beşa jîngehên ku navê wan bi ajalekê re çêbûne de tomar kiriye.

III.3. NAVÊ TEŞEYÊN ERDNÎGARÎ LI HERÊMA DÊRIKÊ

Me teşeyên erdnîgarî di nava xwe de wek sê beşên guhertî dabeş kir. Beşa yekemîn teşeyên bi “bilindayî” ne ku bi giranî ev nav ji herêma çîyê, lêf û Qerecdax hatine tomar kirin. Beşa duyemîn teşeyên rast, berî, guher û hwd. in. Beşa sêyemîn jêderên avê yên wek çem, gol, kanî û hwd. in. Me wek beşa çaremîn jî navê cihên civakî, yên bi destê mirovan hatine çêkirin, yên wek şûnwar, mezal, zîyaret, dergah, avahî, war, rez, xerzik, ben, hol, evşo, dik, rê û pêgrê tomar kir. Di her binbeşekê de me ev çar beşên ku me li jor behs kiriye, bi rêzê tomar kiriye.

Di pêvajoya vê xebatê de ji bo navê hemî cûre “bilindayîyan” û navê ji dûr nêzîk bi van teşeyên bilindayîyan ve têkildar in, em li van têgehên erdnîgarî rast hatin: “çîya, zinar, gir, girik, kur, sikur, pal, lat, tat, text, poz, tim, timik, tilm, qîş, xiram, şewl, best, bestik, newal, enîşk (ênîşk), bereh, devî, beyar, qaf, zaboq, qeşa, neqeb, kevir, pişt, berwar, tel, ax, xaxot.” Li gor biçûkbûn, mezinbûn, kûrbûn, bilindbûn, nizmbûn, tengbûn, firehbûn û taybetmendîyên din ev têgeh tên bikaranîn. Li gor

danasîna beşdarvanan, pênasên van beşên erdnîgarî bi gelemperî bi vî awayî ye: Çîya (ça), ji van beşên erdnîgarî yên li jor navê wan rêzkirî gişî û ji dar û beran pêk tê, qada wê gelekî berfireh e, sînorekî wê yî dîyar tune. Di gelek zimanan de beramberîya ‘‘çîya’’ wek ‘‘zinar’’ tê dayin lê pênasî çîyê ji pênasî zinaran gelekî firehtir e. Ji ber ku sînorekî wê yî dîyar tune, carinan ji bo qadên pir fireh carinan jî ji bo herêmeke di navbera du sê gundan de dikare were bikaranîn. Wek mînak Çîyayê Dêrikê yan jî Çîyayê Mazî qada di navbera Dêrikê, Şemrex, Çinar û Qerecdaxê de tarîf dike. Lê ji bo zinar, gir û daristana di navbera Fitnê, Erbelûş û Mezrê de jî navê ‘‘Çayê Fitnê’’ tê bikaranîn.

‘‘zinar’’, li gor der û dora xwe bilindaya herî zêde ye, li ser qadek fireh dest pê dike her ku diçe bilind, teng û tûj dibe. Ji bo cihê herî bilind yên zinar, gir û sikuran têgehên wek ‘‘poz, pot, qot’’ û bi qertafa biçûkkirinê ‘‘pozîk, potîk, qotîk’’ jî tên bikaranîn. Ji bo cihê nizm yê zinaran, di wateya quntarê de bi piranî ‘‘pal’’ yan jî ‘‘rex’’ tê bikaranîn. Lat, di zinaran de cihê bilind in û bi piranî tatên yekpare nin. Zinarek dibe li rastekê jî bilind bibe, dibe di nava çîyê jî de be, sînore wê dîyar e. Li navenda Dêrikê ‘‘Tûrcel, Mancêl, Zinara Sior’’ mînakên pênasî zinaran e. ‘‘gir’’, ji zinaran biçûktir in û dibe li cihê rast bin jî dibe di nava çîyê jî de bin. Du cûre gir hene, girên şunwar û girên xwezayî. Di nava gel de ji bo biçûktî û mezintîya giran jî sînoreke dîyar tune. Ji bo girê biçûk ‘‘girîk’’ tê gotin. ‘‘kur’’ û ‘‘sikur’’ du teşeyên nêzîkî hev in. Lê hejmara ‘‘sikur’’an kêmanî dudu yan jî zêdetir in û nêzîkî hev in. Wek ‘‘Sukra Qoto’’ û ‘‘Sukra Meqso’’ du girên li hemberî hev in. Mirov dikare bêje di navbera wan û girên xwezayî de jî cudatîyeke eşkere tune. Li hinek gundan cihên ku şênîyan ew wek gir bi navdikirin, ji teşeyên di dirûvê wê de li gundinê din şênîyan jê re digotin ‘‘kur’’ yan jî ‘‘sikur’’. Tiştê misoger ev e ku ‘‘kur, sikur’’ li herêmên çîyê yan jî li herêmê lêf hene û girên xwezayî ne. ‘‘Tat’’ bi piranî ji bo kevirên mezin û yekpare tê gotin. Lê li çend gundan me dît ku cihê ji çend heb tatên mezin pêk hatîye jî wek yekjimar bêjeya ‘‘tat’’ hate bikaranîn. Text ji bo bilindayên ser wan rast tê bikaranîn. Dişibin lata, lê ferqa wan û lata ev e ku text bilindayîyên wek gir û kuran serbixwe nin lê lat beşek ji zinaran e. ‘‘tim’’, ‘‘tilm’’ û ‘‘timîk’’ û ‘‘tilmîk’’ bilindayîyên nizm in û ji gir û girikan biçûktir in. Her çend pîvaneke wê yî eşkere tunebe jî ev bilindayî li deverna bi qasî çend metroyan hebû. Bikaranîneke wan yê din jî heye di dewsa ‘‘qot, pot, poz’’ ê de jî dibe were

bikaranîn. Wek “Timikê Tûrcelê” di wateya “Qotê Tûrcelê, Potê Tûrcelê, Pozê Tûrcelê” de ye.

“qîş”, cihên bi tat û kevir in. Kevirên xuya ne bi piranî ne kevirên wek şeharan bela û ji hev cuda ne, ev kevir bi piranî perçeyên ji zinar yan giran in. Ji ber wê jî li cihên qîş ax tune. “şikêr”, cihên bi awayeke xwezayî kevir lê pir in. “xiram”, cihê bi kevir û tat in lê ne wek qîşan bilind in, bi piranî wek pala ne û hêdî hêdî bilind dibin. “şewl”, cihê bi dar û devî û best û newal e. Bi piranî di navbera çend heb gir û girikan, yan jî kur û sikuran de dimîne. Ji ber wê li gel keviran, axa şewlan jî heye û dar û devî di ber hev de lê şîn tên. “best”, newalên ne kûr in ku bi ava çemên biçûk çêbûne. Beşdarvanekî ji nifşê mezin ji çemekî zuha re got ev best e. Li gundekî din jî beşdarvanekî ji dikek bilindaya wê bi qasî pênc, şeş metroyan bilind û dirêjaya wê bi qasî du sed metrî dirêj rê me da û got em ji cihê weha re dibêjin “best”. Ji wê nizimtir û kintir dibe “bestik”. “newal” valahî û rastîya di navbera gir, zinar û sukran de ye. Em li têgeha “gelî”yê hew li derekê rast hatin ku di eslê xwe de vê derê ne wek pênasî gelîyan, bi piranî wek newalekê bû. “Gelîyê Textê Xerzika” li herêma Xabê, li quntara Tûrcelê ye.

“ênîşk” yan jî bi bilêvkirina hinek beşdarvanan “ênîşk”, bi lebatên mirovan ve hatiye şibandin, ji bo rêyên ku teqrîben li ser nod pileyî dizivire tê bikaranîn. “zaxore” şikeftên karstîk yên biçûk in. Devê wan wek bîra ne û dawîya wan wek tunelan dewam dike. “berek” valahîyên ku bi bandora bê yan avê di binê lat û zinaran de çêbûne. “devî” li herêmên çîyê û lêf, deverên ku katên berî û mazî lê bela ne. Ev kat hişk bibe dibin “hejik” heger qalindtir be dibin êzing. “beyar” zevîyên ji çandinîyê re guncan e lê belê nehatiye çandin. Her çend ji çandinîyê re guncan be jî zevîyên zêde bi kêr nayin beyar tên hêştin. “Qaf” li herêmên zinaran, tatên mezin û gelek caran jêderên avê yên wek kanî yan kidab li der dora wan hene. “zaboq” neqebên tatîn in. Cihê zaboq her dem ba lê heye. “Qeşa” li herêmên çîya, lêf û Qerecdax ew cihên ku nezar ango sersî ne. Yê ku sîyê çêdikin bi piranî qîş, lat û tatên mezin in. Ji ber sarbûna van deran navê wan bûye qeşa. Ji ber ku nezar in, tarî ne, gelek caran bûne cihê kemîn û kuştinê jî. Ji ber wê me gelek navê qeşayan bi navê mirovan re dît. Ji vana hinek jê bi misogerî tên zanîn ku mêlav in. “qûç” komên keviran in. “şikêr” jî komên keviran in lê belê qûç kevirên ji nav zevîyan hatine hevdan û li derekê hatine rûkirin, şikêr komên xwezayî ne.

‘‘neqeb’’ derîyên xwezayî yên li ser dirêjayîyê ne. Du alîyên wê dibe tat, zinar yan gir be. Neqebê çêkirî jî hene ku ji bo mirov têkevin nav rez û xerzikan tên çêkirin, ango peywira derî dibînin. Bi awayê razber di wateya ‘‘navber’’ de tê bikaranîn. ‘‘*Di neqeba min û te di fesadîyê diki.*’’ ‘‘kevir’’ dema di wateya herêmekê de tê bikaranîn dibe keviyek tenê be jî û dibe ji çend heb kevirên mezin jî pêk were. ‘‘pişt’’ pala dawîyê ya gir û zinaran e. Carinan ji bo ser gir û zinaran jî tê bikaranîn. ‘‘berwar’’ rê, dik yan jî bestên li ser dirêjayîyê û gelek caran bi zîvirok in. Têgeha ‘‘berwarkî’’ di lêkirina dîwaran de ya bi keviran tê bikaranîn. Ji bo kevir li ser kêlekê were danîn tê bikaranîn. ‘‘tel’’ çîyê li gor der û dora xwe ji nişka ve bilind dibe û kaşên wê tîk in. ‘‘ax’’, deverên bi ax in. Pêkan e li herêmen weha zevîyên tên çandin jî hebin û pêkan e ji bo çandinîyê ne guncan bin jî. Herêmen bi ‘‘ax’’ê tên xwendin bi piranî li gor rengên xwe nav sitendine. ‘‘xaxot’’ girik û şikeftên karstîk in, ax û kevirê wê ji kîl û kilsê ne û di forma şîstê de ne.

Ji teşeyên erdnîgarî yên wek berî, rast û guheran em li van têgehên rast hatin: Berî, rast, guher, deşt, meydan, kort, erd, beyar, şehar. Pênasên van têgehên ku me ji beşdarvanan girtîye bi vî awayî ne: ‘‘berî’’ qadeke gelekî berfireh e ku sînorekî wê yî dîyar tune. Bi piranî zevîyên ku ji çandinîyê re guncan e lê hene. ‘‘rast’’ qadên biçûk in, bi piranî li der dora jîngehan e. Carinan li taxekê qadek pir biçûk e û wê demê navê wê dibe rastîk, carinan li nava gundekî, cihê dîlanê ye. ‘‘guher’’ jî rastên biçûk û mezin in. Li der dora gundan jî guher heye û li dûrî gundan, li herêmen çîya û zinar jî heye û gelek caran ji bo mexela pez tê bikaranîn. Li deverna ji bo guheran sererast navê ‘‘mexel’’ jî tê bikaranîn. ‘‘deşt’’ ji berîyê biçûktir e û cihê wê jê bilindtir e. Bi piranî li ser zinaran, di nava çîyê de ye. Zevîyên wê ji çandinîyê re guncan in. ‘‘meydan’’ ji guheran bêtir nêzîkî navendên jîngehan e. Bi piranî ji bo dîlan, civîn û lîstikan tên bikaranîn. ‘‘kort’’ rastên nizm in. Her çend navê wan kort be jî nayê wateya ku gelekî nizm in. Gelek car zevîyên çandinîyê tê de hene. Me hinek kort dîtin ku bi qasî sê sed donim zevî hebû. ‘‘erd’’, li herêma Dêrikê ji dêvla têgeha ‘‘zevî’’yê tê bikaranîn û sererast zevîyên ku çandinî lê tê kirin. ‘‘beyar’’ zevîyên ji çandinîyê re guncan e lê nehatîye çandin.

‘‘şehar’’ rast yan jî palên bi tat û kevir in. Me li cihên ku wek şehar dihate bi navkirin dît ku li hin cihan şênîyan kevir dane hev, erd vedane û ji bo çandinîyê

bikaranîne. Li cihê weha me gelek qûçên ku bi van keviran hatine çêkirin dît. Lê bi pîranî qadên şehar ji ber tat û kevirên hûr û gir, ji ber erdê hişk ji çandinîyê re ne guncan e. Şênîyekî ji bo vedana erdekî xwe ji me re weha got: “*Mi ji qîmeta wî bêtir pere lê da, heya mi sî donim erd veda.*” (H. Beyrok, 2015)

Di beşa sêyemîn ya teşeyên erdnîgarî de me navê jêder û teşeyên avî tomar kirin. Di vê beşê de em li van têgehên rast hatin: çem, gol, kanî, bîr, sarinc, hezaz, xarxoz, zaxore, şikeft, delav, kidab, hewdik. Li gor beşdarvanan ji bilî van teşeyên wek gol, çem û kanî ango yên pênasa wan dîyar in, pênasa teşeyên din bi vî awayî ne: “sarinc” bîrên di tatên yekpare de hatine kolan. Devê wan teng e binê wan fireh e. “hezaz” bîrên qarstîk in û kûrbûna wan tê guhertin. Di hinekan de av heye, hinek ji wan zuha ne. “xarxoz” dişibin hezazan lê ji wan biçûktir û nizimtir in. Ew jî bîrên karstîk in, wekî hezazan dibe av di wan de hebe û dibe zuha bin jî. “zaxore” jî bîrên karstîk in, binê wan dibe wek tunela. “delav” avên her dem diherikin. “kidab” kanîyên zuha ne, tenê derbuharan bi ava berf û baranan der dibin, demekê diherikin, serê havînan zuha dibin. Salên şilî kêm be pêkan e hinek kidab der jî nebin. “hewd” û “hewdik” kortên di tatan de çêbûne, hinek jê zuha ne. Li cihna di wateya “birk”ê de tê bikaranîn. Koka “hewd” divê ji “hewd(z)” a erebî hatibe. Ji ber ku dengê dawîyê “ض” e ev deng wek “d” jî wek “z” jî dikare were bilêvkirin. Ji berê de di medreseyên Kurdan de ev deng bi pîranî wek “d” tê bilêvkirin. Lê di tirkî de bi pîranî wek “z” tê bilêvkirin. Ji ber wê di tirkî de ev nav wek “havûz” û di kurmancî de wek “hewd” tê bilêvkirin.

Ji bilî van teşe û têgehên erdnîgarî yên li jor nav û pênasên wan hatine dayin, wek beşa çaremîn me navê wargehên wek şûnwar, xirbe, mezel, zîyaret, dergah, war, aş, ben, rez, xerzik, zeytûn, hewq, dik, rê, çarrê, duryan, pêgrê, hol, evşo ku ji alîyê mirovan ve di çarçoveya jîyana civakî, çandî de hatine çêkirin tomar kir. Ji ber ku me dît ku navê van wargehan jî ji bo çêkirina navê herêman dibin referans me pêwîst dît ku em navê wan jî tomar bikin.

Di nava van wargehên civakî de me hewce dît ku em bi kurtasî pênasa çend heban bidin: Ji van navan “war” hem di wateya “herêm, cih” de ye û hem jî me ji hinek beşdarvanan bihîst ku li hin herêmên ku wek war tên bi navkirin xanîyên biçûk, yên demdemî hebûn. Ev xanîkên biçûk tenê di sê çar mehê havînê de tên bikaranîn. Di van mehan de gel li van waran yan li ser reza dimînin, yan di wextê mahseran de li ser

xerzikan dimînin yan li ber pez dimînin. ‘‘hol’’ tenê ji bo çûyina ber pez tê bikaranîn. Dîwarê holan bi piranî bi keviran û bê xerc tèn lêkirin û ser wan yan bi çilo, yan bi tejên mûyînî, yan jî bi paçên mezin tèn girtin û carinan jî ser wan ji bo berf û baranê derbas neke bi naylonan tèn nixumandin. ‘‘evşo’’ jî li nêzîka hola ji bo pez tê çêkirin û wek holan ser wan tèn girtin. Beşdarvanekî dema behsa rabirdûya xwe kir weha got: ‘‘*Ez xort bûm, mala me li hola bû, me pez biribû hêla deştê.*’’³⁰ (R. Xarok, 2014) ‘‘ben’’ û ‘‘bendik’’ diwarên li dora rez û xerzikan hatine çêkirin. ‘‘zeytûn’’ li vir di wateya baxçeyê zeytûnan de ye. ‘‘rez’’ baxçeyên ku gelek cûre darên fêkî tê de hene. ‘‘xerzik’’ baxçeyên tirî ne. ‘‘hewq’’ dikên nizm in û baxçeyên wek pênasa reza ne, gelek cûre darên fêkî tê de hene. ‘‘çarrê’’ di wateya çatrê de ye ku rê dibe çar heb. ‘‘duryan’’ du heb rêyên ku ji hev diqetin. ‘‘pêgrê’’ rêkên bi şopa meşa mirovan û ajalên kedî yên wek ker, bergîr û pez çêbûne.

Ev hemî têgehên erdnîgarî û wargeh di ferhengan de dibe bi hinek awayên guhertî hatibin nasandin, li herêma ku em li navê teşeyên erdnîgarî gerîyan, gel ew bi van awayên li jor hatîye dayin tarîf kirin. Dema ku em li navên taybet yên van cûreyên erdnîgarî dinêrin, li gor awayê navlêkirinê em van beşên navlêkirinê dibînin:

III.3.1. Navê Teşeyên Erdnîgarî, yên bi Navê Riwekekê re Çêbûne

Gelek teşeyên erdnîgarî navê xwe ji riwekekê sitendine. Hinek riwekên ku navê xwe li teşeyên erdnîgarî kirine anha jî li cihê xwe hene, lê hinek jê êdî lê ne xuyane. Wek mînak li ‘‘Newala Biîvê’’ hîn jî darên biîva hene lê li ‘‘Dika Mazî’’ darên mazî nemaye. Li gor rêzê pêşî em ê mînakên navê bilindayîyan, navê teşeyên rast, navê teşeyên avî û di ya dawîn de jî navê herêm û wargehên civakî ango navê şûnwar, mezal, zîyaret û hwd. bidin. Hin navên me tomar kirin û hêjayî mînakdayinê ne ev in:

Zinarê Besta Gêjnikê, Textê Kevota, Textê Hîrê, Kura Kulîlkê, Besta Sîrdima, Tata Kerikê, Girê Noka, Girê Nîska, Gîyarê Şekerokê, Dika Mazî, Newala Mazî, Piştta Mazî, Newala Biîvê, Newala Gwîzê, Keloşka Guhîjê...

³⁰ Ji ‘‘deştê’’ mebest ‘‘Deşta Dîyarbekir’’ e.

Korta Teewkê, Korta Talîyê, Kortika Dara, Korta Mazî, Korta Gwîzê, Guhera Ceh, Guhera Botavkê, Dara Hola Mêra, Meydana Gwîzê...

Çemê Çinarkê, Gola Kulîlkê, Gola Zila, Gola Benîştokê, Ça Sosinkê, Kanya Gwîzê, Kanya Hijîrê, Kanîhinarkê, Kanîkenêr, Bîra Hinarê, Bîra Hijîrê, Şikefta Biîvkê, Hezaza Çilo, Sarinca Hilalkê...

Mezelê Dara Qut, Mezelê Serê Devîya, Ziyareta Girê Dar, Ziyareta Darbero, Warê Biîvkê, Holê Gezo, Duryana Xerzika...

Mirov dikare li van navan binêre û ji mêj ve li herêmê kîjan riwek şîn hatine bibîne. Me ji şênîyan bihîst ku êdî darên kevota li herêmê li ber tunebûnê ne.

Navê hinek herêman bêyî ku navê teşeyek erdnîgarî tê de derbas bibe, bi navê riwekekê û bi navekî din re çêbûne. Wek ‘‘Tawîya Kuştîya, Biîvka Haco, Tûka Sofî Xelef, Dara Mamûda’’ û hwd.

III.3.2. Navê Teşeyên Erdnîgarî, yên bi Navê Ajalakê re Çêbûne

Navê hinek teşeyên erdnîgarî bi navê ajalakê re çêbûne. Ev ajalên ku navê wan li teşeyan bûne hinek ji wan ajalên kûvî ne û hinek ji wan yên kedî ne. Mirov dikare bêje navê ajalên kûvî li gor ku ew ajal li wê herêmê pir hatîye dîtin lewma hatîye dayin. Navê ajalên kedî jî mirov dikare bêje ji ber ku şênîyan ew ajal li wan deran xwedî kirine, karekî bi wan ajalan re têkildar li wan deran hatîye kirin lewma ew nav li wan deran bûne. Wek mînak zinarek ku tim qertel lê hatîye dîtin navê wê bûye ‘‘Zinara Qertel’’ û golek ku berx tê de hatîye şuştin navê wê bûye ‘‘Gola Berxa’’. Devernî jî hatîye şibandî lebateke ajalakê, wek ‘‘Pozê Pişta Kerê’’. Balkêş e cihê ku bi navê ajalên kûvî re tên xwendin cihên wek zinar, poz, gir û sikur in ku cihê jîyana kûvî ne. Cihên bi navê ajalên kedî re tên xwendin bi piranî cihên rast û deşt in ku nêzîkî jîngehan in. Hinek mînakên me tomar kirine ev in:

Zinarê Qertel, Zinarê Teyra, Newala Gura, Newala Pepûkê, Sukra Pepûkê, Kura Mişka, Pozê Pişta Kerê, Pozê Mûristanê, Pozê Ker, Şaxa Bûm, Tata Rêvî, Zanka Şêr,

Girrêvî, Girê Kerkuştî (Di heman demê de şûnwar e, li Eynterîyê ye.) Keloşka Qertel, Devîya Wehşa, Kevirê Lingê Duldulê, Hêlîna Bilbil...

Guhera Ga, Guhera Peza, Guhera Dewara, Korta Mirîşka, Korta Kanîxezalkê, Rasta Kera...

Şikefta Gura, Şikefta Kevoka, Qula Rêvî, Qula Keftêr, Qulika Wahşa, Gola Berana, Gola Berxa, Gola Bizina, Gola Kera, Golmarîn, Kanîya Beqa, Kanîya Xezala, Sarınca Mişk, Bîra Kewa, Hezaza Gura...

Navê mezêl, zîyaret û şûnwaran ku bi navê ajalekê re çêbûye me nedî. Pêkan e ji bo ku wek bêrêzî nebe bi navê ajalan re nav li wan nehatibe kirin. Li Xarok navê herêmekê "Bajarê Çûka" ye. Navê herêmeke din "Lûsa Teyra" ye.

III.3.3. Navê Teşeyên Erdnîgarî, yên bi Navê Mirovan re Çêbûne

Ji bo gelek teşeyên erdnîgarî bi vî awayî dayina navan gelekî bela ye. Kesên ku navê wan li van cihan bûye, ji aliyê nîfşên mezin jî nayin naskirin. Yê hinek kesan jî tenê çîrokên wan tê zanîn. Navê hin cihan jî ne bi navê taybet lê bi nasnavan û bi navên cinsî hatîye dayin. Mirovên ku navê wan li deveran bûye bêguman kesên bibandor bûne. Navê kesên wek şêx, mela, axa, zana, mêrxas, dewlemend, serok û hwd. li herêm û teşeyan hatîye kirin. Hinek cih jî bi awayeke din bi kesê ku navê xwe jê sitendîye ve têkildar e. Wek mînak "Qulika Ezîzê Biro" şikefteke xwezayî ye. Lê Ezîzê Biro ku rewşenbîrekî dema xwe bû, di navbera salên 1970-1980 de hinek xort li dora xwe civandîye û bi alîkarîya wan di vê şikeftê de xebitîye ku avê jê derxîne û bi vê avê dara li herêma Govê biçîne. Ji ber wê ye ku navê vê şikeftê, berê çî bû em nizanin, di nava gel de dibe "Qulika Ezîzê Biro."

Li gelek gundên Dêrikê em li çîrokên van kesan rast hatin ku piranîyên wan nayin naskirin tenê çîrokên wan mane di nava gel de. Hindik be jî hin kes ji wan tên naskirin, kêmanî nîfşê mezin ji dê û bavê xwe neqil dikin ku ew kes jîya ne. Mînakek çîrokekê ku me ji beşdarvanekî guhdar kir bi vî awayî ye: *'Me nedîyi lê belê li gora gi bav û kalê me qal dikirin digotin, li gundê me melak hebûyi, navê wî Husên bûyi. Ev*

mele di dawîya emrê xwe di dixurifi, go carê ji gund derdiket û diçû ser kura li hemberî gund, azan dida. Ji ber wê navê wê kurê bûyi "Kura Husênîk". (C. Fitin, 2014) Hinek mînakên me dane hevdû ev in:

Kura Elî Biro, Kura Husênîk, Kura Bûbikê, Pozkê Miê Kalê, Textê Erebresûl, Kura Şêx Mîr, Şaxa Mamûd Axa, Şaxa Şemo, Xiramê Eysreşê, Besta Xuş, Kura Şêx Mîr, Zinara Bûk û Zava, Textikê Bûka, Histûna Zeynê, Newala Şaxê, Girkê Hecîya, Bereha Ma Silo, Qeşa Fereckê, Qûça Zerikê...

Korta Medê, Kortika Silîmo, Erdê Maro, Guhera Gavana, Rastika Fêrîko, Rasta Zînikê, Korta Qereçîya, Beyarê Mamûçya...

Gola Mûsê, Gola Eysîkê, Gola Gavana, Gola Pîrê, Ça Warê Hiço, Şikefta Şewlê Mezrayî, Qulika Ezîzê Biro, Şikefta Hedikê, Şikefta Hûto, Şikefta Mîşo, Şikefta Hemokê, Kanîya Pîreka, Kanîka Şehemê, Kanîka Şêro, Kanîka Osmên, Sarinca Fatimê, Hezaza Beyo, Hewdê Lawika, Hewdê Keçîkê, Bîra Dayê Silo, Bîra Mala Hemedê Haco, Zaxora Kosê...

Mîrbadîn, Baba Emer, Şêx Hesên, Sîn û Seydoş, Ziyareta Kal û Pîrê, Ziyareta Şîrîf Baba, Ziyareta Şêx Nuredîn, Ziyareta Êrge (Êlge) Baba, Mezelê Mûsa Axa, Mezelê Şêx Osman, Mezelê Şêx Zibêr, Mezelê Şêx Hesên, Mezelê Evdî, Mezelê Xidra (eşîr), Mezelê Şêx Mensûr, Xirbekê Kûto (Xanîka), Warê Bûka, Warê Zerîfe, Evşê Evdilê, Bendika Şendo, Rezê Garê Dêwid, Zeytûnê Çêço, Hewqa Meqsîkorko, Aşê Qadê Ela, Çopilma Ma Emko, Emya Ma Silo ...

Di "Ça Warê Hiço" de bêjeya "Ça" di wateya "çay, çayik"ê de ye û li gor beşdarvanan "Hiço" jin e. "çopilme" li gor pênasê beşdarvanan, bêndera ku lê ceh, nîsk ka, genim û tiştên din tevlihev dibe. Wê çaxê mirov dikare bêje koka vê bêjeyê "çop" e. "ma" di devokê Dêrikê de kurtkirina bêjeya "mal" e û Emko jî kurtkirina navê mirovekî ye. Beşdarvanan nizanîbûn navê vî kesî yê dirêj çî ye lê belê li gor texmînên me dibe ji "Emer (Emo – Emko), Hemdula (Hemo – Hemko - Emko), Mehemed (Hemo – Hemko – Emko)" navek be. "emî" bêjeya "hemî" ye ku li gelek gundên çiyê bi vî awayî tê bilêvkirin. Ev bêje ji "hamî"ya erebî hatîye kurmancî, wek lêker bi awayê "hemandin, hemidandin"ê jî tê bikaranîn. Pêkan e lêkera

“hefidandin”ê jî ji vê bêjeyê guherîbe. Deverên ku jê rê dibêjin “hemî” cihên daristan û devî nin. Xwedîyê hemîyan dikarin ji hemîyên xwe êzing, qurmik û hejikan bibirin û wek ardû bikarbînin yan jî bifroşin. Beramberîya vê bêjeyê di tirkî de “koru, koruluk” e û hem di tirkî de hem di kurmancî de û hem di erebî de wateya wan yek e. Deverên hemî deverên ku “hatine parastin” in.

III.3.4. Navê Teşeyên Erdnîgarî, yên li Gor Taybetmendîyeke Erdnîgarî – Xwezayî Çêbûne

Navê gelek teşeyên erdnîgarî li gor taybetmendîyeke xwe yî erdnîgarî yan jî xwezayî çêbûye. Wek mînak “gir” teşeyeke erdnîgarî ye, “poz” jî ji bo teşeyên wek gir û zinaran cihê herî bilind e. Em di navê “Pozê Bel” de taybetîyeke erdnîgarî û di “Girkê Axîn” de jî taybetmendîyeke xwezayî dibînin. Navê hin teşeyan jî bi navê jîngehê re tê xwendin. Wek “Bîra Xarok, Guhera Çewligê, Dengiza Bixurê, Zeytûnê Heramya” û hwd. Me ev mînak jî di nava vê beşê de tomar kirin, ji ber ku navê van jîngehan jî navên cihekî ne divê wek navên erdnîgarî werin pejirandin. Hin mînakên ku me tomar kirine û dikevin vê beşê ev in:

Girkê Axîn, Girê Çala, Garê Bîra, Gîyarê Kurê, Textê Qûça, Tata Qûç, Kura Hewda, Kura Xiram, Pozê Hewdika, Pozê Bel, Pozê Rûtik, Zinara Qeşê, Pozê Tûmikê, Şeharê Qetaro, Qeşa Qelişî, Xiramê Tûjik, Berwara Dirêj, Enîşka Avê...

Di van mînakan de “Tûmik” navekî taybet yê herêmekê û “Qetaro” jî navê jîngehekê ye.

Rasta Keloşkê, Kortika Ketî, Korta Birûskê, Deşta Berî, Guhera Çewligê, Guhera Rût, Rasta Sûbetanê, Korta Avzêmkê, Korta Zangê, Axreşk, Axgewrk, Axka Dimsê... Di van mînakan de Çewlig û Sûbetan navên taybet yên jîngehan e.

Çemê Bîrika, Çemê Şikestûnê, Gola Qeraça, Goltatîn, Ça Hezazê, Bîra Xarok, Şikefta Keloşkê, Şikefta Dilopa, Şikefta Tatîn, Şikefta Sêderî, Deşta Bel, Kanîbîrk, Kanîya Qelişî, Dengiza Bixurê, Dîyarî Meydan... Di van mînakan de Şikestûn, Hezaz, Xarok, Bixur navên taybet yên jîngehan e.

Xirbê Ofiyê (Ofî), Xirbê Fitnê (Fitnê), Xerabbajar (Fitnê), Xerabbajar (Sîsan), Xirbê Lêr (Mavan) Xirbê Mitik (Talbeş), Xirbekê Arîyê (Xirbê Herîyê), Kela Rebetê (Rebet), Mezelê Kortê, Mezelê Palê, Mezelê Taşîtê, Zîyareta Axa Gewr, Zeytûnê Qerêç, Xerzikê Korta, Çarrêya Siltokê (Siltok gund e.)... Di van mînan de Ofî, Fitnê, Rebet û Taşît navên taybet yên jîngehan in.

III.3.5. Navê Teşeyên Erdnîgarî, yên li Gor Jîyana Civakî Çêbûne

Navê hin cihan li gor kar û barên gel, li gor jîyana şênîyan ya civakî, li gor ol û bawerîyên wan, çand û kevneşopîyên wan çêbûye. Ji van navan mirov dikare di derheqê jîyana gel ya kevin de bibe xwedî fikrekê. Wek mînak ji van navên li jêr mirov dikare bêje gelê herêmê ji berê de bi ajalvanî û bi cotkarîyê ve daketîye. Wek pîşe komir çêkirine, zîvkerî kirine, çûne seydê, ji ajalên xwe re rêsî çêkirine, ji zîyaretan û hêza wan ê mîstîk bawer kirine, di hin deman de bi Erebên ku hatine li talanên wan xîne re şer kirine, carinan di nava xwe de şer kirine, qereçîyên koçer vehewandine... Wek mînak me ji beşdarvanekî guhdar kir, navê “Kevirê Piştîya” bi vî awayî çêbûye: *“Ji navenda Dêrikê keç û jin û pîrek diçûn çê hejîk dianîn. Wexta ji Serê Xabê dadiketî, kevirek wek kursîya gi mere kani lê rûni û piştî xwe bidê heyi. Pîreka li vir hulma xwe vedikirin, teva hejîkê li piştî xwe, li ser vî kevirî rûdiniştin. Ji ber wê navê vî kevirî bûyi Kevirê Piştîya û ev nav bûye navê vê herêmê.”* (E. Dêrik, 2015) Hin navên ku me hêjayî mînakdayinê dîtin ev in:

Newala Qişlê, Kura Zîyaretê, Gomê Seydvanîya, Kura Zîvkera, Neqeba Bêrîyê, Tatê Kiraşo, Girê Etara, Girkemîn, Girkê Bêndera, Girkê Hecîya, Şewlê Goşt, Bereha Eşûra, Kevirê Piştîya...

Korta Karwana, Korta Mewtê, Korta Kûrê, Guhera Ereba, Guhera Şer, Guhera Hola, Korta Qereçîya, Korta Kuşçîya...

Şikefta Cina, Şikefta Dêw, Şikefta Qişlê, Şikefta Rêsîya, Kanîya Bêçare...

Xirbê Qilîç (Xanok), Mezelê Çel Xortê Bi Gulî (Mezra Gêrî), Zîyareta Bê, Mezelê Goristên, Kêldizk (Tilbisim), Bena Dêwa, Holê Gezo, Herêmê Kêfê ...

Ji van mînanan û ji vegotinên şênîyên van herêman tê fêmkirin ku li “Newala Qîşlê” pez hatîye qîşlekirin, li “Girkê Bêndera” bênder hatîye gerandin, li “Korta Kûrê” kûreya komirê hatîye çêkirin, li “Korta Kuşçîya” mirov hatine kuştin, li “Girê Etara” etara tiştên xwe firotine, li “Tatê Kiraşo” jîna kinc şuştine. Gel bawer kiriye yê ku ba di canê wan de hebe dê li “Zîyareta Bê” baş bibin, bawer kirine ku di “Şikefta Cina” de cin heye. Li gor bawerîya şênîyan di “Mezelê Çel Xortê Bi Gulî” de çel xortên bi gulî ku hatine kuştin veşartî ne. Li Holê Gezo jî ser çiloyê darên berî gezo berhevkirine, li “Herêmê Kêfê” pîknîk û seyran kirine.

III.3.6. Navê Teşeyên Erdnîgarî, yên bi Rengdêrên Wek Reng, Pîvan, Hêl û Hejmaran re Çêbûne

Navê hinek teşeyan bi alîkarîya rengdêrên rengan yan jî pîvanên wek biçûk, mezin, dirêj, nuh, kevin, jêr, jor, bilind, nizm û yan jî bi hejmarekê û hwd. hatîye çêkirin. Navdayina bi vî awayî gelekî xurt e, me gelek mînakên wê dîtin:

Gîyarê Reşîkê, Girkê Şînik, Pêncgira, Lata Sor, Lata Şîn, Lata Zer, Pozê Şîn, Pozê Sor, Qîşê Bilind, Tatê Şîn, Gomê Gir, Kevirê Kerr, Kevirê Tingting...

Guvera Dirêj, Sêguherka, Guhera Jêr, Guhera Jor, Korta Fire, Rasta Gewrik, Axreşk, Axgewrk, Pûşgewr ...

Çemê Zuha, Gola Şîn, Gola Sor, Gola Reş, Gola Xwînê, Gola Mezin, Gola Biçûk, Gola Nuh, Goldirêjkê, Kanîsork, Dubîrka, Bîra Miênî, Kidaba Jor, Kidaba Jêr, Şikefta Devnizmik...

Mezelê Gewrik, Mezelê Spî, Mezelê Nuh, Mezelê Kevn, Mezelê Jor, Mezelê Jêr...

Li gundekî heger jî teşeyekê yan jî cihekî du heb hebe wê demê navê wan li ser dijberîyeke rengdêran çêbûye. Wek mînak li jîngehekê du heb mezel hebe ev her du mezel yan li ser nuhbûn û kevnbûnê yan li ser li jêrbûn û li jorbûnê jî hev hatîye cudakirin. Ji ber ku li gelek gund jî bo avdana pez û dewara golên avê hatine çêkirin û li hin gundan jî hejmara golan jî yekê zêdetir bû, me di navê golan de mînakên bi vî rengî

gelekî dîtin. Li gundê ku golek tenê lê hebûya bi piranî ev gol wek “Gola Gund” hatibû bi navkirin.

III.3.7. Navên Bi Avahîyekê, bi Şûnwarekê re Têkildar

Di navê hin teşeyan de şopên şûnwaran xuya ne. Carinan jî serast navê avahîyekê bûye sedem ku nav li teşeyeke erdnîgarî yan jî li herêmekê bibe. Mînakên bi vî awayî navdayinê kêm bin jî ji ber ku pêkan e li wan deran şûnwar hebin me pêwist dît ku em wan jî tomar bikin.

Qîşê Kêlê (Sadan), Kela Kaska (Kumtere), Gîyarê Kelê (Bixur), Dika Dengê (Fitnê), Neqeba Kelê (Bixur)...

Korta Kelê (Belik), Guhera Sêsitûnê (Belik), Guhera Zêr û Besrek (Taşît)...

Bîra Dêrê (Meşkîna), Kanîbindêrê (Xab), Ça Xiznê (Xarok), Gola Aşê Gewr (Xozberîya Jor)...

Dêra Fila (Qizilê), Mezelê Fila (Fitnê), Qesrîk (Mezra Gêrî), Rêya Aşa (Fitnê)...

Li ser van avahîyan agahîyeke eşkere tune. Li hinek cih tu şopek li rûyê erdê tune, tenê navê wan maye. Wek mînak me li sê gundê cuda navê “Korta Kelê” dît lê li gundekî jî kele tunebû. Li gor agahîyên şênîyan dan me, di demên kevin de li wan deran “Kele” hebûye. Cihên ku navê avahîyan tê de derbas dibe û cihên şûnwar lê hene di nava kevanê de navê gund jî hatîye nivîsandin.

III.3.8. Navê Mêlavan û Çîrokên Wan

Li herêma Dêrikê, cihên ku mirov lê hatine kuştin wek “mêlav” tên bi navkirin. Li gor agahdarîyên beşdarvanan dan me sedemên van kuştinan bi piranî ji ber dijminatîyê ne. Ji bilî dijminatîyê sedemên wek şêlandin, dizî, destdirêjî û carinan pevçûnên biçûk yê di navbera du hevalan de qewimîne jî heye. Sedem her çî dibe bila bibe weha tê fêmkirin ku ev bûyer û kuştinên çêbûne bandor li şênîyên herêmê kirine û

ew der, çi jin dibe çi mêr dibe bi navê yê kuştî bi navkirine. Ji van kesên kuştî hinek jê tîrî naskirin û çîroka kuştina wan tîrî zanîn lê hinek jê hatine ji bîrkirin. Di nava van mîlavan de yêrî nuh jî hene ku tîrî fêmkirin awayê navdayînê yêrî li ser bûyerên bi vî rengî hîn jî berdewam e. Gelek şênîyan nexwestin di derheqê van bûyerên ne xweş de bi hûrgilî agahîyan bidin, ji ber wê me jî ji bilî çîrokên çend bûyeran li çîrokên mîlavan nepirsî. Ji aliyê onomastîkê ve girîngîya mîlavan ev e ku mîlav mînakên li ser bûyerekê navên li herêman bûne. Bêjeya “mîlav”ê me ji beşdarvanekî tenê wek “mêrav” bihîst, yêrî mayî gişan ew wek “mîlav” bi lêv kirin. Ev bêje ji aliyê etîmolojîk ve hêjayî lêkolînê ye. Navê çend heb mîlavên ku me dane hev ev in: Mîlava Eyno, Mîlava Elikê, Mîlava Bindo, Mîlava Evdilê, Mîlava Keleş, Mîlava Şêxiko... Ji bilî van navê herêman yêrî ku bi “mîlav”ê dest pê dikin, navê hin mîlavan jî bi teşeyên erdnîgarî ve û bi navê kesên kuştî re çêbûne: Korta Reanê, Kortika Silîmo, Qeşa Şêxê Misto, Qeşa Yendo, Qeşa Evdilayê Emo, Qîşê Ozmên... Ji bilî van cihên ku şênîyan gotin ev cih jî mîlav in, pêkan e hinek herêm û teşeyên ku bi navê mirovan re tîrî xwendin jî di eslê xwe de mîlav bin lê hatibin ji bîrkirin. Wek, “Şaxa Mamûd Axa, Newala Şaxê, Kura Bûbîkê, Xirbekê Kûto, Şikefta Mîşo” û hwd.

III.3.9. Navên Xwerû û yêrî Wateya Wan Ne Dîyar

Me gelek herêm û teşeyên erdnîgarî dît ku bîyî ku navê teşeyên wan were gotin, tenê navê wan yê taybet hebû. Ji van navên xwerû jî wateya gelek ne dîyar e. Ev nav yan jî ber ku gelekî kevn in, wateya wan wenda bûne yan jî bi zîmanekî ji derveyî kurmancî nin. Wek mînak zîrana “Tûrcel”ê tenê bi navê xwe yê xwerû tîrî xwendin, ne wek “Zîrana Tûrcelê”. Bikaranîna di nava gel de bi vî awayî ye. “*Em ê îro herin ser Tûrcelê.*” ti kes nabêje, “*Em ê îro herin ser Zîrana Tûrcelê.*” Hinek mînakên navên xwerû ev in:

Zînar: Tûrcel, Mancel, Êrge (Êlge) Baba, Firna Gawira, Textê Qîza Qrêl, (Navenda Dêrikê) Tûmik (Fitin), Qoto, Meqso, Mozlan, Esenka, Reşbilind (Xarok) Kêlê (Sadan)...

Herêm: Dêrkalos, Têzzerab (Bixur), Herêzm, Sîswan, Dêrîşk, Dînar, Alosê (Xarok), Tirozî, Hoçim (Qizil), Keytare (Kevirşîn), Sîsiban (Meşkînan), Xab (Navenda Dêrikê)

Wekî van mînakên li jor, hinek navên ku bi navê teşeyên xwe re tên xwendin lê wate û zimanê wan ne dîyar in jî hene. Hinek mînakên wan ev in: Gîyarê Qerengozê, Zinarê Tilqut, Besta Çalixişê, Textikê Derema, Newala Majê, Newala Memilê, Pozê Şoqo, Kurka Aylan, Sukra Hûrgêzka, Sukra Mioqilik, Şikênîka, Garoz, Deşta Bacacixê, Bîra Eberûş, Gola Bêmisorkê, Xirbê Bixalîyê...

Navên wek Majê, Memilê, Şoqo, Aylan, Mioqilik dişibin navê mirovan. Heger ev nav navê mirovan bin jî yan navên kurmancî lê pir kevn in û wê demê pêkan e navên kurdî yê berî misilmantîyê bin, yan jî bi zimanekî biyanî û navê kesên ne ji ola misilmantîyê bin.

Li hinek gundan jî navê hin avahî, herêm yan jî teşeyên erdnîgarî bêyî navê taybet, tenê bi têgehên erdnîgarî dihate binavkirin. Me bi pirsê ji şênîyan fam kir ku ev teşeyên erdnîgarî yan jî herêm bi tena serê xwe ne û ji ber ku yek tenê ne navekî wan yê taybet tune. Gelek car ev teşe, avahî û herêmên gund bi navê "gund" re dihate xwendin. Wek, 'Kanîya gund, kanî, zaboq, gol, gola gund, qîş, gome, çem, çemê gund, mezel, mezelê gund, ça, kidap, delava gund, bîr, bîra gund...' heger li cihekî ji teşeyekî du heb hebe, kêmanî bi rengdêrên wek "biçûk-mezin, jêr-jor, nuh-kevn" û hwd. nav li wan bûye.

Em dikarin van encamên li jêrîn ji van agahîyan derxînin:

III.4. ENCAMA BEŞÊ

Li Tirkîyê guhertina navê cihan di sala 1925' an de dest pê kiriye, di sala 1940'î de bingeha wê ya zagonî hatîye danîn, heya sala 1982'yan li temama Tirkîyê zêdeyî navê 12000 gundî hatîye guhertin. Sedema bingehîn ya guhertina navê gundan ew e ku ev nav ne bi zimanê tirkî ne. Piranîya van navên hatine guhertin navên kurdî, erebî, Lazî, Çerkezî, Ermenîkî, Gurcîkî ne. Navê hinek gundan jî bi hinceta ku wateya wan

nexweş bûye, yan gotina wê bi zehmet bûye, yan jî li nêzikî wê gundekî din bi heman navî yan jî nêzikî wî navî hebûye ku ji bo tevlihevî çênebe hatine guhertin. Herêmên herî pir navê gundan lê hatine guhertin Herêma Rojhilata Anadoluyê, Herêma Başûrê Rojhilata Anadoluyê û Herêma Deryaya Reş e. (Tunçel, 2010: 23-34)

Li Dêrikê berî ku navê gundan yên bi kurmancî werin guhertin û navên tirkî li wan werin kirin, ango di destpêka salên pêşî yên Komara Tirkîyê de, di kar û barê fermî de navê gundan yên kurmancî hatine bikaranîn û di nasnameyên gelek mirovên temenmezin de ev nav bi hin guhertin û xeletiyên biçûk hîn jî heye. Di listeyên hilibjartinê de, di beşê jidayikbûn û cihê ku di nifûsê de lê qeydkirî de em li gelek navên bi vî awayî rast hatin. Wek mînak ji bo navê Kevirşîn'ê "Kevershin", ji bo navê Bixur'ê "Buğur" ji bo navê Tilbisim'ê "Telbisim" hatîye nivîsandin. Navê van her sê gundan yên bi tirkî îro bi rêzê bi vî awayî ne: Göktaş, Derinsu, Tepebağ. Piştî ku navê gundan hatîye guhertin em dibînin ku navên gundan yên bi tirkî bi çar awayan hatine çêkirin. Awayê yekemîn ev e ku navê gundan yên bi kurmancî ji wateyên xwe yên bi kurmancî hatine wergerandinî tirkî. Wek "Germik-Ilıca, Bizmaro-Çivili, Guhera Dirêj-Uzunova". Awayê duyemîn ev e ku navê hin gundan yan wek kurmancîya wan yan jî bi nêzikaya fonetîka wan ya bi kurmancî hatîye çêkirin. Wek "Gamir-Gamır, Devşil-Defşil, Lal Hesso-Lal Hasso, Sereb-Serap, Beyrok-Böğrek, ". Awayê sêyemîn navê hin gundan li gor xwezaya wan, erdnîgarîya wan, hatîye çêkirin. Wek "Bixur-Derinsu". Li Bixurê aveke kûr heye, navê gund yê bi tirkî ji ber vê avê hatîye çêkirin. "Derin-su" tê wateya "ava-kûr". "Rebet-Hisaraltı" Li Rebetê keleyek heye û navê wê yî bi tirkî tê wateya "binya kelê". "Belotî-Üçtepe" Li Belotîyê sê girê mezin heye, navê gund yê bi tirkî tê wateya "sêgir". Awayê çaremîn jî ev e ku, navê hin gundan jî nakeve van her sê kategorîyan jî, navên kêfî, texmînî li wan hatîye kirin. Wek "Çıldiz-Adakent, Girêsor-Bayraklı, Xırar-Dumanlı". Ji van mînakan jî tê fêmkirin ku navê gundan yên bi tirkî, navên "çêkirî" ne, ne navên dîrokî, çandî û resen in.

Ji ber qedexebûna bi gelemperî ya li ser kurdî û guhertina navên bi kurmancî bûye sedem ku navê kuçe, kolan û taxan yên bi kurmancî ji aliyê nifşê biçûk bên jibîrkin. Ev yek dibe sedema ruxandina pira di navbera nifşê mezin û yê biçûk de. Ji ber ku di gelek çîrok û serpehatîyên nifşê mezin de navê van kuçe, kolan, tax û herêman derbas dibe. Ji bo ku ev xeterî ji holê rabe divê navê van cihan yên resen, li wan were

vegerandin. Navê kurmancî yê resen tên ji bîrkerin lê ji hêla din ve navên tirkî û yê kurmancî yê ku di van salên dawîn de ji alîyê şaredarîyê ve hatine dayin jî ji alîyê gel ve nehatine pejirandin.

Li herêma Dêrika Çîyayê Mazî navê jîngehan, ango navê Dêrikê û gund û mezrayên wê li gor van sedeman li wan bûne: Kesê jîngeh ava kirine yan şên kirine (Ûsibê Pîrê, Gundikê Hecî Hesên, Qesra Qenco), taybetmendîya erdnîgarîya jîngehê (Mezra Newalê, Mezra Gêrî, Kendal); riwekên li herêmê nav daye jîngehê (Tawîk, Kanîzeytûn, Kudir); navê hinek jîngeh ligel taybetmendîyên wan ê erdnîgarî û xwezayî bi navê regekê re çêbûye (Girê Sor, Kevirşîn, Xirbêreş); navê hin jîngehan li gor avahîyekê li wan bûye (Dêrik, Birc, Qesrîk); navê hin jîngehan ji ajalekê hatîye (Xirbê Gura, Kanya Ga, Golika Geryayî); navê hin gundan di heman demê de navê alavekê ye (Bizmaro, Kelek, Qamçîya); navê jîngehên hemnav li gor hêlan yan jî li gor eşîran ji hev hatine veqetandin (Germika jêr, Germika Jor, Bizmarê Metînan, Bizmarê Menda); navê hin jîngehan ji şûnwarên li der û dora wan çêbûye (Xirbêreş, Xirbê Belek, Xerabreşk), navê hin jîngehan bi wateyên razber çêbûye (Selamet, Heyalê, Heramîyê); navê hin jîngehan bi lêkeran, li ser rewşa avakirina jîngehê yan jî bi bûyerekê ve têkildar e: (Gamir, Zorava, Tirbamamo) Ji bilî van sedemên dîyar, navê gelek jîngehan jî yan bê sedem in yan bi demê re sedemên wan hatine jibîrkerin yan jî bi zimanekî din in: (Taşît, Ûrt, Mixat, Ofî, Mavan) û hwd.

Li gel navê jîngehan, em di navê teşeyên erdnîgarî yê wek zinar, gir, çem, gol û hwd. de û di navê wargehên civakî, çandî yê wek şûnwar, mezel, war û hwd. de jî dibînin ku di awayê navlêkirinê de bi awayeke xurt ji xwezayê sûd hatîye wergirtin. Ji ber wê di navê jîngeh, teşeyên erdnîgarî û wargehên civakî de em gelek mînakên navê riwekan, ajalan, taybetmendîyên erdnîgarî û xwezayî, reng û rengdêrên guhertî dibînin. Navê jîngehan yê wek ‘‘Tawîk, Kanya Ga, Bixur, Guhera Dirêj, Xerabreşk’’; navê teşeyên erdnîgarî yê wek ‘’, Girê Niska, Kura Kulîlkê, Korta Talîyê, Zinarê Qertel, Newala Gura, Girê Çala, Goltatîn, Lata Şîn, Çemê Zuha’’; navê wargehên civakî yê wek ‘‘Warê Biîvkê, Zîyareta Darbero, Xirbê Mitik, Holê Gezo’’ mînakên vê yekê ne. Mirov dikare ji ber van mînakan bêje di awayê navdayinê de nêrîneke xwezayî serdest e û ev nêrîn di heman demê de encama jîyana gel ya di nava xwezayê de ye.

Ji bilî nêrîna xwezayî, hîmeke girîng ya di awayê navdayinê de xwedî nirxeke mezin e “mirov û jîyana civakî” ye. Bi girîngîya nirxê mirovan û jîyana civakî, navê jîngehên wek “Ûsibê Pîrê, Warga Xensê, Qesra Qenco”; navê teşeyên erdnîgarî yên wek “Kura Husênîk, Qulika Ezîzê Biro, Korta Silîmo, Qeşa Şaxê, Ça Warê Hiço, Korta Kûrê, Kura Zîvkera, Girê Etara, Tatê Kiraşo”; navê wargehên civakî û çandî yên wek “Ziyareta Baba Emer, Sîn û Seydoş, Ziyareta Bê, Mezele Kaliko, Zeytûnê Çêço, Rêya Aşa” û hwd. hatine dayin. Di van navan de mirov û jîyana mirovan ya civakî xuye ye. Di van navan de mirov yan avakar e, yan kuştî ye, yan lehengê bûyerekê ye, yan kaşîf e, yan xwedî nirxeke olî, bawerî ye... Di gelek navan de jî em hêmayên jîyana civakî, aborî, çandî, bawerî û hwd. dibînin.

Di hinek navan de pêkan e şopa çanda gelên ji derveyî kurdan û olên ji derveyî misilmantîyê jî were dîtin. Di navê jîngehan û teşeyên erdnîgarî de gelek bêjeyên wateya wan ne dîyar hene. Ev navên ne dîyar hêmayên şaristanîyên kevn, ol û netewên guhertî ne ku li vê herêmê bûne serdest. Navên wek “Tûrcel, Mancêl, Êrge (Êlge), Mîşo, Meqşîkorko, Hiço, Majê, Meqso, Qerengoz, Herêzm” û hwd. ji aliyê zimanên Suryanîyan, Ermenîyan û şaristanîyên kevn ve divê were lêkolîn. Ji navên wate û zimanê wan ne dîyar hinek jê pêkan e bi kurdîya kevin bin jî. Ligel hin hêmayên Mesîhîtiyê yên wek xaç û mezelên tatîn yên ku me li hin şûnwaran dîtin; navên wek “Dêrik, Dêra Çolê, Dêra Metînan, Dêrkalos, Dêrîşk, Kanîbindêrê, Bîra Dêrê” û hwd. ku bêjeya “dêrê” tê de derbas dibe ew jî hêmayên ola Mesîhîtiyê ne, tê vê wateyê ku di demekê de li vê herêmê milletên ola wan Mesîhîti bûye bûne serdest.³¹ Pirsra ku divê mirov bipirse ev e, “Miletên ev şaristanî ava kirine kî nin? Ev millet di kîjan deman de bûne serdest?” Bersîva van pirsan dêbi lêkolînên dîroknasan û şûnwarnasan derkeve holê. Lê belê li gor dîroka der û dora Dêrikê, bi taybetî ya bajarê Mêrdîn, Dîyarbekir û Ruhayê mirov dikare bêje pêkan e ev şaristanîyên kevin yên Suryanîyan, Ermenîyan û yan jî Roma û Bîzansîyan bin; lê dibe Kurdên Mesîhî jî hebin, ji ber ku “dêr” bi xwe bêjeyek kurdî ye û bi navê dêrê re hinek navên din jî yên bi kurmancî em dibînin. Wek mînak ji van bêjeyên jor “Dêrik, Dêra Metînan, Kanîbindêrê, Bîra Dêrê” bi tevayî bi kurmancî nin. Dibe “kalos” ji bêjeya “kolos” guherî be ku di kurmancî de tê wateya “pot, qot”ê zîgara û ji xwe cihê ku ev şûnwar lê ye herêmeke bi gir û zînar e. Ev bêje li herêma Dêrikê di navê şeweyek cil û berg de di peyva “kum û kolos” de hîn jî heye.

³¹ Wêne 10.

“îşk” li herêma Dêrikê di wateya cûreyek “girêk” de tê bikaranîn. Pêkan e ji koka “hişk”ê hatibe.

Mirov dikare bêje navên kevn bi gelemperî hatîye parastin. Gundên ku dest guherîne, xwedîyê wan û şênîyên wan hatine guhertin bi piranî navê teşeyên erdnîgarî, herêm û wargehên wan yan qet nehatine guhertin yan jî pir kêr ji wan hatine guhertin. Ji navên li herêma Sefa û gelek gundên li herêmên din yên dest guherîne ev yek bi awayeke eşkere tê fêmkirin. Sefî ji herêma Çewligê hatine li herêma Dêrikê bi cih bûne. Dema vê hatinê ne dîyar e. Sefî û gelek eşîrên din ku bi navê “Mehelî” tên bi navkirin Kurdên Zaza nin û anha jî ligel kurmancî bi zazakî jî dipeyivin. Lê ku mirov li navê gund û mezrayên wan, li teşeyên erdnîgarî, herêm û wargehên li herêma Sefa dinêre mirov dibîne ku piranîya navê wan bi kurmancî ne. Gund û mezrayên eşîra Sefa lê dijîn ev in: Kwêtê (Kwêtû), Şawerdî, Sîyamed, Qamçîya, Kato, Silik, Kunder, Xirbêreş, Kanîzil, Hedreş, Hoz, Zook, Kanyagê (Kanyaga), Kurşêran, Kurbeşk, Devşil, Keloşk, Goma, Dirik, Gamir, Guhera Dirêj. Li van herêman navê ku me dîtî bi piranî navên kurmancî bûn. Kêr be jî di hinek navan de taybetmendîyên zaravayê zazakî hene. Navê jîngehan yên wek “Kwêtû, Kato, Hoz, Goma”; navê hinek teşeyên erdnîgarî yên wek “Gomekê Zereş, Kanya Linco, Wargê Ristam, Newala Çewligê” û navê hinek malbat yên wek “Mala Kal Hes, Mala Kal Nebî, Mala Mi (Miê), Mala Etikê” dibe ku li herêma Çewligê hebin ku bi xwe re anîbin li vir bikaranîbin; yan jî ev nav li herêma Dêrikê lê bi zaravayê zazakî li wan kiribin.

Sedemên herî xurt yên navdayina der û dorê, daxwazîya naskirin, ji hev cudakirina teşeyan û serwerîya li ser xwezayê ye. Di navdayina teşeyên erdnîgarî de ya girîng zêdebûna tiştan e. Li gundekî heger ji teşeyê erdnîgarî yek tenê hebe, bi piranî navekî taybet li vê teşeyê nehatîye kirin. Di rewşên weha de piranî teşe wek “girê gund, gola gund, mezal, çem û hwd” hatîye bi navkirin. Lê ku ji vê teşeyê dudu û zêdetir hebe, ji bo ku ji hev werin veqetandin şênîyan her yek navekî cihê li wan kiriye.

Navên toponomî bi awayeke vekirî ji bo têkilî û desthilatdarîya mirovan ya li ser erdnîgarîyê pêwîst e. Mirov bi xêra van navan serwerîyê li erdnîgarîyê dike. Ev navên toponomîyê tunebe mirov nikare planan li ser jîyana xwe ya rojane û demên hîn dûr çêke, bi mirovên din re li ser der û dorê li hev ke, der û dora xwe tarîf bike, navnîşana deyne. Navdayina teşeyên erdnîgarî, herêman û wargehan di jîyana gundewarî de gelekî

girîng e. Ev pêdivî li nava bajaran bi navdayina kuçe, kolan û taxan; lê li herêmên gundewar, bi navdayina gir, zinar, çem, kanî, rast, guher, mezel, herêm, wargeh û hwd. tê çareserkirin. Me çend heb hevokê şênîyan ji bo ku bibe mînak tomar kir: ‘*Sibê em ê erdê xwe yî Korta Talîyê biçînin.*’, (F. Fitin, 2014) ‘*Mi do pezê xwe biribû hêla Herêzmê. Li vegerê ez di alîyê Gola Kulîlkê re hatim. Ez li wir lê hayil bûm gi karek mi ne xuyayi.*’ (Ş. Xarok, 2014), ‘*Ez li Kortika Mezel bûm Hesên ban min kir (bi telefonê), heya ez hatim ber Girê Çala mi dî way Mehemed ji hêla Kêldizkê xwe bera jêr didi.*’ (S. Tilbisim, 2015), ‘*Sibê erebe yê li Kortika Dara li benda me bi.*’ (D. Xarok, 2014) Di van mînakan de jî xuyaye ku heger mirova nav li der û dora xwe nekiriba, nikarîbûn di derheqê serpêhatîyên xwe de bipeyivin, têkilîyê bi hev re û bi dora xwe re dînin, li ser pêşeroja xwe planan çêkin. Mirov dikare bêje li Dêrikê, bi taybetî jî li herêmên jîyana gundewarî lê serdest e, navdayina der û dorê gelekî xurt e. Gav bi gav, hust bi hust, kevir bi kevir nav li deveran bûye. Li gelek cih me dît ku herêmên bi qasî pêncî-sed metrî ji hev dûr jî bi navan ji hev hatibûn cudakirin.

Piştî navê teşeyên erdnîgarî, wek mijara sêyemîn ya onomastîkê beşa ethnonymê, êdî em dikarin li navê komên mirovan yên wek eşîr û malbatan hatine dabeşkirin binêrin.

IV. NAVÊ EŞÎR Û MALBATAN LI HERÊMA DÊRIKÊ

Li Tirkîyê di 21.06.1934'an de bi zagona 2525'ê li ser her mirovekî hatîye ferzkirin ku paşnavêkî bistîne. Li gor vê zagonê paşnavên tê de peyamên wek paye, peywirên fermî, navê eşîr û malbatan, navê netew û nijadên bîyanî, paşnavên wateya wan li derî edeba umûmî, kerax û pêkenok hatîye qedexekirin.³² Li Dêrikê û herêma wê ligel paşnavên fermî, ji bo naskirin û nasandina kesan, navê eşîr û malbatên wan jî tên bikaranîn. Bi taybetî nişê mezin bi paşnavê mirovan nizanin, zanibin jî ji dêvla wan bi pîranî navê bav û kalên wan û heger hewce bike navê eşîr û malbatên wan bikartînin. Di çarçoweya xebata binbeşa etnonîmê ya onomastîkê de me ji herêma Dêrikê navê eşîr û malbatan tomar kir û me ev nav li gor awayê çêbûna wan sinifandin. Armanca etnonîmê bi awayê gelemperî famkirina awayê çêbûna navê netew, gel, eşîr, malbat û komên din yên civakî ye. Li vir em ê tenê behsa navê hemî eşîr û hinek malbatên li navenda Dêrikê bikin. Ji ber ku navê malbatan gelek in, tenê yên ku ji awayê çêkirina navan re hêjayî mînakdayinê ne hatine tomakirin.

IV.1. NAVÊ EŞÎRAN LI HERÊMA DÊRIKÊ

Li navenda Dêrikê û herêma wê bi giştî me navê 35 eşîran tomar kir. Ji van eşîran navenda gelean Dêrik û herêma wê ye. Lê navenda hinek eşîran jî cihên dûr yan nêzîkî herêma Dêrikê nin. Ji ber weha, girseya van eşîran li herêma Dêrikê hindik e, lê bi hindikayî be jî ji ber ku li vê herêmê ev eşîr hene me navê wan jî tomar kir. 35 eşîrên

³² http://www.nvi.gov.tr/Files/File/Mevzuat/Nufus_Mevzuati/Kanun/pdf/soyadi_kanunu.pdf

ku me navê wan tomar kirine, li gor rêza alfabetîk ev in: Badilî, Bêreşî, Caferî, Delikî, Dewrêşekî, Ebasî, Eboyî, Eloyî, Esomikî, Etmankî, Hamî, Hemzoyî, Îsayî, Îskî, Îzolî, Kîkî, Mamûdî, Mamûdkî, Mendayî (Mendî), Metînî, Mistefakî, Pîranî, Pîroyî, Porî, Rûtî, Salkî, Sarxwanî (Salxwanî), Seferkî, Sefî, Sorkî, Şaqûlikî, Şêxî, Şikakî, Tat, Xidrî.

Ji van eşîran Badilî, Îzolî, Kîkî û Şikakî ne eşîrên Dêrikê yên navendî ne. Eşîra Badilî bi piranî li herêma Ruha û Dîyarbekirê; eşîra Îzolî li herêma Ruha, Dîyarbekir û Dêrsimê; eşîra Kîka li herêma Mêrdîn û Qoserê, eşîra Şikakî li Rojhilat, Rojava, Başûr û hin bajarên Bakurê Kurdistanê bi cih û war e. Malbatên ji van eşîran di demên kevn de ji herêmên cuda koçî Dêrikê û herêma wê kirine. Me navê eşîrên li herêma Dêrikê, li gor çêbûna navê wan bi şeş awayî dabeş kir: Navê eşîran yên ji navê mirovan çêbûne, yên wek rengdêran çêbûne, yê ji navê herêmekê çêbûye, yê ji navê lebateke mirovan çêbûye, yê ji navnasekê çêbûye û yên wateya wan ne dîyar.

Piranîya navê eşîran ji navê mirovan çêbûye. Ev kesên ku navê xwe dane eşîrên xwe, ji ber ku gelekî dûr diçin û ti eşîra bi awayê nivîskî şecereya xwe negirtîye, nayin zanîn, tenê navê wan maye. Navê mirovan yên ku bûne navê eşîran navê mêra ne. Di navê eşîran de navê jinan tune ye. Mirov dikare bêje navê van kesan, li dû wan li eşîrên wan hatine kirin û ev kesên ku navê wan li eşîrên wan bûye divê xwedî hin taybetmendiyên girîng bin û di demên xwe de divê kesên bi bandor bin. Taybetmendiyên ku wan bi bandor bike dibe mêrxasîya wan, dewlemendîya wan, hebûna gelek zarokên wan yên law yan jî wesfên serokatîya wan be. Bi taybetî, ji ber ku di civatê de pederşahî serdest e, hejmara zarokên law ji bo serjimêriya eşîrê girîng e. Ji navên ku me tomar kirine navê eşîrên ku ji navê mirovan çêbûne û navê mirovên pêşeng ku navê wan li eşîrên wan bûne ev in: Caferî (Cafer), Delikî (Del), Dewrêşekî (Dewrêş), Ebasî (Ebas), Eboyî (Ebo), Eloyî (Elo), Esomikî (Heso, Eso+Emîne, Emik), Etmankî (Etman), Hamî (Hamî), Hemzoyî (Hemze), Îsayî (Îsa), Mamûdî (Mamûd), Mamûdkî (Mamûd), Mendayî-Mendî (Mendo, Menduh, Memduh), Metînî (Metîn), Mistefakî (Mistefa), Pîroyî (Pîro), Sarxwanî-Salxwan (Sarûxan), Seferkî (Sefer), Sefî (Sefa), Xidrî (Xidir). Li ser hinek navan vegotinên cuda yên endamên van eşîran hene. Wek mînak hinek endamên eşîra Metînî, navê eşîra xwe bi Çîyayê Metînan yê li Başûrê Kurdistanê ve girêdan. Ev agahî rast be jî di ya dawî de li gor me ev nav dîsa ji navê ‘‘Metîn’’ hatîye. Beşdarvanekî ji eşîra Esomikî li ser navê eşîra xwe ji me re weha got: ‘‘Navê

kalikê me Hesên bûyi. Hesên bi navê ca xwe Emînê hatîyi xwendin.'' (A. Dêrik, 2015) Li gor vê vegotinê navê Hesên di ya dawî de divê bûbe ''Eso'' û navê Emînê jî bûbe ''Emo, Emê''. Divê her du nav bi hev kelijîbe û bûbe ''Esomikî''. Di navê malbatan de navê jinan gelek in, lê di navê eşîran de em hew di navê vê eşîrê de navê jinekê dibînin. Di rastîya xwe de ev eşîr ji taybetmendîyên eşîrî bêtir wek malbatekê ye ku di nava eşîra Ebasî de ye. Sedema ku me ew di nava eşîran de tomarkir, awayê bilêvkirina navê wê ye. Her çend taybetmendîyên wê yî malbatî bêtir bin jî, li herêma Dêrikê navê malbatekê bi vî awayî tune. Navê hemî malbatan bi bêjeya ''mal''ê dest pê dike, wek ''Mala Oso, Mala Hecî Mikaîl, Mala Meaçê'' û hwd. Lê ji bo ''Esomikî''yan bêjeya ''mal''ê nayê bikaranîn, awayê bilêvkirina navê wê dişibe navê hin eşîrên din, wek ''Seferkî, Mistefakî, Dewrêşekî, Rûtî'' û hwd. Qertafa ''-î''ya di dawîya navê eşîran de ji navekî navek din çêdike û wateya aîdîyetê, cihê jêderê û hwd. dide. Wek ''Dêrikî'' kesê ji Dêrikê ye, ''Metînî'' kesê ji eşîra Metînî ye. Ji ber wê divê ev nav navê eşîrekê be û di demên nedîyar de bi awayê tifaqê di nava eşîra Ebasî de cî sitendibe. Ji xwe li herêma Dêrikê bêyî têkilîyeke xwînî, di nava eşîran de em gelek tifaqên bi vî awayî dibînin.

Di nava van navan de yê pêdivîya wê bi şîroveyê heye navê ''Delikî'' ye ku li gor vegotinekê ev nav ji navê ''Del'' tê. Agahîya di derheqê navê ''Del'' de, di çîroka gelêrî ya ''Şewlê Mezrayî'' de derbas dibe. Di vê çîrokê de Del, navê hevaleyê ''Şewl'' e. Di cihekî çîrokê de vegotinekê bi vî awayî derbas dibe: ''*Şewlê Mezrayî, Delê Dinayî, Çiplaxê Bindayî; her sê şêrê vî çîyayî...*'' (R. Mezrê, 2014) Li gor vê vegotinê Del ji herêma ''Dina'' ye. Li gor beşdarvanekî temenmezin ku ji eşîra Delikî bû, dema ku varyanteke vê çîrokê ji me re vegot behsa gundê ''Dina'' kir û got ''*Ev gund li hêla Wêranşar i û em jî ji neslê Del in, ji ber wê ji me ri gotini Delikî.*'' (Ş. Dêrik, 2014) Her çend navê Delikî wek ji navê cihekî çêbûbe jî em dibînin navên wek Seferkî, Mistefakî û Dewrêşekî jî bi heman şêweyê û ji navê mirovan çêbûne. Li gor vî beşdarvanî, Del bi xwe ji ola Êzîdî bû, ji ber wê dibe ev nav di Êzdayetîyê de hebe û dibe kurtkirina navekî be. (Wek Delîl, Delal...)

Di beşa duyemîn de navên wek rengdêran çêbûne hene: Rûtî, Bêreşî, Sorkî û Şaqûlîkî. Bêjeya ''rût'' di wateya ''tazî'' de ye. ''Bêreşî'' ji bêjeya ''reş''ê, ''Sorkî'' ji bêjeya ''sor''ê û navê Şaqûlîkî ji bêjeya ''şaqûl''ê çêbûye. Di van navan de ji bilî

wateyên yekemîn, hin wateyên mecazî jî hene. Navê “Rûtî”, di wateyên mecazî de dibe di wateyên wek “xizan, keçel” de jî were bikaranîn. Navê Bêreşî, di wateya “kesên bêreş” de dibe were bikaranîn û dibe were wateyên wek “kesê şînnegirtî, kesên cilê reş li xwe nekirî” û hwd. Navê “Sorkî” dema ji bo mirovan were bikaranîn di wateya “kesên sor, sorik, kej” de dikare were bikaranîn. Navê “Şaqûlikî” dema ji bo mirovan were bikaranîn dibe di wateyên mecazî de were wateya “kesên wek şaqûlan gilover, kesên bi şaqûla dileyizi” û hwd. Lê dema ku ev nav wek navên eşîran tên bikaranîn ji van wateyên xwe gişan dûr tên bikaranîn, wateyê wan yê neyênî tune. Sedemên ku ev nav tên van wateyan, wateya di koka bêjeyan de û “rengdêrbûna” wan e. Du buşdarvanên ji eşîra “Şaqûlikî” li ser navê eşîra xwe gotin ku ev nav ji “şah-qûlû” hatiye ku ev nav di dîrokê de navê kesekî alîgirê Şah Îsmâîl e di sala 1511’an de li hemberî Osmanîyan serhildaye. Li pê wî ev nav bûye wek navê Turkmenên Şîî yê alîgirên Şah û Îranîyan.³³ Ji xwe bêjeya “şahqûlû” tê wateya “qûlê şah”. Ango heger ev agahîya ku her du buşdarvanan da me rast be divê ev eşîr eşîreke nijadtirk be.

Li ser navê “Bêreşî” du endamên vê eşîrê yê me hev dîtî bi wan re çêkir, kême zêde tiştên nêzîkî hev ji me re gotin. Li gor van vegotinan pêşîyên wan sê bira nin û ji herêma Şengalê hatine û ji ola Êzîdî bûne. Gel ji wan re gotine “ba-reş-î” ango yê ji başûr hatine. Li gor van agahîyan mirov dikare bêje ev nav di demên pêş de bûye “Bêreşî”. Li herêma Dêrikê bayê ji jor, yê ji çîyê ango ji bakur tê wek “bayê kur”; bayê ji başûr jî tê wek “bayê reş” tê bi nav kirin. Ji bo başûr anha jî kesên ji nifşê mezin bêjeya “bareş” bikartînin. Pêkan e bêjeya “başûr” bi awayê metatezê ji bêjeya “bareş”ê hatibe guhertin. Bêjeya “ba” di nava peyvê de bi awayê xwezayî tê tewandin û dibe “bê”. Ji bilî bi awayê xwerû, di hin biwêjan de ev bêje bi halê xwe yî tewandî tê bikaranîn. “*Li ber bê çû, li ber bê ket, bê bir*” û hwd.

Di beşa sêyemîn de navê eşîrê tenê heye ku ji navê herêmekê çêbûye. Navê eşîra “Pîranî”, ji navê gundê Pîran yê bi Şemrex ve girêdayî ye. Endamêkî vê eşîrê ji me re got, “*Hinek merê me hîn jî li Pîran in. Em û hinek malên wan bi ser hev de diherin û tên.*” (S. Dêrik, 2015) Ji ber ku ev nav di heman demê de navê herêmekê ye, ji endamêtiya eşîrêkê bêtir, aîdiyeta vî “cîh”î tîne bîra mirov. Mirov dikare bêje li Dêrikê

³³Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Prof Dr. İbrahim Aslanoğlu, “Aleviliğin Tarihsel-Sosyal Temelleri” <http://w3.gazi.edu.tr/~iarslan/aleviligintarihsel.pdf>

navê ‘‘Pîranî’’ ne wek navê eşîrekê ye, ji wê bêtir navê girseyek mirovên bi eslê xwe ji Pîran in. Ji ber ku li Pîran zîyareta Pîr Xetab heye û Pîranîyên li Dêrikê dijîn xwe ji binemala wî dihesibînin, di nava gel de malbatên Pîranî wek ‘‘şêx’’ tên pejirandin û têkileyê wan ya xwînî bi hev re heye, ev kom jî dikeve statuya eşîran. Hêjayî gotinê ye bi sedema zîyareta Pîr Xetab, di nava malbatên Pîranî de navê ‘‘Pîro’’ û ‘‘Xetab’’ wek navê lawan gelkî hatîye bikaranîn. Ev her du nav ji bilî malbatên Pîranî, di nava eşîr û malbatên din yê Dêrikê de jî hene. Wekî navê Pîranî, bi taybetî li herêma berîya Dêrikê aîdîyetên li ser navê herêman, lê di wateya eşîran de gelek in. Wek mînak Tarînî, Erbanî, Heramî, Hezazî, Şêbî, Meşkîni, Çayî (Çîyayî) û hwd. Em li hin gundan li malbatên ku van navan bikartînin rast hatin. Wek mînak li ser pîrsa me ya ku hun ji kîjan eşîrê nin, bersîvên bi vî rengî hatin dayin: ‘‘*Em Tarînî nin, bav û kalên me ji Tarîn hatine vir.*’’ ‘‘*Em Tarînî nin.*’’, ‘‘*Em Heramî nin.*’’... Mirov dikare bêje heger pêvajoya eşîrbûnê di mecra ya xwe ya xwezayî de bimeşîya, di demên pêş de dibû ku ev aîdîyetên li ser van gundan bibûna eşîrên xweser. Lê ji ber ku komên civakî yê wek eşîra organîze bûne, ji ber sedemên ku berê jî me behs kirûbû her ku diçe têk dihere, ev yek dêbi vî awayî encam nede.

Di beşa çaremîn de navê eşîra ‘‘Porî’’ heye ku ev nav di halê xwe yî anha de divê ji koka bêjeya ‘‘por’’ hatibe. Lê bi heman bêjeyê li bakurê Kurdistanê navê gundan heye. Dibe têkilî di navbera van gundan û vê eşîrê de hebe. Bi vî awayî be jî navê eşîrê ji navê lebateke mirovan hatîye çêkirin. Her weha li herêma Dêrikê wek navê jinan jî ‘‘Porê’’ tê bikaranîn. Ji ber wê pêkan navê vê eşîrê ji navê jinekê jî çêbûbe. Eşîra Porî di demên ne dîyar de ji herêma Wêranşar hatîye li gundê Dêrikê li Dumirlîyê bi cih bûye û di demên berê de di nava eşîra Ebasî de cih sitendîye. Ji vê mînakê û çend heb mînakên din jî tê fêmkirin ku di demên berê de hin eşîrên biçûk xwe bi eşîrên mezin girtine û bi wan re tevgerîyane. Bi vî awayî eşîrên mezin, wek konfederasyonan ava bûne.

Di beşa pêncemîn de navekî bi awayê navnasekê çêbûye heye. Ev nav navê eşîra ‘‘Şêxî’’ ye. Mirov dikare bêje ev nav ne ji navê mîra yê ‘‘Şêxmûs’’ hatîye. Ji ber ku ev eşîr wek malek ûcax, şêx tê naskirin, pêkan e navenda vê eşîrê malek şêx be û di demên dawî de malbatên xwe bi wan ve girtibin jî wek ‘‘şêx’’ hatibin pejirandin. Ev eşîr bi giranî li herêma Qoserê dijî, lê li berîya Dêrikê jî, piştî reforma erdan li çend heb gund û mezra bi cih bûne.

Di beşa şeşemîn de navê eşîrên Salkî, Tat, Şîkakî, Badilî, Îskî, Îzolî û Kîkî heye ku wateya van navan bi misogerî nayê zanîn. Endamekî eşîra Kîkî wateya navê eşîra xwe bi bêjeya ‘‘Kek’’ê ve girêda û got ev nav ji herêma Mûsilê hatîye ku tê gotin koka eşîra wan ji wir tê. Li gor vî beşdarvanî, ji Mûsilê du bira bi hev re hatine û ji wan re gotine ‘‘kekan’’ ango du birayên hev. Ev nav di nava demê de guhertîye û bûye ‘‘Kîkan’’. Li dû wê jî bûye ‘‘Kîkî’’. Bêjeyên Tat û Şîkakî du bêjeyên di erebî de xwedî wate ne. Heger ev her du nav ji erebî hatibin, ‘‘Şîkakî’’ di wateya ‘‘muxalif, dijmin’’ de ye. Tat jî li gor beşdarvanekî vê eşîrê tê wateya ‘‘kesên bîyanî, kesên lal û nezan’’ Bi taybetî ji ber ku eşîra Tatan eşîreke nijadereb e, divê mirov li wateya vê bêjeyê di erebî de bigere.

Li dû navê eşîran em ê nuha li navê malbatan binêrin bê ka navê malbatan li herêma Dêrikê bi çi awayî çêbûne.

IV.2. NAVÊ MALBATAN LI HERÊMA DÊRIKÊ

Li herêma Dêrikê wek komên sosyolojîk, ji aliyê mezinbûna xwe ve li dû eşîran ‘‘malbat’’ tên. ‘‘malbat’’ û ‘‘ezbet’’ du bêjeyên di heman wateyê de tên bikaranîn. Ji bo mezinbûn yan jî çêbûna malbatan pîvaneke eşkere tune. Sê çar heb mal jî dikare malbatekê çêke, sed mal jî dikare wek malbat were bi navkirin. Li navenda Dêrikê û li gundên wê mînakên her duyan jî hene. Ji bo ku malbatek çêbibe divê çend heb nifş derbas bibin jî ne dîyar e. Di hinek mînakên de em dibînin piştî sê nifşan malbatek ava bûye, di hin mînakên de jî mirov dibîne ji heft, heşt nifşan malbatek çêbûye. Malbatên ku bi nifşên hindik çêbûne bi piranî ji aliyê serjimêriya xwe ve, li gor ku ji nifşên hindik çêbûne, qerebalix in. Divê were gotin pênasa têgeha ‘‘nifş’’ê jî li gor civakê ne têgeheke zelal e. Li ser pîrsa me ya li ser vê têgehê, du pênas derketin pêş. Li gor hinek beşdarvanên temenmezin her bavek nifşek e. Ango ji bo ku mirovek wek nifşekî were hesêb divê bûbe bav yan jî hatibe wexta zewacê. Hinek beşdarvanên din jî gotin her zarokê bîst salî nifşek e. Li gor me ev her du pênas ne dîrî hev in. Ji ber wê me jî pîvana bîst salî pejjirand ku ji xwe ev sal di heman demê de li gor civata Dêrikê temenê zewacê ye jî. Heger kurê yekî bibe bîst salî, kurê wî dibe nifşê yekemîn, ew dibe nifşê duyemîn, bavê wî jî dibe nifşê sêyemîn.

Di dewsa têgeha ‘malbat’ê de dîsa wek têgeheke sosyolojîk bêjeya ‘mal’ê pirtir tê bikaranîn. Dema kesek navê malbata xwe bêje bi piranî bi vî awayî dibêje: ‘*Ez ji ma(la) Haro mi.*’ Bêjeya ‘mal’ê bi piranî tê kurtkirin û wek ‘ma’ tê bilêvkirin. Di dema pirsan de bêjeya ‘malbat’ê jî tê bikaranîn. Wek, ‘*Navê malbata we çi yi?*’ Lê ji bo famkirina navê malbatê, di pirsan de jî formê ‘*Tu ji kîjan malê yi?*’ bêtir tê bikaranîn. Têgeha ‘malbat’ê û têgeha ‘ezbet’ê di heman wateyê de ne û mirov dikare bêje rêjeya bikaranîna herduyan jî ji bikaranîna ‘ma(l)’ê kêmtir e.

Têgeha ‘mal’ê ji bilî ji dêvla ‘malbat’ê, di heman demê de di wateya malên biçûk yên ji dê, bav û zarokan pêg hatîye jî tê bikaranîn. Wekî bêpîvanîya malbatan, ji bo malên biçûk jî pîvaneke vekirî tune. Lewma di malbatên biçûk de li gel dê, bav û zarokan; bapîr, dapîr, ap û metik jî dikarin di heman malê de bi hev re bijîn.

Ji navenda Dêrikê û gundê wê me gelek navê malbatan da hevdû. Ji ber ku navên ku me dan hevdû gelek bûn, pêşî me ev nav li gor çêbûna wan sinifandin da ku em bibînin bê navê malbatan bi çi awayî çêbûne. Dûv re me ji van navan tenê ji bo mînak hinek tomarkirin. Wek mînak beşa herî zêde navê malbatan yên ji navê mêran çêbûne. Lê tenê me navê çend heb malbatan wek mînak dane ku ev nav bibin mînakê vê beşê. Ji xwe armanca me, wek dokumenter ne civandina navê malbatên li herêma Dêrikê bû. Armanca me ew bû ku ji bo lêkolîna etnonîmê em tespît bikin bê li herêma Dêrikê navê malbatan li gor çi û bi çi awayî çêbûne. Di çêbûna navê malbatan de bi giştî heft awa derdikevin pêş. Navên ji navekî mêran çêbûne, yên bi navnasan çêbûne, yên ji du navê mêran çêbûne, yên bi nasnavan çêbûne, navên di heman demê de navê pîşeyê malbatê ye, yên ji navê jinan çêbûne, yên ji navê mêrekî û jinekê çêbûne...

Herî zêde, navê malbatan ji navê mirovan çêbûne. Ji bilî çend heb navên ji pîşeyên malbatê û çend heb navên ji nasnavekî çêbûye yê mayî giş di vê beşê de ne. Hin mînakên navê malbatên ji navê mêran çêbûne ev in: Mala Qaso, Mala Hilo, Mala Zîya, Mala Haro, Mala Bixdo, Mala Hîko, Mala Dawo, Mala Eyo, Mala Sînên, Mala Seîd, Mala Ozmên, Mala Nebî, Mala Silo, Mala Mamikê, Mala Sêlim, Mala Meaçê... Li gor ku ji mînak jî tê fêmkirin di vê beşê de navên ku em dibînin, tenê ji navê mêrekî çêbûye. Ev kesên ku navê wan li malbatên wan bûne ji nifşên guhertî ne. Yê herî nêzîk nifşê sisîyan e, yê mayî jê dûrtir diherin.

Navê hinek malbat ligel navê mêra, bi navnasê (unvan) wan re tên xwendin. Sedema vê yeke navnasê wî kesê ku navê wî li malbatê hatiye kirin e. Hin mînakên me tomarkirine ev in: Mala Mel Dawid, Mala Mel Emîn, Mala Mel Hesên, Mala Melkinik, Mala Hecî Xalit, Mala Hecî Hemo, Mala Hecî Necîm, Mala Hecî Sînan, Mala Beg, Mala Mîr, Mala Dawid Axa, Mala Şê(x) Emer, Mala Hesên Efendî, Mala Mistikê Efendî... Wekî ji mînakan jî xuyaye, navnasên olî yê wek mele, hecî û şêx ji yê din bêtir in. Navnasên wek axa, efendî, beg, mîr di heman demê de payeyên civakî, siyasî û hîyerarşîyê ne.

Navê hinek malbat ji du navê mêra pêg tên ku ev her du kes bav û law in. Dema ku ji bo naskirina malbatekê navek tenê têrê neke, wê demê bi navê vî kesî re navê bavê wî jî tê xwendin. Ev rewş bi piranî dema di navbera du malbatan de hemnavî hebe derdikeve holê. Bi vî awayî tevlihevî ji holê tê rakirin. Wek mînak li du gundê Dêrikê û li navenda Dêrikê du eşîrên bi navê "Mala Ela" heye. Ji bo ku ev her du nav ji hev were qetandin û her du nav tevlihev nebe, navê bavê Elayan jî tên xwendin: Mala Elayê Mamê, Mala Elayê Birê Hecî Elî. Hin mînakên din bi vî awayî ne: Mala Hesê Eyo, Mala Hesê Biro, Mala Elîyê Beko, Mala Elîyê Eysê, Mala Emînê Mamo, Mala Emînê Oso... Hinek malbat jî ne bi sedema hemnavîyê be jî bi du navan tên naskirin: Mala Osmanê Reşo, Mala Qadê Mehemed, Mala Esê Şakir, Mala Evdê Elî...

Ji bilî navnasan em dibînin navê hinek malbat jî bi nasnavekî (bernavk) re çêbûye. Ev nasnav yan li ser dirûvê kesan, yan jî li ser taybetmendîyeke wan î civakî, dîrokî hatiye dan. Ji van navan hinek jê xwedî çîrokekê ne: Mala Kose, Mala Emoreşkê, Mala Dirêjo, Mala Ciliko, Mala Kizino, Mala Çoq, Mala Kuncî, Mala Çep, Mala Hijîro, Mala Gûpira, Mala Qoyin, Mala Xerêt, Mala Qezencî, Mala Bûbê Qesab... Ev her sê navên dawîn di heman demê de navê pişeyên van malbatan in.

Navê hinek malbat ji navê jinan çêbûye. Ev jinên ku navê wan li malbatên wan bûne yan di demên zû de mîrê wan mirîye û li ser zarokên xwe rûniştine, yan ji mîrê xwe jêhatîtir bûne û yan jî malbata wan ji malbata mîrê wan bibondortir bûye. Çend heb mînak: Mala Siltikê, Mala Fincikê, Mala Fersê, Mala Horê, Mala Şaxê, Mala Zînikê, Mala Zeynikê, Mala Momê, Mala Gewrê, Mala Fatê, Mala Hubrê... Ji bilî van navan navê hinek malbat jî bi navê mêrekî û bi navê dîya vî mîrî tê xwendin ku sedemê

vê yekê jî heman tişt in: Mala Qadê Zeynê, Mala Elê Eysê, Mala Evdê Hemşê, Mala Elîyê Pîrê, Mala Şêxê Zîno, Mala Qadê Eysê...

IV.3. ENCAMA BEŞÊ

Navê eşîr û malbatan ji bo naskirina mirovan wek paşnavan e. Her çend nifşên nuh hînî paşnavan bûbin jî, di nava nifşê mezin de bi temamî û di nava nifşên navîn de jî bi piranî mirov bi navê eşîr û malbatên xwe tên naskirin. Di karên fermî de, li gor zagona paşnavan, paşnavên ji alîyê komarê ve hatîye dayin tên bikaranîn. Ev paşnavên li malbata bûne, bi piranî bi awayê kêfî hatine dayin û têkilîyek di navbera van malbatan de û paşnavên li wan bûne tune.

Di civata Dêrikê de pederşahî serdest e. Merivantîya ji alîyê bavê tê, ji ya ji alîyê dê girîngtir e. Ango herkes li ser eşîr û malbata bavê xwe tê xwendin. Lê xal û xwarzêtî jî têkilîyeke girîng e. Bi piranî kesên ku dîya wan ji malbatên "xuyanî" ne, bi xalanên xwe serbilind in û dibêjin "Ez xwarzîyê filankesê filankes im." yan jî "Ez xwarzîyê filan malê mi." Ji ber têkilîyên pederşahî ye ku piranîya navê eşîr û malbatan ji navê mêran çêbûne. Her çend di civatê de pederşahî serdest be jî, qedr û qîmeta jinan jî bilind e. Bi taybetî jinên mêrê wan dimre û heger wek temen pîr bûbin, dibin wek mêra, pêdivîyên mala xwe yên aborî, civakî dabîn dikin. Ji ber wê jinên navê xwe dane malbatên xwe gelek in. Kêm zêde di her eşîrê de mêrên bi navê dîya xwe tên xwendin hene. Ev nav piştî çend nifşan wek navê malbatê mayinde bûne.

Bi navê mirovan re navê nasnav û navnasên wan jî tê bikaranîn û ev yek ji bo navê eşîrê yan jî malbatê jî tê bikaranîn. Bi piranî navnasên wek hecî, mele û şêx ku navnasên olî nin, bi navê mêran re bûne navê malbatan. Di her eşîrê de malbatên ku navenda eşîrê temsîl dikin ango wek axayên eşîrê ne hene. Ew malbatên ku di navê wan de navnasên wek axa, beg û yan jî efendî derbas dibin, ev malbat in.

Ji bilî navê mirovan navê hinek malbatan ji pîşeyê pêşîyên wan tê. Ji ber ku li herêmê pîşesazî bi xwe kêm e, navê van malbatên ku ji pîşeyan çêbûne jî kêm in. Navê hinek malbat ji dirûvê pêşengê wan çêbûne. Reşbûna wan, kinbûna wan, dirêjbûna wan, kosebûna wan bûye sedem ku navê malbata wan jî bi van pênasan were xwendin.

Navê hinek malbat li ser bûyerekê çêbûye. Ji van bûyeran hinek ji wan wek çîrokan, hinek ji wan wek qerfan tîn vegotin. Bi piranî nîşên mezin van vegotinan dizanin. Navek tenê ji navê jîngehekê çêbûye, çend heb navê din yên ji navê jîngehan çêbûne ji navê eşîrekê bêtir wek navê aîdiyeta jêderekê tîn bikaranîn. Divê were gotin ji ber ku li herêma Dêrikê têkilîyên eşîrtî û malbatî her ku dihere lawaztir dibe, bikaranîna navê eşîr û malbatan jî kêr dibe. Mirov dikare bêje di demên pêş de navê eşîr û malbatan jî dê ji holê rabin û di dewsa wan de dê paşnavê wan werin bikaranîn.

V. ENCAMA GIŞTÎ

Di dawîya vê xebatê de em gîhaştin van encamên li jêr ku li gor rêza xebatê hatîye rêzkirin:

1. Erdnîgarîya Dêrika Çîyayê Mazî ji sê herêmên bingehîn pêk tê. Herêma berîyê, herêma çîyê û herêma Qerecdax. Gelek gund jî di quntara çîyê de, di lêf de hatîne avakirin. Bandora erdnîgarîya van herêman berî her tiştî li ser aborîya gundan heye. Gundên li herêma berîyê, ji ber derfetên çandinîyê, ji gundên din dewlemendtir in. Ji alîyê çandê ve jî guhertinên biçûk di navbera herêman de heye.

2. Aborîya herêmê li ser çandinîyê ye. Ji bilî çandinîyê li herêmê ajalvanî jî tê kirin. Li gor demên berê ajalvanî her ku diçe girîngîya xwe wenda dike. Ji bilî van her du karan, beşa sêyemîn bazirganîya biçûk e. Pişesazî li herêmê pêşneketîye. Li navenda Dêrikê beşek din ya kar baxçevantîya zeytûnan e. Ji ber ku derfetên kar kêr in, ji herêmê, her sal di demên guhertî de gelek malbat wek karkerên demsalî diherin li bajarên rojavayê Tirkîyê dixebitin. Ji bilî koça demsalî, ligel sedemên aborî, ji sedemên şer û pevçûnên li herêmê diqewimin, serjimêrîyeke girîng ji niştecihên herêmê koçî bajarên der dor û bajarên rojavayê Tirkîyê kirine. Herêm, ji alîyê baxçevantî û ajalvanîyê ve xwedî potansîyeleke mezin e, ev yek divê were nirxandin. Di vî warî de gel ne bi rêxistin e.

3. Li ser dîroka kevnar ya herêmê lêkolînên zanistî û agahîyên nivîskî kêr in lê ji pîrbûna şûnwarên li rûyê erdê tê fêmkirin ku herêm ji alîyê şaristanîyên kevnar ve xwedî dîrokek dewlemend e. Bi lêkolînên arkeolojîk dîroka herêmê dikare were

ronîkirin. Ji ber ku hemî eşîr û malbatên li herêmê koka xwe bi dereke din ve girêdidin, Dêrika anha heye di demên nêzîk de hatîye şênkirin. Berî vê şênkirinê Dêrik ji bo çî vala bû, yan jî heger ne vala bû kî lê bû, ev şênî bi ku de çûne naye zanîn. Di derheqê şênkirina navendê de vegotinên cuda hene. Vegotina herî pir derdikeve pêş ya li ser ‘‘Dawidê Kalo’’ ye. Lê di derheqê wî de agahîyên pir û yê misoger tune ye.

4. Niştecihên herêmê bi piranî Kurdên Kurmanc in. Ji bilî wan li herêma Qerecdax li çend heb gund Kurdên Zaza û li berîyê li gundekî welatîyên Ereb dijîn. Heya 30-40 sal berê jî serjimêrîyeke girîng ya navendê ji welatîyên Ermenî û Suryanîyan pêk dihat. Koça ‘‘fîla’’ li dû derbeya leşkerî ya 12’ê Îlonê bi leztir bûye. Mesîhîyên ji Dêrikê barkirine bi piranî li Stenbûl bi cih bûne. Ji ber wê herêm wek ol misilman û wek mezheb jî ji bilî çend heb malbatên Henêfî, li ser mezhebê Şafîî nin.

5. Civat ji eşîr û malbatan pêk tê lê belê ev komên civakî her ku dihere bandora xwe wenda dîkin. Pêla Kurdperwerîyê ku li herêma Dêrikê ji salên 1925’an û vir de hebû, bilindtir dibe, nasnameya ‘‘Kurdûn’’ê dikeve dewsa nasnameya ‘‘eşîrtî’’yê. Ya ku vêya diçespîne çar hîlbijartinên şaredarîyê yê dawîn in. Di her çar hîlbijartinan de jî endamên eşîra bi binketine. Ji bilî pêla Kurdperwerîyê, nasnameyeke din ku xurt dibe ‘‘takekesî’’ ye. Ger mirov berawird bike, hestên ‘‘malbatî’’ jî ji hestên ‘‘eşîrtî’’ xurttir e. Ango li gor rêzê jî bo piranîya mirovan yê girîng Kurdûna wan, takekesîya wan, malbata wan ya biçûk, malbata wan ya mezin û eşîra wan e.

6. Dêrik herêmeke kurmancîaxêf e. Tevî ku piranîya gel bi tirkî jî zane û bi girseyên biçûk be jî li herêmê bi zazakî û bi erebî jî tê peyivandin, zimanê têkilîyê yê yekemîn kurmancî ye. Kurmancîya herêmê xwedî hin taybetmendîyên devokî ye. Di nava gel de mînakên her cûre zargotina kurmancî heye lê ev berhem di bin xeterîya wendabûnê de ne. Her çend kurmancî ziman û zaravayê serdest be jî, di nava nîfşê biçûk de asta peyivandina bi kurmancî kêmtir dibe. Ji bilî asta peyivandinê, di navbera nîfşê mezin û biçûk de cudayîyê dest pê kiriye û di nava nîfşê biçûk de qalîteya peyvê jî lawaz dibe. Sedemên vê rewşê ev in ku perwerde bi kurmancî nayê kirin, di telewîzyon û înternetê de zimanê serdest tirkî ye û bi salan kurdî qedexe maye.

7. Di folklorê herêmê de, berî her tiştî bi bandora modernbûyinê, guhertinên mezin heye. Piranîya kevneşopîyan, cil û bergê mirovan, şîn û şahî, awayê jîyana civakî,

têkilîyên di navbera nifşan de û di gelek warên din de civat diguhere. Ev guhertinên bûne û yên dibin, di derûnîya hin kesên ji nifşê mezin de bandorên neyênî çêkiriye; hin kes jî ji guhertinan xweş in û wan wek pêşketin dipejirînin.

8. Li herêma Dêrikê ji 2792 mirovê ku me navê wan nirxandîye, navê ji % 66,2 kesî bi erebî ye. Di rêza duyemîn de navên kurmancî ji % 11,2 û di rêza sêyemîn de navên tirkî heye, rêjeya wê ji % 6,8 e. Sedemên vê rewşê ev in: Ji ber bawerîyên olî navên erebî pir in. Ji ber sedemên qedexebûna kurmancî navên kurmancî kêmtir in. Ji ber serdestîya tirkî ya di navgînên ragihandinê û perwerdeyê de, navên tirkî di rêza sêyemîn de ye. Ji navê şagirtan tê fêmkirin ku asta navê kurmancî û navê bi tirkî zêde dibe, yên bi erebî kêmtir dibe. Sedema zêdebûna navên kurmancî bilindbûna pêla Kurdperwerîyê û bi awayeke kiryarî sistbûna qedexebûna li ser kurdî ye. Mirov dikare bêje di demên pêş de navên kurmancî dêzêdetir bibe lê rêjeya navên erebî her çend li gor anha kêmtir bibe jî, ji ber sedemên olî û bawerî dê girîngîya xwe biparêze.

9. Di lêkirina navê mirovan de ev pêkar û meylên navdayinê derdikevin pêş: Navê bapîr û dapîran û navê xizmên mirî li zarokan dibin. Bi piranî bav û dê nava li zarokên xwe dikin, lê bapîr, dapîr û xizmên din jî dikarin nava li zarokan kin. Navên tên hilbijartin divê navên xêrê bin, wateya wan xweş bin, gotina wan hêsan bin. Dema çêbûna zarokan wek şev û roj, meh û demsal dibe navê zarok tayîn bike. Hejmara dunavan kêmtir e. Bernav, nasnav û navên xwedî peyamên sîyasî tên bikaranîn. Piranîya şagirtan ji navê xwe hez dikin û bi wateya navên xwe dizanin. Hinek zarok di bin bandora çanda populer de dimînin û dixwazin navekî din li wan bûya.

10. Li ser çêbûna navên Dêrikê ihtîmalên cuda hene. Navê tax, kuçe û kolanên Dêrikê yên resen di nava nifşê mezin de tê bikaranîn lê di nava nifşên nuh de kêmtir tên zanîn. Ji ber erdnîgarîya Dêrikê, cûreyên teşeyên erdnîgarî gelek in. Navê teşeyan bi piranî bi nêrîn û têkilîya bi xwezayê re û bi bandora jîyana civakî çêbûne. Navê mirovan, navê riwekan, ajalên, taybetmendîyên erdnîgarî, jîyana civakî, reng û pîvanên teşeyan, şûnwar û avahîyên li der û dorê navê xwe dane teşeyên erdnîgarî. Ji bilî van navên awayê lêkirin û wateya wan dîyar, wateya navê teşeyên mîqdarek girîng jî naye zanîn. Ev nav yan bi zimanên bîyanî ne yan jî bi kurdîya kevn bin jî bi demê re wateya wan û awayê çêkirina wan wenda bûye. Balkêş e heman tişt ji bo navê gundan jî durust e. Navlêkirina teşeyên erdnîgarî û navlêkirina gundan dişibe hevdu. Wek awayê

navlêkirinê li gor me di navbera “Xiramê Eysreşê” û “Warga Xensê” de yan jî di navbera “Pozê Qertel” û “Çemê Qêntir” de tu cudayî tune. Navê gundan jî li gor navê mirovan, ajalan, riwekan, taybetmendiyên xwezayê, rengdêrên reng, hêl û alîyan, xirbe, şûnwar û avahîyan çêbûne. Ji bilî van navan, ziman û wateya gelek navê gundan jî naye zanîn. Ev nav jî pêkan e bi zimanên bîyanî bin û yan jî navên kurdî ne lê wateya wan hatine jibîrkirin.

11. Navê eşîr û malbatan bi pîranî ji navê mirovan çêbûne. Di nava van navan de jî bi bandora pederşahîyê yê herî pir hatîye bikaranîn navê mêran e. Wateya navê hinek eşîr nayê zanîn. Navê eşîrekê tenê ji navê herêmekê çêbûye. Li berîya Dêrikê bi taybetî jî gundên li piştî reforma erdan hatine avakirin, navê jîngeh û herêmên ku ev malbatên avakar jê hatine wek navê jêderê, lê di wateya eşîrê de tê bikaranîn. Navê hinek malbat li ser bûyerekê, yê hinek malbat li gor dirûv, nasnav, navnas û pîşeyê avakarê malbatê hatîye dayin. Mirovên navê wan li eşîran bûne ji ber ku pir dûr diherin nayin naskirin lê yê navê wan li malbatê wan bûne ji ber ku nêzîk in, tên zanîn.

V. ÇAVKANÎ

- Akin, S. (2013). *Lêkolînên Zimannasîya Kurdî*. Stembol: Avesta.
- Aksan, D. (1999). *Anlambilim*. Ankara: Engin Yayınevi.
- Aydoğan, M. (2008). Çima “Carbekir” û Ne “Cêrik”. Dema Gihîştinê: 04.02.2015
http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=10&ArticleNr=2787#.VMq6LmNnxH4
- Beşikçi, İ. (1990). *Devletlerarası sömürge Kürdistan*. Dema Gihîştinê: 12.12.2015, <http://bnk.institutkurde.org/images/pdf/6VNG8RT3H5.pdf>
- Beşikçi, İ. (2014a). *Göçebe Alikan Aşireti*. İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı.
- Beşikçi, İ. (2014b). *Kürt Toplumunu Üzerine*. İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı.
- Beşikçi, İ. (2014c). *Doğu Anadolunun Düzeni*. İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı.
- Bozarıslan, M.E. (2001). *Tarihte İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürtler*. Şemseddin Sami (Ed) *Di hundirê Kamusu'l Alam* de (c.3. Rûpel: 2212-2213) İstanbul: Deng Yay.
- Can, Q. (2009). *Qedrî Can Hemû Berhemên Wî*. Rênas Jîyan (Amadekar). Stenbol: Belkî.
- Chomsky, N. (2012). *Doğa ve Dil Üzerine*. Ayşe Banu Karadağ (Çev.). İstanbul: Sözcükler.
- Çamurcuoğlu, G. (1992). Türkîye Cumhuriyeti'nin Toprak Reformu ve Milli Burjuvazi Yaratma Çabası. *Gazi Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi C.XIII*, Sa. 1-2 Dema Gihîştinê: 22.05.2015, http://webftp.gazi.edu.tr/hukuk/dergi/13_7.pdf
- Dersimi, Dr. Vet. M. N. (1952). *Kürdistan Tarihinde Dersim*. Halep: Ani Matbaası.
- Diyarbakır Salnameleri, (1999). H.1286-1323 (M.1869-1905). c.1 (s.49, 218, 249) İstanbul: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yay.
- Diyarbakır Salnameleri, (1999). H.1286-1323 (M.1869-1905). c.3 (s.49) İstanbul: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yay.
- Diyarbakır Salnameleri, (1999). H.1286-1323 (M.1869-1905). c.4, (s.41, 210, 244) İstanbul: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yay.
- Diyarbakır Salnameleri, (1999). H.1286-1323 (M.1869-1905). c.5, (s.58, 154, 265, 317) İstanbul: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yay.

- Durmuş, E. û Yiğit, A. (2003). Türkîye'nin Meyve Üretim Yörelere. *Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. Cilt: 13, sayı:12, sayfa 23-54, Elazığ. Dema Gihîştinê: 10.06.2015
<http://web.firat.edu.tr/sosyalbil/dergi/arsiv/cilt13/sayi2/023-054.pdf>
- Farqînî, Z. (Amadekar), (2005). *Ferhenga Kurdî – Tirkî*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Farqînî, Z. (amd.), (2000). *Türkçe – Kürtçe sözlük*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Gökçe, B. (1992). *Toplumsal Bilimlerde Araştırma*. Ankara: Savaş.
- Güneydoğu Anadolu Araştırmaları Sempozyumu, 30 Nisan-1 Mayıs 2009, Sariatun Savaş, Kuzey Mezopotamya'da Bir Halaf Yerleşmesi: Kerküşti Höyük) Dema Gihîştinê: 21.11.2014
http://www.academia.edu/6325547/A_Halaf_settlement_in_the_Northern_Mesopotamia_Kerkusti_Hoyuk
- Güven, E. (2008). *Derik Tarihi-1. ?*: Anadolu Baskı İşleri ve Gezetecilik.
- Hajdu, M. (?) The History of Onomastics. Dema gihîştinê: 02.01.2014
<http://nevtan.arts.unideb.hu/nevtan/tagozat/06hajdu.pdf>
- Kasımoğlu, A. (2013). *Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî*. İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
- KTHC (Kürt Talebe Hêvî Cemîyeti) (2008). *Hîngerê Zimanê Kurdî*. İstanbul: bgst.
- McDowall, D. (2004). *Modern Kürt Tarihi*. Neşenur Domaniç (Çev.). İstanbul: Doruk.
- Malmîsanij – Lewendî, M. (1992). *Rojnamegerîya Kurdî*. Ankara: ÖZ-GE.
- Mardin İl Yıllığı, (1967). Ankara: Ajans-Türk Matbaacılık.
- Oktar, S. û Varlı, A. (2010). Türkîye'de 1950-54 Döneminde Demokrat Parti'nin Tarım Politikası. *Marmara Üniversitesi, İ.İ.B.F Dergisi, cilt XXVIII, sayı, 1, s. 01-22*. Dema Gihîştinê: 14.04.2014, http://dosya.marmara.edu.tr/ikf/iib-dergi/2010-1/01_oktar-varli.pdf
- Öçal, S. (2008). Şevlo (Koroğlu Destanı'nın Derik Varyantı). *Zeytindalı Dergisi, Dîyarbakır: İtaki Tasarım*
- Önen, A. (2008). *Ferhenga Erdnîgarîyê*. Stenbol: Doz.
- Popov, K. û Dobrov, A.S. (1991). *Burjuva Demokratik Devriminin Proleter Devrime Dönüşmesi*. İstanbul: Dönüşüm.

- Propp, V. (1998). *Folklor Teori ve Tarih*. İstanbul: Avesta.
- Samî Ş. (?). Kamusu'l-A'lam, cîld:3. Rûpel: 2212-2213. 1308 (1891) İstanbul: Mihran Matbaası.
- Sarıaltun, S. (2009). Kuzey Mezopotamya'da Bir Halaf Yerleşmesi: Kerküşti Höyük, Güneydoğu Anadolu Araştırmaları Sempozyumu, Dema Gihîştinê: 11.12.2014,
http://www.academia.edu/6325547/A_Halaf_settlement_in_the_Northern_Mesopotamia_Kerkusti_Hoyuk
- Sav, B. (2010). Cratylus'tan Cours'a Dil Göstergesinin Felsefi Temelleri. *Gazi Eğitim Fakültesi Dergisi*, c.30, sayı.2 s. 615-628.
- Schmökkel, H. (?) Sümer Dini. Dema Gihîştinê: 11.06.2015,
<http://dergiler.ankara.edu.tr/dergiler/37/748/9576.pdf>
- Tunçel, H. (2000). Türkiye'de İsmi Değiştirilen Köyler. *Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. Cilt: 10, Sayı: 2, Elazığ.
- T.C Dahiliye Vekaleti Mahalli İdareler Umum Müdürlüğü, (1933). *Belediyeler*. İstanbul: Holivut Matbaası.
- Uzun, M. (1995). *Antoljîya Edebîyata Kurdî -1*. İstanbul: Tüm Zamanlar.
- Uzun, M. (1992). *Destpêka Edebîyata Kurdî*. Ankara: Beybûn.
- Wallerstein, I. (2005). *Dünya Sistemleri Analizi: Bir Giriş*. İstanbul: Aram.
- Yıldırım, A. û Karadoğan, S. (2010). Derik (Mardin) Güneyinde Korunması Gereken Jeolojik – Jeomorfolojik Bir Doğal Miras: Kuşçu Krateri. *Dicle Üniversitesi Zîya Gökalp Eğitim Fakültesi Dergisi*. 14. 119-133 Dema Gihîştinê: 11.11.2013,
http://www.zgefdergi.com/Makaleler/2120086702_14_10_Yildirim-Karadogan.pdf

PÊVEK

Pêvek 1: Kaxeza Pirsan

A. Pirsên Hevdîtinên Li Navenda Dêrikê

1. Navê eşîr û malbata we çi ye?
2. Eşîra we, malbata we ji ku û kengî hatîye Dêrikê?
3. Di demên berê de têkilîyên eşîrî û malbatî çawa bûn?
4. Li gor we girîngîya eşîr û malbatê çi ye? Hun bi çi serbilind in, bi eşîra xwe, bi malbata xwe, bi ola xwe yan bi milletê xwe?
5. Têkilîya we bi eşîr û malbata we re çawa ye?
6. Di navbera Dêrika anha û ya berê de çi ferq heye?
7. Jîyana berê xweş bû yan jîyana anha?
8. Aborîya berê li ser çi bû, we bi çi debara xwe dikir?
9. Têkilîyê we û filehan (Mesîhîyan) çawa bû?
10. Dîlanên berê çawa bûn?
11. Şînên berê çawa bûn?
12. Cil û bergê we çawa bûn?
13. Di demên berê de têkilîyên di navbera mirovan de çawa bûn, li gor we anha çawa ne?
14. Li ser dîroka Dêrikê hun çi zanin?
15. Hun ji çîrok, destan, meselok û kilaman çi zanin?
16. Hun li malê bi kîjan zimanî dipeyivin, hun bi kîjan zimanî çiqasî zanin?
17. Li Dêrikê berê xweza çawa bû, anha çi hatîye guhertin?
18. Hun navên çawa li zarokên xwe dikin, hun li gor çi navê wan hildibijêrin? Heger qedexebûnek tunebe, hun dixwazin navê zarokên we bi kîjan zimanî bin?
19. Hun kî nava li zarokan dikin? Dema ku hun navekî li zarokekî dikin hun li çi dinêrin?
20. Hun bi wateya navê xwe dizanin yan na? Kê ev nav li we kiriye?
21. Li navenda Dêrikê kîjan teşeyên erdnigarî hene, navê wan çi ne?

22. Ji kuçe, kolan û taxên Dêrikê hun kîjanan nas dikin?

23. Hun dema xwe çawa derbas dikin?

B. Pirsên Hevdîtinên Li Gundan

1. Navê gundê we çi ye?

2. Wateya navê gundê we çi ye, li gor we ev ji ku tê?

3. Şênîyên gundê we ji kîjan eşîrê ne?

4. Di gundê we de çend malbat hene û navê wan çi ne? Têkilîya eşîr û malbatên gund çawa ne?

5. Li gundê we şûnwar hene yan na? Heger hebe navê wan yan jî yên herêmên wan çi ne?

6. Li ser dîroka gund hun çi zanin, gundê we kengî û çawa ava bûye?

7. Aborîya gundê we li ser çi ye, şênî bi kîjan karan dadikevin? Malên diherin karên demsalî hene yan na?

8. Li gundê we kîjan berhem tî çandin, kîjan ajal tî xwedî kirin, rewşa aborîya şênîyên van karan dike çawa ye?

9. Têkilîya we bi kîjan navçe û bajaran re heye? Dan û sitendinên we bi piranî li ser ku ye?

10. Li gundê we berê jîyan çawa bû, anha çawa ye? Çi hatîye guhertin, ev guhertin bi we xweş e yan ne xweş e?

11. Li gundê we di demên berê de dîlan, şîn, cejn çawa bûn?

12. Hun bi kîjan zimanan zanin, li gundê we şênî bi kîjan zimanan dipeyivin?

13. Li gundê we çîrok, meselok, destan û kilamên tî gotin hene yan na?

14. Hun li ser kîjan mezhebî nin? Li gundê we ji ol û mezhebên din kesek heye yan na?

15. Li mala we telewîzyon, telefon û înternet heye, yan na? Hun telefonên desta bikartînin? Hun li gund dema xwe çawa derbas dikin?

16. Li gundê we kîjan teşeyên erdnigarî hene, navê wan çi ne?

17. Li gundê we wargehên wek war, rez, mezel, û zîyaretan çi hene, navê wan çi ne?

18. Li gundê we sazîyên fermî yên wek dibistan, kooperatîf, komele, mala tenduristîyê, qereqol çi hene?

19. Li gundê we qehwexane, odeya gund, dikan, firne çi hene?
20. Li gundê we rewşa binesazîyê çawa ye? Rewşa rê, ava vexwarinê, kanalîzasyona gund çawa ye?
21. Pirsgirêkek di nava gund de derkeve hun çawa çareser dikin?
22. Kêmanîyên gund çi ne, gilî, gazin û daxwazên we çi ne?

2. Mînakek Lîsteya Hilbijêran

İlgili Kanun ve Madde: 298.

: MARDİN
: DERİK
İhtarlık : BOYAKLI MAH.

MUHTARLIK BÖLGESİ ASKI LİSTESİ

Sayfa No : 7

Seçmen Sıra No.	SEÇMENİN OTURDUĞU		SEÇMENİN					
	Caddesi, Sokak Veya Kütüphanesi Adı	Binanın		Adı	Cinsiyeti	Baba Adı	Doğum Tarihi	Nüfusa Kayıtlı Olduğu İlçe
		Kapı No.	Daire No.	Soyadı		Ana Adı	Doğum Yeri	İlçe
187	BOYAKLI SOKAK	185	ZERGA	K	MEHMET ŞERİF	15/12/1994	MARDİN	
134****216			ÇAĞLAR		BAHAR	DERİK	DERİK	
188	BOYAKLI SOKAK	187	HADİCE	K	EMİN	24/8/1966	MARDİN	
164****292			ÇAĞLAR		FATMA	KIZILTEPE	DERİK	
189	BOYAKLI SOKAK	187	HALEF	E	ŞEYHMUS	17/11/1973	MARDİN	
164****470			ÇAĞLAR		ZEYİNİ	DERİK	DERİK	
190	BOYAKLI SOKAK	187	SABAHAT	K	HALEF	14/2/1996	MARDİN	
164****410			ÇAĞLAR		HADİCE	DERİK	DERİK	
191	BOYAKLI SOKAK	3	FATMA	K	İSMAIL	10/7/1964	MARDİN	
197****928			ÇELİK		FAİKA	DERİK	DERİK	
192	BOYAKLI SOKAK	3	MENDERES	E	MENDUĞ	5/6/1988	MARDİN	
197****352			ÇELİK		FATMA	DERİK	DERİK	
193	BOYAKLI SOKAK	3	MENDUĞ	E	İDAN	1/1/1957	MARDİN	
198****372			ÇELİK		GÜLÇİN	KIZIL	DERİK	
194	BOYAKLI SOKAK	3	MURAT	E	MENDUĞ	8/11/1984	MARDİN	
197****496			ÇELİK		FATMA	DERİK	DERİK	
195	BOYAKLI SOKAK	3	MUZAFFER	E	MENDUĞ	15/3/1996	MARDİN	
195****816			ÇELİK		FATMA	DERİK	DERİK	
196	BOYAKLI SOKAK	3	UĞUR	E	MENDUĞ	9/11/1993	MARDİN	
196****636			ÇELİK		FATMA	DERİK	DERİK	
197	BOYAKLI SOKAK	7	AZİZE	K	ALİ	25/9/1981	MARDİN	
196****344			ÇELİK		GÜLİ	DERİK	DERİK	
198	BOYAKLI SOKAK	7	KAHRAMAN	E	MEHMET	9/4/1978	MARDİN	
197****114			ÇELİK		ZERGA	DERİK	DERİK	
199	BOYAKLI SOKAK	7	SALAHATTİN	E	MEHMET	10/1/1986	MARDİN	
196****200			ÇELİK		ZERGA	DERİK	DERİK	
200	BOYAKLI SOKAK	7	SAVAŞ	E	MEHMET	9/4/1981	MARDİN	
197****278			ÇELİK		ZERGA	DERİK	DERİK	
201	BOYAKLI SOKAK	7	UMRAN	K	ABDULVAHAP	21/9/1984	MARDİN	
473****018			ÇELİK		SULTANI	DERİK	DERİK	
202	BOYAKLI SOKAK	44	ESMA	K	ALİ	1/3/1966	MARDİN	
198****392			ÇELİK		ZELİHE	DERİK	DERİK	
203	BOYAKLI SOKAK	44	HACI	E	VECDİN	1/7/1995	MARDİN	
195****544			ÇELİK		ESMA	DERİK	DERİK	
204	BOYAKLI SOKAK	44	VECDİN	E	İDAN	8/4/1971	MARDİN	
198****456			ÇELİK		GÜLÇİN	DERİK	DERİK	
205	BOYAKLI SOKAK	56	AYŞE	K	İBRAHİM	15/8/1990	MARDİN	
111****516			ÇELİK		ZAHRA	DERİK	DERİK	
206	BOYAKLI SOKAK	56	FERİDE	K	İBRAHİM	1/11/1992	MARDİN	
110****328			ÇELİK		ZAHRA	DERİK	DERİK	
207	BOYAKLI SOKAK	56	İBRAHİM	E	ŞEYHMUS	1/1/1963	MARDİN	
113****722			ÇELİK		ŞEMSİ	DERİK	DERİK	
208	BOYAKLI SOKAK	56	MERAL	K	İBRAHİM	4/9/1988	MARDİN	
111****442			ÇELİK		ZAHRA	DERİK	DERİK	
209	BOYAKLI SOKAK	56	SONGÜL	K	İBRAHİM	5/8/1994	MARDİN	
109****612			ÇELİK		ZAHRA	DERİK	DERİK	
210	BOYAKLI SOKAK	56	ZAHRA	K	ALİ	21/9/1967	MARDİN	
111****366			ÇELİK		HECİ	DERİK	DERİK	
211	BOYAKLI SOKAK	57	AYDIN	E	ŞERİF	6/6/1991	MARDİN	
110****276			ÇELİK		YILDIZ	DERİK	DERİK	
212	BOYAKLI SOKAK	57	CELİLE	K	ŞERİF	3/7/1989	MARDİN	
110****112			ÇELİK		YILDIZ	DERİK	DERİK	
213	BOYAKLI SOKAK	57	MUSTAFA	E	ŞERİF	1/12/1987	MARDİN	
111****204			ÇELİK		YILDIZ	DERİK	DERİK	
214	BOYAKLI SOKAK	57	ŞERİF	E	ŞEYHMUS	1/1/1961	MARDİN	
113****668			ÇELİK		ŞEMSİ	DERİK	DERİK	
215	BOYAKLI SOKAK	57	YILDIZ	K	EKREM	1/1/1989	MARDİN	
111****016			ÇELİK		CELİLE	DERİK	DERİK	
216	BOYAKLI SOKAK	57	YILDIZ	K	MEHMET	1/1/1970	MARDİN	
113****220			ÇELİK		AZİZE	DERİK	DERİK	
217	BOYAKLI SOKAK	58	MEHMET	E	ŞEYHMUS	2/12/1975	MARDİN	
111****630			ÇELİK		ŞEMSİ	DERİK	DERİK	

3. Mînamek Lîsteya Şagirtan (Ji Dibistana Qizilê ya Seretayî)

<u>Adı</u>	<u>Soyadı</u>	<u>Sınıfı</u>	<u>Durumu</u>
AHMET	TEMEL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
ALAATTİN	DAĞLI	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
ASYA	DAĞLI	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
AYLİN	GÜVEN	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
BERİVAN	DAĞLI	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
CELİLE	KAÇMAZ	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
CEMAL	KAÇMAZ	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
CİVAN	ÖZKIZIL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
ELİF	TEMEL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
ELİF	TUR	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
ESRA	DAĞLI	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
FAHRİ	KAÇMAZ	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
FELEK NAZ	ŞAMAN	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
FERHAT	ÇAĞLAR	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
FERHAT	KAYA	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
FERMAN	ÇELİK	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
FİLİZ	TEMEL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
FİLİZ	TUR	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
FURKAN	KANAK	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
GAZAL NUR	ÇELİK	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
HACİ	TEMEL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
HALİT	TÜRKOĞLU	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
HATİCE	TEMEL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
HAVİN	KAYA	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
HEJA	SAKİN	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
HELİN	KIZIL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
HIDİR	KIZIL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
KÜBRA	ÖNGÖRÜR	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MAHMUT	KIZIL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MEHMET	DİDİN	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MEHMET	KIZIL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MEHMET	TAŞKIRAN	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MEHMET SALİH	SAKİN	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MEHMET SALİH	YILMAZ	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MERVE	DAĞLI	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MEZİN	SAKİN	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MUSTAFA	GÜVEN	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MUSTAFA	TEMEL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
MÜNİR	TEMEL	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
NAİME	DİDİN	3. Sınıf	Aktif Öğrenci
NUJİYAN	EKEN	3. Sınıf	Aktif Öğrenci

Pêvek 4: Anketa li DAL'ê û li ATA. O.'yê Hatîye Çêkirin

Atatürk Ortaokulu Öğrencilerine Yönelik Kişi Adları Üzerine Bir Anket Çalışması

1. Adınız: Soyadınız: Doğum Yılıınız:

2. Varsa göbek adınız (ikinci adınız) :

3. Babanızın Adı: Annenizin Adı:

Babanızın Öğrenim Durumu:

- İlkokul
 Ortaokul
 Lise
 Üniversite
 Okuryazar değil
 Okuryazar

Anninizin Öğrenim Durumu:

- İlkokul
 Ortaokul
 Lise
 Üniversite
 Okuryazar değil
 Okuryazar

4. Adınızı kim koymuş?

- Babam Annem Dedem Ninem
 Amcam Dayım Halam Teyzem
 Doktor İmam Bilmiyorum

5. Bu adın size niye verildiğini biliyor musunuz?

- Dedemin adıdır Ninemin adıdır Amcamın adıdır Dayımın adıdır
 Halamın adıdır Teyzemin adıdır Babamın adıdır Annemin adıdır
 Ünlü birisinin adıdır ().....

6. Adınızın Anlamını biliyor musunuz?

- Evet Hayır

7. Adınızı Seviyor musunuz?

- Evet Hayır

8. Cevabınız hayırsa adınızın ne olmasını isterdiniz?

.....

9. Kardeşlerinizin adını büyükten küçüğe doğru sıralayınız:

.....

Ankete katıldığınız için teşekkür ederim.

Serdar Öçal
Derik Anadolu Lisesi
Türk Dili ve Edebiyatı Öğrt.

Pêvek 5: Wêne



Wêne 1: Mozayîkek Zemberorê (Zemberor)



Wêne 2: Wêneyê Belkirî yê Xezalekê yan Pezkûvîyekê, ji Parçeyek Şelbik. (Tilbisim)



Wêne 3: Mezelên Tatîn (Fitin)



Wêne 4: Hewşa malekê (Qizil)



Wêne 5: Dîmenek Bixurê (Bixur)



Wêne 6: Ava Dengiza Bixurê (Bixur)



Wêne 7: Şûnwarên Fitnê (Fitin)



Wêne 8: Jinek ji çiyê êzinga tîne.(Xarok)



Wêne 9: Jinek li ser tenûrê girikan hildike. (Xarok)




Wêne 10: Kevirekî xaç li ser. (Selmê)



Wêne 11: Dîmeneke Dêrikê

Pêvek: 6. Nexşeya Dêrikê û Cihê Qizilê, Bixurê, Fitnê û Xarok



Nexşeya Dêrikê û çar gundan.



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**DERİK YÖRESİNDE AD VERME BİÇİMLERİ
(ONOMASTİK-SOSYOLOJİK BİR İNCELEME)**

Serdar Öçal

12711004

Tez Danışmanı

Prof. Dr. Farouk İsmail

Mardin 2016